

Amed TÎGRÎS

6762

Gotinên Pêşîyan

KUR
398.
2095667
TIG

Amed Tigrîs

6762

Gotinên pêşîyan

هه‌و‌نامه‌ی کتێب

IREWŞEN

Li ser gotinên pêşiyar û vê berhevokê çend gotin

Girîngî û pêwîstiya gotinên pêşiyar

Kurd ji gotinên pêşiyar re “gotinên mezinan, peyvên pêşiyar, gotinên bav û kalan, metelokên kurdî,” û “Pendên kurdî” jî dibêjin.

Gotinên pêşiyar di wêjeya kevn a devkî de cîhekî girîng digirin. Ew berhemên kolektîv ên hezar salan in. Dîrok, felsefe û sosyolojiya civatê ne. Bi zanebûna gotinên pêşiyar mirov di derbareyê çanda xwe ya kevn de serwext û zane dibe. Di axavtinê de karanîna gotinên pêşiyar, axaftina mirov xurt dike, dixemlîne û tesîr li ser guhdaran dihêle. Herweha di nivîsaran de jî rola gotinên pêşiyar wek ya devkî girîng e. Carnan gotineke pêşiyar jî hezar gotinên normal kurtir, hêjatir û berbiçavtir e.

Xaleke girîng jî ev e, ku dijminê me çanda me ya kevn a dewlemend li me qedexe kiriye û jî aliyê din ve, jî xwe re dike mal û dibe. Di warê gotinên pêşiyar de jî weha ye. Gotinên me berhev dikin, werdigerînin zimanê xwe û dibêjin “yên me ne.” Wek nimûne, îro nivê gotinên pêşiyar ên Tirkan yê me ne.

Girîngiyeyeke din jî ev e, ku heta niha gotinên me yên pêşiyani ji ber nebûna dewletê, bi devkî û herêmî mane. Her kes yên herêma xwe dizane û bi kar tîne. Ji her herêmî nehatine komkirin û nebûne malê gel. Ji devkî derbasbûna wan a nivîskî ancax dikare tixûbên herêmî biçirînin û bibin Kudistanî.

Min bi salan ji kal û pîrên herêmên cuda ku li Ewrûpayê dijîn, gotinên herêmên wan pirsî û li ba xwe not kir. Piştî min çiqas roman, çîrok, rêzimanên kurdî û nivîsarên kurdî yên ku bi dest xist, yek bi yek xwend û di nav rûpelên wan de, li gotinên pêşiyani geri-yam. Di vê mijarê de çavkaniyên herî bi kelk û dewlemend pirtûka Hüseyin Deniz a bi navê “Gotinên Pêşiya”, ya O. Celîl û C. Celîla bi navê “Mesele û Metelokên Kurdî”, ya Mele Mehmûdê Dêrşewî bi navê “Miştexa Çiya Gotinên Pêşiyani”, ya A. Balî bi navê “Gotinên Pêşiyani ên Kurdî”, ya Mehfûzê Mele Silêman bi navê “4000 Pendê Kurdî” û gramera Celadet Bedîrxan û Lescot a ku bi navê “Türkçe Açıklamalı Kürtçe Grameri” û hwd. bûn.

Ji derî van berhemên jorîn, di gelek kovar, rojname û weşanên Kurdan de gotinên pêşiyani hatibûn weşandin. Yên ku min ji wan sûd û kelk girtin, min navên wan di dawîya pirtûkê de yek bi yek rêz kirin. Min bergehê lêkolîna xwe kûr û berfireh kir û berê xwe da gotinên pêşiyani ên tirkî û swêdî jî. Di vî warî de ne ku gotin ji wan bigirim lê li ser dîtin û teoriyên wan rawestam. Rastî çî bêm baş e? Di dîroka lîteratura cîhanê de (Litteraturens-historiya cilt-1) rast hatim ku cara pêşî gotinên pêşiyani li Mezopotamyayê di dema Sumeran de, li bajarên Ûr û Ûruk hatine gotin û li ser kevirên bajêr bi nivîsarên wêneyî hatine nivîsîn. Piştî di Încîlê beşa Tewratê de rastî pirtûka gotinên pêşiyani hatim ku 2500 sal berî niha ji aliyê kralê Îsraîl Solomo ve hatiye nivîsîn. Mirov dikare bêje, ku ev li cîhanê pirtûka gotinên pêşiyani a yekemîn e. Homeros Odîssên yê Grekî jî li ser gotinên pêşiyani rawestayê. Bingehê gotinên pêşiyani ên cîhana Xirîstiyani jî van gotinên Solomo pêk tînin.

Di her zimanî de gotinên pêşiyani ên kevn û nû hene. Hinek hene ku bingeha wan digihe hezar salî û hinck jî hene ku temenê wan çend sed sal in. Ji derî vê her ku dem û teknîk tê guhartin, di gotinên pêşiyani de jî guhartinên çêkirin, hevoka kevn wek xwe dimîne lê yek an du gotinên wê tînin guhartin. Wek nimûne, di gotineke pêşiyani ya swêdiya kevn de gotina “çûxe” heye û di ya îro ew gotin bûye “qazax.” Di gotineke din de di şûna gotina “hesp” de gotina “makîne” cîh girtiye. Di gotinên kurdî yên kevn û nû de jî weha cîhguhartinê peyvan hene. Di gotineke kevn de weha ye: Mala ku mix lê tune be, mirov nikare qutikê xwe dayîne wir. Di ya nû de gotinên “mîx” û “qutik” hatine guhartin û di şûna wan de gotinên “bizmar” û “çaket” cîh gir-

tine û gotina nû weha bûye: Mala ku bizmar lê tune be, mirov nikare çaketê xwe dayîne wir.

Ez di hemû berhemên kurdî yê heyî de rastî şaşî û çewtiyên gelek mezin hatim, ku ev şaşî û çewtî îro jî, ji aliyê gelek nivîskarên Kurd ve tên kirin. Ez dixwazim bi çend xalan li ser van tevlihevî û şaşiyên rawestim û mijarê piçek zelal bikim. Armanca berhevkirina min a gotinên pêşiyên yek jê jî, ev bû. Yanî hîlbijartin û zelalkirina gotinên pêşiyên bû. Êdî pêwîst e, ku gotinên me li bêjîngê bikevin.

Yek; di pirtûka Celîlan de piraniya gotinên pêşiyên ji herêma Serhedê û Kurdên Sovyeta Kevn hatine berhevkirin. Ya Hüseynî Denîz hîn tengtir, biçûktir e û mirov dikare bêje ew berhevokeke gotinên herêma Mêrdînê ye û bi heman devokê hatiye nivîsîn. Mele Mehmûd Dêrşewî jî, bi tenê gotinên pêşiyên ên herêma Bahdînan berhev kiriye û bi devoka herêmê nivîsiye. Ya A. Balî tevlihev e û heta wergerên gotinên tirkî jî di nav de hene. Ya Mehfûzê Mele Silêman berhevokeke Kurdên Binxetê (Sûriyê) ye û bi taybetî ya herêma Efrînê ye û bi devoka Efrînî û Torî hatiye nivîsîn. Mirov di vê berhevoke de rengê zimanê erebî û zaravayê soranî jî dibîne.

Du; ew berhevokên ku heta niha hatine çapkirin ji aliyê rêziman û rastnivîsînê ve xwediyê gelek şaşiyên in. Bi devokên herêmî hatine nivîsîn. Bi taybetî wek ku li hinck deveran gel dipeyîve weha bê daçek hatine nivîsîn an jî paş daçek heye, lê pêş daçek tune.

Sê; Berhevkarên van berheman qaşo gotinên pêşiyên berhev kirine, lê bi gotinên pêşiyên re hevokên normal, mamik (tiştanok), lihevhatî (tekerleme), biwêj (deyîm), metelok û kurteçîrok tevlihev kirine û ji hemûyan re gotine “gotinên pêşiyên.” Halbû ku her yek ji van bi serê xwe beşek ji folklorê gelêrî ye. Ji wan şaşî û tevliheviyan çend mînak:

Agir li ber piyê wî dike av. Bû ava bin kayê. Barê êzingan im. Hevrîşkên avê ji hev re çêdikin. Libên kuncî ji dest narije. Mar di bin zik re nehilkişiya. Mast û sed car mast. Rast xelas. Stêrk bi ezmanan ketan û tîfing bi destê min. Tifa ser hevrazê ye. Tilî zêrbirîn. Timî berê kevçiyê bi xwe ve dike. Xêr û xweşî li me barî, kevir û kuçik li we. û hwd.

Di van berheman de, bi sedan gotinên weha hene ku ne gotinên pêşiyên in. Hinck ji wan biwêj in û hinek jî hevokên normal in.

Çar; di hinek berheman de xwediyê gotinê bi xwe diyar e. Hingê ew ne gotina pêşiyên e, wecîze ye. Yanî gotina kesekî bi nav û deng e. Wek mînak, gotina Ehmedê Xanî jî kirine nav gotinên pêşiyên.

Pênc; berhevkarên gotinên pêşiyên li gor deveran, heger di hevokê de gotineke cuda jî hebûye, ew ne wek hevokê, du gotinên pêşiyên ên cuda hesibandine û nivîsîne. Wek mînak: “Ferqa kûçikê sor û spî tune.” û “Ferqa

kûçikê reş û spî tune.” “Ecelê nêrî tê diçe nanê şivan dixwe.” û “Ecelê mar tê diçe xwe li ser rê kilor dike.” “Dilê şivan bixwaze, dikare ji nêrî şîr bidoşe.” û “Dilê şivan bixwaze, dikare ji nêrî golemast çêbike.” “Goşt û neynik ji hev nabin.” û “Neynik ji goşt demayê....”

Berhevkarên me, hevokên ku gotineke wan ne wek hev e û wateya wan yek e, her yek wek gotineke serbixwe hejmartine û nivîsîne. Lê min weha nekir; min çend gotinên nêzîkên hev, gotinek hesiband û yên din jî wek varyant bi tîpên reş û biçûk li bin ya sereke nivîsî û yên ku varyantên wan jî yekê bêhtir bûn, min ew li bin wek a), b), c) bi rêz kirin. Di vê berhevokê de yên bi hejmar wek hûn jî dibînin 6762 û varyantên bêhejmar jî 846 gotin in. Hemû dikin: 7608 gotinên pêşyan. Ew dagîrkerên ku bi sed salan in zimanê kurdî qedexê kirine û bi ser re jî dibêjin “zimanê kurdî 33 kelîme ye”, ev berhevok ji bo wan bersiveke berbiçav e. Bila bibînin ka zimanê kurdî çi ye, çend kelîme ye û bi zimanê xwe re muqayese bikin!

Şeş; min ne xwest, orjînalê gotinê xerab bikim lê heta ji destê min hat, min ew li gor prensîbên rêzimanî nivîsîn. Lê ji derî yên ku bi helbestî an jî kêşanî hatine gotin, min dest neda yên weha.

Gelo taybetiyên gotinên pêşyan çi ne?

Gotinên pêşyan temendirêj in. Şîret û ders in. Telesî û rêşan in. Anonîm in, xwediyên wan ne diyar in û malê gel in. Li gor mercên dem, civat, demsal û mehan hatine gotin. Taybetiyên gotinên pêşyan, gotin gelek kurt û bi hunerê ramanî dagirtî ne. Di çîrok, helbest, mamik, lihevhatî û metelokan de lîstika gotin û ziman heye, gotinên wan sergirtî, hevok dirêj û bi çend wateyan in. Mirov dikare bêje ferqa herî mezin ya ku di navbera biwêj û gotinên pêşyan de heye ew e, ku di gotinên pêşyan de hevok tam e lê di biwêjan de hevok ne temam e, nîvçe ye. Gotinên pêşyan pexşan in, ne helbest in lê paşgînên hinek gotinan bi kêşan in yanî helbestkî ne.

Cureyên gotinên pêşyan

Pisporên berhemên folklorîk, gotinên pêşyan du beş dihesibînin:

- a) gotinên pêşyan ên resen
- b) gotinên pêşyan ên nîvbiwêjî

a) Gotinên pêşyan yên resen

Gotinên resen (sade) gelek vekirî û zelal in. Şîret in, bi bend û prensîb in, tecrûbe ne, wezîfeyên zanîn û rênasiyê pêk tînin. Her yek wek qanûn. prensîba exlaqî, pîvana însanî, xû, edet û hukmek e. Wezîfeyên encam, lêgerîn, lêkolîn û helwesta mirov bi cîh tînin. Heta hinek jî wan wek qanûn

in û gelek helwest û tiştî qedexe dikin an jî weha dibînin. Ev beşa resen jî di nav xwe de dibê sê beş:

1. Yên prensîbên exlaqî, perwerde, hînkirin, îbret, hukim û telesiyê ne, wek: Xwendin nanê patî ye û di tûrika mirov de ye.

Di vê beşê de hinek tecrûbe, telesiyên demsal û mehan in. Li ser rewş û avhe-waya demsal, meh û rojan hatine gotin. Li gor herêman tarîfa xweristê dikin û wateyeke wan ê mecazî jî nîn e. Wek: Adar e tirok e, sibat e revok e. Bayê germ bayê baranê ye, bayê sar bayê berfê ye.

2. Di vê beşê de raste rast eqildayîn, qedexe û şîret hene. Wek: Dost mirov digirîne, dijmin dikenîne.

3. Gotinên pêşiyên ên çîrokî. Ev gotin jî, ji çîrokan hatine girtin û gelek hatine kurtkirin. Divê mirov vê cureya gotinên pêşiyên yê resen ku bingehe wan ji çîrokan hatine girtin û yê biwêj ên çîrokî tevlihev neke. Hinek ji wan çîrok hatine kurtkirin û diyalog in û ev hevok ji aliyê kesê sêyemîn ve tê gotin, wek: Ji yekî re gotin: Tu bext dixwazî an text? Got: Bext hebe, dê text hebe. Çend cureyên din jî hene ku ew ji aliyê kesên duyem an jî yekem ve tên gotin. Di çîrokên fabil de jî gotinên pêşiyên hene. Kes baş nizane ew gotinên pêşiyên ji çîrokên fabil çêbûne an jî fabil li ser binhegê gotinên pêşiyên hatine çêkirin.

b) Gotinên pêşiyên ên nivbiwêjî

Gelek zehmet e, ku mirov bikarîbe, gotinên pêşiyên ên nivbiwêjî û biwêjan ji hev cîhê bike an jî veqetîne. Ew gelek nêzikî hev in. Wek min li jor jî destnîşan kir, ji ber vê yekê, berhevkarên Kurd heta îro gotinên pêşiyên û biwêj tevlihev kirine û hema hema ji hemûyan re gotine "gotinên pêşiyên." Gotinên pêşiyên ên nivbiwêjî bi gelemperî ji biwêjan dirêjtir in. Di axaftina rojê de kêm derbas dibin. Piranî bê mester in. Du nimûne: Berûya ku ji darê dikeve darê nasnake. Dawet li malê ye, dehol li çolê ye. Biwêj bi gelemperî xwedî wateyeke mecazî ne û carnan gotinên qebe ne. Piraniya wan ji çend peyvên hevduvanî pêk tên. Wek: Çavsorî, destdirêjî, doxînsistî, pozbilindî, piştîsikestî û hwd.

Ez hevî dikim, ku min di vê xebata xwe de ev taybetiyên ha li ber çav girtin û bi awayekî firehtir lê kola. Gotinên pêşiyên, ji nav hevok, tiştanok, lihevhatî, biwêj, metelok û kurteçîrokan li moxilê xist, hîlbijart û di vê berhemê de kom kir. Lê dîsa jî, hinek gotinên weha hebûn, ku ez bi xwe jî, nikarîbû biryar bidim, ka ew sermoxil in an jî binmoxil in.

Ev xebat him ji aliyê gotinkomkirin û him jî, ji aliyê zimên û rastnivîsînê ve xebateke ne herêmî ye. Kurdistanî ye. Ji herêmên Serhed, Sovyeta kevin, Biradost-Mukriyan, Hekarî, Bahdînan, Mêrdîn, Qamîşlo, Efrîn, Amed,

Botan, Xerzan, Berfîrad, Xoresan, Kurdên koçber (Qonya, Enqera, Sêwas, Qirşehîr) û heta zaravayên Soran û Dimilî jî digire nav çarçoveya xwe ya xebatê. Xebateke weha ku êdî kes nebêje, “li herêma me weha dibêjin.” Çavkaniyên nivîskî ku di dawiya vê pirtûkê de hatine nivîsîn vê rastiyê didin diyar kirin.

Min hinek gotin şirove kir û şirova wan jî, bi tîpên edetî li bin wan nivîsî.. Yên bê şirove hinek ji wan wateya wan gelek zelal bûn û şirove ji wan re ne pêwîst bûn. Hinek jî ez bi xwe di şiroveya wan de ketim gumanê û dikarîbû şaş şirove bikim. Ji ber vê yekê jî, min ew bê şirove hişt in, ku xwendevan bi xwe biryar bidin.

Min li gor mijaran li dawiya pirtûkê îndeksekê çêkir; bi alîkariya vê îndeksê mirov dikare li gor daxwaza xwe li gotinan bigere û bibîne.

Amed Tîgrîs
01. 05. 2000 Stockholm

هه‌و‌النّامه‌ی کتیب

- 1- Aborî bi razan û zikmizdanê nabe bi xebat û xwêdanê dibe.
- 2- Adar e dew li dar e, danê sibehê sar e,
danê êvarê kûçik xwe davêje sîha dîwar e.
Weha jî dibêjin: Adar e dew li dar e, çilo bû mîna guhê kar e.
- 3- Adar e dew li dar e,
li ne Hazirbo û Sîwar
li Mosil û Jengar e.
Di meha adarê de êdf bihar dest pê dike lê ne li her derî; li Başûr bihar
zû tê lê li Bakur dereng tê.
- 4- Adar gehişte bîstan xweş dibin bax û bostan
- 5- Adar e sibehê sar e, nîvro bihar e.
- 6- Adar e tirok e, sibat e revok e.
- 7- Adar ne bihar e, xox ne dar e û qîz ne war e.
- 8- Adar e berf dide guliyên darê lê namîne heta êvarê.
- 9- Agir baş e lê her agir ne xweş e.
- 10- Agir berda kayê û xwe da aliyê bayê.
- 11- Agir bi agir venamire.
- 12- Agir bi avê vedimire.
- 13- Agir bi daristanê dikeve ter û hişk tev dişewitin.
Li hinek deverên welêt weha jî dibêjin:
 - a) agir bi çiyê dikeve teyr û tilûr bi hev re dişewitin.
 - b) agir bi çiyê dikeve, ter û hişk tev dişewitin.
- 14- Agir bi darê hûr geş bike!
- 15- Agir bi ser serê min ketiye, tu firîgê xwe diqelînî.
Li gelek deverna weha jî dibêjin:
 - a) agir bi serê min ketiye, tu jî rûnê xwe li ser diqijrînî.
 - b) agir girtibû mala yekî yê din ser û pê li ber dikizirandin.
- 16- Agir bike lê bê dû bike.
- 17- Agir berda komê û xwe da aliyê zomê.
Weha jî dibêjin: Agir da kozê û xwe da fêzê.
- 18- Agir davêje devê xwe dibêje;" hay jê nîn im."
- 19- Agir debara zivistanê ye.
- 20- Agir di kevnebizûtan de dimîne.
- 21- Agir di malê de leme-leme, cîh ji kêç û mişkan re nema.

- 22- Agir dibêje, "bi min bimîze lê bi min nelîze."
- 23- Agir girtibû mala derewînan kesî bawer nedikir.
- 24- Agir girt mala yekê û mal şewitî, got:
Datikê tîr ji keçan re nema.
- 25- Agir gula zivistanê ye.
- 26- Agir pêkeve bîhna pîso jê nayê.
- 27- Agir û pîso li cem hev nabin.
Varyanteke weha jî heye: Agir û barût li ba hev nabin.
- 28- Agir xweş e lê xwelî jê çêdibe.
- 29- Agirê bîyaniyan mirov germ nake.
- 30- Agirê dilan agirê sêlan.
Weha jî dibêjin: Agirê dilan, darê ber pilan.
- 31- Agirê dostan mirov naşewitîne.
- 32- Agirê evînê dil disotîne.
- 33- Agirê gamêşan bû warê qelsemêşan.
- 34- Agirê gurr her kes destê xwe dide ser.
Weha jî dibêjin: Agirê gurr he rkes derdê xwe dide ser.
- 35- Agirê ku pênekeve dû jê dernakeve.
- 36- Agirê kuçikan timî germ e.
Weha jî dibêjin: Agir di kuçikan de disekine.
- 37- Agirê mala xwe bermede mala cîranê xwe.
- 38- Agirê qirşan nahsiyên Tirkan.
Çawa bawerî bi agirê qirşan nabe, zû vedimire, herweha bawerî bi got-
inên
Tirkan jî nabe. Tirk jî zû soz û peymanên xwe ji bîr dikan.
- 39- Agirê şevê nêzîk xuya dike.
- 40- Agirê xweş agirê qurman e.
Li hinek herêman weha jî tê gotin: Agir li qurman dimîne.
- 41- Agirê xweş çêtir e ji mazûvanê dilreş.
- 42- Aha aş aha çirçirik!
- 43- Ahên bizina kol ji ya kiloç re namîne.
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Ahên vî destî namînin li vî destî.
- 44- Ahên sêwiyan, namîne li ser zaliman.
- 45- Alamet tarî qîyamet.
- 46- Aletê xerab naşike.
- 47- Alim bibe rê di ser re derbas nebe.
- 48- Alîm ji bîr dike lê qelem ji bîr nake.

49- Alîyekî şîn e aliyekî girîn e.

50- An bike û nepirse an neke û netirse.

51- An mêr be an bivir be an jî bimire û xilas be.

52- Ancax bira li hewara bira here.

53- Anî cîhê xwe rakir rûyê xwe.

Weha jî dibêjin: Xwedî kir bi nanê xwe û berda canê xwe.

54- Anî ji derya da xêra mirîya.

55- Anîna sêwiyan xweş e lê xwedîkirina wan reş e.

56- Ap bi biraziyar re xal bi xwarzar re.

Li hinek cîhan ev gotin weha jî tê gotin: Ap û birazî, xal û xwarzî.

57- Apê Faris çî li mal çî li ber garis.

58- Apê Xidir e her ro li vir e.

59- Apo mezin î bi xwe pesinî.

60- Ard diçe kepek dimîne.

61- Arê kewarê risqê biharê.

Bi kurdî du wateyên gotina "ar" hene. Him ji bo agir û him jî ji bo arvan.

62- Arê kewan e risqê betan e.

63- Ardê xwe li bêjîngê xistiye û bêjînga xwe dalqandiye.

64- Arê xwe pêtiye ariya xwe rêtî ye.

Ev varyanta gotina "Ardê xwe li bêjîngê xistiye û bêjînga xwe dalqandiye." ye. Ji ariyê re xwelî jî dibêjin.

65- Ariya tenûran li serê pîsman û gir û hûran.

66- Arvanê salê bî salê re diçe.

Li hinek herêman weha jî dibêjin: Arvanê salê di salê de dihêre.

67- Asman berz û zevî sext e li ber mala te dibim text e.

Bi soranî û zazakî ji bilînd re berz dibêjin.

68- Asmanê sayî baran jê nayê.

69- Asteng bêderece nabin.

70- Astenga mezin li ba deriyê mala mirov e.

71- Aş bi xeyalekî aşvan bi xeyalekî.

72- Aş çûye li du çeçeqoyê ketiye.

73- Aş digere qeraş bi xwe dipesine.

74- Aş digere bi avê û kur hiltîne karê bavê.

75- Aş dike, aşvan dixwe.

76- Aş ji du keviran, hevaltî ji du biran.

77- Aş ev aş be qeraş ev qeraş be dê arvan jî tim bişewite.

78- Aş şuxilê xwe dike çeqçeço dev û diran li xwe dişkîne.

79- Aşê dînan bê av digere.

80- Aşê nezanan Xwedê digerîne.

81- Aşê xerabe arvan nahêre.

82- Aşekê bihêle ku tu arvanê xwe lê bikî.

83- Aşiqan mala xwe bi rûniştinê xerab kiriye.

84- Aşîd her ku gêr dibe, mezin dibe.

85- Aşvan tu car nabe poşman.

86- Aşvanê aşê mîran bi xulam e.

87- Av, avahî ye.

88- Av ber bi hevrazî ve naçe.

89- Av bi avê vedişî.

90- Av bi bêjingê nayê civandin.

91- Av bi dîwar ve nakişe.

92- Av bila te bibe lê di ser pira nemerdan re derbas nebe!

93- Av bîhna agir dişkîne.

94- Av çiqas kêr be co ziwa nabe.

95- Av diçe lê aş li cîhê xwe dimîne.

96- Av dar ji kokê hildike paşî wê şîm dike.

97- Av diherike qûm li pey dimîne.

98- Av dilop bi dilop dibe gol.

99- Av di cîhê teng de deng dide.

100- Av di cîhê nizm de diçe.

Varyanteke weha jî heye: Av di cîhê zirav de vediqete.

101- Av di golê de bimîne genî dibe.

Weha jî dibêjin: Ava sekinî genî dibe.

102- Av di golê de dimîne kevanî di malê de dimîne.

103- Av di serkaniyê de şêlû dibe.

Li hinek herêman weha jî dibêjin: Av ji serî şêlû dibe.

104- Av diçe avahiyê.

105- Av dizane binav li kû ye.

106- Av girik bibe dê li hev bikeve.

107- Av ji Nêrwanê û feyde ji Toqyanê.

Nêrwan, Toqyan du gundên Silopiyê ne û cîranê hev in. Dema mirov kar bike û fêde û kelk negihe mirov û bigihe kesekî din, wê demê vê gotinê dibêjin.

- 108- Av ji kaniyê nan ji baniyê
 109- Av ku herikî çî gazek çî sed gaz.
 110- Av li gewrî, gewrî xeniqî.
 111- Av li ser masî, masî hişk bû ji tîhna.
 112- Av paqijî ye.
 113- Av pir rabe dê qirşikan bi xwe re bibe.
 114- Av rabû deng belav bû.
 115- Av rabû sikur xerab bû.
 116- Av riya xwe dibîne.
Weha jî dibêjin: Av riya xwe diguhêre.
 117- Av şêlû ne be zelal nabe.
 118- Av şûna nan nagire.
 119- Av tevizî, diz lerizî.
 120- Av û agir razin dijmin ranaze.
Li gelek deveran weha jî tê gotin:
 a) av û agir disekinîn lê dijmin nasekine.
 b) av dinive neyar nanive.
 121- Ava bê pir mîna mirovê bê keç û kur.
 122- Ava bin kayê deng jê nayê.
 123- Ava bin kayê kî noq bibe jê dernayê.
 124- Ava bi qiwet bi ser hevraz re diçe.
 125- Ava bîran bi tedbîran.
 126- Ava cemidî ji kaniyê qut nabe.
 127- Ava cîhê teng dibe peng û deng.
 128- Ava dewlikê aşê nazîvirîne.
 129- Ava dînan ber bi jor ve dimeşe.
 130- Ava diherike coya xwe çêdike.
 131- Ava du biran naçe ser hev.
 132- Ava golê dimîne heta salê.
 133- Ava golan bê tevger e.
 134- Ava goleke homoş heram nabe ji devê tolekê.
Gotina "homoş" di wateya helal de ye.
 135- Ava gurr jê metirse.
 136- Ava hêdî me ecêb jê dî.
Li hinek herêman weha jî dibêjin: Ava hêdî me ecêbê giran jê dît.
 137- Ava kedûnê nû genî nabe zû.

- 138- Ava ku da serî çî buhistek çî çar tîlî.
- 139- Ava ku bişkul bibe ne helal e û ne xiral e.
- 140- Ava mêran bi sê hevraz diçin.
- 141- Ava ser berûyê wekê zavayê bi dilê xesûyê.
- 142- Ava xwestî naçe hestî.
- 143- Ava xortan ber bi jor ve dimeşe.
- 144- Ava zimzim pê ve dibezim.
- Li hinek deveran di şûna gotina "Zimzim" de Zemzem" jî dibêjin.
- 145- Avahiya gundan ji pahnaiya rê ve kifş e.
- 146- Avahiya ku dû jê here, venamire.
- 147- Avahiya malê kevanî ye.
- Li gelek deverî weha jî dibêjin:*
- a) avahiya malê di destê jinê de ye.
- b) avahiya malê bi jinê ve girêdayî ye.
- 148- Avahiya mirov stariya serê mirov e.
- 149- Avê bîne ji mesîlan qîzê bîne ji esilan.
- 150- Avê li agir kin agir li ser agir nekin.
- 151- Avê sarê tu bi ser çî de diçî xwarê?
- 152- Avê tu bidî keviran, kevir şîm dibin.
- 153- Avê vexwin ji kaniyan jinê neyînin ji bîyaniyan.
- 154- Avên çeman çiqas şêrîn bin di deryayê de şor dibin.
- 155- Avên kaniya kêr dibin lê şirikên serê keçelan kêr nabin.
- 156- Avên biçûk yên ku diherikin ji yên sekiniyên mezin çêtir in.
- 157- Ax dilê min bû dax dilê hesinê nabe çirax.
- 158- Axa bi deh gundê xwê ve bawer dike ku Key Xesrew e.
- 159- Axa ji êlê xeyîdî ye êl hay jê tune.
- 160- Axa jin û mêran ji hev e.
- 161- Axa karê gavantiyê bike gavan jî karê axatiyê dike.
- 162- Axa kendalan dibe rewşa (tezchiya) malan.
- 163- Ax û avayî nav û navdayî.
- 164- Ax û ofa leglegê nêr leglegê mê ferq dike.
- 165- Ax û wax lingên min,
janê girtiye dilê min,
ji destê kêmeqiliya min.
- 166- Axa bi xulam e, xulam jî bi olam e.
- 167- Axa bi xulam e, xulam tûltajî ye.

- 168- Axa bû homo xwelî li serê me komo.
- 169- Axa got mirtib: Ez dê rabim li te bixim.
Mirtib got: Axayê min ez dê rûnim.
- 170- Axa hat ji der xulam rabû ji ber.
- 171- Axa ji xulam re got, xulam ji seyê xwe re got
 û se jî, ji dêla xwe re got.
- 172- Axa li kêfê ye mal li bin berfê ye.
- 173- Axa mirov ji cewahîrê xelkê çêtir e.
Çend varyantên weha jî hene:
- a) nan û dewê mirov ji qeliya xelkê çêtir e.
 - b) axa mala mirov ji cewherê xelkê çêtir e.
 - c) axa mirov ji gulistana xelkê çêtir e.
- 174- Axa xwediyê xulam e û xulam jî xwediyê derd e.
- 175- Axaftin pelên pîvazê ye ji ber hev dirabin.
- 176- Axaftina bi zîvî bikire û bi zîvî bifroşe.
- 177- Axayê me Pilo şîva kerê me bû çilo?
- 178- Axayê spîxwar bê xulam dimînc.
- 179- Axê me Omê xwelî li serê me komê.
- 180- Axir-aqubet heta devê gorê ye.
- 181- Axiriya xêrê ji sibehê ve xêr e.
- 182- Axîna kûr ji dilê kul tê.
- 183- Azadî hat dinê, zimanê lal hat vekirinê.
- 184- Azabê mala xwe be, paşêyê xelkê be.

- 185- Ba berî li kû be kelekvan jî li dû ye.
- 186- Ba bê zebeşan bidêr ba neyê guh bidêr.
- 187- Ba bizûza berfê ye, mirov bizûza çiyê ye.
- 188- Ba li dîwarê der ve dixê.
- 189- Ba çawa tê, hênderê welê bide bayê.
- 190- Ba dibêje: Mêrik derî veke ez kayê bînim.
Mêrik dibêje: Ji min dût bikeve kara te ji min re ne lazim e.
 Dema kesekî bi guman ji mirov re bêje ez ji te re alîkariyê bikim lê mirov jî dizane, ku ne qencî ew dê xerabiyê bike.
- 191- Ba dizane kortal li kû ye.
- 192- Ba hat berket lê hat û bi serket.
 Dema mirov li dij tiştê be û bêje ne baş e, lê di dawiyê de ku baş derket û wê demê jî, bibêje ku min dizanibû weha baş e û pesnê xwe bide.
- 193- Ba ji berfê re dibêje: Ez bidim peyî te, dê tu xwe li kû bixî?
 Dema mirov ji kar û kiryarên hinekan bi guman û dilxişûş be, wê demê vê gotinê bi kar tînin. Yanî tu çi dikî û bi kû ve diçî ne dîyar û zelal e.
- 194- Ba ji tehtê çi dibe?
- 195- Ba neyê pelçik naheje.
- 196- Ba pê ket, kûçik li pey ket.
- 197- Ba sitila dagirtî naxîne.
- 198- Ba tê her kes kumê xwe li serê xwe digire.
- 199- Bacceriya xwe bide û serê xwe neşkîne.
- 200- Bade nede ser rê, bûkê bide bi dilê zavê.
- 201- Bajarî li erdê nêrî.
- 202- Balgiya pêşî zêde ye!
 Ev gotin dema ku mirov zêde rûmet û rêzgirtinê bide kesekî, tê gotin.
 Yanî zêde îsrar neke, hewqas ne hewce ye.
- 203- Ban qul e, bin ban şil e.
Weha jî dibêjin: Bang kul e, xanî binê wî şil e.
- 204- Banek û bagurdanek!
- 205- Banê me yek ban e aliyek deşt e yek zozan e.
 Dema ne wekhevî û bêserûberiyek hebe, wê demê vê gotinê dibêjin. Yanî kes guhdariya kesî nake.
- 206- Banê xanî tenê bi keviran bilind nabe.

- 207- Bar mirov naêşîne serbar mirov dêşîne.
 Yanî gotinên zêde mirov dêşînin. *Li hinek herêman bervajiyê vê gotinê dibêjin:* Bar mirov naêşîne binbar mirov dêşîne.
- 208- Bar naçe ber ker, ker diçe ber bar.
- 209- Bar xwar bû, divê heval hebe rast bike.
- 210- Baran çî bike ji kevir şîret ji dînan bigir.
- 211- Baran dibare zevî pesnê xwe dide.
Weha jî dibêjin: Baran tê zad pê şîn tê, zevî pesnê xwe dide.
- 212- Baran dibare ji xwediyê zeviyê re kar e.
- 213- Baran hat qelşên qadê hatine hev.
- 214- Baran ji ewrê reş tê û kar ji dilê xweş tê.
- 215- Baran li cîhê avî dibare.
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Baran li cîhê bi av dibare.
- 216- Baran sekinî ga cil kir.
- 217- Barana havînê şil kir bin kulînê.
 Havînan baran kêr dibare, dema dibare jî gelek dibare, lehî radibe û ze rareke mezin dide hawîrdorê.
- 218- Barana havînê şikir bîne bi kadînê.
 Ev jî varyanteke gotina "barana havînê şil kir bin kulînê"ye.
- 219- Barana nîsanê çetir e ji malê Xuristanê.
- 220- Baranê guşe-guşe dengê baranê ji dûr ve xweş e.
- 221- Barekî dirav yan barekî derew.
- 222- Barê eqilan li pişta kêr eqilan.
- 223- Barê giran li ser milan.
- 224- Barê giran mede ser pişta hevalan.
- 225- Barê giran tim li ker dikin.
Weha jî dibêjin: Barê giran tim ker dibin.
- 226- Bar e, heceta xwar e.
- 227- Barê hêştir li kêçê nayê kirin.
 Kurd ji deveyê re "hêştir" dibêjin.
- 228- Barê ker tîfing bin jî dê dîsa gur kerê bixwe.
- 229- Barê ketî kesek ranake ji xeynê xwedî.
Li hinek cîhan weha jî dibêjin: Barê ketiyan kes bilind nake.
- 230- Barê kesê bêhiş lingan şîn dike.
- 231- Barê serê bêcqil ling dikşînin.
- 232- Barê tu nikaribî ranehêjê û nekev bin.
- 233- Barê xwar nagihe qonaxan.

234- Barê zanan li pišta nezanan.

335- Barkirina malekê û rakirina êlekê.

236- Baskê firindan dixurînim, destê cehşa naqurînim.

Li hinek herêman bêjeya tirkî xistine nav vê gotina pêşyan û weha dibêjin:

Baskê firinda dixurînim destê sîpa naqurînim.

237- Baş be û ne belaş be.

238- Baş birayê pîsan e.

239- Baş li me nagerin, lê pîs jî, jî me nagerin.

240- Bav ber bi zarok diçe, zarok ber bi çiya.

241- Bav çawa ye kur wisa ye.

242- Bav dikare bîst zarokan xwedî bike

lê bîst zarok nikarin bavekî xwedî bikin.

Weha jî dibêjin: Bavek heft zarok xwedî dike, heft zarok bavek xwedî nakin.

243- Bav divê kur jê çêtir be seyda divê şagirt jê jîrtir be.

244- Bav hesirm dixwe lê diranên kur diseqin.

245- Bav Îsa ye, çiqas dirûne dîsa ye.

246- Bav ji êş tê, kur jê re qise dike.

247- Bav ling hilanî, kur deh li şûnê danî.

248- Bavê bêqîz, çiyayê bêav e.

249- Bavê mêran mêr e.

250- Bavê mirov pišta mirov e.

251- Bavê Naso naxîrvan e ker û golik berdane,
di dest de maye xeberdan e.

252- Bavê pak mezela wî li ber deriyê qîzê ye.

253- Bavê qantirê ker e, çiqas bi hêz bê û çiqas bi kêr bê!

254- Bavê qîzê ezîz e.

Weha jî dibêjin: Bavê qîzan padîşah e.

255- Bavê rezek da lawê xwe, lawê guşiyek tirî neda bavê xwe.

256- Bavê te siwaran kuşt peyan kuşt?

Dema bûyerek biqewime û hinek kes li ser tiştên biçûk û sifîk rawestin,
wê demê vê gotinê dibêjin. Yanî ya girîng encam e û li wê binêr. Bav
hatiye kuştin, ferq nake, ha peya kuştiye û ha siwaran kuşt.

257- Bavê xwe bibîne gunehê xwe bi xwe bîne.

258- Bavê xwe dikuje û bi gorê sond dixwe.

259- Bavêje erdê bispêre Xwedê.

Gundî dema tov davêjin zeviyê weha dibêjin: Pêşî tu wezîfeya xwe bi cîh
bîne, piştî Xwedê mezin e û tu dê encamê bigirî.

- 260- Bavêje pişt belkî jê derkeve tişt.
- 261- Bavûtî tişteki çê ye kurîtî rûgeşiya dinê ye.
- 262
- Bavo min tevîrek dît! Bav jê pirsî:
 - Kanê? *Got:* Min wenda kir!
- 263- Baweriyeke mirov a baş hebe, mirov pê sed sal nan dixwe.
- 264- Baweriya Kurdan her bi çiyê tê.
- 265- Baweriya xwe ne bi avê ne bi hespê
ne bi jinê û ne jî bi axayê xwe bîne.
- 266- Bax bê dar nabe.
- 267- Baxê bêgul kirasê bêmil, gayê bê cil.
- 268- Bax salê carek kulîlkan dide.
- 269- Baxê nemerdan şîn nabin û kulîlkan nadin.
- 270- Bayê cahîlan gurr e û aliyekî dir e.
Kesên ciwan û nezan sersar û xemsar in. Ne xwedî tecrûbe ne û dikarin
her tiştî bikin. Divê mirov li hember wan bi baldar be.
- 271- Bayê germ bayê baranê ye, bayê sar bayê berfê ye.
Weha jî dibêjin: Bayê reş baran û yê kurr berfê tîne.
- 272- Bayê gurr, gurrîn e; jina vir, virîn e; bi wan çênabin jîn e.
Weha jî dibêjin: Bayê gurgurî wek jina virvirî.
- 273- Bayê kur bêmirad e.
- 274- Bayê kur qadê dike çikur.
- 275- Bayê mirov rabe zebeş li ba dike.
- 276- Bayê reş bayê baranê ye.
- 277- Bayê sibehê li mirovan nexerê yê êvarê hîç e.
- 278- Bayê xortaniyê bahoz e.
Weha jî dibêjin: Bayê xortan gurr e.
- 279- Bayê xurt wek jina şerûd û qîjqîjok e.
- 280- Baz bi bazan, qaz bi qazan, mirîşka kor bi dîkê kulek re.
- 281- Baz di warê xwe de xweş nêçîrvan e.
Ev jî wek gotina "her dîk li ser sergoya xwe bandide" ye.
- 282- Bazar bazara pêşî ye.
- 283- Bazar bila li şûv be, ne li pirêzê be.
Dema mirov bêhêvî nebe û bi guman be, wê demê vê gotinê dibêjin. Her
tiştê pirêzê qediya ye û heta saleke din tişt tune, lê şûv dibê ku bi tov be
û çend meh paşê şîn bibe.
- 284- Bazara serobinî, bin sekinî ser nasekine.

- 285- Bazara te bi dilê te ye.
- 286- Bazirgan bêxwedî ye, kes nizane para kê ye.
- 287- Bed xeber bi xeberekê disekine.
- 288- Bedew gund tînin ber çav.
- 289- Bedew kiraskin in.
- 290- Bedewê çav kil kir, dilê xortan tev kul kir.
- 291- Bedewî deh in neh jê çek in.
Di vê hevokê de “çek” di wateya “cil” an jî “kinc” de hatiye bi kar anîn.
Rola cilûberg mezin e. Kincên baş mirov dîlber û dîlbaz nîşan didin.
- 292- Bedewî nayê veşartin
- 293- Bedewiya mirov zanabûn û hunerê mirov e.
- 294- Beg timî xwînxwar in.
- 295- Begzade dibin gade, şêx dibin rêx.
- 296- Behsa gur e, gur hazir e.
Li hinek herêman weha jî dibêjin: Behsa gur bike, dar amade bike.
- 297- Behsa kûçik bike lê dar bigire destê xwe.
Dema mirov behsa kesekî ne baş bike û ew bi xwe bi ser gotina mirov re were, wê demê vê gotinê dibêjin. *Bervajiyê vê gotinê dibêjin:*
a) mirovê baş bi ser gotinê re tê.
b) mirovê baş li ser navê xwe tê.
- 298- Behr bi devê se nalewite.
- 299- Behra şîn e av tê de nîn e.
Ev gotin ji bo ew kes, malbat an jî dem û dezgehên ku xwe mezin û bi hêz didin xuya kirin lê li navê tiştekî wan tune ye, bi tenê nav û gotinên vala hene, tê gotin.
- 300- Bejn biriqî dil xeriqî.
Ev gotin ji bo ew kesên ku bi cil û kincên xwe dilşa dibin, tê gotin. Bi ciwanî xemla xwe bala xelkê dikşînin.
- 301- Bejn tît e, mal mizgeft e.
Bejn bedew e, li xwe baş mêze dike, lê belengaz û xizan e û mala wî/wê wek camiyê vala ye, tu tişt têde nîne. Weha jî dibêjin: Bejn tît e mal rût e.
- 302- Bejn zêrezer dil jehrezer e.
Li hinek deveran weha jî dibêjin:
a) bejnê zêr e, dilî jar e.
b) bejn şehr e mal jehr e.
- 303- Bela koran zor e.
Li hinek herêman jî dibêjin: Derdê koran zor e.
- 304- Bela nabêje “ez kengê têm.”

- 305- Bela tê serê mêran.
- 306- Belaş e wek laş e.
- 307- Belayê newe dema tu hatî, li ser ser û herdu çavan!
- 308- Belengaz rûreş in.
- 309- Belengazan kumê xwe bi carekê re xwelî kirine
û dane serê xwe.
- 310- Belê heye, bcla ye.
Weha jî dibêjin: Belê heye hûda heye.
- 311- Belgên darê, darê dixemilîne.
Kurd ji “pel” re “belg” jî dibêjin.
- 312- Belkî bi serpiştê ji mala xwe derdikeve.
- 313- Ben di cîhê zirav de diqete.
- 314- Bend ji bendê tê nas kirin.
- 315- Bendê bêkes jê re nebêjin bes.
- 316- Bendê siwar peya nabe.
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Kesê siwar peya nabe.
- 317- Benîştê dînan ji ritlê ye.
- 318- Benîşt benîşt e, çiqas tu biciwî pûç dibe.
Varyanteke weha jî heye: Benîştê ku bikeve dev pûç dibe.
- 319- Beniştê mêrê pîs çîroka mêrê qenc e.
- 320- Beq bi avê serxweş dibe.
- 321- Beq nequre dê bidire.
- 322- Beq nikare cot bajo.
- 323- Beq qedrê beq, şivan qedrê şivan dizane.
- 324- Beqan deng li maran kir, kevjalan lingên xwe li ba kir.
- 325- Beqê çav li çêlekê kir, çavên wî teqiyan.
- 326- Ber bi şerê sibehê ve here lê ber bi xêra êvarê ve mere.
- 327- Ber çênekiriye di navê de rûdine.
- 328- Ber jêr tu tif bikî rû ye, ber jor simêl e.
- 329- Ber ji besta xilas nabin.
- 330- Ber li cîhê xwe bi rûmet e.
Her kes li welatê xwe bi rûmet e. Li bîyanistanê rûmeta mirov tune an jî
kêm e. Kurd ji kevir re “ber” jî dibêjin.
- 331- Ber li şixulê bigire ku hîn ne qewimî ye, hingê qewimî bê feyde ye.
- 332- Ber li serî yan ser li berî, her serî dişikê.
Yên bi hêz û xwedî desthilatdariyê tim mafdar in û yên xizan û reben
çawa dibe bila bibe, sûcdar in.

333- Bera dil, ber e.

334- Beranê bisko bûya dê di nav pezê bavo bûya!

335- Beranê zivistanê mîna ava bizdanê.

336- Berazî û Bagazî li vê navê bûne xal û xwarzî.

337- Berber bi rû ye, cildirû tazî ye.

338- Berdana jinê edeta dinê.

339- Bereketa her tiştî di destê Xwedê de ye
lê ya dew di destê jinê de ye.

340- Berê bi axive, paşê bikenc.

341- Berê bixwe, biedilîne, paşê bixemilîne.

342- Berê bixwe, paşê bişikirîne.

343- Berê bişêwire, piştire bikire.

344- Berê biemilîne, paşê biteqilîne.

345- Berê dara te hebe, dê silav li te be.

346- Berê dest destan dişo, paşê serçavan dişo.

Divê mirov pêşî ji xwe re bike û piştire ji hevalê xwe re bike. *Wek ku dibêjin:*
“Pêşî can û piştire canan.”

347- Berê devê ket ku ew der erzan e.

348- Berê dê û bavan bi ewlad de, berê ewlad bi çiya de.

349- Berê gotina xwe bipêje û pişt re bibêje.

Weha jî dibêjin: Berê xeber bibêje, paşê birêje.

350- Berê guhdarî bike, paşê biaxive!

351- Berê gul bû, baranê lê kir şil bû.

352- Berê havînê bavêje kulîne.

Ev gotin weha jî tê gotin: Kevirê havînê bavêje kadîne.

353- Berê hîvê li mirov be, stêrkên dorê çi ne?

Dema kesekî bi hêz û dewlemend bi mirov re, wê demê hewcedariya mirov bi kesên bêhêz û xizan tune. *Weha jî dibêjin:* Berê heyvê li te be, stêrkên dorê çi bikin?

354- Berê ketî li qadê namîne.

355- Berê mezin di cîhê xwe de giran e.

Li hinek deveran weha jî dibêjin: Kevirê mezin di cîhê xwe de giran e.

356- Berê şekir û şîr, paşî şûr û tîr.

357- Berê text a jinan bûye.

358- Berê xwe bide oxirê, piştira xwe bide felekê.

359- Berê xwe ji karê neguhêre.

360- Berê Xwedê, dûr re mal.

- 361- Berî derziyê dixwe de bike û
paşê jî şûjinê di hevalê xwe de bike.
- 362- Berî baranê ba tê, berî mirinê ta tê.
- 363- Berî ku mirov fêrî bazdanê bibe, divê mirov bimeşe.
- 364- Berî ku tu bigihîjî ba avê, delingê xwe hilnede.
- 365- Berî xelas be, piştîre aştxwaz be.
- 366- Berf bi dilê xwe nahele.
- 367- Berf bikeve dê lingan bişewtîne.
- 368- Berf dihele lê çiya dimîne.
Weha jî dibêjin:
a) berf dihele çiya nahele.
b) berf diçe erd dimîne.
- 369- Berf çiqas bibare jî havînê dihele.
- 370- Berf hatiye ku ling bicemdîne.
- 371- Berf heliya ling weşiyar.
- 372- Berf hevîrtirşê erdê ye.
- 373- Berf li çal û kortan digere.
- 374- Berf li çiyar dibare.
Du wateyên vê gotinê hene:
a) dema kesekî mustheq be, ji bo wê tê gotin..
b) çiya bilind û cîhê rûmetê ye ji ber vê yekê berf lê dibare.
- 375- Berf pir bibare kûçik li kerguhan digirin.
Ev ji bo kesên fersendkar tê gotin. Dema fersend û îmkan dikevin destê wan bi kar tînin.
- 376- Berf spî ye, kûçik li ser riye.
Dema mirov bêje, qîmeta xweşikbûna fizîkî tune lê qîmeta zanîn û xû heye. *Weha jî dibêjin:* Berf spî ye, se pêde riye.
- 377- Berf û baran dihat rêç wenda dikir.
- 378- Berf xizna erdê ye.
- 379- Berfa ber bi êvarê, qirê tîne li debarê.
- 380- Berfa edarê dide guliyên darê, namîne heta êvarê.
- 381- Berfa hûr xwe avêt ranê stûr.
- 382- Berfa spî û mirin li ber deriyê her kesî ne.
- 383- Berfê çiya kiras kirin, heft mêrxasan manga xwe terxan kirin û hespê xwe nal kirin.
- 384- Berfê girte serê çiya, ziravê hirçê bêderb çiriya.
- 385- Bergîr dixwest rêveçûna kehêlê bike ya xwe jî, ji bîr kir.

- 386- Berhev kir ji deriyan da xêra miriyan.
- 387- Berhev dikim bi çoçikan wekî bidim kûçikan.
- 388- Berîka feqîran tim qul e.
- 389- Berîka kefen tune.
- 390- Berîka mirov hevalê mirov e.
- 391- Beroşê got: Ez qûnzêrîn im,
Heskê got: Ez di nav te de me.
- 392- Beroş bê derxûn nabe mêr bê papax nabe.
- 393- Bersiva kerîtî bi kerîtî nayê dayîn.
- 394- Bertîl kevir nerm dîke.
- 395- Bertîl bide û here bihuştê.
- 396- Berû da bizinê dest avêt qemçikê.
Dema kesekî bê xapandin wê demê vê gotinê dibêjin. Ji ber ku berû didin bizinê û wê digirin û dibên ser jê dikin.
- 397- Berûya ku ji darê dikeve darê nas nake.
Weha jî dibêjin: Berû ji qaşlê xwe derdikeve lê qaşlê xwe naccibîne.
- 398- Berûyên darekê ne, şêlimên mişarekê ne.
- 399- Berx li beran diçe, qîz li dê diçe.
- 400- Berx teslîmê gur kirine.
- 401- Berxa ber çêlekê, mala sermiyan yek, ava bû gelek.
- 402- Berxa ku Xwedê xwedî bike, gur nikare bixwe.
- 403- Berxa li ber miyê wek beranê bêriyê.
- 404- Berxa li ber bizinê, mala sermiyan jin, xerab bû ji bin.
- 405- Berxa mirî ji gur natirse.
- 406- Bexê çê ji ber kozê ve kifş e.
- 407- Bexê mijok bi du makan dimije.
- 408- Bexê nêr ji bo kêr.
- 409- Bexê nêr li ber du maka ye.
- 410- Bexê pîr ji miya pîr e.
- 411- Bexê ser kozê serbar e.
- 412- Bexê sêwî nabe heran.
- 413- Bexê vîrnî jî dibe heran!
- 414- Bexê xelkê di koza mirov de nabe heran.
- 415- Bexvanê xwe bigire, paşê beranê xwe berde.
- 416- Beşera xweş derya dil e.
- 417- Bet çiqas qoq dibe hewqas cîh lê teng dibe.

Bet çiqas mezin dibe, hewqas cîh lê teng dibe. Bi mezinbûnê re sergêjî jî derdikevin holê. *Weha jî dibêjin:* Bet çiqas kok dibe qûn teng dibe.

418- Betalî xerabmalî.

419- Betê hêk kir hevaleyê ji xwe re çêkir.

420- Bexçeyê gulan para bêeqilan.

421- Bext, bextê gurê pîr e.

422- Bext ji qelsiyê tê, axatî ji birakujiyê.

423- Bext hebe, text tê.

424- Bext kela mêran e.

425- Bext kurk e li mirov dibe û ji mirov dibe.

426- Bext mirov radike ser text.

427- Bext nadim bi text.

428- Bext ne tê çandin ne tê çêrandin.

429- Bextê derewînan nîn e.

430- Bextê dê cihêzê qîzê.

431- Bextê hesp, sîleh û kinc tune.

432- Bextê mêran zêr e.

433- Bextê mêran gûza pûç e, pira şikestî ye.

434- Bextê mêran ji mêran naçe.

435- Bextê nêr ker jî dike nêr.

436- Bextê pêşîn warê şîn.

437- Bextê reş tim yê xwedî ye.

438- Bextê Romê tune.

Kurd ji Tirkan re Rom dibêjin.

439- Bextê sêwîyan hebûyan dê û bavên wan nedimiran.

440- Bextê te hebe dê pisîka te nêçîrvan be.

441- Bextê xelkê reş e lê yê min reş û beş e.

442- Bez nesipêre pisîkan.

443- Beza pisîkê heta kadînê.

Weha jî dibêjin: Beza kerguhê heta ber derî ye.

444- Beza hespê namûsa siwar e.

Di şûna gotina “namûs” de gotina “şeref” jî bi kar tînin.

445- Beza hespê zû diqede.

446- Bêberkavik, teşî naye ristin.

447- Bêbextî li miriyan dibin, li zindiyan nabin.

Varyanteke weha jî heye: Derew li miriyan dibin li zindiyan nabin.

448- Bê derpê bigere lê stûyê xwe li ber zaliman xwar meke.

449- Bê dev gotin nayên der.

450- Bê emrê Xwedê pel ji darê naweşe.

451- Bê haveyn şîr nabe mast.

Kurd ji “haveyn” re “mayan” jî dibêjin. *Du varyantên din jî hene:*

a) bêhaveyn şîr to (qeymax) nagire.

b) bêhaveyn hevîr tirş nabe.

452- Bê himhim çênabe.

453- Bê malo, bêxaltî û bêxalo; bi malo bi xaltî û xalo.

Dema malê mirov tune be û mirov xizan û belengaz be, xal û xaltiyên mirov jî, li mirov xwedî dernakevin. Dema mirov delemend be, her kes xwe nêzîkî mirov dike. Varyanteke weha jî heye: Bêmalo bêxwişk û xalo.

454- Bê mêrekî meçe dîwana mîrekî.

Dema kesekî zana û serwext bi mirov re tune be, mirov dikare li dîwan û cemetan şaşî bike û bikeve rewşeke ne baş.

455- Bê malê malxoyê malê neyê malê qeda salê.

456- Bê nan û dew xeber nayê hev.

Weha jî dibêjin: Bênan û dew gotin êdî hew.

457- Bê qatix şîr havên nagire.

458- Bê serwerî girara pîran nakelî.

459- Bê şer û teşxele kar nameşe.

460- Bê şerman dikin hebanan,

lingên xwe di hingilan de derdixin.

461- Bê şivan çêriya bê xwedî mezin bûye.

462- Bê şêx û pîr meçe dîwana mîr ku tu nekevî halê feqîr.

463- Bê xîret bê îman in.

464- Bê Xwedê dibe lê bê xwedî nabe.

Li hinek herêman jî dibêjin: Bê Xwedê be lê ne bê xwedî be.

465- Bê ziravê temen dirêjo!

Kesên tirsonek temenên wan dirêj in. Ji tirsan şer nakin. Di şûna gotina “temen” de gotina erebî ya “emr” jî dibêjin.

466- Bê zanîni li dij ilm e.

467- Bê zirne direqise.

468- Bêdera ku çêlek li ser bigere ew çi bêder e?

469- Bêdera xwedî ne li ser nabe mîyaser.

Weha jî dibêjin: Bêdera bê xwedî ji mirov re nabe bêder.

470- Bêje-bêj e ziman dirêj e.

471- Bêje min hevalê xwe ez bêjim tu kî yî.

Weha jî dibêjin: Hevalê xwe ji min re bêje, ez bêjim tu kî yî!

472- Bêjin lal e nebêjin tiral e.

Ji bo ew kesên tembel tê gotin. Tembelî navekî ne baş e.

473- Bêkarî mirin e.

474- Bêkarî bêkanî ye.

475- Bêş hat ser maldaran, avêtin ser feqîr û jaran.

476- Bi agaha min bike û bi pêkanîna min meke.

Ev wek gotina “Bi îlmê min bike û bi emelê min meke” ye.

477- Bi alastinê zik têr nabe.

478- Bi belkî mezêl bi dest nakeve.

479- Bi berxêti têr şîr venexwar bi kavirtî têr giya nexwar.

480- Bi berxan re tê şûştin bi kaviran re tê birîn.

481- Bi bêjingê tîrêjên rojê nayê girtin.

482- Bi bêxemîtiyê mirov nagihe axatiyê.

483- Bi bîhna fireh bêsure dibe doşav.

484- Bi bîhna fireh herkes digêhe heqê xwe
lê xwediyê bîhna teng wenda dike.

485- Bi çavgivaştinê çav teng nabe.

486- Bi darekê digire hezar devî dihejîne.

487- Bi darê zorê hezkirin nayê Torê.

488- Bi derewan aş nagere.

489- Bi derewan mal ava nabe.

490- Bi destan da û bi lingan lê geriya.

Weha jî dibêjin: Bi destan dide û bi lingan lê digere.

491- Bi destê jinê mirîşk nayê serjêkirinê.

492- Bi destê nemerdan neçe bila sêlav te bibe.

Sêlav, di wateya “laser” an jî “lehî” de hatiye bi kar anîn.

493- Bi destê xwe dike bi stûyê xwe dikşîne.

494- Bi destê zorê pîrê davêjine bîrê.

495- Bi devê xwe biçêre, bi pîyê xwe bigere.

496- Bi dijmin re pêşî gotina xweş pişt re gopala geş.

Weha jî dibêjin: Bi dijminan re, zimanê xweş û piştta hişk.

497- Bi dilê kalan qîzan bistîne, bi dilê xortan hespan.

Dema mirov behsa tecrûbe û bêtêcrûbetiyê bike, wê demê vê gotinê dibêjin. Kal bi tecrûbe û xort jî ji macerayê hez dikin.

498- Bi dilopan behr tijî nabe.

499- Bi dînan bişêwire lê bi eqilê xwe bike.

Weha jî dibêjin: Bi dînan bişewire lê dîsa jî wek xwe bike.

500- Bi dînan delavan çêdike.

501- Bi dor e ne bi zor e.

502- Bi dueyan hec qebûl nabe.

Li hinek herêman di şûna gotina "due" de gotina "temî" bi kar tînin:

Bi temiyên hec qebûl nabe.

503- Bi ducyan nebûme ku bi nifiran bimirim.

504- Bi dûranî bi şêranî.

Weha jî dibêjin: Dûr be bi nûr be.

505- Bi elba mezin mede bi elba biçûk bide.

506- Bi emelê pîrê neçe bîrê.

507- Bi eqilê vala mirov nagîhe hevalan.

508- Bi gayekî narim cem axayekî.

509- Bi girî kar naçe serî.

Weha jî dibêjin: Bi girî tutişt havil nabe.

510- Bi girî ranabin mirî.

511- Bi gotineke mirov dikare dilê sed mirovî
ji xwe bihêlc lê nikare dilê mirovekî ragire.

512- Bi got-got mirov nare cot.

513- Bi gotina mele bikin lê bi emelê mele nekin.

Varyanteke weha jî heye: Bi îlmê mele bike, bi emelê mele meke.

514- Bi gotina xweş mar ji qulê derdikeve.

Weha jî dibêjin: Bi zimanê şîrîn mar ji qulê tê der.

515- Bi gulekê bihar nayê.

Varyanteke weha jî heye: Bi kulîlkek û dukulîlkan bihar nayê.

516- Bi gurmistê dibcze şûşinê.

517- Bi gur re dixwe û bi xwedî re şîn dike.

Ev ji bo ew kesên durû û tê gotin. *Weha jî tê gotin:*

a) bi gur re dixwe bi şivan re şîn dike.

— b) bi Îsa re nan dixwe, bi Muhemed re selawatan dike.

518- Bi heq e wekî deq e.

519- Bi hêçeta kurik dixwe virik.

520- Bi hîne-mîne tu xelas nabî ji gotina jinê.

Du awayên din yê vê gotinê jî hene:

a) bi minê -minê dernakeve ji ber hukmê jinê.

b) bi minê-minê rovî naçe kunê.

521- Bi kale-pîrekî bişewire lê dîsa bi eqilê xwe bike.

Weha jî dibêjin: Bi dînan bişewire lê dîsa bi eqilê xwe bike.

522- Bi ker nikare, radibe kurtanê.

Weha jî dibêjin: Bi ga nikare, radibe golikê.

523- Bi keran re negerin dê dawî bizirin.

524- Bi kerê be, kurtan li xwe nake.

525- Bi kevçiyê kom kir, bi heskê belav kir.

526- Bi kevirekî xanî nayên lêkirin.

527- Bi ku re zer bû bi ku re der bû?

Dema kesek rastiye nebêje û bixwaze tiştekî bi lez û bez veşere wê demê vê gotinê dibêjin. *Weha jî dibêjin:* Li kû der bû, li kû zer bû.

528- Bi kulman neçin dirêşê.

529- Bi kulmek xwê derya şor nabe û bi tozek ax çav kor nabe.

Weha jî dibêjin: Bi kulman xwê bilind nabe, bi toza çav kor nabe.

530- Bi kundirê avê melevanê neke.

531- Bi lav-lavê mirov ji ber jinê xelas nabe.

532- Bi lengan re bigerî tu yê leng bî

bi şengan re bigerî tu yê şeng bî!

Mirov bi başan re bigere baş dibe û bi xeraban re bigere xerab dibe. *Gotineke weha jî heye:* Navê hevalê xwe ji min re bêje, ez dê bêjim tu kî yî.

533- Bi lingekî mirov nagîhe serê çiyê.

534- Bi maneya lorikê, dixwe kilorikê.

Ev gotin jî wek ya “bi maneya kurik, dixwe virik” e.

535- Bi masiyê re soberî meke.

536- Bi mêşê dimije û paşê davêje.

537- Bi min xurto li min xurto.

538- Bi mirovê xwe re kirîn û firotin meke.

539- Bi mîz aş nagere.

540- Bi nanekî nandar nabî, bi darekî mêrxas nabî.

Dema mirov bixwaze bêje, ku qîmeta tiştekî biçûk nîn e , wê demê vê gotinê dibêjin. *Li hinek herêman weha jî dibêjin:* Bi nanekî mirov nandar nabe.

541- Bi nexweşan re çû ser zebeşan.

542- Bi pariyên xelkê zik têr nabe.

543- Bi payîzî zû dake bi biharî zû rake.

544- Bi peyvê paxir nabe zêr.

Weha jî dibêjin: Bi peyvê sifir nabe zêr.

545- Bi pênc qurişan kûçik dişo

bi deh qurişan destê xwe helal dike.

546- Bi pîrî tê ber hevîrî.

547- Bi qewêtiyan hec qebûl nabe.

Weha jî dibêjin: Bi silavan hec qebûl nabe.

548- Bi rojê li dêrê ye, bi şevê li nêçîrê ye.

Ji bo kesên bê karakter tê bi kar anîn. Ew kesên durû ku hem xwe dîndar nîşan didin û him jî tolaziyê dikin. *Weha jî dibêjin:* Bi roj li dêrê ye, bi şev li mizgeftê ye.

549- Bi roj pîrhevok e bi şev şemamok e.

Weha jî dibêjin: Bi şev şemamok e bi roj pîrhevok e.

550- Bi salan mehan carek mêvanê xalan.

551- Bi salê here sultan be

bi mehê here mêvan be

bi rojan here ber dest û piyan be.

552- Bi sebrê tirî dibe mot.

Mot dims e. Çend varyatên din ên vê gotinê jî hene wek:

a) bi sebrê tirî dibe helaw.

b) bi bîhna fireh bêsûre dibe doşav.

553- Bi ser ve Alah, bi bin ve neûzû bilah.

554- Bi serê dijminê xwe meke dê bê serê te.

555- Bi ser ve mit e bi bin ve qûna rût e.

556- Bi sîr re pîvaz nayê xwarin.

557- Bi şev rêwî li rîyan, qeda li ber pîyan.

558- Bi tajiyê xelkê nêçîr nabe.

559- Bi te xweş e, bi min bîst û şeş car xweş e.

560- Bi tekbîr dikolin bîr.

561- Bi tenî bû xenî.

562- Bi tir û fîsan tendûr germ nabe.

563- Bi vî destî bide bi wî destî bistîne.

564- Bi werîsê xelkê danekeve bîrê.

Du varyantên weha jî hene:

a) bi werîsê bîyaniyan xwe bernede çalê.

b) bi pîran meçe bîran.

565- Bi wê qûşê nagihî Mûşê!

Weha jî dibêjin: Bi vê qûnê nagihî Meyqûnê.

566- Bi xatirê xatiran, xelk diçe ser dînê kafiran.

567- Bi xêra hevalan, em gihan malan.

568- Bi xêra law xwar helaw.

Ev gotin ji bo ew kesên ku tu qîmet û merîfeteke wan tune bin, lê saya serê hineke dîn bibin xwedî nav û deng an jî dewlemend bin, tê gotin.

Weha jî dibêjin: Bi xêra lawo dixwe nan û helawo!

569- Bi xwe distire bi xwe tew dike.

Weha jî dibêjin: Bi xwe distire û bi xwe ditewîne.

570- Bi xwe ne tişt e hespê şah bazar dike.

571- Bi xwekirinê re derman tune.

Li hinek herêman weha jî dibêjin: Derba ku mirov bi destê xwe li xwe bixe, giran û bê derman e.

572- Bi xweziyan dest nagihêje baqê keziyan.

Weha jî dibêjin: Bi xwezî mirov nabe qazî.

573- Bi xulamane re bixebite, bi mêran re bixwe.

574- Bi ya mezinan bikî, cejneke berî te xwarin e.

575- Bi zanîna zanan bikin lê bi karîna zanan mekin.

Ev jî wek gotina "bi ilmê mele biki lê bi emelê mele neke." e.

576- Bi zengîniya zaliman zirênî nabe.

577- Bi zimanê qîzê dê zane, bi zimanê kur bav zane.

578- Bibe dostê rojên teng bila ji te re jî,

dostên rojên teng çêbibin.

579- Bibe xulamê zanan, nebe mîrê nezanan.

580- Bibêje rast, raze rast.

581- Bibire zimanê xwe bikire cîhê xwe.

582- Biçe Bedlîsê dê bilîze.

583- Biçizî-neçizî qincilîzî.

584- Biçûk li gor mezinan bikin lingên wan li kevîran nakevin.

585- Biçûk li cîhê xwe mezin li cîhê xwe.

Varyanteke weha jî dibêjin: Biçûk biçûk goti ye mezin mezin gotiye.

586- Biçûk xemla malan in.

Li hinek herêman weha jî dibêjin: Zarok kulîlkên malan in.

587- Bide çîzan, nede çîza dê bide mafê gûzan.

588- Bide netirse, bistîne şerm neke.

589- Bide tetika û bigire ji pepikan.

590- Bide xortê çardeh salî dê gelek bîne bîra xwe wî halî.

591- Bifroşe kera reş bixwe xwarina xweş.

592- Bigîhe kala bixwe mala bigîhe xortan, bixwe rota.

593- Bihar bi gul e payîz bi kul e.

594- Bihar bi kulîlkek nayê.

595- Bihar e, gur har e.

Weha jî dibêjin: Bihar e ker har e.

596- Bihar e, keç har e.

597- Bihar e rewş ne dîyar e.

598- Bihar hat zivistan hilhat.

Weha jî dibêjin: Bihar hat rûmeta sermê hilat.

599- Bihar gula mewsîman e.

600- Bihar keçek ciwan, havîn dayikek,
payîz jinebîyek, zivistan jî damariyek e.

601- Bihar xweş tê serê keçelan disotê.

602- Bihara me roj û danek ew jî bû xerab zemanek.

603- Bihara paşîn bihara mirovan, bihara pêşîn bihara heywanan.

604- Bihara stewr û havîna avis xerab al e;
bûka stewr û qîza avis xerab mal e.

605- Biharan xwe şil mekin, payîzan xwe gêro mekin.

606- Biharê girt û lêkir payîzê jêkir.

607- Biharê pez, payîzê rez û zivistanê ez.

Li hinek deveran weha jî dibêjin: Biharê pez, havînê rez, payîzê agirê
goştê bez, zivistanê jî ez.

608- Biharê xwe têr neke payîzê xwe bi derengê nexe.

609- Biharê zû pez ter meke payîzê jî dereng mexe.

610- Bihustek gelacî gazek xizanî.

611- Bike bi Xwedê re berde bi avê re.

612- Bike mîna mêran bixwe mîna şêran.

613- Bike nelerize an neke nelerize.

614- Bike zehmet bixwe nîmet.

615- Bikuje, bimije.

616- Bila avis be bila dûr be.

617- Bila baş be bila dereng be.

618- Bila baş be bila dir be.

619- Bila bihata pêşî serê min bişkanda.

620- Bila bi dil be tûrê parsê li nav mil be.

621- Bila bi dil be bila bi kul be.

622- Bila bixwenda paşê bigota.

623- Bila bizê nêr û mê yek e.

624- Bila bihur be bila kûr be.

625- Bila bira be bila ji guran be.

626- Bila bîr be bila kûr be.

627- Bila congayê rojek bim ne ku çêleka sed salî bim.

Li gelek herêman weha dibêjin:

a) bila mirov mêr be emrê mirov roj û danek be.

b) bila mirov dîk be emrê mirov roj û danek be.

628- Bila çavê mirov derkeve lê navê mirov dernekeve.

629- Bila çavekî mirov tune be bila bextê mirov hebe.

630- Bila çê be bila keça se be.

631- Bila dax be li piştê destê rast be.

632- Bila deyndar bim ne xwîndar bim.

633- Bila dil bi dil be tûrê parsê li mil be.

Li hinek herêmên Kurdistanê weha jî dibêjin:

a) bila dil bi dil be bila kirasê caw li mil be.

b) bila dilê mirov rehet be xwarina mirov xwelî be.

634- Bila dilê te neşiqite hemû çavbelean.

635- Bila dijminê mirov şêr be ne rovî be.

636- Bila dijmin be kurê camêran be.

637- Bila girtiyê girtîgehê be ne miriyê gorê be.

638- Bila gur be pêşî kerê min bixwe.

639- Bila helaw şîrîn be bila mirî gor bi gor be.

640- Bila hemû tiştên te teze bin lê dostên te kevn bin.

641- Bila hêviya te Xwedê be lê guhdirêjê xwe girêde.

Guhdirêj di wateya ker de ye. Tiştên xwe saxlem bike ku diz nebe.

642- Bila hindik be bila rindik be.

643- Bila jin be jina mêran be.

644- Bila jina çê be bila di nav ordiya Romê de be.

Dema jin bi namûs be, di nav eskerên Tirk de be jî tişt pê nayê.

645- Bila jina mêrê çê be bila li ser hewî û sêwîyan be.

646- Bila jina mêran be li ber stêrk û bîyûran be.

647- Bila mirov jina mêran be bila stêrk û pêra be.

648- Bila keç be bila pak be.

649- Bila keç be bila pîr be.

650- Bila keça şivan be lê bûka malan be.

651- Bila kor be ne kurr be.

652- Bila kurik be lê navê keçê lê be.

653- Bila lawikê min lawîn be bila kirasê wî cawîn be.

654- Bila lawikê min şane be bila maeşê wî li ser qûna çapê be!

655- Bila li ber siya rovî nebî bila şêr te bixwe.

- 656- Bila li daristanan nebe li goristanan be.
- 657- Bila li dinê be bila deyndar be.
- 658- Bila li mal be ne li can be!
- 659- Bila li rê be bila dûr be.
- 660- Bila li ser erşan be ne li ser ferşan be.
- 661- Bila mele pere bigire, mirî gor bi gor be.
- 662- Bila mê be şîr qismet e.
- 663- Bila mêr mêr be kelemê ber çavê dijmin be.
- 664- Bila mêrê min hebe pişkul be.
- 665- Bila mêrê min siwar be bila deyndar be.
- 666- Bila mêrê mêr be, bi hezaran deyndar be.
- 667- Bila mirin hebûya lê kalbûn tune bûya.
- 668- Bila mirina hespê ji ceh be!
- 669- Bila mirov deyndarê dewlemendan be
ne yê teze pêkhatiyar be.
- 670- Bila mirov dûr be ne li bin axa kûr be.
- 671- Bila mirov girtiyê şaristanan be lê ne miriyê goristanan be!
- 672- Bila mirov here ser sêwiyar lê neçe ser hewiyar.
- 673- Bila mirov ji tedarek nemîne tedarek ji mirov bimîne.
- 674- Bila mirov kuştiyê şêran be ne girtiyê roviyan be.
Li hinek herman weha jî dibêjin: Bila ez xwarina şêran bim, lê ne nêçîra
çeqel û roviyan bim.
- 675- Bila mirov kûçik be lê ne birayê biçûk be.
Weha jî dibêjin: Bila mirov cewrikê kûçikan be, ne birayê biçûk be.
- 676- Bila mirov mêr be, emrê mirov roj û danek be.
Çend cureyên vê gotinê hene:
a) bila mirov dîk be, emrê mirov roj û danek be.
b) bila mirov mêr be, rojekê li dinê be.
c) bila mirov kelê (congayê) rojekê be lê ne mangeya hezar salan be.
- 677- Bila mirov ne sêwiyê berdestan be, pcpûkê ser çiyar be.
- 678- Bila mirov se be lê bê xwedî nebe.
- 679- Bila mirov se be ne ker be.
- 680- Bila mirov rezîlê dinê be lê ne qebraxê jinê be.
- 681- Bila mirov şêrê rojekê be, ne roviyê salekê be.
Ev jî wek gotinên:
a) bila congayê rojekê be na mangaya salek.
b) dîkê rojekê be ne mirîşka salekê û hwd. e.

682- Bila mirov xwedî qedir be lê ne di bin siya qedir de be.

683- Bila mirov xwîndar be lê ne deyndar be.

684- Bila mirov zîyaretan xerab bike lê navê qîzan xerab neke!

685- Bila mîxê te di dîwarê te de be.

686- Bila namûsa mirovan li cîh be bila pariya mirovan nîvçe be.

Weha jî dibêjin: Bila pariye mirov nîvî be lê namûsa mirov li cîh be.

687- Bila parî bi rûn be, serî bi xwîn be.

688- Bila qîz be bila pîs be.

689- Bila qîzê bibin ser xencerê lê nebin ser xeberê.

690- Bila rezê min li nav rezan be bila tirî li min heram be.

691- Bila rê be bila dûr be bila qîz be bila pîr be.

692- Bila rûyê mirov bêş e ne dilê mirov.

693- Bila serî hebin kum zehf in.

694- Bila serê mirov sax be, lingê mirov li kevir nakeve.

Weha jî dibêjin: Bila sidqê mirov sax be lingê mirov li kevir nakeve.

695- Bila sor be bila pênc qurîşên wê zêde be.

Kurd ji rengê sor zêde hez dikin. Bi taybetî jî Kurdên Dimilî.

696- Bila şerê şûvê be ne qopqopê bêderê be.

697- Bila şêr pišta mirov bişkîne ne ku rovî devê mirov bihalêse.

698- Bila şîn di malê de be lê şer di malê de nebe.

699- Bila Xwedê yar be dinya hemû neyar be.

700- Bila Xoristan be ne goristan be.

701- Bila yek be bila pak be.

Piranî alozî û tevliheviyê tîne, kes guhdariya kesî nake. *Weha jî dibêjin:*

a) piranî viranî.

b) bila yek be bila beq be.

702- Bila yê dehê li ser yê nehê be.

703- Bila zikê mele bel be bila giya û pel be.

704- Bila zik têr be hez bikî ji tovlê darê be.

705- Bike kal, bixwe mal.

706- Bilbil bimire gul diçilmise.

707- Bilbil û şalûl li ser lata xwe, xweş awazbêj in.

708- Bilbilê kirine qefesa zêrîn dîsa gotiye ax welatê min.

Varyanteke weha jî heye: Welatê xelkê ji mirov re nabe welat û mala xelkê jî ji mirov re nabe mal.

709- Bilind nefire da ku tu li crdê nekevî.

Li hinek herêman weha jî dibêjin: Bilind mefir, nizim dikevî.

- 710- Bilûra li ber ga ye, çira li ber kora ye.
- 711- Bimîne, bibîne.
- 712- Bin bênderê para mirîşkan e.
- 713- Binê beroşê para zirav a delalî ye.
- 714- Binî pîso serî sîso.
- 715- Bipirse netirse.
- 716- Bira bira ye, bazar cuda ye.
- Weha jî dibêjin:*
- a) birader bi biratî, bazar bi bazartî.
- b) bira bira ye bazar xuya ye.
- 717- Bira bi pišta bira kela ye.
- 718- Bira di hewariya bira de tê.
- Kurd dibêjin:* Bira cigera hev in.
- 719- Bira dijminê bira nebe jina wî mar nake.
- 720- Bira kezeb e, ewlad raser e.
- 721- Bira li bira çi kiriye vegeriye hambêz kiriye.
- 722- Bira mezelê bira dikole.
- 723- Biratî bi rastî.
- 724- Biratiya rast kulîlka jîyanê ye.
- 725- Birayek dîn û yek hişyar dan mûyekê neqetandin.
- 726- Birayê mêr ê macerî civiya ba barek hirî.
- 727- Birayê ne ji makê nabe pisê malekê.
- 728- Birayê xerab jê cîhê be cîranê xerab jê bireve.
- 729- Birca Belek mirov keviran davêjê gelek.
- 730- Birçîbûn birayê her kesî ye.
- 731- Birçîbûn sofîtiyê nahêle.
- 732- Birek کنار nabire.
- 733- Birîncê îro ji goştê sibehê çêtir e.
- 734- Birîn xwe dêşîne.
- 735- Birîna min bi min keser tê.
- 736- Birîna hevalan mîna tîra li kendalan.
- 737- Birîna ku mirov bi destê xwe nexurîne, rehet nabe.
- 738- Birîna kevn nû neke.
- 739- Birîna şûr qenc dibe şûna gotinan qenc nabe.
- 740- Birîna şûran ji birîna şûran kûrtir e.

741- Birîna xwe bi destê xwe derman bike.

742- Birîndar bi êşa birîna xwe dizane.

Weha jî dibêjin: Birîndar bi birîna xwe dizane.

743- Birîndar ji birîna xwe hînî hekîmiyê dibe.

744- Birka ku qul be binê av nagire.

745- Birûyê min şeh dikî lê çavê min derdixî.

746- Bistîne ji deriyên bide xêra miriyan.

747- Bitirse ji yê ku ji Xwedê natirsin.

748- Bitrî ji gayê cot re namîne.

749- Bivîrvan dar birî yê li ser darê guman ji Xwedê birî.

750- Bixwe bi gurikî rabe bi mêrikî.

Ev jî nêzîkê gotina “bixwe mîna mêran û rabe mîna şêran.” ye.

751- Bixwe malê belaş bibe mîna wehş.

752- Bixwe mîna mêran rabe mîna şêran.

Du wateyên vê gotinê hene:

a) li ser xwarinê şerm meke.

b) di hemû karê xwe de jîr û jêhatî be. Pûno û şermok mebe.

753- Bixwe paşê bişikîne.

754- Bixwe cefayê bibîne sefayê.

755- Bixwînin, bidin xwendin xwe ji bîr ve nekin.

756- Biyanî bidî goştê ranî dê bi ser te de bê poşmanî.

757- Bizanibe giliyan welat şêrîn e ji hemûyan.

758- Bizin bi lingên xwe mîh bi lingên xwe.

759- Bizin bi dizî gon dixwe bi eşkera dize.

760- Bizin bimire jî dûva xwe berjêr nake.

761- Bizin ketiye derdê serê xwe qesab jî ketiye derdê goştê xwe.

762- Bizin ku bizin e, cîhê xwe çêdike.

763- Bizina kulek, şivanê bezek êvarê tev tên guherekê.

764- Bizin mir agir vemir.

765- Bizin ne tişt e lê nêrî li pişt e.

766- Bizin têr dixwe stûyê xwe di kendal de dide.

Ev gotin jî nêzîkê gotina “bizina jar wexta kok bû, dê strûyê (qiloçên)

xwe li kendalan bide.” ye. Lê ferq di navbera wan de heye. Dema kesekî rewşa wî/wê baş bibe û rabe dest bi çavsorî û zordestiyê bike, tê gotin.

767- Bizina jar wexta kok bû dê strûyê xwe li kendalan bide.

768- Bizina kol tiştîr e.

- 769- Bizina kol hînî danîyên şor bûye.
 Dema kesek hînî tişteki belaş bibe, wê demê vê gotinê dibêjin. *Li hinek herêman weha jî dibêjin*: Bizina kol hînî danûyan bûye.
- 770- Bizin ku hestî nexwaran diran nediketin.
- 771- Bizina ku bi şûn de bimîne para gur e.
- 772- Bizina kulek paya gur e.
- 773- Bizina kurmî li ser çaviyê av vedixwe.
- 774- Bizina lanctî dev lêketî.
- 775- Bîhna dê tê ji xaltiyê.
- 776- Bîhna fireh ji qîma fireh e.
- 777- Bîhna fire ji qelsiyê ye.
- 778- Bîhna gulan ji gulan tê; bîhna mirovan ji mirovan tê.
- 779- Bîhna kiz tê ji mala diz.
- 780- Bîhtengî ji qûntengiyê ye.
- 781- Boçika seyî têxe qalib dîsa gêr e û li mil e.
- 782- Buhra here bila kûr be,
 riya here bila dûr be,
 qîza bîne bila pîr be.
- 783- Buhrîna xortan zor buhr e lê bidî dê te bibe lê nedî tu mayî!
- 784- Buhistek bêxemî gazek xesaret e.
- 785- Buhistek nezanî metrek xizanî.
- 786- Bûk anî bi lez da bi ga û pez, sivika malê dîsa ez.
- 787- Bûk bi dilê zavê ye, çi hela-hela mele ye.
- 788- Bûk çê ye, xesû dê ye.
- 789- Bûk di sorikê de dergûş di lorikê de.
- 790- Bûk hat dawet hilhat.
- 791- Bûk li ser zîn e, kes nizane nesîbê kê ye.
 Ji bo tiştên ne dîyar û zelal tê gotin. Benda encamê be. *Weha jî dibêjin*:
 Bûk li hespê ye, hevsar li destê ye, kes nizane qismetê kê ye.
- 792- Bûk şerm dike rû digire lê zik vedike.
- 793- Bûka apê kete kapê, bûka xalê delaliya malê.
- 794- Bûka bavan li ber çavan.
- 795- Bûka ku xeniqandiye heft xesû ji bilqêniya cêrê tirisî.
- 796- Bûka malê rewşa malê.
- 797- Bûka malê kevnika ser destan e.
- 798- Bûka malê xwe dixapîne ji xortan re kodik û kevçî tîne.

799- Bûka malê xweş xebitî ker girêda û cehş filitî.

800- Bûka metê her roj li dawetê.

801- Bûka metê li ser agir û pêt e.

802- Bûka mezin kevaniya malê ye.

803- Bûka qenc stûna malê ye.

804- Bûka salê qeşmera malê.

Piranî û giraniya karên malê bi bûka nû tê kirin. Şerm dike û nikare

bêje “na.” *Weha jî dibêjin:*

a) bûka salê dîna malê.

b) bûka salê meha nîsanê.

805- Bûka tûtik xwe li ber malê çêdike.

806- Bûka xalê ezîza malê.

807- Bûkê meymûnê, mal kire gola xwînê!

808- Bûkê ne zar û ne ziman e û xesûyê jî ne dîn û ne îman e.

809- Bûkê têkine reşiyê pîrê têkine xweşiyê.

810- Bûkê xêlî avêt rû ma bê şerm û fihêt. 811- Bûme bûk, bûme pepûk.

812- Bûye al ketiye mal.

813- Camêrî pîvana mirovatiyê ye.

814- Can derkeve lê xû demakeve.

815- Can şêrîn e.

816- Car heye rev ji desthilarînê çêtir e.

Weha jî dibêjin: Carnan rev ji desthilarînê çêtir e.

817- Car heye yarî dibe neyarî.

818- Car heye mirov ji ker re dibêje dayê.

819- Car ji cara kerê boz bi xwe were bara.

820- Carekê bi kuwarekê.

821- Carnan jehr derman e.

822- Carnan qelem ji şûr tûjtir e.

823- Carnan xatir dibe qantir.

824- Caşik mezin be jî dîsa ker e.

825- Caşekî mirov hebe barê mirov li erdê namîne.

826- Caw bû kitan, dew bû derman.

827- Cawê malê erzan e.

Dema kesek rûmet û qîmeta kesên xerîb bizanibe û yên nas û xisman ni zanibe, wê demê vê gotinê dibêjin. Wek mînak, Kurd ji hev hez nakin û rêza hev nagirin lê ji bîyaniyîn re gelek rêzdar û spasdar in.

828- Ceh keran şamî dike,

siqa şûran misrî dike,

xizanî mêran kotî dike.

Varyanteke weha jî heye: Ceh keran bitir dike, siqa şûran misrî dike, pere mêran bengî dike.

829- Ceh nabe kizin, mîh nabe bizin.

Li hinek deveran weha jî dibêjin: Ceh nabe genim.

830- Ceh reşandiye genim naçine.

831- Cejna bê qurban mîna mala bê mêvan.

832- Cejna salê bi salê re dibore.

833- Cendek bê serî nabe.

834- Cendek ku ket qertêl zû bîhnê digirin.

835- Ceneta ku sofî lê hebe xêra wê cenetê tune.

836- Cenet li rûyê erdê ye.

- 837- Cenet û cehenem di bin pîyê dayikê de ye.
- 838- Cer nû ye av sar e.
- 839- Cera kaniyê li riya kaniyê.
Varyanteke weha jî heye: Cer di riya avê de dişikê.
- 840- Ceribandin ji ceribandîne çêtir e.
Weha jî dibêjin: Cerbandin, ji necerbandîne çêtir e.
- 841- Cewrê dêla tirek gurîx nabin.
- 842- Cewrê seyê dir timî dir in.
- 843- Cezayê qencyê, xerabî ye.
- 844- Cêr nabe bê çembil mişar nabe bê kermil.
- 845- Cihû dema îflas dike bi defterên kevn dikeve.
- 846- Cihû te bibim buhiştê!
Got: Na, îro şemî ye bi kêr nayê.
- 847- Cila zêr û zîv li ker bikin, dîsa ker e.
- 848- Cilên canê min kulên serê min.
- 849- Cilê xwe hildide berî ku bigihîje bihurê.
- 850- Cineta ku ez ne têde bim bila ker têde bigevize.
- 851- Civat li mala pîrê û pîrê li mala xelkê ye.
Weha jî dibêjin: Civat li mala Fatê ye û Fatê li mala Xatê ye.
- 852- Ciwanbûn nezanbûn pîrbûn kislambûn,
 ez mirim poşman bûm.
- 853- Ciwanî bizaniya pîrî bikariya!
- 854- Ciwan mişen e belê xwînşîrîn kit-kite ne.
- 855- Cixara li ba bayê û raketina li ser kayê ne tu tişt in.
- 856- Cîh heye ku bêdengî ji axavtinê çêtir e.
- 857- Cîh heye rev ji mêraniyê çêtir e.
Weha jî dibêjin: Car heye rev ji desthildanê çêtir e.
- 858- Cîh ji dilan fireh e, cîh ji dilan teng e.
- 859- Cîhan ava ye her kes bi eqilê xwe şa ye.
- 860- Cîhanê kê dot yê kirî û yê firot
 lê dîsa negihîştin xwediyê cot.
- 861- Cîhê baran lê bibare teyrok jî lê dibare.
- 862- Cîhê baz e, kund lê digaze.
- 863- Cîhê bênamûsan ne li cenetê û ne jî li cehnemê heye.
- 864- Cîhê ku av û agir li wir tune, îman jî tune.
- 865- Cîhê ku agir tune dû jê dernayê.
- 866- Cîhê ku destê digihîje pîyê xwe mavêje.

- 867- Cîhê ku destên te digihêje wê lingên xwe jî bigihîne wê derê.
- 868- Cîhê ku dil bêşe bila rû bêşe.
- 869- Cîhê ku ji te re dest nede bihêle û bireve.
- 870- Cîhê ku jinan xerab nekiriye hîn ava ye.
Weha jî dibêjin: Derê ku jinan xera nekiriye hîn ava ye.
- 871- Cîhê ku maşe hebe destê xwe meşewtîne.
- 872- Cîhê ku mirin heye, tirs çi ye?
Wek gotina ku dibêjin: Tirs ber li mirinê nagire.
- 873- Cîhê ku miriyên te lê nebin ne warê te ye.
- 874- Cîhê ku pakî hebe nepakî çi ye?
- 875- Cîhê ku rûmeta te tune, rûnene.
- 876- Cîhê ku şîn lê ye tahma şahiyê nîn e.
Weha jî dibêjin: Cîhê şînê, li şahiyê çi ye?
- 877- Cîhê nenas bike pars.
- 878- Cîhê tirs li wir hebe şerm li wir heye.
Weha jî dibêjin: Dera tirs lê hebe şerm lê heye.
- 879- Cîhê tu hêviyê jê nekî gazine jê neke.
- 880- Cîhê valabûna şêran, rovî lê dikin gêran.
Li hinek herêman weha jî dibêjin:
 a) cîhê valabûna şêran, rovî xwe nîşan didin wek mêran.
 b) cîhê ku şêr tune be rovî dibe muxtarê gund.
- 881- Cîhê yekê li gund nebû, digot: Cîh kê m in.
- 882- Cîran hevparê cîran e.
 Hevpar di wateya wêris de ye. Divê mirov xwedî li cîranê xwe derbikeve.
Dibêjin : Ezabê cîran ji cîran tê xwestin.
- 883- Cîranê nêzîk ji birayê dûr çêtir e.
- 884- Cîranê ne baş strûyê ber çavên mirov e.
- 885- Cîranê xerab bihêle û diranê bi êş bikişîne.
- 886- Cîranê xerab ji ezabê gorê xerabtir e.
- 887- Cîranê xerab mirov dike senetkar.
- 888- Coka bostanan bi kêmayê ji bo aşvanan.
- 889- Comerd di rojên teng de xuya dibin.
- 890- Comerd hesp û qespek li balê yek in.
- 891- Cot bi gayê pîr nabe.
- 892- Cot bi gayekî nabe.
- 893- Cot li mirtiban nayê.
Bi nuwanseke biçûk weha jî dibêjin: Cot bi aşiqan nabe.
- 894- Cotê bê gîsin nikul zû lê dişikê.

895- Cotyaro tu çi diçînî?

Got: Dema hişîn bû tu dibînî!

896- Cotê zexm ji xeta pêşîn ve kifş e.

897- Coya ku av têde çûye dê tim têde here.

898- Cûne dixwe heft libê sabûnê lê cûna nayê qanûnê.

Ji rengê spiyê ku wek qirêjê ye re dibêjin cûne. Ewropî ji vî rengî re “grî” an “gro” dibêjin. Vê gotinê ji bo ew kes û tiştên ku nayên rayê û rastkiri na wan ne mumkun e, tê gotin.

- 899- Çar hesp bi singekê ve nayên girêdan.
- 900- Çaroxan ji seyan re çêkin dê ew çaroxên xwe bixwin.
- 901- Çav dibîne, dil dihebîne, eqil lêdixe werdigerîne.
Li hinek herêman weha jî dibêjin: Çav dibîne, dil dihebîne.
- 902- Çareyê bêçareyan Xwedê ye.
- 903- Çav dibîne, dil dimîne.
- 904- Çav dijminê xwe nas dike.
- 905- Çav ji çavan fedî nakin.
- 906- Çav ji çavan şerm dikin bertîl keviran nerm dikin.
- 907- Çav kil e dawî şil e.
- 908- Çav li savarê kir silav ji bîr kir.
- 909- Çav neynika çavan e.
- 910- Çav stûr e tixûb zor e, çov zirav e tixûb av e.
 Dema ku çavê mirov ji tiştêkî bitirse, ev gotin tê bi kar anîn.
- 911- Çav sûretê dilan e.
- 912- Çav teres e, dest mêrxas e.
- 913- Çav tirsonek in, dest û ling mêrxas in.
- 914- Çav xên ji xwe her tiştî dibîne.
- 915- Çav xinamê xwe nas dike.
- 916- Çavek li kirinê çavek li mirinê.
- 917- Çavekî mirov kor be mirov destê xwe dide ber yê din.
- 918- Çavekî kor, loqmeke bi don.
- 919- Çavê çepê ronî nade çavê rastê.
- 920- Çavê kor rondikek jî jê bê, baş e.
- 921- Çavê kor sax dibe. dilê kur sax nabe.
- 922- Çavê ku bi kêr nayê, tiliya xwe di bin de ke û rake.
- 923- Çavê kul ji çavê kor çêtir e.
Li hinek deveran weha jî dibêjin:
 a) çavê şilopî ji çavê kor çêtir e.
 b) şeliqî ji çavê kor çêtir e.
- 924- Çavê li deriyên xwelî li seriyên.
- Weha jî dibêjin: Çav li der xwelî li ser.*
- 925- Çavê qîzê li yasîné ye çavê mele li doxîné ye.

926

- Çavê te kê derxist?
- Mirovê min derxist.
- Loma kûr derxist!

927- Çavê tirsîyayî zû xwelî dikeve.

928- Çavên melan çar in.

929- Çavên mirov ji axê têr dibe.

930- Çavên nalbendan li simê hespan e.

931- Çavên reş ne hewceyên kildanê ne.

Weha jî dibêjin:

a) çavên reş kilnaxwazin.

b) ji çavên kul re kil navê.

932- Çavên zil di bin kayê de jî dibînin.

933- Çavkulbûn ji çavkorbûnê çêtir e.

934- Çavsorî ji kesek re namîne.

935- Çavzer hebin çavreş pir in.

936- Çawa dirêse weha jî badide.

937- Çawa ku mirov perçek ji xwîna dê û bavê xwe ye mirov weha jî perçek ji axa welatê xwe ye.

938- Çawa çaq e, saq liyaq e.

939- Çawa sûk e, weha jî bûk e.

940- Çawa sûk e, gaz biçûk e?

941- Çawa şêx-mela ne rehmet li me cahilan e.

942- Çax ji çaxê fedî nake.

943- Çaxa dîk birçî be sergoyê bi bîra xwe tîne.

944- Çaxa gul dibarin ez diçim ba keran.

945- Çaxê maza pivo raza.

946- Çaxê nêçîr tê gûyê tajiye tê.

Ev jî wek gotina “çaxê maza pivo raza.”ye.

947- Çek ne ya hemû kesî ye lê nefis ya hemû kesî ye.

Di kurdî de du wateyên çek hene: cil (kinc) û sîleh. Li vir, di wateya cil an jî kinc de ye.

948- Çek ya mezinan e, av ya biçûkan e.

949- Çekê mêran nivê kar e.

950- Çekên te hebin bê wan mere çolê.

951- Çelê dayik e melê mayik e.

952- Çêlck û mitêl ker û zîn, hirç û cot?

- 953- Çem bê çeçel nabe.
- 954- Çem tim nahê ku qirş û qal bi xwe re bîne.
- 955- Çemê biçûkê av jê herikî çêtir e
ji yê mezinê ku av lê çikçikî.
- 956- Çemê mezin ji çiyayê bilind tê.
- 957- Çend pêtir e çêtir e.
- 958- Çepelên mêrkuj ji dûr ve kifş in.
- 959- Çerçî helawa xwe naxwe.
- 960- Çerkezê simêlboş e,
totika dibêje çar goşe,
rûn dikire lê nafroşe.
- 961- Çerm nabe post dijmin nabe dost.
- 962- Çermê golikê li ber me dê xwedî were bi ser me.
- 963- Çermê mêran fireh e.
- 964- Çermê ker e ne dibe dhol ne dibe çarox.
- 965- Çerxa felekê geh li jêr e û geh li jor e.
- 966- Çerxa cîhanê bi xwendinê digere.
- 967- Çeyî bike û bi avê re berde.
Weha ji dibêjin: Çeyî nabe xerabî.
- 968- Çeyî dibe xerabî!
- 969- Çeyî ne bi pere ye.
- 970- Çêkîro bi xwe kîro xerobkîro bi xwe kîro.
- 971- Çêl û dotin kezwan û kelotin ne vêkktiye.
- 972- Çêle tune bimije golik tune bikuje.
- 973- Çêlegur exlaqê gur hiltînin.
- 974- Çêlek bi ga be kel pir in.
- 975- Çêleka belek dûrî mala çeleng.
- 976- Çêleka rîxo garanê dihermîne.
- 977- Çêleka sor şîrê xwe dide lê di dawiyê de lingê xwe lê dixê.
- 978- Çêleka xizanan ma li ser guhanan.
- 979- Çêleka xwe li pêş xelkê medoşe.
- 980- Çêlekê didoşe Xatê to dide Fatê.
- 981- Çêlika kûçikan xerak e zaroka xwe bi delalî ranekê.
- 982- Çêlikên gura ji mirov re nabin bav û bira.
Dema mirov bixwaze bêje, ku zarokên dijmin ji mirov re nabin dost, wê demê vê gotinê dibêjin. Li hinek herêman ji “çêlik” re “çêjik” jî dibêjin.

- 983- Çêlikên maran bê jehr nabin.
- 984- Çêlikên rovî lewlebaziya rovî hiltînin.
Lewlebazî di wateya dek û dolab an jî fen û fûtan de tê bi kar anîn.
- 985- Çêlikên şêran şêr in.
- 986- Çêr şanê qelsan e.
“Çêr” di wateya “dijmîn” an jî “sixêf” de ye.
- 987- Çêrê yekî ku kirin çî li ser xaniyan û çî li ber deriyan.
- 988- Çêrî li cîhê asê dimîne.
- 989- Çêyiya kejan li pişt milan e.
- 990- Çî bayê hat bi berbîkevî
çî ava ku hat bi serkevî
divê ji dinê bi dûr bikevî.
- 991- Çî biçînî tu dê wê hilînî.
Weha jî dibêjin: Çî bikî kuwarê dê ew bê xwarê.” ye
- 992- Çî deşt be çî zozan be derdê pez şivan be.
- 993- Çî diçe ji bax diçe lê ji baxvan tiştêk naçe.
- 994- Çî di hûr de di tûr de.
- 995- Çî havînê şîn bibe zivistanê hewce ye.
- 996- Çî hat eqilê te wê neke.
- 997- Çî li pişt dergûşê û çî li pişt deşta Mûşê.
- 998- Çî ne çê ye para hirçê ye.
- 999- “Çî” nivê pevçûnê ye.
Dema mirov ji kesekî bipirse û ew jî, bi gotina “çî” bersiv bide, di gotina “çî” de dîyar dibe, ku eciz bûye an jî qehrî ye.
- 1000- Çî roj baran e, ew roj zivistan e.
- 1001- Çî tê serê mirov ji zimanê mirov tê serê mirov.
- 1002- Çîkûs gûyê xwe hişk dikin û jê re dibêjin çortan e.
Li hinck herêman “çekod” li hinek herêman “xesîs” li hinek herêman jî “destvala” dibêjin.
- 1003- Çîl heramî nikarin rûtekî bişêlînin.
- 1004- Çîlek û çîlek dibe milek.
- 1005- Çîle nebe bihar nabe.
- 1006- Çîlkek û milkek.
- 1007- Çîlo kor li Xwedê dinêre wilo Xwedê jî lê dinêre.
- 1008- Çîlmê her kesî li ser lêva wî şîrîn e.
- 1009- Çîma ez kumê sor im li ser serê her kesî bi dor im!
- 1010- Çîma razim li newal û kaş çîma bibînim xewna şaş.

Dema mirov bêje, tiştên ku bi bela û metirsî hene, ez têkil nabim...

Weha jî dibêjin: Çima razim li newala kûr, çima bibînim xewna dûr.

1011- Çiqas bilind bifirî hewqas berjêr dikevî.

1012- Çiqas bireqise hewqas jî dimelise.

1013- Çiqas boz e hewqas pîroz e.

1014- Çiqas çem kûr be dê sobayî xweş be.

1015- Çiqas çiya bilind be dê destê mirov qul be.

1016- Çiqas dinê dibînî hewqas ecêb bibînî.

1017- Çiqas dibî mîr, Xwedê meke ji bîr.

1018- Çiqas dotên te hingiv be tevî mealêse.

1019- Çiqas dûr hewqas gul û nûr.

Weha jî dibêjin: Çiqas dûr e, hewqas nûr e.

1020- Çiqas got: Kew e.

Got: Nikilê wî sor e.

1021- Çiqas kevir bavê jî se dê hewqas biewite.

1022- Çiqas mirovatî şîrîn e hewqas jî tahl e.

1023- Çiqas mirovên te pîs bin pêl li wan meke.

1024- Çiqas serê me mezin bibe dê çavê me ecêban bibîne.

1025- Çiqas tu xizan bî, neçe ber deriyê axan.

1026- Çira bê don ronî nade.

1027- Çira bi koran çi bike şîret li pîran çi bike.

1028- Çira li ber koran, tenbûra li ber kerran.

1029- Çira tu kesî heta sibehê naşixûle.

Weha jî dibêjin: Çira tune ta sibehê pêkeve.

1030- Çira xizanî nezanî.

1031- Çivîk bi baskekî nafire.

1032- Çivîka li piziyê çêtir e ji beranê berûyî.

1033- Çivîka wîtwîtanî bihara ber zivistanî,
te mala xwe xera kir ya me li ser danî.

1034- Çiya bê devî nabe qîz bê dê nabe.

1035- Çiya bi guh e.

Varyanteke weha jî heye: Dîwar bi guh e.

1036- Çiya bilind e, li dorê bajar û gund e.

1037- Çiya bi çiyar nakevin çav bi çavan dikevin.

1038- Çiya çiqas bilind be dîsa rojekê riya mirov pê dikeve.

1039- Çiya hemû çiya ne erd û ezman jê xuya ne.

1040- Çiya hewceyê çiya dibin.

1041- Çiya ji ber çiya bilind bûne.

Weha jî dibêjin: Çiya ji rika çiya bilind bûne.

1042- Çiya naçe dewrêş diçe.

1043- Çiya ne sar be berf lê nabara.

1044- Çiya rastî çiya nayê lê mirov rastî mirov tê.

1045- Çiyayê berz li civatan tim ez.

1046- Çiyayê bêgul mîna mirovê bêdil.

1047- Çiyayê bilind ji cîranê xerab çêtir e.

1048- Çiyayê bilind timî li ser dûman heye.

Du wateyên vê gotinê hene. Yek, mirov çiqas mezin û navdar be, hewqas jî dijminên mirov pir dibin û bela li pêş mirov heye. Ya duyem jî, mirovê mezin timî guman li ser heye..

1049- Çiyayê bilind bê ba nabe, geliyê kûr bê av nabe.

1050- Çiyayê bilind bê dar nabe qîza axê bê yar nabe.

1051- Çiyayên ku dihejin, xerab nabin.

1052- Ço qero hoşt qero.

1053- Çol fereh e û derew bê pere ye.

1054- Çomaxê xwar deholê diqelişîne.

1055- Çov ji çov vedigere.

1056- Çov li kewê neket kew li çovê ket?

1057- Çovê stûr ji bihuştê hatiye.

1058- Çov stûr e, tixûb zor e; çov zirav e, tixûb av e.

Yanî hêza mirov hebe, sînorê mirov fireh e, na ku tune be, sînor teng e an jî tune ye.

1059- Çovê kê stûr e arvanê wî/wê hûr e.

1060- Çû dermanê mîzê, gû lê qesirî.

1061- Çû dewrêşan danî ber mastê gamêşan.

1062- Çû gerê, hat ji gerê dîsa kerê berê.

1063- Çû ku bavê xelas ke dayîkê jî da ser.

Weha jî dibêjin: Çû ji bo heyfa dê, qûna bavê jî li ser da.

1064- Çû ser darê guliya bin xwe birî.

1065- Çûçik çûçik e jî dema av vedixwe dişikirîne.

1066- Çûk digere digere dîsa li ser garisê sêwiyan datîne.

1067- Çûka bilotanî ji xwe û hevalan re tev de anî.

1068- Çûka ku di deste de ye, çêtir e ji deh çûkên li ser darê.

1069- Çûn dewsa miriyan her kes li miriyê xwe geriya.

1070- Çûn tolana seyan li hestiyan geriyan.

1071- Çûn welatê keran anîn barê peran.

1072- Çûyîna riyan di rêberiya riyan de kifş e.

1073- Da kitikan, geriya li pepikan.

Li hinek herêmên Kurdistanê ji pisîkê re kitik dibêjin. Dema ku mirov li malê xwe xwedî dernekeve, qîmeta wê nizanibe an jî nikarîbe biparêze û zerarê bike, wê demê vê gotinê dibêjin.

1074- Da palan hat bû miriyê malan.

1075- Dadkirina mar nabe ji bilî dar.

Li hinek deveran weha jî dibêjin: Dadkirina mar nabe ji pêvî dar.

1076- Dagêr xweş e hilgêr reş e.

1077- Dan çiqas bikele nabe birinc.

1078- Dan ez dikutim lê intê te tê.

Weha jî dibêjin: Dan ez dikutim intênî ji te tê.

1079- Danûk berdan dawa sêwiyan, “k...”ê wan rabû.

1080- Danûstandinê bi mirovê ehmeq re meke.

1081- Danûstandin di destê Xwedê de ye.

1082- Dar baş e di cîhê xwe de gotin baş e di cîhê xwe de.

1083- Dar behra wê li buhiştê ye.

Li hinek deveran “behr” dibêjin û li hinek deveran jî “par” dibêjin.

1084- Dar ber digire, serê xwe berjêr dike.

1085- Dar bi xwedîkirinê mirov bi gotinê mezin dibe.

1086- Dar bi ber in lê bi pelên xwe şîrîn in.

Weha jî dibêjin: Dar bi berê xwe ve şîrîn e.

1087- Dar bi berê xwe mirov bi navê xwe.

Weha jî dibêjin: Dar bi berê xwe ve eyan e mirov bi navê xwe ve.

1088- Dar bi pelên xwe ve diheje.

1089- Dar çiqasî stûr dibe, hewqas jî zû dişike.

1090- Dar darê dibire.

Weha jî dibêjin: Destiyê bivir ji dar e.

1091- Dar dikeve gulî bi ku de diçin.

Weha jî dibêjin: Dar dikeve gulî dipekin.

1092- Dar gula jîyanê ye.

1093- Dar heta pelan nede ber nagire.

1094- Dar jê nebe dibe dar xwelî li kesên bê war.

1095- Dar ji koka xwe kurmî dibe.

1096- Dar ji ziravî, mirov ji stûrî dişike.

1097- Dar ku xwar dibe dişike.

1098- Dar li kewê neket an kew li darê ket?

Varyanteke din jî: Kew li çovê ket, ne ku çov li kewê ket. e.

1099- Dar li ser ra û koka xwe hêşîn dibe.

1100- Dar nabe hesin mer nabe gîsin.

Li hinek deveran di şûna gotina “mer” de gotina “bêr” jî bi kar tînin.

1101- Dar nîn e ku ba lê nexe.

1102- Dar para wê li buhiştê heye.

1103- Dar verotinan mirov bi gotinan.

1104- Dara belkî şîn nabe.

1105- Dara bê ber zû tê birîn.

1106- Dara bê gul mîna evîna bê dil û hevkirina tevkul.

Gotina “hevkirin” di wateya zewacê de ye.

1107- Dara bi tenê mîna mêrê bin destê jinê.

1108- Dara bilind nizim nabe.

1109- Dara bîyê bê kêr e ne ber e ne bostan e.

1110- Dara bîyê para mîyê.

1111- Dara di nav rez de gurê di nav pez de.

1112- Dara gelazan bixwe û bide hevrazan.

1113- Dara gezê bona pezê.

1114- Dara gûzê bextê qîzê.

1115- Dara jîyanê bi xwînê tê avdan.

Weha jî dibêjin: Dara ku mirov bi xwînê av nede berê şîrîn nagire.

1116- Dara ku berê wê nexwim av nadim.

1117- Dara ku ji qurmê xwe ve kurmî bibe kara kesaxê tune,
rih û simêlên ku spî bibin çara wan a vegeê tune.

1118- Dara ku neyê avdan hişk dibe.

1119- Dara ku siya xwe nede koka xwe xêra wê tune.

Varyanteke weha jî heye: Dara ku sîhê li binê xwe neke, biha jê re nîn e.

1120- Dara ku zêde mêwe bigire serê xwe berjêr dike.

1121- Dara ku xwar bû nabe kêran.

1122- Dara merdayî çikildayî.

1123- Dara rezdayî bi çiqil ve kifş e.

1124- Dara strî nagire tirî.

1125- Dara ter ditewe.

Li hinek herêman weha jî dibêjin: Dara ter xwar dibe.

1126- Dara xebatkaran tim bi ber e.

- 1127- Dara xweziya şîn nabe li her ciha.
- 1128- Dara xweziyê kes li ber sîha wê rûnane.
- 1129- Dara zorê zû stûr dibe û zû dişikê.
- 1130- Darbiro daran bibir destê xwe ji Xwedê nebir.
- 1131- Darekê biçîne bila ber bigire, gotinekê bêje bila ser bigire.
- 1132- Darekê bigire zordarekî birevîne.
- 1133- Darê bi strî nabe gopal.
- 1134- Darê bi tenê mîna mêrê li ber hukmê jinê,
darê du agirê kodo, darê sê agirê tisê,
darê pênc û şeş, agir dike xweş.
- 1135- Darê bi destê xwe bi avê re bermede
ku te berda bi du nkeve.
- 1136- Darê di çavê xwe de nabîne zilika di çavê xelkê de dibîne.
*Li hinek deveran weha jî dibêjin: Şûjinê di çavê xwe de nabîne derziyê
di çavê xelkê de dibîne.*
- 1137- Darê ji binî ve mebare.
- 1138- Darê merxê bide bin çerxê.
- 1139- Darê stûr nabe gopal.
Weha jî dibêjin: Darê mezin nabe gopal.
- 1140- Darê xwar e, hostayê rast e.
- 1141- Darê xwe bike şeş ku agir bibe geş.
- 1142- Darê zorê ji bihuştê hatiye.
- 1143- Darikê dixê “q ...”ê gul dide bîhnê.
- 1144- Daro şikesto xwaro besto?
- 1145- Darvan dar birî yê ser darê gumana xwe nebirî.
*Li hinek deveran weha jî dibêjin: Baltecî dar birî, yê ser darê gumana xwe
nebirî. Gotina baltaçî” bi tirkî ye. Kurd ji “êzingvan” re “darvan” jî dibêjin.*
- 1146- Das di destê kê de be ew pale ye.
- 1147- Das ji destê pale nayê girtin.
- 1148- Das li kû tir li kû?
- 1149- Das û werîs li riya Bedlîs.
Varyanteke weha jî heye: Das û werîs çiyayê bilî.
- 1150- Dasa palan nedizin.
- 1151- Dawa jinan ji wan re dijmin e.
- 1152- Dawet bê berbûk nabe.
- 1153- Dawet bê dehol û zirne çênabe.
Weha jî dibêjin: Daweta bê def û zirne ji çi re ye?

- 1154- Dawet bê girî û şîn bê ken nabe.
- 1155- Dawet bê tirşik nabe.
- 1156- Dawet firikî berbûkî hedikî.
Weha jî dibêjin: Dawet ferikî mêvan hedikîn.
- 1157- Dawet heye dew e.
- 1158- Dawet li dar e, nan û penîr bi hejmar e.
- 1159- Dawet li malê ye dehol li çolê ye.
- 1160- Dawet tune li kevçiyên digerin.
- 1161- Daweta bê xwedî xweş nabe.
- 1162- Daweta bê axa xweş nabe.
- 1163- Daweta mîran agir ket feqîran.
- 1164- Daweta mirtiban e û mirtib bi xwe lê dixin.
- 1165- Dawiya derewan kuçe ye.
- 1166- Dawiya derewan nîn e.
- 1167- Dawiya pevçûnê dijminahî ye.
- 1168- Dawiya sebrê selamet e.
- 1169- Dawiya şer poşmanî ye.
- 1170- Dawiya şer şêranî ye.
- 1171- Dawiya virê nederketina kuçê ye.
- 1172- Dawiya werzan zivistan e.
Bi soranî ji “demsalê” re “werz” dibêjin.
- 1173- Dawiya xêrê ji sibehê ve xêr e.
- 1174- Dawiya zorkeran kuştin e.
- 1175- Dax be û li destê sax be.
- 1176- Daxwaza kor du çavên reş in.
- 1177- Dayê belayê xwişkê talhişkê,
jinê were kolika minê te bigerînim li dora dinê.
- 1178- Dayê buhok e, jinê ruhok e.
Weha jî dibêjin: Dayê edûyê, jinê were li ser kokila min rûne, te bigerînim li dinê.
- 1179- Dayîk axreta mirov e.
Varyanteke weha ya dînî jî heye: Buhîşt di bin lingên dayikan de ye.
- 1180- Dayîk hate derda, rabû Xwedê berda.
- 1181- Dayik hewşiya zarokan e.
- 1182- Dayîka du dotan li xwe didin du lotan.
- 1183- Dayîkê bibîne dotê bîne.
- 1184- Dayîna axa û began mîna ewrê ber ba ye.

- 1185- Dayîna destan qinyata dilan.
- 1186- Dayîn jî dil e ne ji hebûnê ye.
- 1187- Def di destê min de ye çomaxê tu lê dixî.
- 1188- Def hîn deng nade ew direqise.
- 1189- Defa ber keran e, çireya ber koran e.
- 1190- Def û zirne berdaye bi kendalê ebes girtiye.
- 1191- Deftera mirov li pişt mirov tê xwendin.
- 1192- Deh bi duyan e Hurmiz Xwedanê Gulolan e.
- 1193- Deh mal in diwazdeh rûspî ne.
- 1194- Deh mêr bîn kuştin li ser postê pezekê li hev tîn.
- 1195- Deh serî jêkirin dîsa her kes beziya seriyê xwe hilda.
- 1196- Dehan bipîve yekê bibire.
- 1197- Dêhê xwe bêje hîn yekê hevalê xwe.
- 1198- Dêhên piştgirêdayî ji yekî piştvala re dixebitin.
- 1199- Dêhên stewr bi dêhên şîr re dixwin.
- 1200- Delal berê delal bû, kerê delal jî wenda bû.
- 1201- Delalê malê bê naz nabe dikandar bê gaz nabe.
- 1202- Delavê ketiyan bi çirav e.
- 1203- Delavê tenik her kes lê dixê.
- 1204- Dem bi dor e her gav li ber deriyê yekî disekine.
- 1205- Dem bi mirov re neçe mirov bi demê re diçe.
- 1206- Dem bi demê re her dem bi Xwedê re.
- 1207- Dem diçe li benda mirov nasekine.
Weha jî dibêjin: Dem diçe venagere.
- 1208- Dem hene pîroztir in ji deman.
- 1209- Dem ji zêr e pê re here.
- 1210- Dem tiriya tirş şîrîn dike.
- 1211- Dema avê da navê çî li çogê çî li navê..
- 1212- Dema ba li bêdera mirov were,
 mirov dikare zebeşan jî bi ba bike.
Li hinek herêman weha jî dibêjin: Dema ba li bêndera mirov were, mirov dikare zebeşan jî bidêre.
- 1213- Dema ba û bager rabin pêş lê nayê girtin.
- 1214- Dema barê mirov xwar bibe, her kes kevir lê dixê.
- 1215- Dema biçûk e dibêje “hêk”,
 dema mezin dibe, dibêje “qaqe.”

- 1216- Dema canê ker bixwire, dizire.
- 1217- Dema çêleka te kê m şîr bide wê bifroşe.
- 1218- Dema dê dimire destên wê jêkin û pê sêwiyan bikutin..
- 1219- Dema dêl bi ba be, kûçik ji Bexdê radibe.
- 1220- Dema eqilê mirov ji kîsê mirov nebe,
hefsarê mirov di destê xelkê de ye.
- 1221- Dema gul dibarin, ez diçim ba keran.
Li hinek herêman weha jî dibêjin: Dema gul dibarin, Îso diçe ba keran.
- 1222- Dema gur bixwe, pûrt bimîne jî baş e.
- 1223- Dema hebe tû dixwe, tune be gû dixwe.
Weha jî dibêjin: Dema hebe nan û rûn dixwe, tune be gû dixwe.
- 1224- Dema hebe bol e, tune be çol e.
- 1225- Dema heye mêvanî tune golikvanî.
- 1226- Dema hingavtina kerê tê, diçe firavîna cotyar dixwe.
Weha jî dibêjin:
- a) dema ercelê nêrî tê, diçe nanê şivên dixwe
 - b) dema ecelê mar tê diçe xwe li ser rê kilor dike.
 - c) dema ecclê gêrikê (mîro) tê, perên wê çêdibin.
- 1227- Dema kar xerab be şîretkar pir in.
- 1228- Dema li te bû pêsîrtengî yan piştta xwe bide mêrekî çê yan jî bide çiyekî asê.
- 1229- Dema mirov rahişe kar pîr û kal dibin Ristemê Zal, dema mirov ranehişte kar, Ristemê Zal dibe pîr û kal.
- 1230- Dema raser rabe sikur xerab dibe.
Li hinek deveran ji “raserê” re “lehî” dibêjin.
- 1231- Dema raser rabe qirş û qal bi ser dikevin.
- 1232- Dema se bezî gur, gur mir.
- 1233- Dema siûd hat serî bila bizirc wek kerî xelk dê bêje aferîn.
- 1234- Dema Xwedê bide ji yek û nîvê jî dide.
- 1235- Demek ji demê re demek ji kêfa dinê re.
- 1236- Demekê gulê ye, yekê gulşîlavê ye.
Weha jî dibêjin: Demekê gulê ye yekê sosinê ye.
- 1237- Den çî tede be ew dide der.
Kurd ji “den” re “kûp”, “helûb” û dîzik” jî dibêjin.
- 1238- Deng heye lê reng tune.
- 1239- Deng ji hev vedidin.
- 1240- Deng li xwedîyan xweş tê.
- 1241- Dengbêj gula govendgeran e.

- 1242- Dengê defê ji dûr ve xweş tê.
- 1243- Dengê defê nas dike lê mala dawetê nas nake.
- 1244- Dengê ewrê mizgîna baranê ye.
Weha jî dibêjin: Dengê ezman nîşana baranê.
- 1245- Dengê hemû dengbêjan ne yek e.
- 1246- Dengê keçan zû digîhe mala bavê kuran.
- 1247- Dengê kerê bi kerê xweş tê.
- 1248- Dengê mirinê zû belav dibe.
- 1249- Dengnekirin zêr e.
- 1250- Derb ji derban zêdetir e.
- 1251- Derb ya pêşî ye.
- 1252- Derba dostan ji ya dijmin kûrtir û xedartir e.
- 1253- Derba mêran yek e.
- 1254- Derba ku nan dibire şûr nabire.
- 1255- Derba li hevalan mîna tîra li kendalan.
- 1256- Derba rakirî ji ya danî çêtir e.
 Yanî desthildan ji lêdanê çêtir e. Ji ber ku mirov dema dest hilde lê jî dide, êdî tirs dişike. Li hinek cîhan di şûna gotina “rakirî” de gotina “hinamdî” dibêjin.
- 1257- Derba tu kesî tu car li ser xwe nehêle.
- 1258- Derba xwe ne hilweşîne dijminê xwe biêşîne.
- 1259- Derban ji derbdîtiyan bipirse!
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Derb ji derblêketiyan bipirse.
- 1260- Derbên hirçan kevir e.
- 1261- Derbên neyaran xedar in.
- 1262- Derdan ji xwediyê derdan bipirsîn.
- 1263- Derd e dev jê berde.
- 1264- Derdê axa ne lor e penîrê şor e.
- 1265- Derdê ano nano ye.
- 1266- Derdê birçiyên nan e yê zarok guman e.
- 1267- Derdê bêkesan giran e wekî dirana bi jan e.
- 1268- Derdê dilan hûr e kûr e û dûr e.
- 1269- Derdê dilan nayê milan.
- 1270 - Derdê feqîran nan e derdê axa kêf û dîlan e.
- 1271- Derdê hewiyê giran e mîna tiliya bi jan e
 mîna qolinca roviyan e.

- 1272- Dêrdê kezêbê da ser neqebê.
- 1273- Dêrdê kotûbûnê li dijminan dernekeve.
- 1274- Dêrdên neyaran xedar in.
Li hinek herêman jî dibêjin: Dêrbên neyaran xedar in.
- 1275- Dêrdê nezanan jî zora zorkeran zortir e.
- 1276- Dêrdê pîrê pilor e, dêrdê Hebo gebol e.
“Pilor” û “gebol” navên du xwarinên kurdî ne. Dema her kes bikeve heyra dêrd û pîrsa xwe, wê demê vê gotinê dinêjin.
- 1277- Dêrdê qeraş av here ser aş.
- 1278- Dêrdê sêwî girar e û har e.
Weha jî dibêjin: Dêrdê sêvo girar e.
- 1279- Dêrdê xwexwetiyê wusan e mîna jana diran e.
- 1280- Dêrdkêş bi dêrdê xwe dizane.
Varyanteke weha jî heye: Birîndar bi çêşa birîna xwe dizane.
- 1281- Dereng bû lê çeleng bû.
- 1282- Derew bibin xwelî navêje nav zeviya xwe.
- 1283- Derew derew e çî ceh çî genim.
- 1284- Derew dêrd e ku bûk bêje xesûyê “kerê ber de.”
- 1285- Derew li miriyan dibe li zindîyan nabe.
- 1286- Derew li xerîbiyê fort li kalbûniyê.
- 1287- Derew sêwî ye.
Weha jî dibêjin: Derew sêwî ye tu bi ku da lêxî bi wê re dihere.
- 1288- Derew tim mala xwediyê xwe xerab dike.
- 1289- Derewek bike ku kesên dora te ji te bawer bikin.
- 1290- Derewîn dijminê Xwedê ye.
- 1291- Derewîn carekî dixwe firavîn.
- 1292- Derewîn îflah nabin.
- 1293- Derewîn pîrbêj dibin, evîndar dengbêj dibin.
- 1294- Derewîn serî bi ard be jî jê bawer neke.
- 1295- Dêrê ku hêvî jê heye gazin jî heye.
- 1296- Dêrê nan dibire şûr nabire.
- 1297- Dêrî dar bike malê star bike.
- 1298- Dêrî veke, xizman kom ke.
- 1299- Deriyê zirt zû dişikê.
- 1300- Deriyê xwe baş kilît bike cîranê xwe diz dernexe.
Ev jî wek gotina “dêrî dar bike, malê star bike” ye.
- 1301- Deriyê xêrê ku vebû deriyê şêrê tê girtin.

- 1302- Deriyê xêrê nayê girtin.
- 1303- Deriyê xelkê nekute ku deriyê te jî neyê kutan.
- 1304- Deriyo tu dar bî li serê min star bî!
- 1305- Dermanê bi xwekirinê tune.
- 1306- Dermanê diranê kurmî kişandin e.
- 1307- Dermanê ehmeqiyê tune.
- 1308- Dermanê gurî hebûya dê pêşî bi serê xwe de bida.
- 1309- Dermanê her tiştî xû ye heke xû bi xwe xerab e,
derman nîn e.
- 1310- Dermanê her tiştî zêr e lê ji zêr xurtir jî zor e.
- 1311- Dermanê şer aştî ye.
- 1312- Dermanê xwestinê dayîn e.
- 1313- Derpiyê jinê sor e, çavê mêr kor e.
- 1314- Derpiyê li lingan her bilî ne.
- 1315- Derpiyê min li xwe ke lê tê de tir û fisan neke.
- 1316- Derwêş dizane çi di hebana derwêş de heye.
- 1317- Derya bi devê se pîs nabe.
- 1318- Derziya jinan tim di serê jinan de ye.
- 1319- Dest bi dest dizane.
- 1320- Dest bi ser destan ve heye heta mala xwedê.
Weha jî dibêjin: Dest ber destî ye, heta ber ezmanî.
- 1321- Dest davêje kevçiyê lê nizane dawet li kû ye.
Ev jî wek gotina “dengê defê tê lê nizane mala dawetê li kû ye.”
- 1322- Dest, dest nas dike.
- 1323- Dest destan dişo dest dizivire dev û rû dişo.
- 1324- Dest di bin derî de bikêşî dê bimire nekêşî dê biherişe.
- 1325- Dest hılanîn pîrozî ye.
Li hinek herêman weha jî dibêjin: Desthılanîn fereca xêrê ye.
- 1326- Dest kut e dev hût e.
- 1327- Dest li ser destan heta ezmanê heftan.
- 1328- Dest û dev bûn heval kar ma betal.
- 1329- Destekî dizî ye destê din li xwedî gazî ye.
- 1330- Destê ber xerc birca xerabe bax û bostanan xerab dike.
- 1331- Destê bi kêr bide ser zikê têr.
- 1332- Destê bi tenê deng jê nayê.
Weha jî dibêjin: Destê bi tenê şêrê Elî be jî deng jê nayê.

- 1333- Destê bi tenê rûyê mirov reş dike.
- 1334- Destê bi tenê naçe ser xwarinê.
- 1335- Destê çikûsan dirêj e.
- 1336- Destê dê, reng û rûyê qîzê.
- 1337- Destê dirêj kin nabe û destê kin jî dirêj nabe.
- 1338- Destê dizan rast naçe paşilê.
- 1339- Destê dizan bi dizan nayê birîn.
- 1340- Destê diziyê nakeve ber kiziyê.
- 1341- Destê diziyê tu carî nasitre.
- 1342- Destê feqîriyê sar e.
- 1343- Destê gurî ketiye hebûna dinyayê.
- 1344- Destê helawxwaran ji dûr ve kifş e.
- 1345- Destê hêsan li ser zîkê birçî ye.
- 1346- Destê hukimetê dirêj e.
- 1347- Destê kefîlan tim di berîkê de ye.
- 1348- Destê ku hîn bû diziyê, qûna ku hîn bû qehpiyê ray lê nabe.
- 1349- Destê ku carek şikest êdî wek berê naceribe.
- 1350- Destê ku şerîet jê bike xwîn jê nayê.
- 1351- Destê ku neyê gezkirin tê maçî kirin.
- Weha jî dibêjin:*
- a) destê ku neyê geztin, tê ramîsan.
- b) destê ku tu nikaribî jêbikî gez bike û yê ku nikaribî gez bikî, ramîse.
- 1352- Destê ku li hêviya destan be dê bêguman be.
- 1353- Destê merdan dermanê derdan.
- 1354- Destê mêran ne weqî û ne mêzîn e.
- Weha jî dibêjin:* Destê mêran ne şihî, ne mêzîn e.
- 1355- Destê min diz e dilê min dilerize.
- 1356- Destê mirovan nebe rêx, devê mirovan nabe rûn.
- 1357- Destê mirovatiyê yek ba ye, yek baran e.
- 1358- Destê qîzê yek dêran e yek wêran e.
- 1359- Destê rastê kur e, destê çepê qîz e.
- 1360- Destê rastê nizane destê çepê çî dike.
- 1361- Destê siwaran li siwaran dipirse.
- 1362- Destê te bi don be bi serê xwe de bide.
- Li hinek herêman di şûna gotina “don” de gotina “rûn” jî dibêjin.
- 1363- Destpêkirina karekî nivîkirina wî karî ye.

- 1364- Destê vala deng jê nayê.
- 1365- Destê vala ne ehla û sehla.
- 1366- Destê westayî li ser zikê têr e.
Ev ji varyantekê din a gotina “destê hêsa li ser zikê birçî” ye.
- 1367- Destê xwarinê dirêj e.
- 1368- Destê xwe meke kûpikê cinan.
- 1369- Destê xwe neke her qulî
di hinekan de mişk henc
û di hinekan de jî mar.
- 1370- Destê xwedî di bin kevir de ye.
- 1371- Destê zêr nabire kêr.
- 1372- Destmala sorik daye ber çavê korik.
- 1373- Dev dixwe lê çav şerm dikin.
Li hinek herêman weha jî dibêjin: Dev dixwe û rû şerm dike.
- 1374- Dev ji alfabê berdaye bi devê zirneya zer girtiye.
- 1375- Dev ji girarê şewitiye pif dike keçiyê.
Weha jî dibêjin: Dev ji şîr şewitiye, bifî dew dike.
- 1376- Deve çiqas dûrên hev biçêrin dîsa guhên wan li ser hev in.
- 1377- Deve di kodikê de nayê avdan.
- 1378- Deve hate pol, pol peyde nebû.
- 1379- Deve li xeyalekê û devevan li xeyalekê ye.
- 1380- Deve nal dikirin, rovî çû got “papê min jî.”
- 1381- Deve neyê xîyakirin, nayê barkirin.
- 1382- Deve pêl li hêkan bike, naşkîne.
- 1383- Deve û gêle?
- 1384- Deve û qapqap çî dibêjin hev!
- 1385- Devê beş çêtir e ji çavê reş.
- 1386- Devê bi çermê ve dixwe lê dilê xwe bi mêşê dişewitîne.
- 1387- Devê dîzê vemeke, serê nan jêneke
ya min ji te re got ji bîr meke.
- 1388- Devê hirçê nagihîje sêvê dibêje tirş e.
Varyantekê weha jî heye: Devê rovî nagihîje tirî dibêje tirş e.
- 1389- Devê miriyan sar e.
- 1390- Devê ku hînî derewan bû,
qûna ku hînî tiran bû ray lê nabe.
- 1391- Devê ku pîvazê nexwe bîn jê nayê.
- 1392- Devê pisîkê nehîşt goşt,

- Got:* Bila xêra dê û bavê min be.
- 1393- Devê rovî nagihîje tirî dibêje tirş e.
Ev varyanta gotina “devê hirçê nagihîje sêvan dibêje tirş e.” ye.
- 1394- Devê xelkê ne doxîna mirov e ku bê girêdan.
- 1395- Devê xwar ken lê nabe star.
- 1396- Devî jî dibin dar!
- 1397- Devî zû dibin girdar, xwelî li serê mirovê bê war.
- 1398- Dew bû derman caw bû kitan.
- 1399- Dew dikilim dew nabe, rûn li meşkê belav nabe.
- 1400- Dew ji ber devê mirtiban narije.
- 1401- Dew li mirtiban nayê.
- 1402- Dew tune firke lê li hespê siwar dibê çir dike.
- 1403- Dew tune lê rûn difroşe.

Weha jî dibêjin: Dew tune firke li hespê siwar dibê çir dike.

- 1404- Dew xwestin kodik veşartin.
- 1405- Dewar bi lingê xwe tê girêdan,
mirov bi devê xwe tê girêdan.
- 1406- Dewar nekire li meha nîsanê û jin hilnebijêre li dîlanê.
- 1407- Dewê bê kil, kirasê bê mil, mêrê bê dil yek in.
- 1408- Dewê cerbandî ji mastê ne cerbandî çêtir e.
- 1409- Dewê mîyê ye rûspiyê jinê ye.
- 1410- Dewê payîzan bide ezîzan, dewê biharan bide neyaran.
Li hinek herêman di şûna gotina “dew” de gotina “mast” jî bi kar tînin.
- 1411- Dewê şilavê ber li avê.
- 1412- Dewê te hebe mêş ji Bexdayê tên.
- 1413- Dewê tîr li kûpê kûr.
- 1414- Dewlemend bimire êl diheje, xizan bimire gund pê nahese.
- 1415- Dewlemendiya bi lez, rez û pez.
- 1416- Dewlemendî di bin gurzê giyê de ye.
- 1417- Dewleta ku ba di bin de here ne tu dewlet e.
Weha jî heye: Heywana ku ba di bin zikê wê de here, qîmeta wê tune.
- 1418- Dewleta pelegewr e bi şev sahî ye û bi roj ewr e.
Belê dewlet mezin û xurt e lê hemû rezaletên wê veşartî ne. Mînaka herî mezin dewleta Tirkiyê ye.
- 1419- Dewleta pelegewr , qîz avis, bûk stewr.
- 1420- Dewleta te hebe dê êl bi te re be.
- 1421- Dewr bi te re nayê tu bi dewrê re here.

1422- Dewra felekê kîn û kin e.

1423- Dewran timî bi dor in geh li jêr in geh li jor in.

Weha jî dibêjin: Dewran siya darê ye gel livê hêlê û geh li wê hêlê ye.

1424- Dewrêş dizane di hewana wî de çi heye.

Li hinek herêman ji “hewan” re “heban” jî dibêjin.

1425- Dewsa şêran rovî dikin kêf û seyran.

Weha jî dibêjin: Dewsa şêran kund dikin sêra.

1426- Dewsa şûr xweş dibe lê dewsa gotina nexweş xweş nabe.

Ev varyanta gotina “dewsa xencera qenc xweş dibe lê dewsa gotina ne qenc, xweş nabe” ye.

1427- Dewsa tîra xwe bike û paşê bihingêve.

Pêşî baş bifikire û piştê dest bi pratîka wê bike.

1428- Deyn e meyne!

1429- Deyn ji te kir çav li xwe kir.

1430- Deyn ne mirovan sar dike ne mirovan germ dike.

1431- Deyndaran xwe avêtin pişt xwîndaran.

1432- Deyndaran deyndar xwarine?

1433- Deyneker im, zêrê zer im.

1434- Deynekir mêrekî xwe kir.

1435- Deynê biçûk mezin dibin mîna zarokên biçûk.

1436- Deynê mêran li mêran bi deyn e.

1437- Dê axreta miriv e.

1438- Dê bibînin, dotê werînin.

1439- Dê bi kula kezebê diçe gorê.

1440- Dê bi tev bavê cotek bask e.

1441- Dê bi rastî digirîn wekî din bi qestî digirîn.

1442- Dê bû damarî, bav bû bamarî.

Du varyantên weha jî hene:

a) dê bû damarî, bav bû Kavarî. Kavar li herêma Licê- navê gundek e.

b) dê bû jinbav, bav jî bû zirbav.

1443- Dê dibistana zarokan e.

1444- Dê hejandiye, dê mijandiye.

1445- Dê ji bavê şîrîntir e.

1446- Dê û bav ber bi zarok, zarok ber bi çiya.

Weha jî dibêjin: Dê û bav ber bi ewlad, ewlad ber bi çiya.

1447- Dê û bavê bûkê dibin palas.

1448- Dê û dotê şer dikir kêmeqilan bawer dikir.

- 1449- Dêl ba be, se ji Bexda radibe
- 1450- Dêlik ku teriya xwe nehejîne kûçik lê venahewîn.
- 1451- Dêr çêkirin ka poplîska wê?
- 1452- Dibêjin lê napêjin.
- 1453- Dibistan kana zanîne ye.
- 1454- Diçe tolana seyan li hestiyên digere.
- 1455- Diçim aş, aş xerab dibe; tîm kanî, kanî zuha dibe.
- 1456- Di ava sekan de şêlû dibe.
- 1457- Di ber ker re derbas dibe caşê jê didize.
- 1458- Di bêjingê de dotiye di scradê de meyandiye.
- 1459- Di cem kûçikê har re mere.
- 1460- Di dinê de ji ziman şîrîntir tune û jê taltir jî tiştêk din tune.
- 1461- Di dinê de her tişt bi dest dikeve lê dê û bav na!
- 1462- Di firehiyê de her kes dikare hespê xwe bibezîne.
- 1463- Di garanê de digere disa diçe dora kera xwe.
- 1464- Di govenda nezanan de sergovend ne dîyar e.
- 1465- Di malekê de mezin tune be,
kevirê giran bîne û pê bişêwirc.
- 1466- Di malê de tune arvanok navê jinê Dînanok.
- 1467- Di malê de bi tenê aş û cot tune.
- 1468- Di navbera jin û mêr de behr hene.
Weha jî dibêjin: Di navbera jin û mêr de çiya hene.
- 1469- Di navbera gotin û kirinê de çiya hene.
- 1470- Di navbera mêranî û teresiyê de mûyek heye.
- 1471- Di navbera qencî û xerabiyê de bihustek heye.
- 1472- Di navbera şûr kişandin û lêxistinê de gelek zeman heye.
- 1473- Di nav mêran de mêr be di nav şêran de şêr be!
- 1474- Di navendê de rûdine û ji qeraxê dixwe.
- 1475- Di quncika min de rûniştîye bi riya min dilîze.
- 1476- Di rojên teng de dê ewladê xwe davêje.
- 1477- Di salekê de du havîn nabin.
- 1478- Di salê du caran cejn dibin
di wan rojan de jî zikê sêwiyan dêşe.
- 1479- Di ser dîyaran re nehre û hophop neke,
tiştê ku bi te ne xweş e bi xelkê neke.
- 1480- Di sîhî de şêr e di çilî de mêr e di şêstî de kalemêr e.

- 1481- Di şer de sêv belav nakin.
- 1482- Di tasa dijmin de av venexwe!
- 1483- Di tariyê de çire ro ye.
- 1484- Di tengiyan de jî deriyê nemerdan ne kute.
- 1485- Di ziman de hestî tune.
- 1486- Dijmin bibe pir jî bi ser re nebûre.
Varyanteke din jî ev e ku dibêjin: Di pira dijmin re derbas nebe.
- 1487- Dijmin bi kuştinê rê bi qutkirinê.
 Mirov bi têkoşîn û şer zora dijmin dibe û bi rêçûnê jî rê diqedîne û digi he armanca xwe. Di şûna gotina “qutkirin” de gotina “bihartin” jî tê gotin.
- 1488- Dijmin bi rewşa dijmin nizane.
- 1489- Dijmin e, minet tune.
- 1490- Dijmin e, sînor tune.
- 1491- Dijmin mezelê mirov dikole, dost jî mirov vedişêre.
- 1492- Dijminê bavan nabin dostê lawan.
- 1493- Dijminê bi eqil ji dostê bêeqil çêtir e.
Weha jî dibêjin: Dijminê bi bîr, ji dostê ehmeq çêtir e.
- 1494- Dijminê bi rext çêtir e ji dostê bêbext.
- 1495- Dijminê camêr ji dostê teres baştir e.
Weha jî dibêjin: Dijminê bi eqil ji dostê bê eqil çêtir e.
- 1496- Dijminê dijwar ji dostê xayîn çêtir e.
- 1497- Dijminê dijminê mirov, dostê mirov e.
- 1498- Dijminê mêrxasan di nav ûçkên jinê de ne.
- 1499- Dijminê mêran yek ziman e û yek jî jin e.
- 1500- Dijminê mêrxasan vexwarin û jin e.
- 1501- Dijminê mirov daqoqê serê mirov e.
- 1502- Dijminê mirov di nav simêlê mirov de ye.
Weha jî dibêjin: Simêl li ber pozê mêran heye.
- 1503- Dijminê mirov mêş be jî divê mirov hesabê wî bike.
 Di şûna “mêş” de “mîro” jî dibêjin.
- 1504- Dikale lê şîr nade.
- 1505- Dike-nake binê tûrê qul e.
- 1506- Dil agahdarê dil e.
- 1507- Dil bide ser dilan, gul bide ser simêlan.
- 1508- Dil benîşt e pê nişt e.
- 1509- Dil bijî çav rijî.

1510- Dil bixwaze dîwar qul dike, behrê derbas dike.

1511- Dil dil e ne ard e û ne bulxur e.

1512- Dil dilekî dihebîne.

Weha jî dibêjin: Dil dilan dihebîne.

1513- Dil, dilan dihebîne; çav, çavan diniqîne.

1514- Dil dibije goştê kerê, dibêje:

Guhên wî wek yên kerguhan e.

1515- Dil dixwaze lê laş ranabe.

Li hinek herêman weha jî dibêjin: Dil dixwaze lê pê ranabin.

1516- Dil fireh be rê fireh e.

Weha jî dibêjin:

a) dil fireh be rê jê re gelek in.

b) dil ku fireh be dê cîh hebe.

1517- Dil ji dilan hez dike.

1518- Dil ku neşewite hêstir ji çavan naşimite.

1519- Dil li dij dil e.

1520- Dil li ser dil e jê re nîn e derd û kul e.

1521- Dil li xerîbiyê zîz e.

1522- Dil miqabilê dil e.

1523- Dil ne sifre ye ku mirov li ber her kesî veke.

Weha jî dibêjin: Dil ne merş e ku mirov li ber her kesî raxe.

1524- Dil perçek goşt e.

1525- Dil qence girtiye kes nizane çi têde veşartî ye.

1526- Dil şûşe ye heke bişike naceribe.

1527- Dilê bi xezeb nagîje miradan.

1528- Dilê dê li ser dotê ye yê dotê jî li ser çiyê ye.

1529- Dilê dê û bavê li ser kur e yê kur li ser kevir e.

1530- Dilê dilxwaz nan û pîvaz.

1531- Dilê fireh pîr nabe.

Li hinek deveran weha jî dibêjin: Dilê mezin pîr nabe.

1532- Dilê firoşkeran fireh e.

1533- Dilê ku xem têde be bi heft derfan şa nabe.

1534- Dilê mêrik bi jinikê ne xweş e gava hevîr dike jê re dibêje:

Çima tu qûna xwe dihejînî?

1535- Dilê mirov gul e.

1536- Dilê nabenciyan tim fireh e.

1537- Dilê nazik nagihîje tu mirazî.

Weha jî dibêjin: Dilê nazî, nagihe tu razî.

1538- Dilê rûtan bi xeman xweş e.

1539- Dilê şivên bixwaze, dikare ji nêrî şîr bidoşe.

Weha jî dibêjin: Dilê şivan bixwaze, dikare ji nêrî golemast çêke.

1540- Dilê te ku fireh be, cîhê me dê hebe.

1541- Dilê te naşewite bila pozê te bişewite.

1542- Dilê tirsonek singa gewrê nabîne.

1543- Dilê xerîban tim bi ber malê ve ye.

1544- Dilê xweş her lê bihar e.

1545- Dilê yekê kete kevirekî, heft sal bi xwe re gerand.

1546- Dilê zaliman wek kevir e.

1547- Dilê zaroktiyê ji her tiştî çêtir e.

Dilê zarokan pak e. Zarok xerabî û zikreşiyê nizanin. Li ser lîstokan şer dikin û piştire re dibin heval û dîsa dilîzin. Dilê zarokan wek awêneyeke pak e. Li hinek deverên Kurdistanê ji şûna gotina “zarok tiyê” de gotina “gadeyatî” jî bi kar tînin.

1548- Dilketin xweş e bi xortaniyê, zozan xweş in bi koçeriyê.

1549- Dilo bixwaze te toq an pîvaz?

1550- Dimilî, bi darê ve şindilî ji bo nanê gilgilî.

Zaza ji nanê gilgil gelek hez dikin, heta ji bo nanê gilgil diçin mirinê.

1551- Dinê ka be, devê kerê min pê nabe.

1552- Dinê li dinê çavê gur li bizinê.

Dema kesekî teng û biçûk bifikire û bi rikokî bi tenê kesekî ji xwe re bike hedef, wê demê vê gotinê dibêjin. *Li hinek herêman weha jî dibêjin:* Dinê li dinê, Mendo li jinê.

1553- Dinênediyan dinê nedî,

lawek ji wan re bû, rabûn çûkê wî jêkirin.

1554- Dinênediyan dinê nedît rabûn savar çêkirin gotin “cejn c.”

1555- Dinya aşê mirinê ye her kes arvanê xwe lê dike.

1556- Dinya av e mirov li nav e.

Weha jî dibêjin: Dinya ava em bi tev li nava.

1557- Dinya ava ye, her kes bi eqilê xwe şa ye.

1558- Dinya baqê nivco ye.

1559- Dinya bê şîn û şahî nabe.

1560- Dinya bi dor e geh li jêr û geh li jor e.

1561- Dinya bi dor e ne bi zor e.

Weha jî dibêjin: Dinya bi dor e, rojekê geş e, rojekê zor e.

1562- Dinya bi sebrê ava bûye.

1563- Dinya bi tiran bûya dê hemû para keran bûya.

1564- Dinya bisekine av, agir û dijmin nasckinin.

1565- Dinya bûye kes tu kes negotiye bes!

1566- Dinya çerx û felek e.

Weha jî dibêjin: Dinya çerx e, em têde dizivirin.

1567- Dinya çiçika diya mirov nîn e ku mirov bi tenê bixwe.

1568- Dinya dehle em têde diçêrin.

1569- Dinya dem e hemû kul û xem e.

1570- Dinya dewran û dem e.

Weha jî dibêjin: Dinya dewran e, demekê gul e, demekê gulşîlan e.

1571- Dinya diheje lêbelê xerab nabe.

1572- Dinya direwîn e ji kesî re namîne.

1573- Dinya dûv e eqil kêr e.

1574- Dinya giş bûye milk, mêr tune hilke.

Varyanteke weha jî heye: Dinya milk e, mêr divê hilke.

1575- Dinya gul e her kes tê de dijî.

1576- Dinya gulek e, bîhn bike û bide hevalê xwe.

1577- Dinya hemû neyarê kewê ye û kew jî neyarê xwe ye.

1578- Dinya ji kesê re namîne.

1579- Dinya ji qencan vala nabe.

1580- Dinya li ser milê ga û masiyê ye.

1581- Dinya ma ji du pîran re wan jî li hev par nekirin.

1582- Dinya meydanake mezin e, her kes hespê xwe têde dibezîne.

1583- Dinya mêrdewan e rabûn jî heye, ketin jî heye.

Weha jî dibêjin: Dinya mêrdewan e hin hildikişin û hin dadikevin.

1584- Dinya mîna dar û devî têde hene şêr û rovî.

1585- Dinya mîna sîha darê ji kesî re namîne heta êvarê.

1586- Dinya ne behs û bazar e dinya soz û qerar e.

1587- Dinya ne soz û qerar e dinya keys û fesal e.

1588- Dinya nedîto, gava dîto bi xwe de rîto.

1589- Dinya penîr e, mirov kêr e; yek dibire û yek lê dinêre.

1590- Dinya sar e cilik yar e.

1591- Dinya siha darê ye geh li vir û geh li wir e.

1592- Dinya tijî herkes têde dijî.

1593- Dinya û qehpik xwişkên ayînî ne.

1594- Dinya war e ne mal e.

1595- Dinya warê dînan e.

1596- Dinya warê tevger û têkoşînê ye.

1597- Dinya weha hatiye û dê weha jî here.

1598- Dinya xan e û mirov bazirgan e.

Weha jî dibêjin: Ev dinya xan e û mirov têde mêvan e.

1599- Dinya xana tijî,

destek dimire, destek dijî,

destek têr e û destek pijî.

“Pijî” di wateya vala û birçî de hatiye bi kar anîn.

1600- Dinya ye hinek dikenin û hinek digirîn.

1601- Dinya ye hinek dikin û hinek dixwin.

1602- Dinyayeke boş û betal e ji kesî re qet nebû mal e.

1603- Dinyayê kê dot kê kirî û kê firot?

1604- Diqedîne loma diqewirîne.

1605- Diran beş hundir reş.

1606- Diran êş û derman kêş!

1607- Diranê jaran ji pelûrê dişikê.

Li hinek herêman di şûna gotina “jar” de gotina “belengaz” jî bi kar tînin.

1608- Diranên mar ku dêşe, ew di nav rê de disekine.

Du varyantên weha jî hene:

a) dema ecelê miro tê, per û paskên wê tên.

b) dema ecelê nêrî tê, diçe nanê şivên dixwe.”

1609- Dirêj e heywan e, qut e şeytan e.

1610- Dirijiya rîh ji berê rîh dîyar e.

1611- Divê mirov birîna xwe bi destê xwe derman bike.

Li hinek deverên Kurdistanê weha jî dibêjin:

a) diyê mirov serê xwe bi destê xwe bixwirîne

b) divê mirov piştta xwe bi xwe bixurîne.

1612- Divê mirov nebêje Erebo merhaba,

heyne wê birî li ser kurk û eba.

1613- Divê xesû bi guhek û çavekê be.

1614- Dixwe nan û avê mineta kesê navê.

1615- Dixwim nan û avê nakşînim mineta dê û bavê.

1616- Diya baş ji hezar mamosteyî çêtir e.

1617- Diya dergûşan li hewa dimire.

1618- Diya dergûşan bi destekî ye.

1619- Diya dizan du tiran dike, yekê ji kêfan û yekê ji tirsan.

- 1620- Diya kuran mir li axuran lê tim ezîz in diya qîzan.
- 1621- Diya kuran be lê ne li bin dara kuran be.
- 1622- Diya mirov her gav law nayîne.
- 1623- Diya qîzan pirû da dîza, dîz çêkirin xelkê birin.
- 1624- Diya xelkê nabe diya mirov,
welatê xelkê nabe welatê mirov.
- 1625- Diz bê şop nabe.
- 1626- Diz diz e, çi hêkek çi gamêşek?
- 1627- Diz hebin şevereş gelek in.
- 1628- Diz ji mal e, derî bê havil e.
- 1629- Diz ku ji malê be ga ji kulekê derdixe.
- 1630- Diz li şevreşan digere.
- 1631- Diz û malxo bûn yek ga di kulekê de derdixin.
- 1632- Diz xwemal e derbend betal e.
- 1633- Dizan ji dizan dizî, erd û azman lerizî.
- 1634- Dizê bostanan mukir dibin zivistanan.
- 1635- Dizê malê di malê de be xêra wê malê tune.
- 1636- Dizê malekê kurmê darekê.
- 1637- Dizê te li mal be dergeh girtin betal e.
- 1638- Dizî ji qûçekî, qehpetî ji ramîsanekê.
- 1639- Dizî ne şanê mirovan e dizî para kûçikan e.
Weha jî dibêjin: Dizî ne şanê mirovan e şanê segan e.
- 1640- Dizî naye veşartin.
- 1641- Dîk malan teva nake rik malan teva dike.
- 1642- Dîk li ser tarê xwe axa ye.
- 1643- Dîkê bextê min berjêr bang dide.
- 1644- Dîkê dewlemendan hêj jî dîk e.
- 1645- Dîkê çê di hêkê de bang dide.
- 1646- Dîkê ku bêwext bang dide, serê wî tê jêkirin.
Weha jî dibêjin: Dîkê ku ezan nede, serê wî jê dibê.
- 1647- Dîkê rojek be ne mirîşka sed rojî.
- 1648- Dîlan herikê berbûrî hedikî.
- 1649- Dîlana du kesan e agir ketiye deh kesan e.
- 1650- Dîn di şîn û şahiyên de kifş dibin.
- 1651- Dîn dînan dibînin şivikên xwe vedişêrin.

- 1652- Dîn ji dîlanê zarok ji lîstikê têr nabin.
- 1653- Dîn û îman nan e, nan ku tune be,
qewraş îro Êzdî ye û sibehê jî Musilman e.
- 1654- Dîn û serxweş yek in.
- 1655- Dînên bi cil naske.
- 1656- Dînê mirov ji baqilê xelkê çêtir e.
- 1657- Dînik ji dînikan û mela ji meyîtan hez dîkin.
- 1658- Dîtin ez im û ne dîtin diz im.
- 1659- Dîtin û gotin nabin yek.
Weha jî dibêjin: Dîtin û gotin ne wek hev in.
- 1660- Dîtina çavan qînyata dilan.
- 1661- Dîtina deyndarî ne xweştir ji pêvedana koremarî.
- 1662- Dîwar bi guh in.
- 1663- Dîwar hilweşî toz hilkişî.
- 1664- Dîwar li ser qeşayê ava nabin.
Varyanteke weha jî heye: Dîwar li ser cemedê nabe.
- 1665- Dîwaro eyb û qisûr sitaro.
Weha jî dibêjin: Dîwaro, kêmasî bê veşaro.
- 1666- Dîwaro ez ji te re dibêjim, bûkê tu fêm bike.
Weha jî tê gotin: Kcçê ez ji te re dibêjim, bûkê tu fêm bike.
- 1667- Dîyarî qesp in,
şûndiyarî hesp in.
- 1668- Dîyariya şivan hilekok e.
- 1669- Dîzik ji beroşê re dibêje “rûtenî.”
- 1670- Dîzik tijî be û agir jî xweş be dê bifire.
- 1671- Dîzika kevaniyê bişike, deng jê nayê.
- 1672- Dîzikê got: Ez qûn bi zêr im.
Heskê got: Ez di nav de me.
- 1673- Do ji hêkê derketiye îro bi mirîşkê qayîl nabe.
- 1674- Dolab hebs e teşî reqs e nexş hewez e.
- 1675- Don nekî çirê, çira pê nakeve.
- 1676- Donê çêlê têra daxê çêlê nake.
- 1677- Donê genî nabe rûn,
qereçî tucar nabe xatûn.
- 1678- Donê nemerdan li scrê xwe mede.
- 1679- Dor bi dor e ne bi zor e.
- 1680- Dora te di peyîvê de neyê, nepeyîve.

- 1681- Dorê bide domasan.
- 1682- Dost dûr be jî nêzîk e û ne dost nêzîk be jî dûr e.
- 1683- Dost ji xwe re zû çêneke û dostê xwe jî zû bermede.
- 1684- Dost li serî dinêre, dijmin li lingan dinêre.
Weha jî dibêjin: Dost li lingan, dijmin li çavan dinêrin.
- 1685- Dost mirov digirîne, dijmin dikenîne.
- 1686- Dostaniya dostê xwe berde
 lêbelê dostaniya dostê bavê xwe bernede.
- 1687- Dostekî bi kêr, çêtir e ji deh birayên bê xêr.
- 1688- Dostê bavan nabin dijminê lawan.
- 1689- Dostê diljar xerabtir e ji neyar.
- 1690- Dostê çê di rojên teng de bi kêrî mirov tê.
- 1691- Dostê ketiyan tun in.
- 1692- Dostê kevin hespê zînkirî ye.
- 1693- Dostê ku mirov bide girîne baş e
 ne yê ku mirov bide kenîne.
- 1694- Dostê te jî zimanê te ye
 dijminê te jî zimanê te ye.
- 1695- Dostê te bila dost be,
 dijminê te bila kor be.
- 1696- Dostê xwarinê pir in
 lê yên alîkariyê tun in.
- 1697- Dostê xwarinê tim xeydan e.
- 1698- Dowsen kerê ne filên perê ne!
- 1699- Doz li nik şûr û pera.
- 1700- Du bi hev re rast bin yê sisêyan Xwedê ye.
- 1701- Du bira neçin gura!
- 1702- Du dil tevahî çiya didin ser çiyayî.
- 1703- Du diz li hev rast hatin,
 yekî darê xwe ji ber yê din veşart.
- 1704- Du dîn li warekî nabin.
- 1705- Du henek rastiyeke e.
- 1706- Du hesp li ser afirekî nayên girêdan.
- 1707- Du ji te re bêjin: “Kumê te ne li serê te ye”,
 tu destê xwe bavêje serê xwe.
- 1708- Du jin dîwanek du fileh karwanek.
- 1709- Du karwan e sê bazirgan e.

- 1710- Du kes herin ba qazî yek jê nabe razî.
- 1711- Du parên xizaniyê nezanî ye.
- 1712- Du pê, du rê; çar pê, çar rê.
- 1713- Du refên çûkan li cîhekî daneynin.
- 1714- Du rê naçin gundekê.
- 2715- Du serî ne wek hev bin, naçin ser balgiyek.
- 1716- Du tişt hêsa ne:
 Yek siwarbûna li keran û ya din lêdana sêwiyan.
- 1717- Du tişt mirov didin ezabê, jinbav û dengê dolabê.
- 1718- Du tune, yek e wek deq e.
- 1719- Du Xweda li ezman nabin.
- 1720- Du zebeş bi destekî nayên girtin.
 Weha jî dibêjin: Du zebeş nakevin bin çengekî.
- 1721- Dûeyên kûçikan qebûl bibûyan
 dê ji ezman hestî bibariyan.
- 1722- Dûeyên derwêşan dimînc tira gamêşan.
- 1723- Durê bide durnasan, înciyê bide încînasan.
- 1724- Durrê bide bi durnasan.
- 1725- Dûr here, durist vegere.
- 1726- Dûrî çavan, dûrî dilan.
- 1727- Dûvê kûçik qalib nagire.
 Li hinek deveran weha jî dibêjin:
 Dûvê se, sê sal bixin bilûrê sala çaran derxin dîsa xwar e.
- 1728- Dûvê rovî jêkî jî dîsan rovî ye.

- 1729- Ebasa dibêjin: Xwedê me bê par bike ji îmanê
lê bê par neke ji qapanê.
- 1730- Ebed û cdebî, her tişt dihere li xwedî.
- 1731- Ecel ku hat nade mecel.
- 1732- Ecelê gêrikê tê, perên wê jî tên.
Ev gotin jî, wek gotinên:
a) *ecelê mar tê, diçe xwe li ser rê kilor dike.*
b) *ecelê nêrî tê, ew diçe nanê şivên dixwe.*
- 1733- Ecelê nêrî tê, diçe nanê şivên dixwe.
Weha jî dibêjin: Ecelê mar tê, diçe xwe li ser rê kilor dike.
- 1734- Edalet ji ordiyê xurtir e.
Li hinek herêman weha jî dibêjin: Edalet ji ordiyê çêtir e.
- 1735- Edaleta saetekî çêtir e ji zixtên salekê.
- 1736- Edetên bav û bapîran, kerik xweştirin ji hêjîran.
- 1737- Elegez birinc be, Erez rûn be,
bergedan tune be dê dîsa pûç be.
- 1738- Elevere delevere Mehemedê Kurd nobete.
- 1739- Em çiqas hûr kin em dê gilî kûr kin.
- 1740- Em dixwin nanê sêlekê ew dixwe yê êlekê.
- 1741- Em ne ji malekê ne ji halekê ne.
- 1742- Em ê hû kin -mû kin serê siman bi gû kin.
- 1743- Emanet heta qîyamet.
- 1744- Emel ji emel çêtir e.
- 1745- Emrê çûyî bi paş ve nayê.
- 1746- Emrê ku çû, mede dû.
- 1747- Emrê leglegê çû bi leqleqê.
- 1748- Emrê mêran kurt e.
- 1749- Emrê mirov bi xweşiya wê ve girêdayî ye.
- 1750- Emrê xayînan kurt e.
- 1751- Enîdok simêlboq, serdindoq, çavbeloq
bi van rewşan mirov dibe hoqe-boq.
- 1752- Epraxên sîran bidin pîran,
epraxên birincan bidin law û gencan.

Varyanteke weha jî heye: Epraxên sîran bidin pîran, epraxên birincan-
bidin mîran.

1753- Eqil ar e, hiş av e.

1754- Eqil bi pere nayê kirîn.

Weha jî dibêjin: Eqil nayê firotin.

1755- Eqil bi ser eqil re heye.

1756- Eqil derxistine firotinê, her kesî dîsa eqilê xwe kiriye.

1757- Eqil di serî de ye ne di çog û ne jî di bejnê de ye.

1758- Eqil nayê firotin.

1759- Eqil ne ji mezinahî û ne biçûktiyê ye.

1760- Eqil sivik e, ling çepek e.

1761- Eqil taca zêrîn e li serê her kesî nîne.

1762- Eqil û dil rahiştine hev dil zora eqil bir.

1763- Eqilê dirêjan di lingên wan de ye.

1764- Eqilê giran mû ker dike.

1765- Eqilê kêrî riya xwar dide pêş mirov.

1766- Eqilê kêrî xwediyê xwe şerpeze dike.

1767- Eqilê Kurdan piştî serê wan.

1768- Eqilê kurî bi çûkan re firî.

1769- Eqilê kurî cêniya dêlbirî.

1770- Eqilê kurî risqê bitanê.

1771- Eqilê mirov rêberê mirov e.

1772- Eqilê pîrê şîreta pîrê.

1773- Eqilê sivik barê giran.

1774- Eqilmend timî kifş in.

1775- Erd bi birinc be av jî rûn be,

ku xwedî tune be zû xelas dibe.

1776- Erd nan dide cotkar pesnê xwe dide.

1777- Erd têrnabe ji baranê çav têr nabe ji nêhrînê.

1778- Erdê baş nan tîne.

1779- Erdê neyaran bi buhistan hatiye pîvan.

1780- Erdê xwe bi ceh ke kewara xwe tije ke.

Li hinek herêman jî dibêjin: Zeviya xwe bi ceh ke, kewara xwe tije ke.

1781- Erdê Xwedê milk e lê min mêr divê ku hilke.

1782- Ereb hîn nebûne derpiyan.

1783- Ereb ne însan e hêştir ne heywan e.

1784- Ereb û rez, Filch û pez?

1785- Erebeya vala serê xwedî dêşîne ji teq-reqê.

1786- Erebê rûyê te reş e? Got: Malê min ev e.

Weha jî dibêjin: Gotin Erebê çima qûna te reş e? Got: Malê min ev e.

1787- Erê me deve nedîtiye, ma pişkulên wan jî nedîtiye?

1788- Erzan kirî, heban dirî.

Weha jî dibêjin: Erzan kirî zû dirî.

1789- Esasê ser berfê ne esas e.

1790- Esil ne çentê nexşîn e, esil firavîn e.

1791- Esil pişt e zik ne tişt e.

1792- Eskerê reş ew reşê ga ye em jî beşê ga ne.

1793- Eslê jinê jin e.

1794- Esrarê mirov kilîta dilê mirov e.

1795- Eşqa dizan ji şevereşan tê.

1796- Etar helawa xwe naxwe.

1797- Ev aş, ev jî çirika aş.

1798- Ev çav ronahî nade wî çavî.

Weha jî dibêjin:

a) ronahiya çavê rastê ji yê çepê re tune.

b) xêra çavê rastê ji yê çepê re nîn e.

1799- Ev dar e û ew zirar e.

1800- Ev ev e, te divê li ber be û te divê ji ber be.

1801- Ev hîn nîna ye tîrnîna hîn maye.

1802- Ev lêlê ye hîn lolo maye.

1803- Ev riya ku tu têde diçî ez ji wir ve hatime.

1804- Evîna dilan bi dayîna destan dîyar e.

1805- Evîna dizan şevreş in.

1806- Evîna welat ji her tiştî bi rûmetir e.

1807- Ew cîh xweş e ku dil li wir geş e.

1808- Ew çavê ku dijminê xwe nas neke bila birje.

1809- Ew ezmanê ku min dîtiye baran jê nayê.

1810- Ew ê ditirse, dipirse.

1811- Ew ê dîzikê çêke dikare çembil jî pêxe.

1812- Ew hewş e belê ne ew rewş e.

1813- Ew ê ku tiliya xwe bixe guhê xwe dizanê çi bêje.

1814- Ew ê ku bilind bifire, nizim dikeve.

- 1815- Ew ê ku hêştir bikire,
divê serdana xaniyê xwe jî bilind bike.
- 1816- Ew ê ku dest kiriye dê û bav kiriye.
- 1817- Ew ê neyê hinavan nayê pêş çavan.
- 1818- Ew kesê ku ji Xwedê natirse ji wî kesî bitirse.
- 1819- Ew kesê ku neçe şer şer pê xweş e.
- 1820- Ew kesê ku quweta te pê negihêje, bela xwe jê veke.
- 1821- Ew kesê ku per û baskê tawiz dixwaze,
divê here sefera Hîndistanê.
- 1822- Ew mala ku jin tê de malxo be bila ew mal xerab be.
- 1823- Ew mirî nakeve ber wî girî.
- 1824- Ew mirov nezan e yê ku eqilê wî ji kîsê xelkê be.
- 1825- Ew riya ku te berê xwe dayê ez jê hatime.
- 1826- Ew tas e lê ne ew hemam e.
- 1827- Ew sal e, belê ne ew bihar e.
- 1828- Ew tehtikê ku te lê rîbû baranê ji zû ve şûştî ye.
- 1829- Ew xem ji bo wê demê be.
- 1830- Ewil dibêjin şêrejî paşê dibêjin şêremêr.
- 1831- Ewladê çê serweta bavê.
- 1832- Ewr cor bûn nixte kor bûn.
- 1833- Ewr diçe Heleb erd dibe seleb.
Ev gotin li herêma Amedê tê gotin. Li gor bajariyên Amedê,
dema ewr ber bi Helebê ve here baran tê.
- 1834- Ewr diçe Mûş erd dibe pûş.
Ev gotina pêşiyên jî, li herêma Amedê tê gotin. Li gor cografya Amedê
dema ewr bi aliyê bajarê Mûşê ve here xweşî tê û tav derdikeve.
- 1835- Ewr heye giran e, ewr heye sivik e.
- 1836- Ewrê biharê digere çinebarî.
- 1837- Ewrê bi gur-gur mêrê bi tirtir bêkêr in.
- 1838- Ewrê giran piştê sayî dibe.
- 1839- Ewrê gire-gir baran jê nayê.
- 1840- Ewrê ku min dîtiye ne yê baranê ye.
Weha jî dibêjin: Ezmanê min dîtî, baran jê nayê.
- 1841- Ewrê ku te brûska wê dît jê metirse.
- 1842- Ewrê reş tim jê baran tê.
Weha jî dibêjin: Ewrê reş ewrê baranê ye.

1843- Ewrê reş baran e, ewrê spî zivistan e.

1844- Ewrê sor êvarê cot bavêj beyarê,
ewrê sor sibê, cot bavêj şûvê.

Li gor demê û rengê ewrê dîyar dibe, ku sibehê xweşt an şilî ye. Wek texmînên meteorolojî, Kurdan jî di demên berê de, li gor dem û rengên ewran xwe jî cot re amade kirine.

1845- Eyarê bênamûsan fireh e.

1846- Eyd e bê qeyd e.

1847- Eyd tê xêr û bêr pê re tê.

1848- Eyd xêr û bêr e.

1849- Eynî jin weynî jin disan jin.

1850- Eyšik e bi xwe şik e.

1851- Ez axa, tu axa kê pez bibe nav baxa?

1852- Ez bi tehtan digirim ew jî hatiye bi min digire.

1853- Ez bi te tu bi min em bi tev de bi Xwedê re.

Weha jî dibêjin: Ez bi te me, tu bi min î, em herdu jî bi Xwedê ne.

1854- Ez bûm ax nebêje wax.

1855- Ez çi dibêjim, bilûra min çi dibêje.

Weha jî dibêjin: Ez çi dibêjim, tembûra min çi dibêje.

1856- Ez çi bêjim simsim Simaîl e.

Dema mirov bike û neke kesek guhdariya mirov neke û wek zanîna xwe bimeşîne, wê demê vê gotinê dibêjin.

1857- Ez çiqas ji belayê direvim bela tê li lingê min dimale.

1858- Ez çiya û tu çiya kî ji golik re bîne giya?

1859- Ez çûm gundekî nenas, pesnê xwe da bêqîyas.

1860- Ez çûm serê çiya zûriyam wek guran, birazî nabin bira.

1861- Ez çûm çiyayê dînan,

min stand darê dînan û min firot dînan.

1862- Ez çûme daweta wî, ew hatiye diziya min.

1863- Ez dewê te û tu jî dewê mala mîran bikule!

1864- Ez dibêjim "bira," ew dibêje "biraxur."

1865- Ez dibêjim bira tu dibêjî kirîv.

1866- Ez dibêjim çal, ew dibêje çewal.

1867- Ez dibêjim ewr tune, tu dibêjî dê baran bê.

1868- Ez dibêjim ez xadim im tu dibêjî çend zarokên te hene.

1869- Ez dibêjim germ e, ew dibêje bixwe şerm e.

1870- Ez dibêjim hanê tu dibêjî kanê?

- 1871- Ez dibêjim hirç va ye tu dibêjî rêç va ye.
Weha jî dibêjin: Ez dibêjim rê va ye, tu dibêjî rêç va ye.
- 1872- Ez dibêjim stewr e tu dibêjî bidoşe.
- 1873- Ez didime te bext lê nadime te text.
- 1874- Ez diz berdidim lê diz min bernade.
- 1875- Ez garisê şeng im mêrê roja ceng im.
- 1876- Ez gerîyam li dinê xilas nebûm ji mirinê.
- 1877- Ez geriyam li Elegezê 366 gelî min ne dît mêrekî du gilî.
- 1878- Ez goştê heram naxwim
 lê nanê xwe di avdonkê de hûr dikim.
Weha jî dibêjin: Ez goşt naxwim lêbelê ez nanê xwe yê tisî pê dixwim.
- 1879- Ez hatime daweta te, tu hatî dîziya min.
- 1880- Ez hêdî diçim, bela digihe min,
 ez zû diçim, ez digihîm belayê.
- 1881- Ez hurmet û tu hurmet,
 riya min û te bi hevket,
 ez bi xêr û tu bi selamet.
- 1882- Ez ji te re tu ji kê re?
- 1883- Ez jî rê revîm û rê jî ji min.
- 1884- Ez ji wî re wekî penîr im ew ji min re wekî kêr e.
- 1885- Ez kelê rojekê bim û ne mangeya hezar salî bim.
- 1886- Ez kor û tu kor dê kê mehîrê bibe jor.
- 1887- Ez lawê kerê me lê mêrê çê me.
- 1888- Ez li daweta te diz im diz li goma pez in.
- 1889- Ez li cinan bixim ez dê bi cinan bikevim.
- 1890- Ez li zik dixim tu dibêjî way pişta min.
- 1891- Ez nizamim ez rehetê can im.
- 1892- Ez sing dikutim tu hebin lê girê didî.
- 1893- Ez tîm kuştin lê nayê m çimandin.
- 1894- Ez weha bikim bav dimire weha nekim dê dimire.
- 1895- Ezabê cîran ji cîran tê xwestin.
- 1896- Ezman bi stêrkan dixemile.
- 1897- Ezmanê dirêj bela serê xwe ye.
- 1898- Ez mêr tu mêr kî soqil hemir.
- 1899- Ez mêr tu mêr kî ji me şêr?
- 1900- Ez namirim bi vê derbê ez dimirim ji vê kerbê.

- 1901- Ez ne bi duan bême û ne jî bi nifiran dimirim.
- 1902- Ez pîvaz naxwin ew dibêje "were şekir bixwe."
- 1903- Ez singekê dikutim tu hebenekê davêjî pê.
- 1904- Ez tirnînî ji te re dibêjim tu Yarhezokê li min vedigerîn!
- 1905- Ez zehf stran dizanim lê dengê min tune.

- 1906- Êl hebe, êl beg jî heye.
- 1907- Êl maka mirovan e.
- 1908- Êl mêranîyê dike navê axê bilind dike.
- 1909- Êl rabû, beg wenda bû.
- 1910- Êl, êla min e; nav, navê Bişarê Momin e.
- 1911- Êl yeman, beg yeman?
- 1912- Êla bêserwer wenda dibe.
- 1913- Êlanê dilan jî êlkanê ba gurtir e.
- 1914- Êlê xwe li pîrê girt pîrê xwe li êlê negirt.
- 1915- Êrê-crê ez xwişka heft biran bûm ez şandim kerê.
- 1916- Êrîşa gur pez ditirsîne.
- 1917- Êşa çavan derdê dilan.
- 1918- Êşa li hevalan tîra li kendalan.
- 1919- Êşa tiliyê êşa hemû laş e.
- 1920- Êşa tiliyê derdê hewiyê.
- 1921- Êşa zarokan di qûna wan de ye.
- 1922- Êzîdî bê simêl nabe.
- 1923- Êzîdî ye bi derpê û kirasê spî ye,
ji bav û kalê xwe ve buhiştî ye.
- 1924- Êzîdîtî kirasê spî ye divê deq lê nekeve.

- 1925- Fahşo-mahşo li ber aşo.
- 1926- Fala qereçiyar li hev derdikeve.
- 1927- Fala qereçiyar şansê sêwiyan.
- 1928- Faris bê dîn e û Tirk bê îman e.
- 1929- Fatromê agir berda zomê û çû rûnişt li ser komê.
- 1930- Fedîkirî xisirî.
- 1931- Felek çerx e çep û rast dizivire.
Li hinek herêman di şûna gotina "dizivire" de gotina "digere" bi kar tînin.
- 1932- Feleka fînd û finaz, firindê biçûk û baz
geh da me şahê gedan, ew jî bi minet û naz.
- 1933- Felek e kelek e; pê bawer meke.
- 1934- Felekê ku ji yekî re li hev anî nabêje tu kurê kê yî!
- 1935- Felekê li min rakir, milê xwe hilda û serî bi min re li ba kir.
- 1936- Fen û fût bû peyda pê re bi tirkî xeberda.
- 1937- Fend û virên jinan barkirin ser kerê,
ker di bin de mir û nemir.
- 1938- Fendê jinê serî çiyayê Cûdî xwar kiriye.
Weha jî dibêjin:
a) ji fêlbaziya jinan çiyayê Cûdî xwar bûye.
b) ji weyniyên jinan çiyayê Cûdî xwar bûye.
- 1939- Feqîr bi feqîran re bizewicin dê parsek çêbibin.
- 1940- Feqîr bi halê feqîran dizanin.
- 1941- Feqîr çû diziyê hîv ji hêvar de derket.
- 1942- Feqîr çûn ku xwe balqînînin dîtin ku dewlemend li ba dibin.
- 1943- Feqîr ji lewma jar e, ji ber ku axîna wî av û dar e.
Varyanteke weha jî heye: Feqîr loma jar e, hesreta wî av û dar e.
- 1944- Feqîr li şovê çû dartitûn li qûnê çû.
- 1945- Feqîr li mal e, aş betal e.
- 1946- Feqîr û jar wek par û pêrar.
- 1947- Feqîrek gava dewlemend dibe
dîsa çil roj bîhna feqîriyê jê tê.
- 1948- Feqîrî jenga mêran e.
- 1949- Feqîrî ne eyb e, nezanî eyb e.
- 1950- Feqîrî ne tu çek e, li xwe meke.

- 1951- Fera qeysê me bûye reysê me.
 Qeys ew darê ku pê bangerana ser baniyan digerînin re dibêjin. Dema kesekî xerab û ne layiq bibe mezin an jî sermiyanê dem û dezgehekê wê demê vê gotinê dibêjin.
- 1952- Ferehî zû li pey tengaziyê tê.
Weha jî dibêjin: Bi dû tengasiyê re firehî ye.
- 1953- Ferek cîzmeya Rojkan, berdaye pênc hezar siwarên Silîvan.
 Rojkan li herêma Silîvanê navê eşîrek e.
- 1954- Fermana devê rabû, rovî xwe veşart.
- 1955- Ferqa kûçikê sor û spî tune ye.
Varyanteke weha jî heye: Ferqa kûçikê reş û spî tune.
- 1956- Ferxê şêran jî şêr e.
 Ji çêlik an cewrikan re "ferx" dibêjin.
- 1957- Fesad nivîyan mîh û gur li cem hev çêriyan.
- 1958- Feyda gavanan siwarbûna keran e.
- 1959- Fêkiyên zivistanê agir e.
- 1960- Fikra şêx çî be zikra şêx jî ew e.
- 1961- File(h) e, li mala xwe ye, çî bi te ye.
- 1962- Filehê pîr, musulman nabe.
- 1963- Filehê yekrû çêtir e ji Musilmanê durû.
- 1964- Fira mirîşkê heta ser sergoyê ye.
Varyanteke weha jî heye: Firîna mirîşkê heta enîşkê.
- 1965- Firêza genim ji ya ceh kifş e.
- 1966- Firoşker bi eleza tiştên xwe nizane.
Weha jî dibêjin: Firoşker zimanxweş û derewîn in.
- 1967- Fis di nav sê kesan de tê wenda kirin.
- 1968- Fis reng nagire.
- 1969- Fînoyê sor bê qutik nabe.
- 1970- Fît mane lê xema yê bêlêv e.

- 1971- Ga bide gamirîyan, jin bide jinmirîyan.
- 1972- Ga bi kêrekê ser jêdibe dûr re kêr li ser pir dibin.
Weha jî dibêjin:
 a) ga ku ket kêr lê zêde dibin
 b) ga dikeve kêr pir dibin.
- 1973- Ga bimire gêre lê pir dibin.
Varyanteke weha jî heye: Dema leş bikeve qertêl hazir in.
- 1974- Ga bira ye ker bûka malan e.
- 1975- Ga dikirim dibe golik, genim davêjim dibe şolik.
 Şolik cureyekê nîskan e.
- 1976- Ga dimire çerm dimîne, mêr dimire nav dimîne.
- 1977- Ga ket dûvik li xwedî ye.
- 1978- Ga kok dibe li mêrgê mela li mala miriyan.
Weha jî dibêjin: Ga li mêrga kom dibin, mele li mala miriyan.
- 1979- Ga ku kok dibe strûyên xwe li kendalan dide.
- 1980- Ga ku poçê nehejîne dê mêş wî bixwin.
- 1981- Ga li garanê digere hevserê xwe dibîne.
- 1982- Ga mirar dibû xwedî digot ji min çêtir kes tune.
- 1983- Ga nanale barê ga dinale.
- 1984- Ga rengê ga nagire, xûyê wî digire.
- 1985- Ga û parî li cem mirovê comerd yek e.
- 1986- Gamêş di sînorê xwe de xurt e.
- 1987- Gamêşê qelb zû crebe werdigerîne
 û hevalê qelb riya xwe ji rê derdixîne.
- 1988- Gan li Gewro û curm li Îso.
- 1989- Ganglok ne bihar e xox ne dar e,
 keç ne war e jina bi mêr ne tu yar e.
- 1990- Garan ber bi mal bû jina şivan şuxilkar bû.
Weha jî dibêjin:
 a) garan hat zeviyê jina gavan ji nû bezî teşiyê.
 b) gavan ber bi mal e, jina wî bi kar û bar e.
- 1991- Gava baran dibare herî çêdibe.
- 1992- Gava barê mirov xwar be, her kes kevir lê dixê.
- 1993- Gava çûyî balê bipeyîve bi mêzîn û misqalê

- dê bêjin çi mirovekî pir bi galegal e.
- 1994- Gava ez ciwan bûm bi tîr û kevan bûm,
gava ez kal bûm notirvanê şikefta keviran bûm.
- 1995- Gava hate serî heger bizirî wek kerî
dê bêjin çi mirovekî xweşxeber î.
- 1996- Gava hiş li serî ye çima diçe ber derî ye?
- 1997- Gava ku mirtib birçî dibin dawetê tînin bîra xwe.
- 1998- Gava ku mirov bi xelkê nikaribe bi xwe dikare.
- 1999- Gava ku nêçîra min tê gûyê tajiyê min tê.
- 2000- Gava kûçik bezî gur, gur mir.
- 2001- Gava mezin a devê deriyê mirov e.
- 2002- Gava kur be mizgînî ji Xweda re,
gava qîz be mizgînî ji kesan re.
- 2003- Gava rovî şil bû êdî ji baranê natirse.
Wek ku dibêjin: Ku mirov da navê çi li çokê, çi li navê.
- 2004- Gava te tîr avêt kevanê xwe veneşêre.
- 2005- Gava tu bi giliyan nizanî meçe malan bi mêvanî.
- 2006- Gava tunc bin mêr nav dîkin li keleşêr.
Sorani ji "dîk" re dibêjin "keleşêr."
- 2007- Gava Xwedê ji yekê re kur dide, nabêje kurê kê ye.
- 2008- Gavan axayê naxirê ye.
- 2009- Gavan hewcedarî axa dibe û axa jî hewcedarî gavan dibe.
- 2010- Gavan neçû ba garanê, çû lingê çêlekê şikand.
- 2011- Gavanê sê dan mehrûm bû ji herdu îdan.
- 2012- Gayan radikin, golikan li rahêlê dixin.
- 2013- Gayê baş bi serbaran tal dibe mêrê baş bi gotinan tal dibe.
- 2014- Gayê çê bi cot, mêrê çê bi gotin.
- 2015- Gayê çê ji goliktiya xwe de xuya dike.
- 2016- Gayê kor li ser afirê dimîne.
- 2017- Gayê ku ji garanê bimîne gur wî dixwe.
- 2018- Gayê ku ji nîrê mirov û lawê ku ji mirov nebe,
xêra wan ji mirov re tune.
- 2019- Gayê malê ji golikên malê natirse.
- 2020- Gayê min e lê xeyseta wî tu dizanî.
- 2021- Gayê min ne ji cot re lê jî gûjgûjê re camêr e.
- 2022- Gayê qelb nîr dişkîne.

- 2023- Gayê qol ne mêşan ji xwe kiş dike û ne jî cîranan.
- 2024- Gayê pîs tim golik e û mirovê pîs tim lawik e.
- 2025- Gayê reş çermê xwe naguhêze.
- 2026- Gayê rind û mêrê rind ew in rewşa gund.
- 2027- Gayê sor heta ber kêrê sor e.
Varyanteke weha jî heye: Gayê sor dev ji sortiya xwe bernade.
- 2028- Gayê xişt û mêrê pişt kî digihê dibêje: Min kuşt.
- 2029- Gayê xweş bi alifê rizî tişt pê nayê.
- 2030- Gaz di destê te, de top di destê te de, çawa dipîvî bipîve.
Weha jî dibêjin: Gaz, gaza te ye û caw cawê te ye, tu çawa dixwazî, weha bipîve.
- 2031- Gazina bûkê ji xesûyê ye.
- 2032- Gazî pîra çilpis kin kul û derdan jê pirs kin.
- 2033- Gazîkirin edet e, nehatin dewlet e.
- 2034- Gazîkirin rûmet e, nehatin dawet e.
- 2035- Gaziya du siwaran nagihîje xwediyê xwe.
- 2036- Gedûga teng çêtir e ji mala bêdeng.
- 2037- Geh dibire û geh dikire.
Du varyantên wê yên din jî hene:
 a) geh li nalê dixe û geh li bizmarê.
 b) geh keyfxweş e û geh vedireşe.
- 2038- Geh digirî geh dikene.
- 2039- Gelekan nede bi hindikan.
- 2040- Gelî bê dar nabe zozan bê war nabe.
Weha jî dibêjin: Gelî bê şîlan nabin.
- 2041- Gemiya bêlenger timî qeza li ser.
Weha jî dibêjin: Gemiya bê perde, bi kul û derd e.
- 2042- Genim navêje şûna kizinê, berxê navêje bin bizinê.
- 2043- Gepa necûlî naçe xwarê.
- 2044- Gerdena stûr zû zirav dibe.
- 2045- Gerî li deşt û berî hew gundekî ebo-lebo hebû,
 çû di wir de jî rî.
- 2046- Geriya dikan bi dikan lê dîsa daqoqa serî ziman.
- 2047- Geriya ye diriya ye.
- 2048- Geriyam li dinê, xelas nebûm ji mirinê.
- 2049- Gerîn derman e risq li ser pîyan e.
- 2050- Germ e kel û cil şerm e; sar e kel û cil yar e.

- 2051- Germ germa tûyan e, kêf kêfa rûtan.
- 2052- Gevezan avêtin dojehê gotin: Çiqas sar e.
- 2053- Gewr bi nîvî ne esmer bi xwedî ne.
- 2054- Gewr derin dewsa esmeran esmer derin dewsa keran.
- 2055- Gewriya qul bê risq nabe.
- 2056- Gêre bi golikan nabe.
- 2057- Gêzer zer e kirtîn li ser e.
- 2058- Gilî bi deh awayî tê gotin.
- 2059- Gilî bikim bi kê re xerabî tê pê re.
- 2060- Gilî hate zaran dê têkeve nav malan.
 Li herêma Serhedê peyva "gilî" di şûna "gotin" de bi kar tînin. Dema gotineke bê gotin, êdî di nav gund de belav dibe. Pêwîst e ku mirov sirên xwe nebêje û bi dizî bigire. *Weha jî dibêjin*: Gilî hate zaran, deng giha guhdaran.
- 2061- Gilî heye bi zor in.
- 2062- Gilî hene, gilîker tune ne.
- 2063- Gilî heye ji hezar gilî hêja heye.
- 2064- Gilî ji ber giliyê der tê.
- 2065- Gilî ku çû êdî nede dû.
- 2066- Gilî li nedîtîyan neke.
 Buhtan an jî derew li kesên nedîtî û dûr neke.
- 2067- Gilî qamîşê ber sazan e û toqila pîvazan e.
Weha jî dibêjin: Gilî toqilê pîvazan e, ji ber hev dertên.
- 2068- Gilî têne gotinê ji bo bihîstinê.
- 2069- Giliyê bi telekî nîvê şelekî.
- 2070- Giliyê dê û bavê şîret in.
- 2071- Giliyê mêran yek e: Ya "erê" ya "na!"
- 2072- Giliyê rastiyê bi henekî dibêjin.
- 2073- Giliyê rast bêje bila li Xwêdê xweş be,
 bila li benda ne xweş be!
- 2074- Gilîyekê wusa bêje, sêlê nan bipêje.
- 2055- Giliyê xwe erzan neke, yekê kin bêje, yekê dirêj bêje.
- 2076- Gir be da ku tu girav bî.
- 2077- Gir dibêjin "em çiya ne," golik dibêjin "em ga ne."
- 2078- Girar xweş e geh li mala me û geh li mala we.
- 2079- Girara mêran bi hemd dikele.

- 2080- Girara pirkevanî yan şor e yan kê m xwê ye.
- 2081- Girara rijî ji kêmrûniyê ye.
Weha jî dibêjin: Girara rehin, ji kê m danû ye.
- 2082- Gireka koran kor e.
- 2083- Gireka ku bi destan vebe ne hewceyê diranan e.
- 2084- Gireka xwe bi destê xwe venekî, kes ji mirov re venake.
- 2085- Girîng e karê camêr, bi qelem kes nabe têr.
- 2086- Giriye mirov tê li ser miriyê mirov.
- 2087- Girtiyo, kuştiyo di ber xelkê de.
- 2088- Giv-giv ji pêvedanê nexweştir e.
- 2089- Giya di bin kevir de namîne.
Weha jî dibêjin: Giya çiqas nerm be jî, di bin keviran de hildibe.
- 2090- Giya li çiya xalî nabe.
- 2091- Giyayê hewşê tal e.
- 2092- Giyayê kevn bide dijminê xwe kaya kevn bide mirovê xwe.
- 2093- Giyayê lihûz nabe nefel.
- 2094- Gîsinê cotkar diçirise.
Varyanteke weha jî heye: Gîsinê bêkar, zingar digire.
- 2095- Gîskê bê dayik nabe nêrî.
- 2096- Gîskê nede bi nîskê.
- 2097- Gîskê par hevûrî yar.
- 2098- Gîsinê di çavê xwe de nabîne,
 derziyê di çavê hevalê xwe de dibîne.
- 2099- Gog çiqas gilover e jî, li cîhê rast disekine.
- 2100- Gol dibin bihur keç nabin kur.
- 2101- Golik derin rêxa xwe li cem gayê mezin dikin.
- 2102- Golika li ber benê me ye.
- 2103- Golika xwe bi gayê xelkê mede.
- 2104- Golika xwe bike holika xwe.
- 2105- Golikekî rîxo navê garanekê xerab dike.
- 2106- Golikê malê ji gayê malê natirse.
- 2107- Gor bi gor herin ser ava şor.
- 2108- Goşt bê hestî nabe.
- 2109- Goşt li ser post tê hûr kirin li ser kevir hûr neke!
- 2110- Goşt rastî kesê bêdiran tê.
- 2111- Goştê ga ye li ber çav e.

- 2112- Goştê genî ji ber bimîne di dîza xwedî de ne.
- 2113- Goştê gur ker û se nayên xwarin.
- 2114- Goştê heram naxwe lê pariya xwe li şoravê dixê.
Weha jî dibêjin: Goştê diziyê naxwe lê nanê xwe di avşorka wî de dike.
- 2115- Goştê her teyrekî nayê xwarin.
- 2116- Goştê mirovê xwe bixwe, hestî ji bo xwe bihêle.
- 2117- Goştê mirovan nayê xwarin,
 xû û exlaqê mirovan tê xwarin.
- 2118- Goştê piyê xwe bixwe, malê sêwiyan nexwe.
Weha jî dibêjin: Goştê piyê xwe bixwe, ji malê êfîman çêtir e.
- 2119- Goşt û neynûk ji hev nabin.
- 2120- Got: Apo jina te kevir e.
Got: Ji minetê çêtir e.
- 2121- Got ez sîrkê çêkim lê bû eraq.
- 2122- Got: Kanî gilîvan?
Got: Bi qurbana te û wî zimanî,
 te ev Kurmanciya delal ji kû anî?
- 2123- Got: Ne ji ber wî rabûm ji ber pora wî ya spî rabûm.
- 2124- Gote-got mala mirov xerab dike.
- 2125- Gotin: Avê çima deng ji te tê?
Got: Hevalê min kevir e.
- 2126- Gotin: Bavê te ji birçînan mir.
Got: We jê re şorbeya birincê çêkira!
- 2127- Gotin: Bavê te siwaran kuşt an peyan?
 Got. Heger kuştin ha siwar û ha peya.
Weha jî dibêjin: Gotin bavê te kuştin, got "gelo siwar bû an peya?"
- 2128- Gotin: Birayê te bû axa.
Got: Jina wî bû xatûn.
- 2129- Gotin: Deve stûyê te xwar e.
Got: Li kû yê min rast e..
- 2130- Gotin edet e nexwarin dewlet e.
- 2131- Gotin: Em te têxin cenetê.
Got: Roj nexweş e.
- 2132- Gotin: Ew çi ye diçinî?
Got: Kengê hêşîn bû dê tu bibînî!
- 2133- Gotin: Ez te bikim mîr.
Got: Na min bike kizîr.
- 2134- Gotin filankeso baş e, ew rabû çû di cirnê de rî.
Weha jî dibêjin: Gotin filankeso baş e, ew rabû çû di mizgeftê de rî.

- 2135- Gotin: Filankeso jina te zehf digere!
Got: Çira nexwe ez rojekê di mala xwe de nabînim.
- 2136- Gotin: Gur here berxan!
Got: Lingê min dêşe.
- 2137- Gotin: Guriyo çima porê te tune?
Got: Porê xalîfka min pir e.
- 2138- Gotin: Guriyo te şûşt?
Got: Min hunand jî.
Weha jî dibêjin: Gotin keçelo te şûşt? got: Min vegirt.
- 2139- Gotin: Guro em dê te bikin şivan.
Got: Ez ji siûda xwe ne bawer im.
Weha jî dibêjin: Gotin rovî: Me tu kirî mîrê mirîşkan. Got: Ez ji siûda xwe ne bawer im.
- 2140- Gotin: Horê rebenê te çî dît?
Got: Herçî dît min dît.
- 2141- Gotin jî mirdaran û spî ji qerpalan.
- 2142- Gotin: Jûjî were ser xalîçê!
Got: Zivre û gij e.
- 2143- Gotin : Kelkele meskenê te li kû ye?
Got: Li ba dîzan e.
- 2144- Gotin: Kerengê cîhê te li kû ye?
Got: Xwedê û ba dîzanin.
- 2145- Gotin: Kero cahşek ji te re bû.
Got: Barê min zêde bû û êmê min kêmbû.
- 2146- Gotin: Kero rêza te çî ye? Ker boça xwe hilda û ziriya.
- 2147- Gotin: Kero were em te bibin buhiştê.
Got: Ma gevzonek li wir heye?
- 2148- Gotin: Kê çavên te derxist?
Got: Mirovê min.
- 2149- Gotin: Kê mal avakir?
Gotin: Mêvan
- 2150- Gotin: Kê mirî rakir?
Gotin: Mazûvan.
- 2151- Gotin kitikê gûyê te derman e girt û axê kir ser.
Ji pisîkê re Kurd "kitik" jî dibêjin.
- 2152- Gotin: Koro te çî divê?
Got: Çavekî kor gepeke bi don.
- 2153- Gotin: Koro te çî divê?
Got: Du çavên ronî.
- 2154- Gotin kund: Tu çima nayî gund?

- Got:* Ji destê gavanê ço bilind û ji destê qîz û bûkên rind.
- 2155- *Gotin:* Kuro tu ji kû yî?
Got: Hîn ez nezewicî me.
- 2156- *Gotin* ne xerab e lê pir şîret ezab e.
Weha jî dibêjin: *Gotin* ne hewar e, pi şîret azar e.
- 2157- *Gotin:* Pîso çima tu pîs î?
Got: Xwedê li eniya min nivîsî.
- 2158- *Gotin:* Pişo diya te baş e an bavê te?
Got: Mîyaw mîyaw!
- 2159- *Gotin:* Pişo gûyê derman e.
Got: Na hebirman e.
Weha jî dibêjin:
a) *gotin*, pişo gûhê te derman, firiya çû ezman e.
b) *gotin* qijikê gûyê te derman e, firî û çû ezman e.
- 2160- *Gotin:* Pîyala mîr ketîye şikest yan kupiya?
Got: Hey deng jê hat.
- 2161- *Gotin:* Se çima tu direyî?
Got: Ez ji gur ditirsim.
- 2162- *Gotin:* Singo çima tu xweş bi dîwêr de diçî?
Got: Ji zora pişt xwe.
- 2163- *Gotin :* Siwaro dizgînê hespê te dirêj e.
Got: Kin û dirêjîyê dizgînê di destê min de ye.
- 2164- *Gotin:* Te dinya çawa dît?
Got: Bi qasî dilê xwe.
- 2165- *Gotin:* Te çiqas temen kir?
Got: Bi qasî vê demê.
- 2166- *Gotin:* Terziyo malê barke!
Got: Derziya min di serê min de ye.
- 2167- *Gotin* û şîretan bibîhîse lê yên qenc ji xwe re bibjêre
û yên din ber de.
- 2168- *Gotin* û şîretên hêja nefiroşe bîyaniyan.
- 2169- *Gotin* zerar e, kirin kar e.
- 2170- *Gotin:* Zîyaretê min gelek caran bi te derew sond xwariye.
Got: Min jî gelek caran mala te xerab kiriye.
- 2171- *Gotina* ku bikeve devê zaran dikeve hemû taran.
- 2172- *Gotina* ku ket nav sî û sê diranan
dê bikeve nav sî û sê zimanan.
- 2173- *Gotina* me li mala me.
- 2174- *Gotina* mêran yek e yan erê yan neke.

- 2175- Gotina ne ji dil naçe dil.
- 2176- Gotina ne ji dil mîna meşka bê kil.
- 2177- Gotina paşî mebêje heta negihî paşiyê.
- 2178- Gotina rast bi mirov tal e.
Weha jî dibêjin: Gotina tehl di ber mirov de naçe.
- 2179- Gotina rast sondê naxwaze.
- 2180- Gotina sibeh û êvaran nabe yek.
- 2181- Gotina xwe ji dostê xwe re mebêje,
dostê dostê te hene dê ji wan re bibêjin.
- 2182- Gotina xweş têxe devê neyarê xwe,
pariya xweş têxe devê hevalê xwe.
- 2183- Gatinekê bêje wek sêla nan bipêje.
- 2184- Gotinê êvaran dikevin qulê dîwaran.
Weha jî dibêjin: Gotina êvaran dikeve qulên kewaran.
- 2185- Gotinê rast bêje bila Xwedê ji te xweş be,
evd ji te ne xweş be.
- 2186- Gotinên ji xwe mezintir meke.
- 2187- Gotinên mezinan neqşên li keviran.
Li hinek herêmên welat eeha jî dibêjin:
- a) gotinên mezinan zêrên veşartî ne.
 - b) gotinên pêşyan zêrên veşartî ne.
 - c) gotinên pêşyan bingehê xaniyan.
 - ç) gotinên mezinan bikin guhar û bixin guhên xwe.
- 2188- Gotinên pêşyan kevirên xaniyan.
Ev ji wek gotina "Gotinên mezinan neqşên li berikan in."e.
- 2189- Gotinên xav nepêjin bê tav.
Weha jî tê gotin: Pêşî gotina xwe bipêje û paşê bibêje.
- 2190- Gotina xweş mar ji qulê derdixe.
- 2191- Gotina xweş bihara dilan e.
- 2192- Gotina xwe pêşî bibêje û paşê birêje.
- 2193- Gotîye xaç nabêje paç.
- 2194- Gozek nede kurê xwe da neke didu.
- 2195- Guhanê çeleka şîrdayî jê nekin.
- 2196- Guhan jêkî kemo ye teriyê jêkî quto ye,
kûçikê hero hero ye.
- 2197- Guhdariya kesan kir, mala xwe xerab kir.
- 2198- Guhên erdê hene.
Weha jî dibêjin: Dîwar bi guh in.

- 2199- Guhên mele li girînê guhên mirtib li kenînê.
- 2200- Gul bê strî nabe.
- 2201- Gul bê bîhn nabe.
- 2202- Gul ew gul bû, baranê lê kir şil bû!
- 2203- Gul heye gulan wenda dike, ku heye kulan wenda dike.
- 2204- Gul ji sergo ye.
- 2205- Gul li gulê dinêre vedibe.
- 2206- Gul neçine gul xerab e; li şûna gulê dê sosin rabe.
- 2207- Gula çilmisî venagere.
- 2208- Gula govendê bûk e.
- 2209- Gula ku ji dara xwe bibe dê hişk bibe.
- 2210- Gula ku li ber deriyên şîr be, dê her roj di bin lîngan de be.
- 2211- Gula sûreta jinan mêr e.
- 2212- Gulan e dew li cem hemûyan e.
- 2213- Gulan e moza gayan e.
- 2214- Gulan e, şingêna dasan e.
- 2215- Guliyê jinê rewşa dinê.
- 2216- Guleya nêçîrvanan tewş naçe.
- 2217- Gule li pîrozgehan jî dikeve.
- 2218- Gund bê se nabe.
- 2219- Gund bê sergo nîne.
- 2220- Gund deh mal e, diwanzdeh jê rûspî ne.
Weha jî dibêjin: Deh mal diwazdeh rûspî.
- 2221- Gund xuya ye rêber ne hewce ye
- 2222- Gundek e gindorek e.
- 2223- Gundek e, rindek e.
- 2224- Gundê ava ji dûr ve xuya ye.
- 2225- Gundê bêkûçik her kes destvala lê digere.
- 2226- Gundê bêrez konê bêpez, mirov dibêje ez û ez.
- 2227- Gundê bêserî, şivanê bêkerî.
- 2228- Gundê bincame têde tucarî ava nabe.
- 2229- Gundê rûbar qulix ne lazim e.
- 2230- Gundê xerabe wek kûçikê bê diran e.
- 2231- Gundî nebin axa ji çi re ne?
- 2232- Gundiyan dest hilda axa gund berda.

- 2233- Guneh nayên kirin û firotin wekî cawê bazarê,
gunehkar rûreş e roja biryarê.
- 2234- Guneh xelat bin jî navêjin milê xwe.
- 2235- Gunehê mezin nayê veşartin.
- 2236- Gunehê wî ye li ber piyê wî ye.
- 2237- Gur bi du pariyan namire.
- 2238- Gur bibînim oxirê nebînim baştir e.
- 2239- Gur bi ku de diçe gurîtiya xwe bi xwe re dibe.
- 2240- Gur birrî dê rovî bixwe.
- 2241- Gur bi qeweta xwe bizanibiya dê dinyayê xerab bikiran.
Varyanteke weha jî heye: Gur nizane quweta wî çend e.
- 2242- Gur çermê xwe ji xwe nake.
- 2243- Gur çêlikên xwe naxwin.
- 2244- Gur dibêje: Ez di şeva qer de
berxa qer, mîha qer û seyê qer ji hev dikim der.
- 2245- Gur dibêje: Heta kuştina heft pezan wesîyeta bavê min e, ji
wir bi şûn ve mêraniya min e.
- 2246- Gur girtin û şîret kirin, got:
Zû paşiya keriyê ji destê min çû.
- 2247- Gur goştê guran dixwe ku birçî bibe.
- 2248- Gur gote se: Bîhna xwe bide min?
Se gote: Ku bidime te tu dê dinyayê talan bikî.
- 2249- Gur hat nav waran wey li halê jaran.
Weha jî dibêjin: Gur hate dîyar e, wey li halê sefîl û jar e.
- 2250- Gur heger ji bagerê bitirsîya dê ji xwe re holikek çêbikira.
- 2251- Gur ji birçînan nikare ber bi hevraz here,
dibêjin; "hey mîrato piriya xwariye nikare here."
- 2252- Gur ji teriya rep hiş digire.
- 2253- Gur ku ket nav pez, se li keleşan digeriyan.
- 2254- Gur ku gur e ew nikare ji qismetê xwe zêdetir bixwe.
- 2255- Gur ku dikeve nav kerî ji şabûn devê wî tê nagerî.
- 2256- Gur lê dixwe, qijik dixwe.
- 2257- Gur li beja bê se digere.
"Bej" di wateya reşahî an jî kitayê de ye.
- 2258- Gur li dûmanê digere.
- 2259- Gur mir, rovî li meydanê govend kişand.
- 2260- Gur nabe şivanê pez.

- Carnan weha jî dibêjin:* Lolo gur kirine şivanê pez.
- 2261- Gur nêçîra xwe vedişêre, paşê bi ser ve nabe.
- 2262- Gur oxir e lê mirov nebîne ji hemû çêtir e.
- 2263- Gur peza dawî dixwe.
- 2264- Gur pîr dibe, dibe pêlêhvokê kûçikan.
- Weha jî dibêjin:* Gur pîr dibe, dibe qeşmerê roviyan.
- 2265- Gur şeva reş, gîskê reş û şova reş kifş dike.
- Varyanteke weha jî heye:* Gur di şeva qer de, mîha qer, berxa qer û ewrê qer ji hevdu derdixe.
- 2266- Gur û hirç bûn destbira, dinya bû Mêdî Zeman.
- 2267- Gur û mîh bi hev re naçêrin.
- Weha jî dibêjin:* Gur û mîh tevde naçêrin.
- 2268- Gur û mîh li ser kelekê dilê gur çû goşt.
- Got:* Çima tu dikî toz?
- 2269- Guran kerê Hesên xwar ne gazin e ne hewar e.
- 2270- Guran kera xizanan xwar dewletiyên hay ji xwe kir.
- 2271- Gurê betal diçe dora kerê şûxil.
- 2272- Gurê gerok birçî namîne.
- 2273- Gurê ku xwar pûrt jê bimîne jî baş e.
- 2274- Gurê ku ne dijminê min e bila hezar salî bijî.
- Weha jî dibêjin:* Gur ku min nexwe, bila hezar salî bijî.
- 2275- Gurê mêşe hîn nabe pêşe.
- 2276- Guro bila tu gur bûyayî, pêşî golika min bixwara.
- 2277- Gurrî bi pariya namire.
- 2278- Gurrî dimire dibe gulîsor.
- Varyanteke weha jî heye:* Gurî dimirin por sor dibin.
- 2279- Gurrî gû li nav rê kir ji xwe re navek çêkir.
- 2280- Gû bi berfê nayê veşartin.
- 2281- Gû bi fisan namihe.
- 2282- Gû bixwe û gû nefroşe.
- 2283- Gû çiqas tevdî, hewqas bîhn dide.
- 2284- Gûyê hişk bi mirov ve nazeliqe.
- 2285- Gû jî, ji genim e.
- 2286- Gû ji gûyê re dibêje: "delalê ber dilê min."
- Varyanteke weha jî heye:* Gû tê ser gûyê, dibêje, "merheba qelender!"
- 2287- Gû li ser dil dikele, ew dibêje qey helaw e.
- 2288- Gû jî bi sîh e.

- 2289- Gûkirin rehet e lê gûxwarin zehmet e.
- 2290- Gûyê pisîkê derman e dixwî naxwî hebirman e.
- 2291- Gûyê birinexwaran tê xwarin
lê gûyê gûxwaran nayê xwarin.
- 2292- Gûyên jintiyan pevdiçin li ser sergoyan.
- 2293- Gûza biçûk di serê xizanan de dişikê.
- 2294- Gûzek bi tenê nake xir-xir.
- 2295- Gûzek û gûzek dibe dîzek.
- 2296- Gûzên xwe hesab dike lê sêvên xelkê hesab nake.
- 2297- Gûzeweşîn tov mereşîn.

2298- Ha civata jinan ha bêriya bizinan.

Weha jî dibêjin: Ha şêwra jinan ha bêriya bizinan.

2299- Ha dar bir ha ser bir.

2300- Ha di ûr de û ha di tûr de.

Dema xwarina mirov hebe û mirov bixwaze, wê bixwe an jî bi kar bîne wê demê vê gotina han bi kar tîne.

2301- Ha Hesen ha Hesen keçel?

Dema mirov bêje ku ferq nîne vê gotinê dibêje. *Ev jî wek varyanta:*
Ha şêwra jinan ha bêriya bizinan.

2302- Ha ji pišta dê be ha ji pišta hespê be.

2303- Ha ji zik çû ha ji ser pišta hespê çû.

Gotineke weha jî heye: Ha li zik çûye ha li zîn çûye.

2304- Ha kevir li kûz ha kûz li kevir ket.

2305- Ha kulî xwar ha qulî xwar!

2306- Ha li Mûşê ha li pišta dergûşê.

2307- Ha xeftan ha qeytan.

2308- Hakim kete ber mirinê, zor nema li dinê.

2309- Halan baskên mêrsaxan in.

2310- Hasil gehîşt Mûsil.

Li hinek deveran di şûna gotina "gehîşt" de gotina "guhaşt" jî dibêjin.

2311- Hat Hemoyê takî rîxa wî ya gayekî di mala wî de nîne arvanê xewarckî her roj xwe diguhêre bi awayekî.

2312- Hat ji der de topiz di ber de.

Ji bo kesê çavsor û êrîşkar dibêjin. Çawa ku Tirk ji der ve hatin û bi darê zorê welatê me ji me girtin û îro hebûna me jî qebûl nakin.

2313- Hat kurê malê çû zîyana salê.

Dema kesekî nêzîk bê û zerarekî mezin li mirov bike an jî bixwe wê demê weha tê gotin: Hat kurê malê û ziyana salê.

2314- Hat ku mirî rake yê hat tazî ye.

2315- Hat mirovê malê nehat qeda salê.

Weha jî dibêjin: Hat mal xwediyê malê, nehat zîyana malê.

2316- Hate cîhê min rabû rûyê min.

2317- Hate dema bi çîr-çîr, şagirt bûn dijminê pîr.

Gotina "pîr" di wateya seyda an jî mela de hatiye bi kar anîn.

2318- Hatin jî çûyîn e.

- 2319- Hatîn nav me biyanî ji me stendin rez û xanî.
 Ji bo zordestî û dagîrkeriyê dibêjin. Li hinek herêman di şûna gotina
 "xanî" de gotina "kanî" jî dibêjin.
- 2320- Havîn bavê rençberan e.
- 2321- Havîn û zivistan bira ne.
- 2322- Havîn xweş e li bin siha daran.
- 2323- Havîna mîr bi rûmet e.
- 2324- Havînê berhev nekî zivistanê nikarî bi dest bixî.
- 2325- Hawar hebe gazî li dû ye.
- 2326- Hayê bi min hayê,
 hevrişim hate ber livayê,
 liva ber bi hevrişim nayê.
- 2327- Hebe ercbî ye tune be mirtibî ye.
 Yanî hebe bi carekê de dixwe û diqêdîne, tune be, zik miz dide.
- 2328- Hebe kurê kerê be.
- 2329- Hebîbê Nekar rakev fena her car,
 Xwedê yek e dergch hezar.
- 2330- Hebû xarman tune bû derman.
- 2331- Hebûn ji tunebûnê çêdibe.
- 2332- Hebûn qiloçê mêran e.
- 2333- Hebûn sê bizinê mala mîr yek pîr,
 yek kor û di ya din de tune bû çira şîr.
- 2334- Hebûn strûyê mêran e tunebûn kotîbûn e.
- 2335- Hebûna nezanan di zikê zanan de ne.
- 2336- Hebûna zêde kotîtî ye.
- 2337- Heciyo neçe hecê, solan meqetîne li rê hec ew e tu lê.
- 2338- Heçî ber e gula zer e.
- 2339- Heçî bi mal e bi xaltîk û bi xal e.
Weha jî dibêjin: Heger bi mal e bi nan û xal e.
- 2340- Heçî bi kotekî here mazî nanêre li hevrazî.
- 2341- Heçî bi serserê xwe bi rê de naçe qedrê lingê xwe dizane.
- 2342- Heçî bimîze li dergehê yekê, yekê din dimîze dergehê wî.
Weha jî dibêjin: Yê ku bimîze deriyê xelkê, yekî din jî dimize deriyê wî.
- 2343- Heçî dergehê yekê hikute, dergehê wî jî dê bê kutan.
Weha jî dibêjin: Yê dergehê yekê bikute, dergehê wî jî dê bê kutan.
- 2344- Heçî divê mala xwe bi destê xwe xerab bike
 bila du jinan bike.

- 2345- Heçî derdê xwe dibêje ji te tirê ew dengbêj e.
- 2346- Heçî dizane ji xwe dizane heçî nizane baqê nîskan e.
- 2347- Heçî dîtina tawiz bivê, divê germa Hîndistanê qebûl bike.
- 2348- Heçî guhdar neke li gotinên mezinan,
dê bibin şivan û herin ba bizinan.
- 2349- Heçî here masiyan dê qûn lê şil bibe.
- 2350- Heçî hewce li elbê digere.
- 2351- Heçî jar e, li havînê sar e.
- 2352- Heçî ji çav dût e, ji dil jî dût e.
- 2353- Heçî li hespê hevalan siwar e herî peya ye.
- 2354- Heçî li ser sê singan bileyîze dê yek tê de here.
Weha jî dibêjin: Heçî li ser singan bigere dê sing pêde here.
- 2355- Heçî ne li şer e şervanekî dijwar e.
Weha jî dibêjin: Yê ku ne li şer e şêr e.
- 2356- Heçî nede axçe naçe nav bexçe.
Axçe di wateya pere de ye.
- 2357- Heçî nebîne zehmet naxwe nîmet.
- 2358- Heçî ne li nav hesêban ew tebayê ecêban.
Yên ku ne di nav bûyeran de be, şiroveyê seyr (ecêb) dike.
- 2359- Heçî neke bi gotinê mezinan dê pê ve du şaxên bizinan.
Weha jî dibêjin: Heçî neke ne bi gotina mezinan dê reh bê wek bizinan.
- 2360- Heçî neçe li rê rê naqede.
- 2361- Heçî neke û bixwe, heram e.
- 2362- Heçî neke naxwe.
- 2363- Heçî ne malê nizane hewalê.
- 2364- Heçî ne li govendê xweş dawetî ye.
- 2365- Heçî nizane bi qeweta xwe ew dût e ji dewleta xwe.
- 2366- Heçî pijiya ew rija.
- 2367- Heçî Tirk e virek e û pê bawer neke.
- 2368- Heçî yê birincê bixwe, xencerê jî li xwe digire.
- 2369- Heft bavê çê dîsa esil şîrê dê.
- 2370- Heft bûk li malê rûniştine lê qurta avê nîn e.
- 2371- Heft hevling dikarin bikevin bin kurtana kerekî.
- 2372- Heft kilamên hirçê hene hemû li ser hermê ne.
- 2373- Heft melevaniyên ker hene li ber avê gişan ji bîr dike.
- 2374- Heft mêrên beriyê rakirin barê hiriyê,
Gotin: Wey li me û li bêkesiyê.

- 2375- Heft caran mala xwe seh bike û piştîre cîranê xwe sîcdar bike.
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Heft neqlan mala xwe seh bike, piştîre here mala cîranan.
- 2376- Heft salên xelayê xweştir in ji salek neyartiyê.
- 2377- Heft xwişkan werîsek ji birayê xwe re girê nedan.
- 2378- Heftiyaro li ber çavan dîyaro!
- 2379- Heger avê da ser te bihustek û çar tîlî ferq nîn e.
- 2380- Heger avis be dê bize.
- 2381- Heger axaftin zîv be neaxaftin zêr e.
- 2382- Heger bext ji por be dê keçel pîs û çivt be.
- 2383- Heger bi min e ji bo min e.
- 2384- Heger bira xêra bira bixwesta jina bira mehr nedikir.
- 2385- Heger dar stûr e sînor dûr e;
 heger dar zirav e, sînor çirav e.
Weha jî dibêjin: Eger dar stûr e, sînor zû r (gir) e; eger dar zirav e, sînor çirav e.
- 2386- Heger dermanê gurî hebûya
 dê berî her kesî di serê xwe bida.
- 2387- Heger ders e, herfek bes e.
- 2388- Heger destiyê bivir ji dar nebe, dar nakeve.
Du varyantên weha jî hene:
 a) kew ji eslê xwe re xayîn e.
 b) heger kurmê darê ne ji darê be, dar xera nabe.
- 2389- Heger deşt e, heger zozan e, ruhê pez şivan e.
- 2390- Heger ez taştê bîm dê tu jî firavîn bî!
- 2391- Heger ga qezenc bike û bi xwe bixwe
 dê mirov jî goştê xwe bixwe.
 Mirov bi tenê ji bo şexsê xwe nake, ji bo kesên din jî dike.
Weha jî dibêjin: Heger ga bixebite û bi xwe bixwe dê golik çi bike?
- 2392- Heger gelê te, ji te ne razî be,
 tu bibî Sultan Silêman xêr çi ye?
- 2393- Heger gok hat ber kaşoyê te, lêxe.
- 2394- Heger goşt giran e, nexwarin erzan e.
- 2395- Heger gotin ji gotinê bikişe gotin ji eslê xwe vedikişe.
- 2396- Heger gur ji baranê bitirsiya dê ji bo xwe kurkek çêbikira.
- 2397- Heger hatî çengê min bifikire li rengê min.
- 2398- Heger hebe şilik û pilik heger tune be keser û kulik.

Ev ji bo ew kesên bêhesab û bêplan tê gotin. Dema jî tişteki wan hebe, bêhesab dixwin û belav dikin, dema tune be jî keser dikşînin.

2399- Heger hewez e ew jî bes e.

2400- Heger hemû çûkan hêjîr bixwaran,
lib ji şax û hebleriyan re nediman.

2401- Heger iqbal hate serî herkes dibêje aferîn.

2402- Heger ji fesadan nebûya dê gur û mîh bi hev re biçêran.

2403- Heger jin bi yar e sikur xwar e.

Li hinek deveran di şûna gotina "sikur" de gotina "bask" bi kar tînin.

2404- Heger ker bi nefis e, mistek ceh bes e.

2405- Heger kes tune be tu pê bişewirî, ji stûna nava xanî re bêje.

2406- Heger kûsî çeq e Kurdo xeq e,
kûsî ne çeq e Kurdo ne xeq e.

2407- Heger li te xweş e, li min bîst û şeş e.

2408- Heger li dinyayê mirovên ker tune bin ker dê bê qîmet bin.

2409- Heger mar xwe rast neke naçe kunê.

2410- Heger mezinê malê li defê bidin dê biçûk jî bireqisin.

2411- Heger mirov ne got û kir mêr e got û nekir kerê nêr e.

2412- Heger mirov belengaz be nayê lomekirin
lê ku stûxwar be tê lanet kirin.

2413- Heger mirov da navê çî li çokê çî li navê.

2414- Heger mirov diz be şev pir in.

2415- Heger nanê şil ket zikê mirov qawşan nagire.

Weha jî dibêjin: Eger nanê şil kete zik li qawişa nagere.

2416- Heger ne fend e, ev çî dar û bend e?

2417- Heger nezan e bila mêze bike li cîran e.

2418- Heger nezanî bikire canî.

2419- Heger qûn bi qûnê be bila qûn li cîhê xwe be.

2420- Heger qûnê fihêt fikir tir nedikir.

2421- Heger te li cîhek xwarineke xweş xwar carekê din nexwaze.

2422- Heger tişteki hate serê te piştî xwe bide latekî mezin.

2423- Heger tu bibî mîr Xwedayê xwe neke ji bîr.

2424- Heger tu bi mal î, tu bi bext û xalî
heger tu bê mal î bê bext û xal î.

2425- Heger tu bûyî dijmin jî bibe dijminê dijminekî baş.

2426- Heger tu çûyî mêvantiya guran seyê xwe bi xwe re bibe.

2427- Heger tu dixwazî kurê xwe bikî mêr,

bike şivan lê zû bînc mal ku hîn nebûye heywan.

2428- Heger tu bikevî destê min dê tu ji xwe re bibînî rengê min.

2429- Heger tu dikarî bi dest bike, yan jî bes deyn bike.

2430- Heger tu havînê li ber sîyê pal bidî,
dê tu zivistanê jî zikê xwe miz bidî.

2431- Heger tu mêr bî, rojên cengê pir in.

2432- Heger tu nizanî here nav Xerzanî
û Zazanî paşê dê tu bizanî.

2433- Heger tu qedrê xwe digirî tiştê nexweş ji xelkê re nebêje
da ku li te venegerînin.

2434- Heger vir bin, bila pir bin.

2435- Heger Xwedê bide mû jî dikişîne û tîne.

2436- Heger xweliyê li xwe dikî bila xweliyêke germ be.

2437- Heger xiyar e ji tûtik ve dîyar e.

2438- Heger yekê got:

"Mala min a te ye" ma tu dê agir berdeyî wê?

2439- Heger yekê got;"ez koleyê te me" tu dê misasê bidî destan?

2440- Helawfiroş helawa xwe naxwe.

2441- Helaw-helaw dev şîrîn nabe.

2442- Helaw ji şîrêzê çênabe.

Li hinek deveran di şûna gotina "helaw"de gotina "rîçal" dibêjin.

2443- Helaw şîrîn e Kurmancê dîn e.

Weha jî tê gotin: Kurmancê dîn e, helaw şîrîn e.

2444- Helî çand berket, virnî çand kêmket.

2445- Hemam bi tir û fisan germ nabe.

2446- Hemberê qencyê, qencî ye.

Li hinek deveran weha jî dibêjin: Hemberê çeyîyê çeyî ye.

2447- Hermdûnê bang kir Tilêlûnê "ez bi tayê û tu bi çavkulbûnê,
em nahilên kes li ser qûnê rûne."

2448- Hemêz bike lê ji bîr neke.

2449- Hemû çêlek tén dotin lê hemû gotin nayên gotin.

Weha jî dibêjin:

a) her çêlek tê dotin, lê her gotin nayê gotin.

b) her parî tê cûtinê, her pirs nayê gotinê.

2450- Hemû fileh Îşo ne?

2451- Hemû gul di biharê de venabin.

2552- Hemû heywan goşt dixwin lê navê gur derketiye.

2553- Hemû hêkên xwe nexe selekekê.

2454- Hemû keran bi wişkê majo.

2455- Hemû kes lawê bavê xwe ne.

Weha jî dibêjin: Herkes kurê bavê xwe ye.

2456- Hemû kesî bi darekî majo.

Mirov nikare ji bo her kesî heman metod û karî bike. Divê mirov li gor zanîn û naskirina mirovan kar bike.

2457- Hemû kul diçin lê kulên Bersel Begê bi tenê naçin.

2458- Hemû mêr nabin şêr.

2459- Hemû mirîşk hêkên duzerik nakin.

2460- Hemû qubên spî ne serdan in.

Weha jî dibêjin: Hemû qubên spî ne ne zîyaret in.

2461- Hemû riyên dizanî riyên bazarê nizanî.

2462- Hemû teyr nêçîrê nakin.

2463- Hene ya bûk û zavan e şabûn ya hemûyan e.

2464- Henek dibin genek.

2465- Heq di destê neheqiyê de bare-bare.

Weha jî dibêjin: Heq di destê neheqiyê de dike zare zar.

2466- Heqê bizina kol ji bizina qiloç re namîne.

2467- Heqê cîran ji cîran tê xwestin.

2468- Heqê dê wekê heqê Xwedê ye.

2469- Heqê Elî ji Welî tê standin.

2470- Her bayê ku hat tu bi ber kevî her ava tu bi ser kevî,
tu dê her ji dinyayê der kevî.

Weha jî dibêjin: Her bayê ku hat tu bi ber kevî her ava tu li ber kevî, tu dê her ji Hasil û Musilê der kevî.

2471- Her bedewek kêmasiyek lê heye.

2472- Her bendek xwedî derdek.

2473- Her berjorek berjêriyek xwe heye.

2474- Her beroşek devê xwe dibîne.

2575- Her bêdînek, bêîmanek jê re divê.

2476- Her bûyerek ji mirov re şîret e.

2477- Her car ji mirov re li hev nayê.

2478- Her car kewa gozel nakeve torê.

2479- Her canek di dilê xwediyê xwe de siltanek.

Weha jî dibêjin:

a) her ciwanek xwe padîşah dibîne.

- b) her ciwanek di xwe de padîşah e.
 c) her xanek di dilê xwe de sultanek.
- 2480- Her çûkek warekê xwe heye.
 2481- Her darek ji berê xwe tê naskirin.
 2482- Her devek pariyekê xwe heye.
 2483- Her dem şer çêdibe li ser tola jinan.
 2484- Her demek bayek heye her çixirek riyek heye.
 2485- Her dêlek anîne ji êlek.
 2486- Her dîk mîrê koxa xwe ye.
 a) her dîkekî axayê sergoyê xwe ye.
 b) her dîk şahê pînka xwe ye.
- 2487- Her etar ji xurcika xwe bang dike.
 2488- Her gav laser ranebe û tehtan bi xwe re nabe.
Çend varyantên din jî hene:
 a) her gav lehî ranebe û koçan nayîne.
 b) her gav av ranabe û qirş û qalan bi xwe re nabe.
- 2489- Her gelîyek bendek lê tê.
 2490- Her giya li ser koka xwe şîn dibe.
 2491- Her gulek bîhnek jê tê.
 2492- Her kes axayê mala xwe ye.
 2493- Her kes bi dilê xwe şa ye lewre dinya ava ye.
 2494- Her kes bi gaza xwe caw dipêve.
 2495- Her kes bi tahma devê xwe dizane.
 2496- Her kes bîhna fisa wî pê xweş e.
 2497- Her kes cîhê lingên xwe çêdike.
Weha jî dibêjin: Her kes dewsa lingê xwe dike.
- 2498- Her kes derpê xwe bixweşîne dê birê li piştta xwe bibîne.
 2499- Her kes di ber ciwa ava aşa xwe re dibeze.
 2500- Her kes di hindava xwe de rojê dibîne.
 2501- Her kes di mala xwe de mêr e.
 2502- Her kes di sînore xwe de şêr e.
Weha jî dibêjin: Her kes di sînore xwe de xurt e.
- 2503- Her kes dibêje ez zane lê hov ji dût ve xuya ne.
 2504- Her kes dikare pîsîtiyê bike lê her kes nikare qencyê bike.
 Di şûna gotina "qencî" de gotinên "başî" û "çeyî" jî tên gotin. *Weha jî dibêjin:* Her kes dikare xerabiyê bike, lê qencî dijwar e.
- 2505- Her kes dikare şîretan bike lê her kes nikare nan bide.

- 2506- Her kes dikeve gora xwe.
- 2507- Her kes dîkê koxa xwe ye.
- 2508- Her kes dînan nas dike bêcil,
esil ew e ku dîn bên naskirin bi cil.
- 2509- Her kes giriyê wî bi miriyê wî tê.
Varyanteke din jî weha ye: Her kes li ser miriyê xwe digirî.
- 2510- Her kes hesinkerê bextyariya xwe ye.
- 2511- Her kes ji nefsa xwe re dixwaze.
- 2512- Her kes kerê xwe dajo.
- 2513- Her kes kozira agir bi ber xwe ve dikêşîne.
- 2514- Her kes kurê bavê xwe ye.
- 2515- Her kes li gor şîrê xwe dike.
- 2516- Her kes li ya xwe ye.
- 2517- Her kes miriyên wî li ber dilê wî şêrîn e.
- 2518- Her kes mîrê gundê xwe ye.
- 2519- Her kes nikare zengil têxe stûyê pisîkê.
- 2520- Her kes qazî ye û bi xwe razî ye.
- 2521- Her kes rojê di tanga xwe de dibîne.
- 2522- Her kes risqê xwe dixwe.
- 2523- Her kes xwe li agirê gurr digire. .
Carnan di şûna gotina "gurr" de gotina "germ" jî dibêjin.
- 2524- Her kes xwe diəcibîne.
- 2525- Her kes xwediyê hunerek e.
- 2526- Her kes û şîrê xwe.
Weha jî dibêjin: Her yek û şîrê xwe.
- 2527- Her kes ya xwe dibêje.
- 2528- Her kesî ku here Mekê ne hecî ye.
- 2529- Her kesê ku kum li serî be ne mêt e
û her kesa ku çît li serî be jin e.
- 2530- Her kezîzerek, simêlsorek li ber e.
Weha jî dibêjin: Her gulîsorek, çavreşek li dûv heye.
- 2531- Her ku deşt e her ku zozan e ruhê pez şivan e.
- 2532- Her ku serî bimîne, qûn ecêban bibîne.
- 2533- Her kûçik li ser sergoyê xwe nû ye.
- 2534- Her latek dibe welatek.
- 2535- Her malbarkirinek mal xerabkirinek.

- 2636- Her mêrekî rengê her dîlekî bendek.
- 2537- Her mirov dixwaze çira wî geş be.
- 2538- Her mirovek du têl mû di bin çengê wî de hene.
- 2539- Her mirovek rêke wî heye.
- 2540- Her mîh li berxa xwe diqale.
- 2541- Her Musayek Fîrewnek heye.
- 2542- Her nan e, her deman e.
- 2543- Her nêr li mê siwar e lê gotina mê li ya nêr siwar e.
- 2544- Her pez bi pepika xwe.
- 2545- Her pênc tilî nabin yek.
- Weha jî dibêjin:*
- a) her pênc tiliyên mirov ne wek hev in.
- b) her pênc tiliyên dest ne yek in.
- 2546- Her pêxember due li xwe kiriye.
- 2547- Her qazî ji eqilê xwe razî.
- 2548- Her qezayek şîret e.
- 2549- Her reng rengê e, bêrengî jî rengê e.
- 2550- Her rojekê nexweşekê wê heye.
- 2551- Her roj kûz diçe avê sax nayê.
- 2552- Her se bi dûv mirov nayê ku zanibe hestî ji dest nayê.
- 2553- Her sebrek xêrek pê re heye.
- 2554- Her seyek li ber deriyê xwediyê xwe direyî.
- 2555- Her serekî eqilekî.
- 2556- Her şêrek bi lepê xwe ye.
- 2557- Her şêrekî betleşêrekî heye.
- 2558- Her teyrek bi refa xwe re.
- 2559- Her teyr bi refa xwe re mirov bi koma xwe re.
- 2560- Her tiştêk belayek heye, piştî ketinê hezar bela hene.
- 2561- Her tişt bi ziravî dişke, mirov bi stûrî dişke..
- Weha jî dibêjin:* Her tişt bi ziravî diqete, mirov bi stûrî.
- 2562- Her tişt di destê westayê xwe de zûre-zûr e.
- 2563- Her tişt li heyê dinêre lê heyê li tu tiştî nanêre.
- Weha jî dibêjin:* Her tişt li benda demê dimîne lê dem li benda tiştêk namîne.
- 2564- Her tişt xweş e di wexta xwe de.
- 2565- Her warek biharek e.
- 2566- Her xwenda nabe mela.

- 2567- Her xweşikêk kêmahîyek xwe heye.
- 2568- Her yek hespa xwe dajo.
- 2569- Her yek li navê xwe digere.
- 2570- Her yek nanê xwe bi awayekî dixwe.
- 2571- Her yek rojê di ser xwe re dibîne.
- 2572- Her zikek zîyaretek e.
- 2573- Heram naxwe lê nanê xwe li avadonka wê dide.
- 2574- Herçî bi bira be mîna xaniyê bi çira be.
- 2575- Herçî bîndest e xwelî li ser e.
- 2576- Herçî jê tê lê tê.
- 2577- Herçî jinên wan reş in mêrên wan kêfxweş in.
- 2578- Herçî jinên wan rind in mêrên wan kund in.
- 2579- Herçî kar li ber e ku neke ker e.
- 2580- Herçî malên wan hindik in şêrên çargurçik in.
- 2581- Herçî malên wan pir in rûdinin û dizirin.
- 2582- Herçî mêvan e siltan e.
- 2583- Herçî li ser du singan bilîze, yek di qûnê re derê.
- 2584- Herçî rût e gotin pût e.
- 2585- Herçî xwest bide dest û herçî got "ka" nebêje "na."
- 2586- Herçî zanîn da zanyaran mîna hespê çê siwar e.
- 2587- Herçî zirav û dirêj e pişt guhê xwe ve bavêje;
heçî kin û stûr e, ew bê qisûr e.
- 2588- Here ba yê ku te bigerîne lê neçe ba yê ku te rawestîne.
Weha jî dibêjin: Here ba yekî ku te bigirîne, ne ba yê ku te bikenîne.
- 2589- Here cîhê nenas, payê xwe bide xas-xas.
- 2590- Here derê ku nasên te lê hebin.
- 2591- Here dûr qîz û vegere qîz.
- 2592- Here dûr were durist.
- 2593- Here li rê bila dûr be
bide buhrê bila kûr be
keçê bîne bila pîr be.
- 2594- Here mêvaniya dijmin lê çekê xwe ji bîr meke.
- 2595- Here mêvaniya guran lê bê kûçik neçe.
- 2596- Here millet bigire edet.
Gotineke weha jî hey: Roviye berdayî ji şêrê girêdayî çêtir e.
- 2597- Here were maeşê te pênc pere.

- 2598- Here wê derê ku guh bidin te.
- 2599- Herket bereket betalî xerabmalî.
- 2600- Herê herê hebûn heft birayê Perê, Perê şandin ber kerê.
- 2601- Herêkirin nîvê next e.
Weha jî dibêjin: Herêkirin nîvê qelind e.
- 2602- Hervoşk bi avê çênabin.
 Hervoşk nanê bi rûn û şîr e. Yanî bi avê, nanê rûn çênabe. Li hinek herêman jî hevrişk dibêjin.
- 2603- Hesabê malê li çarşiyê kêr dertê.
Varynateke weha jî heye:
 a) hesabê malê û bajêr nabin yek.
 b) hesabê mal û dikanê nabin yek.
- 2604- Hesen keçel û keçel Hesen çi ferq heye?
- 2605- Hesen bi germê ditewe.
- 2606- Hesen dikutin germe-germ mêran dikutin nerme-nerm.
- 2607- Hesen ji hesin naxwe.
- 2608- Hesen ji jengê xwe nebe narize.
- 2609- Hesen ne esas e zêr bikî kiras e
 ne dibe kêrênde ne dibe das e.
- 2610- Hesenê bêesas ne dibe çakûç û ne jî dibe das.
 Li hinek herêman dibêjin Ne dibe kêr û ne jî dibe das.
- 2611- Hesenê sar bi hilmê germ nabe.
- 2612- Hesenê sar nacimide.
- 2613- Hesenê sar tu bikutî dê bişke.
Weha jî dibêjin: Hesenê sar zor tê kutan.
- 2614- Hesirm bi sebrê dibe tirî.
- 2615- Hesp bi gem û hevsar mêr bi soz û qerar.
- 2616- Hesp dibeze, siwar pesnê xwe dide.
Weha jî dibêjin: Hesp diçe siwar bi xwe dipesinîne.
- 2617- Hesp di şûna kerê de nayê girêdan.
- 2618- Hesp ji deryayê şiv ji dehlê.
- 2619- Hesp ji eyarê xwe dihîre.
 Dema mirov dewlemend û têr be, wê demê xwedî deng e jî. Hesp jî dema têr dixwe û xurt dibe, wê demê dihîre.
- 2620- Hesp ku heye miraz e.
- 2621- Hesp li meydana tîfing li nîşanê.
- 2622- Hesp li ser çar lîngan bi rê ve diçe
 lê dîsa lîngên wî dişemîte.

2623- Hesp li ser afira keran nayê girêdan.

Ev gotin jî wek ya "hesp di şûna keran de nayê girêdan" e.

2624- Hesp nekirîye afir çêdike.

2625- Hesp rakirinê, mêr dengkirinê.

2626- Hesp siwarê xwe nas dike.

2627- Hesp tune, li zîn dixebite.

Weha jî dibêjin: Hesp tune êlif amade dike.

2628- Hesp û kesp li ba wî yek in.

2629- Hesp û histir li hev dixin ker di nav lingan de diçin.

2630- Hespan xwe nalkirin, keran simê xwe li bakirin.

2631- Hespê baş êmê xwe zêde dike.

Weha jî dibêjin: Hespê çê li cehê xwe zêde dike.

2632- Hespê bavê ji kur nayê veşartin.

2633- Hespê çê bila pêxwas be.

2634- Hespê çê qamçiyê li xwe naxe.

a) hespê kehêl zengû li xwe naxe.

b) hespê çê zengûyê li xwe naxe.

2635- Hespê çê siwarê xwe li erdê nahêle.

2636- Hespê çê li meydanê tê naskirin.

2637- Hespê her kesî li gor wextê wî dibeze.

2638- Hespê ku ba guhdirêjê girêbidin

yan dibe çirtek yan jî gezok.

Guhdirêj di wateya ker de ye. Kesê ku bi xeraban re bibe heval, ew jî xû û exlaqê wan digire û bêexlaq dibe.

2639- Hespê ku te bir ser avê jê re bifîkîne.

2640- Hespê ku zîn qebûl neke mirina wî nêzîk e.

2641- Hespê mirinê hespekî beza ye.

2642- Hespê mirovê bêbext nabeze.

2643- Hespê nêr ji têrî dihîre.

2644- Hespê kule derpiyê siwar şil dike.

2645- Hespê pir beza diçe bi qeza.

2646- Hespê qule, mêrê file, tajiyê tûle,

çil rojên çile tu car pê mebe ewle.

Weha jî dibêjin: Hespê qule, tajiyê tûle, kesê mele, hersê yek in.

2647- Hespê şê bi tev qeyd û merbeta xwe ve dere şer.

2648- Hespê tenê tozê ranake.

2649- Hespê têr ji hunerê xwe ditirse.

2650- Hespê xelkê meydanek jina xelkê ramîsanek.

Weha jî dibêjin: Hespê xelkê meydanek, jina xelkê ramîsanek, nanê xelkê danek, ev tev nabin mewdan.

2651- Hespê xwe nal bike pişt re riya xwe hesab bike.

2652- Hestiyê pêşî di beroşa xwediyê xwe de dikele.

2653- Hestiyê stû ne li xêran e û ne jî, li şeran e.

2654- Heta av were êş çavê beqê diteqe.

2655- Heta av zelal nebe tiştên binî xuya nabin.

2656- Heta barê qantirê giran be nizane havê wî ker e.

2657- Heta bav nemire kur bihayê wî nizane.

2658- Heta bêjî rêvî dê eyar here nêvî.

2659- Heta birçî nebe qedrê nan nizane.

2660- Heta bûk xemilî dawet betilî.

2661- Heta çavan nas kir werdekê gol xelas kir.

Varyanteke weha jî heye: Heta me xwe nas kir, emr xelas kir.

2662- Heta çavek derman kir yê din kor kir.

2663- Heta darê av nedî berê wê nagihê xwedî.

2664- Heta derî nekutî derî li ber mirov venabe.

2665- Heta dest neêş e, tchma dev xweş nabe!

2666- Heta dest û lingên mirov nekevin rêxê,
devê mirov nakeve rûn.

2667- Heta dêrek ava kir mizgeftek xerab kir.

2668- Heta diya min dibêje "lawo" bila diya te bibêje.

2669- Heta dilê dê nekevê qîzê nade.

2670- Heta dilê mirov dêşe bila rûyê mirov bêşe.

2671- Heta dikarî xerabiyê mebêje.

2672- Heta di xwe de nebîne bawer nake.

2673- Heta don nekî çire, çire pênaqeve.

Weha jî dibêjin: Heta don nexî çirê, çire ronî nade.

2674- Heta eqil tê serî her tişt ji dest diherî.

2675- Heta ew aş e, ew qeraş e.

2676- Heta ew kûçik li devê deriyê we be
dê gûyê zaroka we wer be.

2677- Heta genim firîk e mela şirîk e.

2678- Heta germa havîne neyê berê daran nagihên.

2679- Heta gotin rovî ye pişt li roviyê şikest.

- 2680- Heta hebûn dims ez mam û tu pismam,
gava nema mot, ez Şervî û tu Bohtî.
Berfiradî ji "dimsê" re "mot" dibêjin.
- 2681- Heta hebûn şilik- milik gava nema keser û kulik.
- 2682- Heta hevraz nekeve ber mirov, mirov qedrê berjêr nizane.
- 2683- Heta hîn bûm pîr bûm.
- 2684- Heta kara xwe kir dilê min sar kir.
Weha jî dibjin: Heta kara xwe kir, avê pir li ber xwe bir.
- 2685- Heta kefa destan reş nebe, tama devan xweş nabe.
- 2686- Heta kirasê te bişewite dê laşê min bişewite.
- 2687- Heta ku dil neşewite, hêsir ji çavan dernayên.
- 2688- Heta ku sûk ev sûk be dê gaz jî ev gaz be.
Dema mirov du kes an jî du tiştî muqayese bike û ji herduyan jî ne razî be, wê demê vê gotinê dibêjin.
- 2689- Heta ku xaço sax e nan û pîvaz yasax e.
Kurd ji nan û pîvazê pir hez dikin. Dema ew ji Filan hêrs dibin, nan û pîvaz li wan qedexe dikin. Dema mirov bixwaze ji kesekî re bêje, tu ni-karî vî tiştî bikî, wê demê vê gotinê dibêjin.
- 2690- Heta li ser destan negerî qedrê lîngan nizanî.
- 2691- Heta malek ava kir bajarek xerab kir.
- 2692- Heta malxo dizî girt diz malxo girt.
- 2693- Heta me xwe nas kir, me emr xelas kir.
Varyantên weha jî hene:
a) heta min xwe nas kir, emrê xwe xelas kir.
b) heta min xwe nas kir, malik li xwe xelas kir.
- 2694- Heta mêw hişk e, tiriya wê gurmişk e.
- 2695- Heta mirinê çav li kirinê.
- 2696- Heta mirinê dest bi ser dest re heyc.
- 2697- Heta mirinê qencî û xerabî nayên ji bîrkirinê.
- 2698- Heta mirinê şerkirin e.
- 2699- Heta mirov ber piyê xwe nebîne divê gava xwe navêje.
- 2700- Heta mirov birçî nebe, qîmeta nade têrbûnê.
- 2701- Heta mirov dojhê nebîne, bihuştê bi bîrmahîne.
Weha jî dibêjin: Heta mirov dojhê nebîne, bihuşt bi mirov xweş nayê.
- 2702- Heta mirov nexas nebe, nizane saxî çî ye.
Weha jî dibêjin: Heta mirov nexweş nekeve qîmeta nexweşan nizane.
- 2703- Heta mirov neçe welatê bîyanî,
mirov xweşiya welatê xwe nizane.

- 2704- Heta nebîne çobax nabêje ax.
- 2705- Heta neçe gorê mirin nakeve qorê.
- 2706- Heta neçe gorê naxwe çorê.
- 2707- Heta pišta deve rast bibe dê hingî dinya rast bibe.
- 2708- Heta pîsan nebînî, qencan bi bîr nayînî.
Weha jî dibêjin: Heta pîsan nebînî, qencan nahebînî.
- 2709- Heta poz pak kin, çav derdixin.
- 2710- Heta rastî were derew cîhê xwe digire.
Weha jî dibêjin: Heta rast geriya, derewê dewsa wê girt.
- 2711- Heta se hestî nekoje dar serî nakeve.
- 2712- Heta serê govendê xwar be govend rast nabe.
- 2713- Heta serê min dêşe bila rûyê min bêşe.
- 2714- Heta serê pîran dikele yê ciwanan datê.
- 2715- Heta serî sax dimîne çav ecêban dibîne.
- 2716- Heta stûn neşike, avahî nakeve.
- 2717- Heta stûyê ga di nîr de asê nebe, nakişîne.
- 2718- Heta strûyên ker neyên ma her ker caşik e?
- 2719- Heta stûr zirav bibe zirav diqete.
- 2720- Heta şêlû nebe zelal nabe.
- 2721- Heta şûrê te bibire, bibire.
- 2722- Heta te hilatî kir, pokê şikeva çêkir.
- 2723- Heta tu aş bî ez qeraş im.
- 2724- Heta tu bêjî gur û rovî dê eyar bê nêvî.
- 2725- Heta tu bikî pite-pit dê li ser serê te hebe kute-kut.
- 2726- Heta tu ev bî dê tim xwelî li serê te bî.
- 2727- Heta tu li karê xwe nepirsî tu kes li te napirse.
- 2728- Heta tu xwînê nerjînî azad nabî.
- 2729- Heta wê demê nekişîne xemê.
- 2730- Heta xanim xemilî def û dawet kemilî.
- 2731- Heta xerab nebe, ava nabe.
Weha jî dibêjin: Heta xerab nebe, çênabe.
- 2732- Heta xwedê li me pirsî, kefenê me rizî.
- 2733- Heval mala hevalan ava jî dike û xerab jî dike.
- 2734- Hevalê baş di rojên teng de kifş in.
- 2735- Hevalê baş ji bira çêtir e.
- 2736- Hevalê dijmin, dijmin e.

- 2737- Hevalê dizan diz e û yê hîzan hîz e.
 “Hîz” ji bo mirovê qûnde tê gotin.
- 2738- Hevalê hevalan zehf in.
- 2739- Hevalê kesê çê be, rojekê tenê li dinê be.
- 2740- Hevalê ketiyan tune.
- 2741- Hevalê ku bêje "heval heval" mede dû.
- 2742- Hevalê lingê şemitî tune.
- 2743- Hevalê parî naçe arî.
- 2744- Hevalê pîs mirov bi xwe re pîs dike.
- 2745- Hevalê qijikê nikulê wî tim di gû de ye.
- 2746- Hevalê rêwiyan nan e.
- 2747- Hevalên rojên firch gelek in.
- 2748- Hevalê şahiyê zehf in lê yên şînê kê m in.
- 2749- Hevalê te bibe şekir xelas neke.
- 2750- Hevalê xerab kula kêlekê ye.
- 2751- Hevaltî bi rastî.
- 2752- Hevaltiyê biratiyê kuşt.
- 2753- Hevaltiyê bi mêrxasan re bike yên ji te mêrxastir bin!
- 2754- Hevîr çiqas bistire nanê wê hewqas tehm dide.
- 2755- Hevîr çiqas di deştê de bimîne hewqas tirs dibe.
- 2756- Hevîrê jin û mêr ji hev e.
Li hinek herêman weha jî dibêjin.: Hevîrê jin û mêr ji hev hatiye çêkirin.
- 2757- Hevîr tirs tune lê tenûrê da dide.
- 2758- Hevrîşîm bi biha xwe hirî bi bihayê xwe.
- 2759- Hewar bike ku hîn devê te germ e.
- 2760- Hewar ji paş ve tê ew li pêş dinêre.
- 2761- Hewara avê ez birim, ez ji tînan mirim.
- 2762- Hewes e ew jî bes e.
- 2763- Hey deşt e hey zozana e esil Xwedan e.
- 2764- Hey deşta Mûşê û hey darê dergûşê.
- 2765- Hey lê hat bazirgan e, hey lê nehat xwediyê gayê wêran e.
- 2766- Heya nema li bûkan xew nema li biçûkan.
- 2767- Hey teqdîrbarî fêde nake hişyarî.
- 2768- Heyam heye li deveran, heval çêtir dibe ji bira.
- 2769- Heye devê bê paçkirin,

heyê devê bê xaçkirin
û heyê devê bê maçkirin.

2770- Heye terk, nîn e berk.

2771- Heyfa ciwaniyê ku pîrî li peyî ye.

2772- Heyfa dijmin li dijmin nayê.

2773- Heyfa heyveronê ku şeva reş li peyî wê ye.

2774- Heyî be kurê seyî be.

Bila mirov qenc be, çi dibe bila bibe. Esil û fesil ne girîng e.

2775- Heywan bi lingên xwe mirov bi sozên xwe têne girêdan.

2776- Heywan hemû goşt dixwein lê navê gur derketiye.

2777- Hez bike ji min hez bikim ji te.

2778- Hezar bavê çê, esil şîrê dê.

2779- Hezar dost kê mî in lê dijminek pîr e.

2780- Hezar pez xwe dide siya darekê.

2781- Hazar pez li ber şivanekî mexel tê.

2782- Hezar salî li dinê bî, xwediyê zêr û xanî bî,
rojekê dê tu mêvanê gorê bî!

2783- Hezîran e gurra maran e û dema das û taran e.

2784- Hezîran e, hezra teyran e.

2785- Hezkirina dil lingan paç dike.

Li hinek deveran di şûna gotina "paç" de gotina "pûç" bi kar tînin.

2786- Hezkirina dilan ji qinyata destan dîyar e.

2787- Hêdî tif bikî dê li rûyê te bikeve.

2788- Hêk û hêkerûn Ehmed axa qure û qotik Mihemed axa.

2789- Hêk li ser serî nasekine.

2790- Hêlîna teyrê kor xwedê çêdike.

2791- Hêrs tê çavreş dibe hêrs diçe rûreş dibe.

2792- Hêrsa mêran û zira keran.

2793- Hêştir derket bihayê keran ket.

2794- Hêştir radibin hev ker di bin lingên wan de diçin.

2795- Hêştir û hemam meymûn û eba?

2796- Hêştirê navê bavê te çi ye?

Got: Navê dîya min mehîn e.

2797- Hêvî dimîne ji nevî re.

Dawiya hêviyan tune û mirov heger benda hêviyan bisekine malxerab dibe. Mirov dimire û diçe neviyên (torinên) mirov belkî bibînin an na.

2798- Hêvî nanê belengazan e.

2799- Hilda lêv e ciyê dev e.

2800- Him bihar e him zivistan e.

2801- Him dar e him debar e.

2802- Him di kêfê de him di kefaretê de.

2803- Him dikuje him vedişêre.

2804- Him diz e him tompiz e.

2805- Him diz e him dizgir e.

2806- Him eçî dike him maçî dike.

Gotina "eçî" di zimanê zarokên biçûk de di şûna gotina "lêxistin" an jî "lêdan" de bi kar tînin. *Weha jî dibêjin*: Him lê dide him miz dide.

2807- Him heqê xwe bide û him jî serê xwe bişkîne.

Li hinek herêman di şûna gotina "heq" de gotina "xercê" jî dibêjin.

2808- Him hima şêx ji bo kevçiyek rûn e.

2809- Him ji dêrê bû him ji mizgeftê.

2810- Him keçel e û him jî qure ye.

2811- Him li nalê dide û him jî li bizmarê.

2812- Him li jêr e û him li jor e.

2813- Him zîyaret him tucaret.

2814- Himeta pêjanî çêtir e, ji hukmê Xwedanî.

2815- Hin dixwin hin li serê xwe dikin.

2816- Hinde pirtir e, çêtir e.

2817- Hindik bide ber dasê ku tu nemînî li asê.

Divê mirov bi lezûbezî kar neke. Dema mirov lez bike, wê demê zû jî diweste.

2818- Hindik bixwe hindik bipeyve û hindik raze.

2819- Hindik hindik dê bigîhe gundik.

2820- Hindikan zora gelean birine.

2821- Hindik e, rindik e.

Li hinek herêman weha jî dibêjin: Hindik, lê rindik.

2822- Hinek bi xwarinê dimirin hinek jî ji birçînan.

2823- Hinek dipeyîvin bi devê xwe,

hinek jî dipeyîvin bi eqilê xwe. *Li hinek herêman weha jî dibêjin*: Hinek dipeyîvin bi devê xwe, hinek jî dipeyîvin bi qûna xwe.

2824- Hinek dikin û hinek jî dixwin.

2825- Hinek hingiv dixwin û mêş bi hinekên din ve didin.

Weha jî dibêjin: Hinekan hingiv xwar û mêşan bi hinekên din veda.

2826- Hinek jin in, hinek jan in,
hinek melhema dilan in
û hinek jî deqên kundiran in.

2827- Hinek kêfa xwe dikin û hinek av li xwe dikin.

2828- Hinekan bîhn dike, hinekan pîn dike.

2829- Hinekan mal û dîwan e û hinekan ne pariyek nan e.

2830- Hingiv dane destê hirç.

Varyantek din jî weha heye: Gur kirine şivanê pez.

2831- Hingivê te ne be mêş li te nacevin.

2832- Hingî gund xera bû mala Tirço ava bû.

2833- Hingî gû bê tevdan bîhn jê tê.

2834- Hingî rez qenc bû teyrokê jî lêxist.

2835- Hirç gevizî erd tevizî.

2836- Hirç goşt genî dike û paşê dixwe.

2837- Hirç hat va ye rez, diz hat va me ez.

2838- Hirç heftê û sê stran dizane, hemû jî li ser hermî ne.

Weha jî dibêjin: Heft kilamên hirçê hene, hemû jî li ser heba hirmê ne.

2839- Hirç ku distre, diore.

2840- Hirç ku heye neyarê serdest e, hêk dike, çêjik dike.

2841- Hirç kor e an garis bê scrî ye?

2842- Hirç lana xwe ji bîr nake, çivîk jî hêlîna xwe.

Lan di wateya "qul" de ye.

2843- Hirç û govend rovî û seyran!

Ji bo tiştên matmayî tê gotin. *Weha jî dibêjin:* Rovî û nav gund!

2844- Hirç û govend, şivan û dîwan,
fileh û pez, Kurmanc û gamêş?

2845- Hirç û govend, rovî û sûk, kevrok û devlok!

Varyanteke weha jî heye: Hirç û govend rovî û sûk, koçer û pîvaztirşk.

2846- Hirça dirinde kedî nabe.

2847- Hirçek li rezeke bi sû hat wê salê çil kêl mewij zêde bûn.

2848

- Hirçê tu ji kû têyî?

- Ji kayê.

- Kudikê tu ji kû têyî?

- Ji şûna dayê.

2849- Hirmiya baş para hirçê ye.

2850- Histirên çavan bi deyn in.

2851- Hiş ji niş girantir e.

2852- Hiş li serî ye ne li bejna kesî ye.

2853- Hiş nebc dê hebûn ji ku be?

2854- Hiş ne di rihan de ye, di deriyan de ye.

2855- Hiş ne genim e ku bê pîvan.

2856- Hiş ne ji biçûktiyê, ne ji mezinatiyê ye.

2857- Hiş taca zêrîn e, li serê herkesî nîn e.

Weha jî dibêjin: Eqil taca zêrîn e, li serî kesî nîne.

2858- Hiş û dirav kirin pez, wî got "ez," wî got "ez."

2859- Hişê gurî se pê de firî.

2860- Hişê sivik barê giran

Di şûna gotina "hiş" de hinek gotina erebiya "eqil" jî bi kar tînin.

Dibêjin ku "eqilê sivik barê giran."

2861- Hişyar ji dînan xenî ne.

2862- Hîleker tu carî têr naxwe.

2863- Hîn av nedîtiye, kincên xwe dişeqîtîne.

Li hinek deveran weha jî dibêjin:

a) hîn çem nedîtiye derpiyê xwe derdixe.

b) hîn bihûr nediye, derpê xwe derdixe.

2864- Hîn li ser zînê tiran dişeqînc.

2865- Hîn axlêve ye neketiye havînê.

2866- Hîn ga tune afir çêdike.

2867- Hîn hesp nekiriye jê re alif çêdike.

2868- Hîn ku devê te germ e deng bike.

2869- Hîn ku mar biçûk e serê wî bipelxîne.

2870- Hîn ku tenûr sar nebûye, nan bipêje.

2871- Hîn nebûye varik hêkên hesinî dike.

Çend varyantên din jî hene wek:

a) hîn nebûye varik li dewsa mirîşkê hêk dike.

b) hîn nebûye conga li dewsa ga rêx dike.

2872- Hîn neke, te hîn kir, deng neke.

2873- Hînbûyan hîn neke, hînkeran ji bîr neke.

2874- Hînbûn ronahiya çavan e.

2875- Hîrîna hespê ji pişta gayê cot tê.

2876- Hîv bi derketinê zilam bi rêveçûnê kifş dibe.

2877- Hîv ku hîv e dîsa leke lê heye.

Weha jî dibêjin: Hîv, hîv e ne bêkêmasî ye.

2878- Hîva gulanê, gamêşa qiranê ne li vir û ne derya Wanê.

2879- Hîvza xwe ji mîroya kulek bike.

Dijminê mirov mîroya (gêre. kurmûrî, mûrî) kulek be jî, dîsa divê mirov xwe jê biparêze.

2880- Hogirê kevin nabe neyar.

Weha jî dibêjin: Dostê kevin an jî hevalê kevin nabin dijmin.

2881- Hosta necar tu binive wekî her car,

Xwedê yek e delîl hezar.

2882- Hub şîrê te girtiye mêze nekî dê tirş bibe.

2883- Hure-hura hêştirê ji destê bar e.

2884- Hurme jî mirov in?

2885- Hurmet goştê mirov e.

2886- Hurmet ku heye ji bo Xwedê ye.

2887- Hurmet heye ku ji mêranyê zêdetir e.

2888- Hurmet hurmetê dixwaze.

2889- Hurmê tenur dada qehpê pê veda.

2890- Hûn ji me re millet ji we re.

2891- Hûr bajo kûr bajo lê gayê pîr ne êşîn.

Varyaneke weha jî heye: Hûr bajo, kûr bajo, bila ga jî newestîn

2892- Hûr bajo, kûr bajo, li ser tatê bajo.

2893- Hûr bifikir, dûr bifikir, kûr bifikir û şûr bifikir!

Weha jî dibêjin: Hûr binêre, kûr binêre û dûr binêre.

2894- Hûr e lê nivê şûr e.

Li hinek herêman weha jî dibêjin: Hûr e lê felqa şûr e.

2895- Hûrik hûrik dagirt tûrik.

- 2896- Îlm behr e.
- 2897- Îlm behr e, her kes kevçiya xwe lêdixc.
- 2898- Îlm wek behreke bê binî ye, mirov di nav de wenda dibe.
- 2899- Îman ku heye ji paqijiyê ye.
- 2900- Îmkan kela mêran e.
- 2901- Înkâr kela mêran e.
Yanî carnan înkârî baş e. Li hinek deveran di şûna gotina "kela" de gotina "qela" jî dibêjin.
- 2902- Însan şîrê xav vexwariye.
- 2903- Însan pola ye.
- 2904- Însan teyrê bê per e.
Li hinek deveran di şûna "per" de "çeng" jî dibêjin. Li herêma Licê *Weha dibêjin*: Însan teyrê bê per û ji vir difire heta Feynter e. Feynter herêmê navê gund e.
- 2905- Însanê dîn ne li şînan dibe ne li şahiyên.
- 2906- Însanê nezan ji dijmin jî xerabtir e.
- 2907- Însanê xerîb kor e.
- 2908- Îro derziyek dizî sibe dê deveyekê bidize.
- 2909- Îro dora we ye sibehê ya me ye.
- 2910- Îro heye sibe tune.
- 2911- Îro î n e mele dîn e.
- 2912- Îro, îro gotiye; sibê, sibê gotiye.
- 2913- Îro kuştina min heye zêrandina min tune ye.
- 2914- Îro mij e gur gij e.
- 2915- Îro nebû bihêle sibe.
- 2916- Îro roja te ye sibê roja min e.
- 2917- Îro sar û serma ye sibe def û zirne ye dusibe daweta te ye.
- 2918- Îro yar e, sibe neyar e.
- 2919- Îro yê min e, sibê yê te ye.
- 2920- Îsal dîsa bal kesîv e.
Gotina "bal" di şûna "per" an jî "bask" de hatiye bikaranîn.
- 2921- Îsot di nikulê dîk de nedin.
- 2922- Îsot nexwe bila dev neşewite.
- 2923- Îşa bike bi esas da dil neke wase-was.

2924- Îşlik çûye lê em bi dû qilçik û dûçikan ketine.

Îşlik di wateya kiras de tê bi kar anîn. Di şûna gotina "îşlik" de gotina "qutik" bi kar tînin.

2925- Îtibariya xwe ne bi avê

ne bi hespê ne bi jinê

û ne jî bi axê bîne.

- 2926- Jana hemû tiliyan yek e.
- 2927- Jana hewiyê jana tiliyê.
- 2928- Jehr ji çêleyê maran xelas nabe.
Ev gotin weha jî tê gotin: Çêlê maran bê jehr nabin.
- 2929- Jehrê maran ji maran naçe.
- 2930- Jehrê maran derman e.
- 2931- Jê keto pê keto.
- 2932- Jêr erd e jor ezman e.
- 2933- Ji ava gurr netirse ji ya hêdî bitirse.
Weha jî dibêjin: Ji ava hej metirse, ji ya mend û mayî bitirse.
- 2934- Ji axê pirtir tune lê kûsî têr ax naxwe.
- 2935- Ji axa re dibêjin "pîroz be,"
ji xizanan re dibêjin "te ji ku anî?"
Weha jî dibêjin: Ji dewlemendan re dibêjin pîroz be, ji feqîran re dibêjin te ji ku anî?
- 2936- Ji bangeranê girantir bi ser çûkan re nayê!
- 2937- Ji başiyê re başî karê mêran e;
ji başiyê re nebaşî karê keran e.
- 2938- Ji behrê derbas dibe lê di newalê de dixiniqe.
Weha jî dibêjin: Ji deryayê derbas dibe di çem de dixeniqe.
- 2939- Ji ber teyrokê revî rastî tofanê hat.
Sê varyantên din ên vê gotinê jî hene.
a) ji ber çirikê çû ber gurikê.
b) ji ber dilopê çû ber şirinekê.
c) ji ber şirikê çû ber mezzîbê.
- 2940- Ji ber san dimîne hestiyê kewan?
- 2941- Ji berfê spîtir tune, kûçik diçe li ser dirî.
- 2942- Ji behrê tasek av here, behr zuwa nabe.
- 2943- Ji bêçarî, mirov goştê mirîşkan dixwe.
- 2944- Ji bê dîn re bê îman lazim in.
- 2945- Ji bêîmkanî mirov ji zirbavê xwe re dibêje "bavo."
- 2946- Ji bêriyê tê ji min şîr dixwaze.
- 2947- Ji biçûkan bipirse ji mezinan bitirse.
- 2948- Ji biçûkan xeta ji mezinan efû.
- 2949- Ji bivê-nevê mirov goştê kewan jî dixwe.

- Weha jî dibêjin:* Mirov ji neçarî goştê mirîşkê dixwe.
- 2950- Ji birîna se re goştê se derman e.
- 2951- Ji bizina dîn, karika dîn dikeve.
- 2952- Ji bîhna kebabê çû bi ser daxdana keran vebû.
- 2953- Ji bo çavekî dihebînim çiyayekî.
- 2954- Ji bo golikan diçe şolikan.
Ji cureyeke nîsk re "şolik" dibêjin.
- 2955- Ji bo her derdek merdek.
- 2956- Ji bo kêçê lihêfê dişewitîne.
- 2957- Ji bo Kurdê hejar çi gur çi siwar.
- 2958- Ji bo mirovekî gundekî wêran meke.
- 2959- Ji bo nanekî xerab dike aravanekî.
- 2960- Ji bo nefsê dikeve hefsê.
- 2961- Ji bo nexweşan çûne zebeşan.
- 2962- Ji bo xatirê xwedî mirov kevir navêje seyî.
- 2963- Ji bo xatirê xatiran dan barê qatiran.
- 2964- Ji bo xatiran mirov dixwe goştê qatiran.
- 2965- Ji bo xatiran mirov diçe ser dînê kafiran.
- 2966- Ji çav derdikeve dil derdikeve.
- 2967- Ji çavekî ez hez dikim ji şarekî.
- 2968- Ji çavê kor nayên histirên sor.
- 2969- Ji çavên zuwa hestir nabarin.
Kurd ji hestirên çavan re "rondik" an "fermisk" jî dibêjin.
- 2970- Ji çekan kurk, ji çandinîyê firk, ji jinan jina Tirk.
Çek di wateya kinc û cilûberg de ye.
- 2971- Ji darekê hezar şax çêdibin.
- 2972- Ji dengê mele bawer nake ji zirêna kerê bawer dike.
- 2973- Ji derda rîh berda.
Weha jî dibêjin: Ji kul û derdan rî berda.
- 2974- Ji derba tirsonekan laşê mêran najene.
- 2975- Ji destiyê bivir nebe dar nayê birîn.
- 2976- Ji destê mêrê merd û şêr tişt nafilte.
- 2977- Ji destên zanan Xwedê çû azmanan.
- 2978- Ji devê ketiyê lê ji hope-hopê nakeve.
- 2979- Ji devê mezintir fîl heye.
- 2980- Ji devê re sol çêkirin jûjî piyê xwe rakirin.

- Varyanteke weha jî heye:* Ji devê re sol dikirin, jûjyê got: "Papê min jî."
- 2981- Ji devê re gotin "çima tu bêmade yî?"
Got: Hevsarê min di destê ker de ye.
- 2982- Ji devê re gotin: Were xet.
Got: Tiştê min nekiriye nakim qet.
- 2983- Ji dewaran re ka û kadîn ji malan re sifre û livîn.
- 2984- Ji dê re bihok e, ji jinê re canok e.
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Ji dê re bihok e, ji jinê re rihok e.
- 2985- Ji dê û bavan dikevin hezar hawa.
- 2986- Ji dêlên tirek çênabin seyên bezek.
- 2987- Ji dêrê be ne giyayê mizgeftê.
- 2988- Ji dêrê bû lê nagihe mizgaftê jî.
Weha jî tê gotin: Him ji dêrê bû him jî ji mizgeftê.
- 2989- Ji dêrînan aş ji daçekan teraş,
 ji mêran nenêre yê li pêş û paş.
- 2990- Ji dijmin re zarê xweş û pišta hişk.
- 2991- Ji dijmin û neyaran bawer nekin tucaran.
- 2992- Ji dijminiyê re sînor tune.
- 2993- Ji dîzan weha ye her kes diz e
 û ji hîzan weha ye her kes hîz e.
- 2994- Ji dîkê kor re mirîşka kor divê.
- 2995- Ji dînan re li defê bixe ji jîran re serê bihejîne.
Weha jî dibêjin: Ji dînan re li defê xe, ji zanan re serê xwe bihejîne.
- 2996- Ji dostê xwe re baş be, xerabî kir jê dûr be.
- 2997- Ji du henekan yek rast digere.
- 2998- Ji dûr ve ji şîrîn ve.
Du varyant,n din jî hene:
 a) çiqas dûr be, hewqas jî bi nûr e.
 b) dûr be, bi nûr be!
- 2999- Ji eqeran aş ji karan simtraş
 ji mêran yê ku ne bide pêş û ne jî paş.
 Li hinek herêman di şûna gotina "eqer" de gotine "halet" an jî "mulk"
 bi kar tînin.
- 3000- Ji Ereb re nebêjin "merhaba" tê ser kurk û eba.
- 3001- Ji eslan bipirsin ji bêeslan bitirsin.
- 3002- Ji ewrê gire-gir metirse ji yê bédeng bitirse.
- 3003- Ji ezaban re jin berdan hêsan e.
- 3004- Ji ezîzan re ezebî czîzî ye.

- 3005- Ji gez qoşme nabc.
 Ji darê gez dîrek an stûn çênabe.
- 3006- Ji giran girê Xerezê kulê avêt ser merezê,
 cz dev jê bernadim heta xwê şîn nebe û qantir nezê.
Xerez: li Kurdistanê navê girekî ye.
- 3007- Ji gotinê heta kirinê riya pazdeh salan e.
- 3008- Ji goştê ber diranan mirov têt naxwe.
- 3009- Ji gur re gotin: Çima stûyê te stûr e?
Got: Ez bi destê xwe dikim û bi devê xwe dixim.
- 3010- Ji gur e gotin: Bibe şivanê pez.
Got: Binê piyên min qusiya ne.
- 3011- Ji guran birçîtir e ji maran tazîtir e.
- 3012- Ji haletan simteraş ji mirovan yên ku nadine pêş û paş.
- 3013- Ji heftê salî pêde bêndera mirinê ye.
- 3014- Ji hekîman re dibe du fincan
 yek kasê xeraban yek kasê qencan.
- 3015- Ji heramzadan helalzade nakevin.
- 3016- Ji hemû fermanan re tu serê xwe xwar bikî dê tu bibî kole.
- 3017- Ji heqê dînan tiredîn derdikevin.
Li hinek deveran jî weha dibêjin: Ji heqê dînan dîn derdikevin.
- 3018- Ji her ewrî baran nabare.
- 3019- Ji her mirovî bawer meke li cîhê teng ji hezarî hîn yek e.
- 3020- Ji hespê peya dibe li kerê siwar dibe.
- 3021- Ji hesinê xerab şûrê baş çênabe.
- 3022- Ji hevalan re cahşekî bixwaze da Xwedê kerekî bide te.
- 3023- Ji hêkekê hêkerûn çênabe.
- 3024- Ji hêlînê çû kulînê.
Weha jî dibêjin: Ji hêlînê diçe kulînê.
- 3025- Ji hêştir mezintir fîl heyc.
 Ji deve re hêştir jî dibêjin.
- 3026- Ji hindik heta bigihê gundik.
- 3027- Ji hinekan re hok e ji hinekan re jî kok e.
- 3028- Ji hinekan xwîn ji hinekan av naçe.
- 3029- Ji hinekan re bêşbêlik ji hinekan re seferberlik.
- 3030- Ji hinekan re deşt e ji hinekan re teşt e.
- 3031- Ji hirçek du eyar dernayê.
- 3032- Ji hirçê post, ji gur dost çênabe.

- 3033- Ji hiştirê re dibêjin pišta te xwar e,
ew dibêje: Ku derê min rast e?
- 3034- Ji jina xerab zarokên çê nakevin.
Weha jî dibêjin:
a) ji dêla tirek cewrikên dir nakevin.
b) ji dêlên tirek çênabin seyên bezek.
- 3035- Ji jinan re divê dar, ji bûkan re paxpax.
- 3036- Ji kar metirse bila kar ji te bitirse.
- 3037- Ji ker û hespê qantir çêdibe.
- 3038- Ji ker weha xuya ye ku maker horî ye.
- 3039- Ji ker kurtan dimîne ji peya nav dimîne.
Weha jî dibêjin: Ji mêran nav dimîne, ji ker kurtan dimîne.
- 3040- Ji ker re bêje dayê lê şîrê wê vemexwe.
- 3041- Ji kerba dijmin mirov kêlek xwê dixwe.
- 3042- Ji kerbê nezanan Xwedê çû ezmanan.
- 3043- Ji kerê re gotin bilîze çirtik avêt.
- 3044- Ji kerî(tî) por kir hirî.
- 3045- Ji keriyê gur, ez mame kavirê gir.
- 3046- Ji kesrê mirov namire.
- 3047- Ji kevirê aş girantir tune lê bi mîxekê radibe.
- 3048- Ji kevjalê pirsîn: Çima tu lîyan lîyan bi rê ve diçî?
Got: Pêşî bi reşî ye.
- 3049- Ji kê zaye ta ku nebezaye!
- 3050- Ji kêfa mewijan dil çû guhêjan.
- 3051- Ji kirinên şêx û melan dîsa rehmet li cahîlan.
- 3052- Ji kîsê xelkê dikirim û xweş dibirim.
- 3053- Ji kulandina se bawer meke.
Weha jî dibêjin: Kulekî ji se re çî ye?
- 3054- Ji kurê bêxîret keça kor pak e.
- 3055- Ji kurê jinebiyan neke tu hêviyan.
- 3056- Ji laserê bêhtir ji ava sekan bitirse.
- 3057- Ji mala bavê bû bi mal ji mala xezûr bû teral.
- 3058- Ji mala xwe tênan e û ji mêrê xwe têrgan e.
- 3059- Ji malê yekî qalê.
- 3060- Ji mehan û salan carek mêvanê xalan.
- 3061- Ji Memê weha ye sala par e.

3062- Ji mewsîma bihar û jina kofîxwar nabe îtîbar.

3063- Ji mêweke mehscrekî girê dide.

3064- Ji mêran nav dimîne, ji gayan çerm dimîne.

Weha jî dibêjin: Mêr dimire nav dimîne, ga dimire çerm dimîne.

3065- Ji mêrê rût û jina pûrt xwe bistirînin.

3066- Ji min re mêr e ji xelkê re kerê nêr e.

3067- Ji mino li mino.

Weha jî dibêjin: Ji min e lê ne li min e.

3068- Ji miriyan neke hêvî.

3069- Ji mirov re kur dikarin her gav bibin lê ne bira.

3070- Ji nanê genim re zikê polayî divê.

3071- Ji navê rabû şermet wenda bûn rêz û rûmet.

3072- Ji neçarî goştê mirîşkê tê xwarin.

3073- Ji neçarî nan bi hêjîran tê xwarin.

3074- Ji nedîtiyan giliyan meke.

3075- Ji nexweşê nemirî re çare heye.

3076- Ji neyarê xwe re neyar be heya bibc qenc, jê re qenc be.

3077- Ji nêvî nekin hêvî.

3078- Ji odeyan re nanê bi rûn ji avahiyê re stûn.

3079- Ji paş ve refek e û ji pêş ve qefek e.

3080- Ji pere şîrîntir dîsa pere ye.

3081- Ji pezê pir ma kavirê kulek.

3082- Ji pezekê du eyar çênabin.

Eyar, di wateya "çerm" de ye.

3083- Ji pez re gotin: Derdê te deşt û çiya ne?

Got: Na, derdê min şivan e.

3084- Ji pêlpêlokan metirse ji nerm nermokan bitirse.

3085- Ji pêşî de namûs ya mêran e.

3086- Ji pêşî dixuye paşî.

3087- Ji piran pir ji hindîkan hindik dihere.

Li hinek cîhan weha jî dibêjin: Ji piran pir diçe, ji hindîkan hindik diçe.

3098- Ji pisîkê re gotin gûyê te derman, got na hebîrman e

Du varyanteke weha jî hene:

a) ji qijikê re gotin zirça te derman e, çû li behrê zirç kir.

b) ji mêşê re gotin gûyê te derman, çû firî çû ezman e.

3089- Ji pisîkê were şêr e.

3090- Ji pişta xelkê mêranî nabe.

- 3091- Ji pîrî hatiye nêrî.
- 3092- Ji odan re lazim e nan û rûn
 ji xaniyan re lazim e stûn
 ji xebatê re lazim e hucim.
- 3093- Ji qantirê pirsîn: Bavê te kî ye?
Got: Hesp xalê min e.
- 3094- Ji qehran xwe avêt behran.
Weha jî dibêjin: Ji qehran ket bin baran.
- 3095- Ji qelsemêran re laşê egît û pclewanan naçe.
- 3096- Ji qelsemêran weya ye ku canê xweşmêran naêşe.
- 3097- Ji qirêjê mar vedireşe.
- 3098- Ji qorîna quling bela tê scrê quling.
- 3199- Ji refek kew ribatek derdikeve.
- 3100- Ji rovî fenektir tune ji eyarê wê pirtir tune.
Weha jî dibêjin: Ji rovî fenektir tune, li scr dukanan ji çermê wê pirtir tune.
- 3101- Ji rovî re gotin: Tu paşayê mirîşkan î!
Tilûnc da û girî: Ez ji şansê xwe ne bawer im.
- 3102- Ji rûyê reş re tenî navê.
- 3103- Ji sed axayan, axayek jî dernakevc.
- 3104- Ji sed derziyî gîsnekê çêdikin.
- 3105- Ji sed filehan yek ser e, ew jî ker e.
- 3106- Ji sed kanî çemek û ji sed çemî golek.
- 3107- Ji serên çûkan qelî çênabe.
Varyantên weha jî hene:
 a) serê çivîkê çi ye, qelya wê dê çi be?
 b) ji serê qijikê qelî çênabe.
- 3108- Ji şêr bipirse ji bedşêr bitirse.
- 3109- Ji şînê re jî navdarî pêwîst e.
- 3110- Ji şîr tirsiya pif kir dew.
- 3111- Ji şîr veke bi mêr veke.
- 3112- Ji tazîtiyê çûye di kuwarê de dibêje:
 Kirasê min ne bi dilê min e, min dîlan navê.
- 3113- Ji te cehd ji Xwedê mirad.
- 3114- Ji te hereket ji Xwedê bereket.
- 3115- Ji tenê bûnê mirov xwe davêje behrê.
- 3116- Ji teresbûna kûçikê me,

rovî qula xwe li ber dîwarê me çêkiriye.

3117- Ji teyran ew ne tu teyr e.

3118- Ji tiralan re tavehîv sibeh e.

3119- Ji tiştan tiştê nûhêjayî ji dostan dostê kevin dilsozdayî.

3120- Ji tiştê bi xwekirinê re tu çare tune.

3121- Ji tunebûna mirovan navê dîkî bûye Evdilrehman.

3121- Ji tunebûnê rê diçe hebûnê.

3123- Ji van hersêyan bireve:

Mirovê kinik hêstira mirik û bociyê fînik.

3124- Ji we re edet e, ji me re qebhet e?

3125- Ji wî bitirse ku ji Xwedê natirse û ji evd fedî nake.

3126- Ji welîyan pelî ji pelîyan welî.

Weha jî dibêjin: Ji welîyan çêdibin xwelî ji xweliyê jî çêdibin welî.

3127- Ji wî miletî dûr bikevin:

Yê ji deholê bicivin û ji ber dar birevin.

3128- Ji xebat û gerê, mêr namire.

3129- Ji xelkê re pir e û ji xwe gir e.

3130- Ji xelkê re gul e ji xwe re derd û kul e.

Du varyantên din jî hene:

a) ji xelkê re jîr e ji xwe re kul e.

b) ji xelkê re bûne pir ji xwe re gir.

3131- Ji xelkê re pîrbêjo ji min re kerr û gêjo.

3132- Ji xelkê re kevroşkan digire ji xwe re kûsiyan digire.

Li hinek herêman di şûna "kevroşkê" de gotina masî bi kar tînin:

Ji xelkê re masî digire, ji xwe re kûsî digire.

3133- Ji xelkê re hêkan dike ji xwe re zilqan dike.

3134- Ji xelkê re purşûnga şîr e ji xwe re mişkê kor e.

3135- Ji xeman xew tê ji kerban ken tê.

3136- Ji xezalê bezatir tune ew jî, ji risqê xwe zêdetir naxwe.

3137- Ji xwe re tenûrek sax bihêlin.

3138- Ji yekî pîrsîn: Te çima karê xwe pêkneanî?

Got: Bi lawijan ji dergûşan û bi tirê gamêşan.

3139- Ji yekî re gotin: Tu bext dixwazî an text?

Got: Bext hebe dê text bê.

3140- Ji zarokê nebûyî re derpê nayê dirûn.

Weha jî dibêjin: Ji zarokên nebûyî re cilan neditirûn.

3141- Ji zîman şêrîntir û tehtir tune.

3142- Ji zivistanê heta havînê sed kum bê xwedî dimîne.

3143- Jinan mal û mêran tevr û bêr.

3144- Jin axa bin lingê mêr e.

3145- Jin bedewa emir e.

3146- Jin bela ye zarok jî hela-hela ye.

3147- Jin berdilika mêr e, dayik mar e.

3148- Jin bidin jinmiriyan, ker bidin kermiriyan.

Weha jî dibêjin: Jin bidin jinmiriyan û ga bidin gamiriyan.

3149- Jin bi xeftan e, mêr bi kurtan e.

3150- Jinbira mirov dikin şîva guran.

3151- Jin biriye qelind nebiriye.

3152- Jin bîne ji esliyan guh bidin ecêban.

3153- Jin bîne ji yên ser xwe ve, keç bide ji yên bin xwe ve.

3154- Jin bîne ji malxwedîyan avê vexwe ji kaniyan.

3155- Jin bûn sê dew ma li sêpê.

3156- Jin çav li der e mêr xwelî li ser e.

Weha jî dibêjin: Jina çav li der mêrê xwelî li ser.

3157- Jin çûn hewaran, mêr ketin kewaran.

3158- Jin darê şikestî ye.

3159- Jin dibêje; hevrişm e kirasê min û jehr e xwarina min.

3160- Jin dibêje; cil ji zêr e, xwarin jehra mêr e.

3161- Jin diçe xwînê, xwîn safî dibe.

Di nav civata Kurd de cîhê jinê him heye û him jî tune ye. Bi rastî dema, meseleyên mêrkuştin û xwînî çêdibin, jin dikevin navê û wê didin xatirê jinê. Şer jî weha ye. Dema şer derdikeve jin dikevin nav û şer radiwes te. Carnan jî jin çarikên serê xwe davêjin nav mêran, êdî mêr şer nakin.

3162- Jin dimire mêr serbirî dibe.

Weha jî dibêjin: Jin dimire serî li mêr digere.

3163- Jin dirêse lê nizane bide berhev.

3164- Jin dîwarê hundir e mêr dîwarê derve ye.

3165- Jin gol e mêr çem e.

3166- Jin hene, jan hene û dermanê dilan hene.

Li hinek deveran weha jî dibêjin:

a) jin hene jan hene berdilika mêran hene.

b) jin hene jan hene û qûnejin hene.

3167- Jin hene, jinkok hene; mêr hene, mêrkok hene.

- 3168- Jin herin xwînan, xwîn bêkar dibin.
- 3169- Jin heye bira ye jin heye birabir e.
- 3170- Jin heye ji sed mêrî çêtir e.
- 3171- Jin heye mirov dike wezîr, jin heye mirov dike rezîl.
Weha jî dibêjin: Jina çê mirov dike wezîr jina xerab mirov dike rezîl.
- 3172- Jin heye rewşa mal e û jin heye terşa mal e.
- 3173- Jin him gula çavan e û him jî kula çavan e.
- 3174- Jin jin gotiye mêr mêr gotiye.
- 3175- Jin kaniya jînê ye.
- 3176- Jin kelec ye mêr felc ye.
Varyanteke din jî weha ye: Jin kelhe ye mêr girtî ye.
- 3177- Jin kelek e mêr kelekvan e.
- 3178- Jin ku heye zeviya li ber gund e.
- 3179- Jina ku ji bavê xwe şerm neke lê negire.
- 3180- Jin ku xatûn be mêr dê darqûn be.
- 3181- Jin li pišta mêr şûrê dudev e.
- 3182- Jin mêran radikin jî û wenda dikin jî.
Weha jî dibêjin: Jin mêr radikin û dadikin.
- 3183- Jin nan pîne dike.
- 3184- Jin parsûya xwar e.
Weha jî dibêjin: Jin ku heye parsûya xwar e.
- 3185- Jin pêçanê mêran e.
- 3186- Jin rewşa malan e.
- 3187- Jin ruhck e, dayik buhok e.
- 3188- Jin sê ne: Jina ji dil, jina bi kul jina dermanê dil.
Varyanteke weha jî heye: Jin sê ne: qenc renc û ji birîna benc.
- 3189- Jin sola teng e heger nebû ji pêyê xwe bigir û bavêje.
- 3190- Jin tê dîtin, bira nayê dîtin.
Weha jî dibêjin: Jin tê dîtin dê nayê dîtin.
- 3191- Jin û mêr dergevanê malê ne.
- 3192- Jin û mêr heval in.
- 3193- Jin û mêr her yek tatekê ne.
- 3194- Jin û mêr tevr û bêr.
- 3195- Jin werîn ji mala mezin, pê bidc hezar û hîn,
 da jê bikevin Mîrşem û Qeretaçdîn.
- 3196- Jina baş ji hezar mêrên xirab çêtir e.
 a) jina çê hêja ye ji hezar mêrên bê rê.

- b) jina çê bergenda heft mêrane.
- 3197- Jina baş mêrê ne baş, baş dike.
- 3198- Jina baş birayê mêrê xwe ye.
- 3199- Jina baş namûsa mêrê xwe ye.
- 3200- Jina berdayî wek kerê bindorê ye.
- 3201- Jina bêesil dawa xwe davêje ser serê xwe.
Li hinck deveran ji "daw" re "pêş" jî dibêjin.
- 3202- Jina bê heya wek girara bêxwê ye.
- 3203- Jina bê kes har dibe mêrê bê kes jar dibe.
- 3204- Jina bêşerm ji mêran natirse.
- 3205- Jina bê zarok dilê wê bi malê naşewite.
- 3206- Jina bira wekî gura.
- 3207- Jinan bi mêran din bera sewr û pewrandin.
- 3208- Jina bi pûrt mêrê zilût pişt bi wan girê mede.
- 3209- Jina bi pûrt bi kundekî mêrê bi pûrt bi gundekî.
- 3210- Jina bî ye, dest li ber rû ye.
- 3211- Jina bî mîna meha adarê ye geh digirî û geh dikene.
- 3212- Jina bî li kû be şer li wir e.
Weha jî dibêjin: Jina bî li kû be ew der bê şer nabe.
- 3213- Jina çê hêjayê dinê.
- 3214- Jina kêrnehatî av dirjîne, dibêje xêr e.
Li hinek herêman weha jî dibêjin: Jina xerab av dirjîne dibêje xêr e.
- 3215- Jina ku ji mirov re nebe sê kevirên wê
bikin guhê melhêfa wê.
- 3216- Jina ku ne di fikra mirov de be dojeh e.
Cehennem bi erebî ye û bi kurdî dibêjin "dojeh."
- 3217- Jina ku zû radize mêrê xwe kal dike.
- 3218- Jina malê binyata malê.
Weha jî dibêjin: Jina malê, binyata xanî.
- 3219- Jina mêran be li ber stêrk û pêwiran be.
- 3220- Jina mêrê çê derî li ser piştê.
- 3221- Jina mêrê xerab e him diz e û him jî qehp e.
- 3222- Jina mêrê zirz e hin dibêjin hîz e û hin dibêjin diz e.
- 3223- Jina ne baş mêrê baş xerab dike.
- 3224- Jina ne delal çavê mirov dêşîne jina delal dilê mirov dêşîne.
- 3225- Jina ne qenc heriyeye sar e.

- 3226- Jina ne bijêre, esil xêr e.
- 3227- Jina paşîn mîna pîna bervajî ye.
- 3228- Jina qenc buhişt e.
- 3229- Jina qenc naxeydc tu ew di derî re bikî der,
ew di kulekê re tê.
- 3230- Jina qenc seyde jina pîs qeyde e.
- 3231- Jina req heq dîke sê telaq.
- 3232- Jina revandî dîms û rûnê tev helandî.
- 3233- Jina rind belayê serê gund.
- 3234- Jina ser mezin a pî biçûk xwezî li wê malê bibe bûk.
Li hinek herêman weha jî dibêjin: Ser mezina ling biçûk wê li malê bikin bûk, ser biçûka ling mezin wê ji malê nekin bûk.
- 3235- Jina te hevala te berîka te xalê te.
- 3236- Jina tiyê min destê min hişt hat rûyê min.
- 3237- Jina ûr jê bikeve here dûr.
- 3238- Jina xelkê ramîsanek hespê xelkê meydanek.
- 3239- Jina xerab bênamûsiya komê ye.
- 3240- Jina xweşik dil dêşîne jina ne xweşik çavan dêşîne.
- 3241- Jinbav çiqas qenc be navê wê jinbav e.
- 3242- Jinebî ye ya hewî ye ya sêwî ye.
- 3243- Jineke çê hêja ye ji hezar mêrên bê rê.
- 3244- Jinê bîne bi komek derew an bi kulmek pere.
- 3245- Jinê bîne bi şîreta pîran hespê bîne bi dilê xortan.
- 3246- Jinê bîne ji esliyan avê vexwe ji kaniyan.
- 3247- Jinê bîne ji maleke mezin tê bide qelend û hin.
- 3248- Jinê birîye lê hîn qelind nebirîye.
- 3249- Jinê dil kir, dîwar qul kir.
Weha jî dibêjin: Jinê dil kir, mêrê xwe sil kir.
- 3250- Jinê hilnebjêre, esil ew xêr e.
- 3251- Jinê were kokila min ê ez te bigerînim li dora dinê.
- 3252- Jinik avis e, pîr bê nefis e.
- 3253- Jinikê xew bi mêrê xwe re didît,
keziya xwe li ser yarê xwe kur dikir.
- 3254- Jintî bi hev re baş bin, bira dê ne şaş bin.
- 3255- Jintî dikuje biratî.
- 3256- Jîyan bê jin nabe.

- 3257- Jiyan çî tal çî şêrîn mirin li dû ye.
- 3258- Jîyan xweş e li cem yarê.
- 3259- Jorê çiyê daristan e jêrê çiyê mêrg e.
- 3260- Jor xemiland jêr qefiland.
- 3261- Jûjî çêlikên xwe mizdidan û digotin:
Ez goriya pûrtê we yên hevrîşîm bim.

3262- Ka ne ya te ye, ma kadîn jî ne ya te ye?

3263- Kalbûn ne tu pêş e bavêjin piştta mêşan,
her sibe radibe derekî wî dêşe.

3264- Kal bû, tehl bû.

3265- Kalan bavêje xweşiyê cahşan bavêje reşiyê.

3266- Kalek bavê xweşiyê ciwanek bavê reşiyê.

3267- Kalê malê rûmet li balê.

3268- Kalê mezin stûna mala mezin.

3269- Kalo ji bêkesî pîrê ji bênefsî herduyan li hev pirsî.

Weha jî dibêjin: Kalê bêkesî pîra bênevsî herdu li halê hev pirsîn.

3270- Kalo memir bihar tê, pîrê memir pincar tê.

3271- Kanî bê xwedî bimîne dê bimiçiqe.

3272- Kanî bê av nabe, zozan bêkoy nabe.

Dimilî ji çiya re "ko" dibêjin.

3273- Kaniya ku av jê bikişe naçike.

3274- Kaniya dilan dibe civata dilan.

3275- Kaniya ku te av jê vexwar û mala ku te nan jê xwar,
spasiyê ji bîr meke.

Weha jî tê gotin:

a) kaniya ku tu av jê vedixwî wê neherimîne.

b) kaniya ku tu avê jê vexwî, kevir navêje.

3276- Kanûn ji ezmanan dibare xûn.

3277- Kanûn kewan naxwaze.

3278- Kapê gotiye; "diya min yek e, bavê min yek e, heft rojan li
ser min bar neke, paşî min di geliyan re wer ke."

3279- Kar bazineke zêr e û di destê xwediyê xwe de ye.

Di şûna kar de, senet jî dibêjin. *Weha dibêjin:* Senet bazina zêr e û di
destê herkesî de nîne.

3280- Kar bike ji bingehî da ku li ber te nebe lehî.

3281- Kar bike wek keran, bixwe wek şêran.

3282- Kar bi kirinê ker bi ajotinê.

3283- Kar bi zorê nabe.

3284- Kar karê keran e, siûd koşk û sera ne.

3285- Kar ker e tu bajoyî dihere, nejoyî nahere.

- 3286- Kar ker e bide pey dihere tu rawestî dê vegere.
 3287- Kar şêr e, belê gava mirov dest pê dike, dibe rovî.
 3288- Kar û zîrar birayên hev in.
 3289- Kara gavan jî siwarbûna li kerê ye.
 3290- Kara te ji min re, kerema Xwedê ji te re.
 3291- Karê bêrê meke ku tu derdê bêderman nebînî!
 3292- Karê bi nêvî jê neke hêvî.
 3293- Karê biçûk mezin meke.
 3294- Karê bi wext, mîna xatûna li ser text.
 3295- Karê demekê çêtir e ji axaftina salekê.
 3296- Karê dizan bêber e.

Li hinek deveran weha jî dibêjin: Karê dizan bêkêr e.

- 3297- Karê îro nehêle sibehê.
 3298- Karên malan sed û sîh ne, qirş û av ji heb belî ne.
 3299- Karê mêr tevr û bêr, xemla jinê zîv û zêr.
 3300- Karê ne ji min re, bayê wî di ser min re.
 3301- Karê paldayî, çala bî derziyê kolayî.
 3302- Karê sêwî nabe nêrî.
 3303- Karê sibehê qeyd e, yê êvarê seyd e.
 3304- Karê şevê belaş e.
 3305- Karê wextê, paşayê li ser text e.
 3306- Karê wî bêbeş e, dilê wî negeş e.
 3307- Karê xwe bike bi esas, bila dilê te neke taswas.
 Karê xwe bi plan û proje bike ku kêmasiyên wî çê nebin. Dudilî nemîne.
 Di şûna "taswas" de "waswas" jî dibêjin.
 3308- Karik di bin selekê de namînin.
 3309- Karika dîn ji bizina dîn e.
 3310- Karite ji kifra ranabin.
 Kifre, li ba ava Xabûrê dareke bilind û pîrgulî ye. Dema mirov ji yekê bi hêvî be lê piştî ew hêviya mirov bi cîh neyê an jî bişkê, wê demê vê gotinê dibêjin.
 3311- Karker hezar in, serok yek e.
 3312- Karkeran kar kir, betalan benîşt cût.
Li hinek herêmên weha jî dibêjin: Karkeran kar kir, xeraban benîşt cût.
 3313- Karkerê mala xwe be, şîrînê ber dilê hevalên xwe be!
 3314- Karkero, kedkero ji xelkê re.

- 3315- Karoz karoz dîsa kerê boz.
- 3316- Kasa malêsê bi alastinê zik têr nabe.
- 3317- Kasa te bi min re, kerema Xwedê bi te re.
- 3318- Katan nebirî dê bibin dar.
Kat, devî ye. Li hinek herêman jî dibêjin: Devî nebirî dê bibin war.
- 3319- Kaxeza gur e, ne kes dixwîne û ne jî kes guhê xwe didê.
- 3320- Kaxez jî ya te ye, qelem jî ya te ye.
- 3321- Kaya kevn û teze bi hev re didin bayê.
- 3322- Keç fasûnên ser dukanan in.
- 3323- Keç hevsar nabe.
- 3324- Keç nixurî, dê stirî, law nixurî, bav stirî.
- 3325- Keç û kurê malê gula dê û bavan in.
- 3326- Keç zîyaret e.
- 3327- Keçel bi perê xwe helaw dixwe.
- 3328- Keçel bi derman zanibe dê pêşî di serê xwe de bide.
- 3329- Keçelo navê min li te, kuma min li serê te.
- 3330 -Keçelo mû bi serê te ve nîn in?
Got: Keziyên xaltîka min li qûnê dikevin.
- 3331- Keçik bizav in, xelk xwe li wan digire.
- 3332- Keçik li ser dengbêjan bengî dibin.
- 3333- Keçik teşiya dê radîke, lawik tîra bavê radîke.
- 3334- Keçik wek sêva darê ye, herkes tê kevir davêje.
- 3335- Keçika baş, rûspiya bavê xwe ye.
- 3336- Keçika mîran bi qelenê gavanan nayê.
- 3337- Keçika pîr û xama, zik tijî, tûr û tûr vala.
- 3338- Keçika qereçî nabe xatûn.
- 3339- Keçika rind dane kund.
- 3340- Keçik e, bi paşgotin û dûçik e.
- 3341- Keçikên bê bav, çiyayên bê av.
- 3342- Keda helal dibe mû lê naqete.
- 3343- Keda helal şîrîn e.
- 3344- Keda helal heram nabe.
- 3345- Keda kera nake pera.
- 3346- Keda kê hema dolan e.
- 3347- Keda xwe mede bavê xwe.

3348- Keftar bi gotina xweş ji kunê derdikeve.

Weha jî dibêjin: Mar bi gotina xweş ji qulê derdikeve.

3349- Keftaro li ber çavan dîyaro!

3350- Kel bi şîr tê difûre.

3351- Kela hêrsê kefa sabûnê ye.

3352- Kelaxê gund ji seyên gund re ne.

3353- Kelbeş divê kerê reş.

3354- Kelhî ne lê tiştêk li mala wan nîn e.

Gotina "kelhî" bi wateya qure û pozbilind tê bi kar anîn.

3355- Kember li piştê digere li taştê.

3356- Ken ji dilê geş tê, baran ji ewrê reş tê.

3357- Kenê bêaran tê ji qulê dîwaran.

3358- Kenê bêhesab ji bê edebiya mirov tê.

3359- Kenê zehf, bêarî ye.

3360- Kengê behr bû şîr, dê Tirk bibin eşîr.

3361- Kengê bibare, hingê zivistan e.

3362- Keno bi xwediyê xwe xweşo.

3363- Ker best, xem verest.

3364- Ker bédeng nazire.

3365- Ker bi karwan qelew nabe.

3366- Ker bi nefis e, mistek ceh jê re bes e.

3367- Ker bi gem û hevsar, mêr bi soz û qerar.

3368- Ker bi Hecê nabe hecî.

Weha jî dibêjin: Ker bi zire-zirê nabe mele.

3369- Ker bi kutanê çênabe.

3370- Ker bi kurtan e, qîz bi xelîtan e.

3371- Ker bîhna buha seh nake.

3372- Ker carekê dikeve heriyê.

3373- Ker çi dizane zehfran çi ye!

3374- Ker çi dizane qedrê gulê.

3375- Ker dema têr dixwin, dizirin.

3376- Ker diçin ba keran ji hev hîn dibin tir û fisan.

Vê gotinê weha jî dibêjin: Ker diçin cem keran dihewsin tir û fisan.

3377- Ker digere li hefsarê xwe rast tê.

3378- Ker dike, qantir dixwe.

- 3379- Ker heft cureyên soberiyê dizane
lê dema tê ba avê hemûyan ji bîr dike.
- 3380- Ker hûr e, buhr kûr e.
- 3381- Ker îblîs e, derman werîs e.
- 3382- Ker ji xweşavê çî fêm dike.
- 3383- Ker Kerwesî, ehmeq mêrikê Xincisî.
Xincis taxeke Licê ye û Kerwes jî gundekî Licê ye. Xelkê herdu cîyan
jî yek ji yê din serhiştir in. *Li herêma Mêrdînê jî weha dibêjin: Ker
Kerceswî, ehmeq zîlamê Xincisî.*
- 3384- Ker ket heriyê ji xwediyê pê ve kes dest navêje teriyê.
Weha jî dibêjin: Ku ker kete heriyê, xwedî dest davêje teriyê.
- 3385- Ker ku dê tesewir ke, sira ku di dûrbînê de.
- 3386- Ker nabe qurban, bihayê kerê dibe qurban.
Varyanteke din jî weha ye: Ker jî dibe kurban?
- 3387- Ker û kurî li hev zirî.
- 3388- Ker û mekteb?
- 3389- Ker û qantirê li hev da, golik di nav lingan de çû.
Varyanteke weha jî heye: Şivan û gavan li hev dan, lê golikvan cirm da.
- 3390- Ker û şûr bazara mirovê kor.
- 3391- Ker û werîs riya Bedlîs.
Li hinek deveran dibêjin: “das û werîs riya Bedlîs.”
- 3392- Ker xîyalek e, karwan xîyalek e.
- 3393- Ker zirî dîwan zivirî.
- 3394- Kera min li garan e, pirsra min li şivan e.
- 3395- Keran serên gelek bezayan biriye.
- 3396- Kerê beş çî fêm dike ji gula geş?
- 3397- Kerê bûtê, yeksalî du kêl hilgirtî, bû du salî kêlek hilgirtî.
- 3398- Kerê digot: Dengêk tê.
Caşikê got: Hinek tazî ne, dê me jî tazî bikin.
- 3399- Kerê guhsist tirên jidî dîkin.
Weha jî dibêjin: Kerên guhsist tirên bendîn dîkin.
- 3400- Kerê ku barê te ne lê be, majo.
- 3401- Kerê mirî ji gur natirse.
- 3402- Kerê mirî ji kurtanê xwe ditirse.
- 3403- Kerê pîr beza guran xwar.
- 3404- Kerê pîr hevsarê sor!
Dema tiştêkî ne normal hebe, wê demê vê gotinê dibêjin. Matmayiya

- xwe didin dîyar kirin.
- 3405- Kerê pîr ûnce taze.
- 3406- Kerê tu jê peya bî, bila şeytan lê siwar be.
- 3407- Kerê xesandî nazire.
- 3408- Kerê xwe ji destê xwe bernede.
Yanî ev fersenda ku ketiye destê te, ji destê xwe bermede.
- 3409- Keriya bê şivan gur dikeve navê û dixwe.
- 3410- Keriyê bixwe û nanê bide.
Weha jî dibêjin: Keriyê bixwe û nanê hilîne.
- 3411- Kero bi te re me, mêvan guhdar be.
- 3412- Kero mêvanê hero!
Weha jî dibêjin: Kero wek hero. “Her ” di zaravayê zazakî de “ker” e
- 3413- Kero nemir qîfar tê, pîrê nemir pincar tê.
Varyanteke din jî weha ye: Pîrê memir bihar tê, kalo memir picar tê.
- 3414- Kerr û gêj, guh tijî qirêj.
- 3415- Kerrê û lalê kela te giha newalê.
- 3416- Kes berxê mirov nake beran.
- 3417- Kes bêsela nabe mela.
- 3418- Kes bê zehmet naxwe nîmet.
- 3419- Kes bi derdê kesî nizane.
- 3420- Kes bi kortêlan têr naxwe.
Ji bermayî an jî avriyê re kortêl jî tê gotin. Kesê ku bermayiyên hinek din bixwin, ew bêşexsiyet dibe.
- 3421- Kes çavê kor naxwaze.
- 3422- Kes dilê xwe li miriyan xweş nake.
- 3423- Kes eqilê xwe bi yê kesî nade.
- 3424- Kes heyê ji tovê keran e û kes heyê zengilê şeran e.
- 3425- Kes heyê ji tovê qirdikan e kes heyê ji tovê dêlikan e.
Weha jî dibêjin: Kes heyê ji tovê mêran e û kes heyê ji yê roviyan e.
- 3426- Kes ji ber arê xweş nareve.
Agir hatiye kurtkirin û bûye “ar.”
- 3427- Kes ji çavên miriyan fedî nake.
- 3428- Kes nabêje dewê min tirş e.
- 3429- Kes nabêje hiriya min qirş e û dewê min tirş e.
- 3430- Kes nabêje kewê min çels e.
Ev jî wek gotina “kes nabêje dewê min tirş e.”
- 3431- Kes nabêje ka bavê te, dibêje ka diya te.

- 3432- Kes nakevc gora kesî.
- 3433- Kes negotiye "ev mala diz û qumarbazan e."
- 3434- Kes nikare qismetê kesî bixwe.
- 3435- Kes şûrê xwe nade bin şûrê kesî.
- 3436- Kes wek dest nizane ku li kû derê mirov dixwire.
- 3437- Kesadî dike fesadî.
- 3438- Kesan hembêz ke lê haya te ji te hebe.
- 3439- Kesekî heta niha malê dinê bi xwe re nebiriye gorê.
- 3440- Kesê bêhêvî dibc, bêbext dibc.
- 3441- Kesê bêvila wî neşewite, bêxîret e.
Li hinek deveran di şûna gotina "xîret" de gotina "rûmet" jî dibêjin.
- 3442- Kesê bizdonek ji sîha xwe ditirse.
- 3443- Kesê bênamûs heft pengên wî hene.
- 3444- Kesê ji destê xwe têr nebe, ji mala xelkê têr nabe.
- 3445- Kesê kesan tîpek bes e.
- 3446- Kesê keysbaz nanê wî li ser çoka wî ye.
- 3447- Kesê ku bi çavkî li mirov binêre,
mirov bi du çavan lê dinêre.
- 3448- Kesê ku ji tîfekê fedî neke,
tu daran di qûna wî de bikufî jî fedî nake.
- 3449- Kesê ku mezin bû û nanê xwe bêhtir kir ji tovê dewaran e;
kesê ku mezin bû û nanê xwe kêr kir ji tovê mirovan e.
- 3450- Kesê ku zimanê xwe wenda bike ew wenda ye.
- 3451- Kesê min o, destê min o.
- 3452- Kesê li ber hindikî nekeve, li ber pir nakeve.
- 3453- Kesê neke hîn nabe.
- 3454- Kesê neke, naxwe.
- 3455- Kesê ne li govendê fît reqas e.
- 3456- Kesê ne li malan, nizane bi ehwalan.
- 3457- Kesê nezan wek dara bêber e.
- 3458- Kesê nezan wek kerê bê bar e.
- 3459- Kesê serê xwe xûz bike, tu hêviyê jê mcke.
- 3460- Kesê şareza û jêhatî mû ji maran dikişîne.
- 3461- Kesê yewanî, bidê goştê canî, dawî poşmanî.
- 3462- Kesî bêkesan tune.
- 3463- Kesî bi destê camêran negirtiye.

- 3464- Kesî dinyayê bi xwe re nebiriye gorê.
- 3465- Kesî ku bi kêrî xelk û welatê xwe neyê, bi kêrî tu kesî nayê.
- 3466- Kesî ku carekê avarûyê wî teqiya, êdî şerm û heya nas nake.
- 3467- Kesî ku deve bikire, divê serderiyê xwe bilind bike.
- 3468- Kesî ku dê û bav nikaribe ew çêbike, dem ew çêdike.
- 3469- Kesî ku hevalê deveçiyar be, derbasê wî mezin dibe.
- 3470- Kesî ku ji keran bixeyîde, ji wan kertir e.
- 3471- Kesî ku ji teştê xwe têr nebe, ji mala xelkê têr nabe.
- 3472- Kesî ku ji fexfexê hez bike nezan e.
- 3473- Kesî ku ji yekê fêhm neke, ji sedî jî fam nake.
- 3474- Kesî ku ji xezalan bitirse, naçe nêçîrê.
- 3475- Kesî ku jin bîne, divê an tûrek pereyê wî hebe
an barek derewên wî.
- 3476- Kesî ku mirinê bibîne, bi nexweşiyê razî ye.
- 3477- Kesî ku têkeve dîlanê dê xwe bihejîne.
Çend varyantên din jî hene:
a) yê ku bikeve govendê dê xwe bihejîne.
b) mirov ku ket dîlanê divê xwe bihejîne...
- 3478- Kesî xêrê nayê dêrê.
- 3479- Kesî xizan û dewlemend tune;
xizanî û dewlemendî ji eqilê mirov e.
- 3480- Kesîb bi halê kesîb dizane.
Kurdên Serhedê di şûna gotina "xizan" an jî "feqîr" de gotina "kesîb"
bi kar tînin. Feqîr bi rewşa feqîr dizane. Yên dewlemend bi rewşa yên
feqîr nizanin.
- 3481- Kesîb ji tunebûnê diçe ku xwe bixinqîne,
dibîne, ku dewlemend li ben li ba dikeve.
- 3482- Kesîb here ba kaniyê kanî dimiçiqe.
- 3483- Kesîb ne li şînan e ne li şahîyan e.
- 3484- Keso keso carek bes o!
- 3485- Keşîş hînî kate bûye.
Dema kesekî hînî belaşiyê bibe û bixwaze biçêre, wê demê vê gotinê
dibêjin. Kurmanc curekê nanê rûn re "kate" dibêjin. Li herêma Pîranê
jî, bi zaravayê dimilî ji "hestî" re "kate" dibêjin.
- 3486- Ket xeberan ker da guran.
- 3487- Ket xeberan ma li deran.
- 3488- Ketî bi xebatê radibe.

- 3489- Kevanî bi mala xwe dizanî.
- 3490- Kevanî yan bêpar e yan sitemkar e.
- 3491- Kevanî timî bê par e.
- 3492- Kevaniya baş risqê diz û pisîka dibirin.
- 3493- Kevanî ya melun e ya mehrûm e.
 Ji kevaniyê re kebanî jî dibêjin. Di kurdî de tîpa “b” û ya “v” dikarin cîh biguhêrin.
- 3494- Kevaniya xêrnedî, keçika cîran dike diz.
- 3495- Kevaniya zexel nanê wê xav e
 û karê bêbextiyê nexek zirav e.
- 3496- Kevçiya hesinî, bi xwe pir pesinî.
- 3497- Kevir avête mêşê, zîyan gihand gamêşê.
- 3498- Kevir li ber dizan nexe.
Li hinek herêman weha jî dibêjin:
 a) keviran nexin bîra dizan.
 b) rê li ba dizan mexe.
- 3499- Kevir li cer ket an cer li kevir ket?
- 3500- Kevir li kew ket an kew li kevir ket?
- 3501- Kevir li kevir nexe, deng dermexe.
- 3502- Kevir navêje kûçikê xwe ji bo ku xelk jî navêje.
- 3503- Keviravêjên sêva sor pir in.
- 3504- Kevirê giran di cîhê xwe de ye.
 Li gelek deverên welêt weha jî dibêjin:
 a) kevirê giran, li quncik e.
 b) kevir li cîhê xwe giran e.
- 3505- Kevirê havînê bavêje kadînê.
Varyanteke din jî weha ye: Kevirê havînê bavêje kulînê.
- 3506- Kevirê ku bileqe keviz nagire.
- 3507- Kevirê mezin timî bi kevirê biçûk disekine.
- 3508- Kevirê mezin ne yê lêdanê ye.
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Kevirê mezin elametê ne lêxistinê ye.
- 3509- Kevirên xwe girêdidin, seyên xwe berdidin.
- 3510- Keviyê bilind ne hewceyê berfê ye.
 “Kevî” berpâlê çiyê ye. Li hinek herêman ji kevî re qerax jî dibêjin.
- 3511- Kevjal nikarin bifirin.
- 3512- Kevjalê çima tu weha xwar diçî?
Got: Ez hewqas dikarim.

3513- Kevroşk çiqas bireve, hewqas ditele.

3514- Kevroşk ji çiya natirse.

3515- Kevroşk jî carnan ji çiyê dixeyîde.

3516- Kevroşka mê û nêr, mirovê xurt dizane.

3517- Kew bi zimanê kewê dizane.

3518- Kew heke kew e, bila li pêş kewê bixwîne.

3519- Kew li dar ket, ne ku dar li kew ket!

3520- Kew li rûyê kewê dixwîne.

3521- Kew neyarê eslê xwe ye.

Ev gotina pêşîyan ji bo kesên xayîn tê gotin. Kesên ku li dij nîjad û nete weyên xwe ne. *Li hinek herêman weha jî dibêjin:*

a) kew ji eslê xwe re xayîn e.

b) kewê gozel dijminê qewnê xwe ne.

3522- Kewêş xwarina hêtûnê ye, hêtûn jî maka kilsê ye.

3523- Kewê çê di qefesê de kifş e.

3524- Kewê çê kewan li xwe dicivîne.

3525- Kewê ku kire qire-qir, kes nikare têkeve kir.

3526- Kewê rêl li kû xweş e?

Got: Cîhê ku ez lê bûme ferx.

Gotina "ferx" di şûna gotina "çêlik" an "çêle" de ye. Yanî ew cîhê ku ez biçûkiya xwe de li wir bûm xweş e.

3527- Kewên lîsandî wekî kelandî.

3528- Keys bû keys, dê Gago bibe reîs.

3529- Keysa te ku hat fersend û xebat.

3530- Kezeb gurê har e, ne eyb e û ne ar e!

3531- Kezeba gurê har e ne dibe ar û ne dibe sar e.

3532- Kezeba mîhê para şivan e.

3533- Kezeba xwe bavêje neqebê, sê siwar tên bi xezebê.

3534- Kezî rewşa qîzan e, simêl rewşa lawan e.

3535- Kê bi re kê, kê kire kê!

3536

- Kê çavê te derxist?

- Mirovê min.

- Loma weha kûr derxist.

3537

- Kê dinyayê dot?

- Yê ku stand û firot.
- 3538
- Kê dinyayê xwar?
- Yê bazirganê xwedîkar.
- 3539
- Kê dinyayê xwar?
- Yê bêfedî.
- 3540- Kê dîtîye, kalê bi guhar,
pîra ling xirxal,
zivistana du bihar?
- 3541- Kê gotîye dizo malîava!
- 3542
- Kê keç kire xatûn?
- Dê
- Kê keç kire darqûn?
- Dîsa dê.
- 3543
- Kê ketî rakir?
- Xwedîyan.
- 3544- Kê kir, ew têr e.
- 3545- Kê kir, ew dê bixwe.
- 3546- Kê kir û kê xwar!
- 3547- Kê kir, kê nekir, sêwiyê bêar kir.
- 3548- Kê lingê xwe kir zengûyê, xwcdiyê hespê ew e.
- 3549
- Kê mirî rakirin?
- Mazûlvanan.
- 3550
- Kê nexweş rakirin?
- Serdanan.
- 3551
- Kê nesaxî hiland?
- Yê cixare kişand.
- 3552
- Kê nexweş rakir?
- Yê ku pîrs kir.
- 3553- Kê rûn xwar û av vexwar, ew mir;
kê goşt xwar û av vexwar, ew bir.
- 3554

- Kê tir kir?
- Xerîbê gund kir!
- Li hinek deveran weha jî dibêjin:*
 - a) -kê tir kir? -Pîra gund tir kir.
 - b) -kê tir kir? -Sêwiya bê dê û bav tir kir.
- 3555- Kê tirşikê dixwe, ew govendê digire.
- 3556- Kê seh kir, kê xwendiyê.
- 3557
 - Kê vegerand mirî?
 - Yê dilkirî.
- 3558- Kêç bikeve destê koran saxbûna wê nîn e.
- 3559- Kêf li Ereban nayê.
- 3560- Kêfa me bi Xunafê xweş bû, wê jî kurekî mirî anî.
- 3561- Kêfa mirov li mirinê nayê.
- 3562- Kêla manan tije nabe.
- 3563- Kêm kêm bixwe lê hertim bixwe.
- 3564- Kêr dermanê gayê nêr e.
- 3565- Kêr di kalan de zingar dibe.
- 3566- Kêr heta tûj dibe, gelek çakûçan dixwe.
- 3567- Kêr nîşana mêr.
- 3568- Kêr ji birînê dertê lê şopa wî dimîne.
- 3569- Kêr pîrbêjekan jê kiriye.
- 3570- Kêra mezin ji şerman dibire.
- 3571- Kêrhatiyên ji kêrnehatiyên biparêze.
- 3572- Kihêl di bin mêrxasan de dibezin.
- 3573- Kîlambêj ku dest dide ba guhê xwe dizane çi bêje.
- 3574- Kîlîta dev parî ye.
- 3575- Kîlîta dilan xelata destan.
- 3576- Kînc li ber siyê nayê raxistin.
- 3577- Kîncê baş rewşa dinê ye.
- 3578- Kîncê ku ket ber pînan,
serê ku ket ber şîretan,
bi kêrî tiştêkî nayê.
- 3579- Kînik e, binerdik e.
Mirovê kînik zikreş in.
- 3580- Kînik ji malan re, dirêj ji şalan re.
Weha jî dibêjin: Kînik im ji malê re, dirêj im ji şalê re.

- 3581- Kirasê min şahr e, xwarina min jehr e.
- 3582- Kirasê mirov diqete, eslê mirov naqete.
- 3583- Kirasê mirov tê guhartin, xûyê mirov nayê guhartin.
- 3584- Kirasê wî spî ye, sabûna wî bi deyn e.
- 3585- Kirêçî mîna qereçî ye.
- 3586- Kirin heta kirinê, gotin heta gotinê heye.
- 3587- Kirinek ji hezar gotinê çêtir e.
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Kirinck hêjayî hezar gotinê ye.
- 3588- Kirinên kiryanan namûs a xatûnan.
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Kirê kirana namûs a xatûnan e.
- 3589- Kirîn û firotin dinyayê sotin.
- 3590- Kirîn û firotinê bi mirovê xwe re neke,
dilê wan ji xwe meke.
- 3591- Kirîv pêl li doşeka kirîv nake.
- 3592- Kirîvatî bi du serîyan.
- 3593- Kirîvatî bi rastî.
- 3594- Kiştên bê fiştên nîn e.
Ev jî wek gotina "cîhê ku agir li wir tune be, dûman jê dernakeve" ye.
- 3595- Kitêba mirovan paşbendî tê xwendin.
- 3596- Kitik ne li mal e, mişk bi qubale.
Li herêmên Bahdînan û Soran ji pisîkê re "kitik" jî dibêjin.
- 3597- Kitik ne li mal e, navê mişk Evdirehman e.
- 3598- Kitkê hingî hilavêjî dê li ser lingên xwe bisekine.
Weha jî dibêjin: Pisîkê çiqas bavêjî, dîsa li ser lingê xwe disekine.
- 3599- Kitkên zemîn dûngên qelew dixwin.
- 3600- Kî berdêlî tîne, ew bêhiş û dîn e.
- 3601- Kî bi lezkeve dê bi paşkeve.
- 3602- Kî bi wefa ye ew bav û bira ye.
Li hinek herêman weha dibêjin: Kî wefa ye, ew bira ye.
- 3603- Kî bûk e, ew berbûk e.
- 3604- Kî çî dike bi xwe dike.
- 3605- Kî çî bike ji bo xwe dike.
- 3606- Kî dere mizgeftê ew ne ewlîya ye.
- 3607- Kî dew bifroşe, ew xwedî pez e.
- 3608- Kî dê û bavê xwe ji bîr bike, Xwedê jî wî ji bîr dike.
- 3609- Kî dibêje: Were kar, li dilê min dibe azar,
kî dibêje: Were taştê, li dilê min xweş tê.

3610- Kî dike û kî dixwe?

3611- Kî diwêre bêje şêr "bîhn ji devê te tê."

3612- Kî dixwe û kî li serê xwe dike?

Weha jî dibêjin: Hin dixwin û hin li serê xwe dikin.

3613- Kî diya min mehr bike, ew bavê min e.

3614- Kî hêviya yarê maye, bê jin maye.

3615- Kî ku kar nake, bê eqîl û gêj e; bila nan nexwe kitêb dibêje.

3616- Kî li du riyên dinêre şaş diçe.

Varyanteke din jî weha ye: Kî li du riyên dihere, şaş der tê.

3617- Kî li nîvê rê vegere, nabe poşman.

3618- Kî nanekî li malê zêde bike, xwediyê malê ew e.

3619- Kî nexebite, ew nizane hêsbûn çî ye.

3620- Kî ne mîlet e, îlet e.

3621- Kî pir bi lez ket, ew li paş ket.

3622- Kî qazî ye, ji xwe razî ye.

Li hinek deveran weha jî dibêjin: Qazî ye û ji xwe razî ye.

3623- Kî qedrê mezinan digire, qedrê Xwedê digire.

3624- Kî şoşban e, ew poşman e.

3625- Kî xal e, ew heval e.

3626- Kî xweş e, ew baş e.

3627- Kîjan tiliya xwe jêbikî, dê bêşe.

3628- "K.." bi keran ve jî heye û bi zilaman ve jî heye.

3629- "K.."ê min rabû, bû mîrê min.

3630- Koç li benda pîrê ma, pîrê hat û guhneda koçê.

3631- Koçer ku bavê wan kal dibê, dişînin ber karikan.

3632- Koçer nabêje dewê min tirş e.

3633- Koda zêrîn çûye bi dû kevçiya darîn ketiye.

3634- Koda tijî li ya vala nexe.

3635- Kokana berxan li ber devê qula gur girêdide.

3636- Kolan tu caran nakevî ser banan.

3637- Komêk bênamûs nake bi seriyek pîvaz.

3638- Komêk xizan, seriyek çortan.

3639- Kon bê kozî nabe.

3640- Konê bê rîşî ji konan der e.

3641- Konê mêran li hember in.

3642- Konê reş bênamûsiyê qebûl nake.

Weha jî dibêjin: Konê reş kêmaniyê qebûl nake.

3643- Kor bêbext in.

3644

- Kor çî dixwaze?

- Çavekî ron, pariyeke bi don.

Du varyantên weha jî hene:

a) got koro tu çî divêyî? Got: Çavekî sax û pariyeke bi don.

b) got: Çavekî ronî û girareke têrrûn.

3645- Kor çawa li Xwedê dinêre, Xwedê jî weha lê dinêre.

3646- Kor dimirin, çavzêrînî dibin.

3647- Kor ji kor re got: Mit di çavê te de ye.

3648- Kor korê Xwedê ne, nîvkor emelê dinê ne.

3649- Kor ku bi destê kor bigire dê bikeve çalê.

3650- Kor nehs in, keçel behs in.

3651- Koremişk çiqas axê bikole, hewqas bi ser xwe re davêje.

3652- Korê bê dar, kalê bê zar, herdu jî yek in.

3653- Koro rîya xanê dîtiye.

3654- Kose bê rîh û bê soz e.

3655- Kose çû ku rih berda, simêl jî li ser da.

3656- Kotek dizane, qonax kanê.

3657- Kotek ji cenetê derketiye.

3658- Koxa pîrê çêtir e ji Birca Mîrê Cizîrê.

Weha jî dibêjin: Konê pîrê xweştir e, ji Burca Mîrê Cizîrê.

3659- Ku bayê sibê mirov nebizdîne, tîrsa bayê şevê namîne.

3660- Ku bextê sêwiyan hebûyan bavê wan zû nedimiran.

3661- Ku bê çengê min dê tu bibînî rengê min.

3662- Ku bi hirî bûya dê li nav kerî bûya.

3663- Ku cotyar ji çûkan bitirsiyan,

to vê garis nedavêt nav zeviyan.

3664- Ku çira vemire, kor çî jê ye?

3665- Ku der bi av be, ava ye.

3666- Ku der kar e, ew war e.

3667- Ku dev bi derd e, kevir bi ser de.

3668- Ku dil hebe, cîh fireh e.

3669- Ku du lihevxin dê yek bikeve.

3670- Ku eqil tune be dê porê spî çî bike.

- 3671- Ku hebe dixwe, tune be dua dike.
- 3672- Ku kela şorbê here, êdî hesk nake pênc pere.
Weha jî dibêjin: Ku kela şorbê çû, bihayê keskê bi perek e.
- 3673- Ku ker ji afirê deve bixwe dê pişta wî xwar bibe.
- 3674- Ku ker ket terî li xwedî ye.
- 3675- Ku kes tune be, kumê xwe dayne û pê bişêwire.
- 3676- Ku malxoyê me Silo be dê xwarina me çilo be?
- 3677- Ku mar pak bûya, lingên wî nediketin zik.
- 3678- Ku mirin hat li kal û ciwaniyê napirse.
- 3679- Ku mirov av nede dar, dar hişk dibe.
- 3680- Ku mirov bide du qatiran, divê tehmûl bike fîs û tiran.
- 3681- Ku mirov bizaniba kengê dimire
 dê gora xwe bikola û qarqara xwe amade bikira.
- 3682- Ku mirov da navê çî lo çogê çî li navê.
- 3683- Ku mirov ket her kes piyê xwe dide ser mirov.
- 3684- Ku mirov tiştan ji bîr neke dê dîn bibe.
- 3685- Ku mirov xeraban nebîne, başan bi bîr nayîne.
- 3686- Ku ne ji gelacan be dê gur bi mîh re biçêriba.
Varyanteke weha jî heye: Ku ji ne gelacan be dê rovî çûba sûkê.
- 3687- Ku pîs û zirz be bila ne li destê min be,
 bila li aliyê dijmin be.
- 3688- Ku rima te şikest, darê wê neşewitîne.
- 3689- Ku riya kur (law) dirêj bû tu ya xwe kur ke.
- 3690- Ku roj ber bi ava ve çû, êdî nema vedigere.
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Roja ku çû ava êdî bi paş ve venagere.
- 3691- Ku rovî şil bibe êdî ji baranê natirse.
- 3692- Ku serê werîs kin bû êdî nagîhe te.
- 3693- Ku serî hebin kum zehf in.
- 3694- Ku te ji kesekî hez kir kevir navêje seyê wî.
- 3695- Ku te mar kuşt serî lê bipelxîne.
- 3696- Ku te nifir li yekî kir, bêje "jina te bimire an tu du jin bînî."
- 3697- Ku te xwelî li serê xwe kir, bila germ be.
- 3698- Ku te zarok şand cîhekê, bi dû de here.
- 3699- Ku tu bibî hesp dê siwarên te zehf bin.
- 3700- Ku tu çûyî civatê li cîhek rûne, ku te ranekin ji cîhê te.

- 3701- Ku tu çûyî mala mêrê xwe,
ji bîr meke xeyseta mala bavê xwe.
- 3702- Ku tu gehîştî koran, tifke erdê û bi wan re here wek rewan.
- 3703- Ku tu nanek nedî se dê tu pezek bidî gur.
- 3704- Ku tu ne melevan bî mekeve avê.
- 3705- Ku tu nimêjker bî rojên încê pir in.
- 3706- Ku Xwedê bêje "erê" êdî kes nikare pêş lê bigire.
- 3707- Ku Xwdê bêje "erê" em dê hev bibînin ser bêderê.
- 3708- Ku Xwedê bide, evd nikare bistîne.
- 3709- Ku Xwedê bide, ji xet û nîvê ve dide.
- 3710- Ku xwediyê aşê dev ji aşê berde, ma dê qeraş çi bike?
- 3711- Ku zik neêşe, dev navêje.
- 3712- Ku zira ker hat kes nikare pêş lê bigire.
- 3713- Kubarî ji gayê cot re jî namîne.
- 3714- Kubarî mirov hildikişîne banî,
pozbilindî mirov dadixe binê xanî.
- 3715- Kul dibin bizûz û dikevîne mirovan.
- 3716- Kul hate malê, dê sê mirov bibe, hemûyan li çavên xulam nihêrîn:
Xulam got: Yek ez lê herduyên mayî kî ne?
- 3717- Kul heye kul reş heye.
- 3718- Kul ji bo mirovan e ne ji bo çiya û baniyan e.
- 3719- Kul kete malê hemûyan li çavên rencber nêhrîn.
- 3720- Kul li dilan e, xeftanî li milan e.
- 3721- Kul li mirovê baş digere.
- 3722- Kul û keser nîvê emrê mirov e.
- 3723- Kul û keser mirov ji însanetiyê dikin der.
- 3724- Kul û kor vehewiya li dukana Evdilor.
- 3725- Kula aşvan jî aş e.
- 3726- Kula Mendo kilor in û kula aşvan jî aş e.
- 3727- Kula kezebê bi dê re diçe gorê.
Li hinek herêman weha jî dibêjin: Dê bi kula kezebê diçe gorê.
- 3728- Kula kûr, çav li riya dûr.
- 3729- Kula pêşî her rij e.
- 3730- Kula pisîkan di dilê se de ye.
- 3731- Kula qîzê tim li dilê dê.
- 3732- Kula se di zikê gur de ye.

- 3733- Kulek bêdû nabe.
- 3734- Kulek para diz û guran in.
- 3735- Kulfet kul e.
- 3736- Kulfet ku heye parsûyê xwar e.
Li vir kulfet di wateya jin de ye.
- 3737- Kulfet şûrê dudev e li pišta mêr e.
- 3738- Kulfetên malê birçîbin, xêr jê naçe.
- 3739- Kulê kovanê, mijê dûmanê,
kêzika reş xwe daye rex mircanê.
- 3740- Kulên xelkê tên ji çol û çiyar,
yên min tên ji ber piyan.
- 3741- Kulîçê sersalê, mirî hate malê.
- 3742- Kulîlka min ji Berfo ye
û golika min jî ji Berfo ye.
- 3743- Kum hebin paçik zehf in.
- 3744- Kumê dînan didin serê dînan.
- 3745- Kumê dînan tim qul e.
- 3746- Kumê mezin û serê vala.
- 3747- Kumê qetî nede serê xwe.
- 3748- Kumê rastan tim qetiyayî ye.
- 3749- Kumê rastiye xwar e.
- 3750- Kumê Tûto li serê Nûto.
Li hinek deveran weha jî dibêjin:
Kumê Xelo dide serê Celo, yê Celo jî dide serê Xelo.
- 3751- Kumê xwe li serê xwe bigire.
- 3752- Kund û baz birayê hev in.
- 3753- Kund dibêje:
Ez hewqas im
û eqilê min jî hewqas e.
- 3754- Kundek xerab dike gundek.
- 3755- Kundir nabe selete.
- 3756- Kurdî halê xwe werdî.
- 3757- Kur be, bila bi kurr be.
- 3758- Kur darê bavê hiltîne, qîz teşîya dayikê.
- 3759- Kur darê li pişt bavê ye,
qîz warê xelkê ye.
- 3760- Kur deriyê malê ye.

- 3761- Kur dîwarê hundir in,
qîz dîwarê derve ne.
- 3762- Kur gûz in nevî kakil û gûz in.
- 3763- Kur heye gula bavê xwe ye,
kur heye kula bavê xwe ye.
- 3764- Kur heye û kurr heye.
- 3765- Kur ji hinavê bira ji bavê.
- 3766- Kur li bavê û keç jî li dê diçin.
- 3767- Kur mezin bû xem mezin bû.
- 3768- Kur sê ne:
- kurê ji bavê çêtir, gul li ser,
- kurê wek bav, ser bi ser,
- kurê ji bavê pîstir, gû li ser.
- 3769- Kurd dibêjin: bila
Xwedê pêşî li heftê miletî bê rehmê
û piştir li me bê rehmê.
- 3770- Kurd dilsoz û bextewar e
lê ji bîyaniyan re ne ji xwe re.
- 3771- Kurd ji hev re hêgîn in lê ne ji neyar re.
- 3772- Kurd şêrê çiya ne,
her mêrekî bi sed mêran e.
- 3773- Kurê baş birayê bavê xwe ye.
- 3774- Kurê bêwar çav li der e.
- 3775- Kurê bira nabin bira.
- 3776- Kurê çak ji malbatê re dostan yê ne çak neyaran çar dikin.
Gotina "çak" bi soranî ye û di şûna gotina "baş" û "rind" de ye.
- 3777- Kurê çê navê bavê xerab bilind dike.
- 3778- Kurê guran ji mirovan re nabin bav û bira.
Varyanteke weha jî heye: Çêlikên maran bê jehr nabin.
- 3779- Kurê jinebîyê jê nêke tu hêviyê.
- 3780- Kurê kerê her ker e.
- 3781- Kurê mezin derdê malê ye, kurê biçûk delalê malê ye.
- 3782- Kurê mêrxas li bavan diçin.
- 3783- Kurê qenc deynê bavê xwe dide,
yê xerab mala bavê xwe xerab dike.
- 3784- Kurê xerab talana bavê xwe ye.
- 3785- Kuriyê kerê li ba diya xwe dibeze.

3786- Kurkê Memê qebe ye tişteke di bin de heye.

Ev ji bûyera Mem û Zînê tê. Dema xelk tê, Mem bi lezûbez Zînê di bin

kurtê xwe de vedişêre.

3787- Kurm û kêzikên newalan bûne kevaniyên malan.

3788- Kurmanc bê dar nabe.

3789- Kurmanc birçî ye, xew jê re çî ye?

3790- Kurmanc dema têr dixwe yan jin direvîne yan mêr dikuje.

3791- Kurmanc deynê xwe ne înkâr dikin û ne jî didin.

3792- Kurmanc dibêjin:

Min dinya tev hilanî û danî, pîrî hat û çû ciwanî, temen çû bi hêsanî;
paşî min tişteke jê negirt û min neanî.

3793- Kurmanc dîn e, helaw şîrîn e.

Weha jî tê gotin: Helaw şîrîn e, kurmanc dîne.

3794- Kurmanc ker e, hingî rûne rê li ber e.

3795- Kurmanc ku bêje "nîn e", nîn e;

ku bêje "belê" dê bike ku serî wî jî tê here.

3796- Kurmanc têr dixwe li pêlava xwe dinêre.

3797- Kurmanc têr e, xew jê re xêr e.

3798- Kurmancê têrxwarî, filehê meyxwarî.

3799- Kurmê cixarê pîs e.

3800- Kurmê darê ne ji darê be, zewala darê tune.

Li hinek deveran weha jî dibêjin:

a) kurme darê ne ji darê be dar pûç nabe.

b) kurme darê ji darê ye.

3801- Kurmê şîrî heta pîrî.

Weha jî dibêjin: xuyê şîrî heta pîrî.

3802- Kurn bi te re me, şerbik tu guhdar be.

3803

- Kuro tu ji kû yî?

Got: Hîn ez nezewicî me.

3804- Kurtan yê keran e, zîn yê hespan e.

3805- Kurtik çûx e, dew tune vexwe.

Li hinek herêmên welêt weha jî dibêjin:

a) kurtikî çox e, nan tune bixwe.

b) dew tune firke lê li hespê siwar dibe çer dike.

3806- Kurtepis mala Rojkan xirab dike.

3807- Kuştin bi destê gura ye, xwarin li firinda ye.

- Kurd ji hemû teyr û çûkan re "firinde" dibêjin.
- 3808- Kuştin heye, lê reva mêran tune ye.
- 3809- Kuştina mêran e, xeta jinan e.
- 3810- Kute-kut malê kor dike.
- 3811- Kûçik bi qusandinê nabe mîh.
Varyanteke weha jî heye: Kûçik çiqas biqusînî jî dîsa nabe tajî.
- 3812- Kûçik bi kurman namire.
- 3813- Kûçik bi kûçik tê xeniqandin.
- 3814- Kûçik bi xwediyê xwe nagire.
- 3815- Kûçik çî dixwe wî dirî.
- 3816- Kûçik çiqas nas be dîsa dar ji destê xwe navêje.
- 3817- Kûçik dev ji kûçiktiya xwe bernade.
- 3818- Kûçik goştê kûçik naxwe.
- 3819- Kûçik ha sor ha spî.
- 3820- Kûçik hestî dixwe hay ji qûna xwe tune.
- 3821- Kûçik ji kê bitirse, bi wî aliyê ve direyî.
- 3822- Kûçik, kûçik e bêxwedî nabe.
- 3923- Kûçik ku kûçik e, bi xwediyê xwe re sadiq e.
- 3824- Kûçik li ber siya dîwar ket, digot "siya min çiqas mezin e"
- 3925- Kûçik li kû nan dixwe, li wir diewte.
- 3826- Kûçik pê li teriya kûçik nake.
- 3827- Kûçik xwediyê xwe nas dike.
- 3828- Kûçikê birçî gûyê xwediyê xwe dixwe.
- 3829- Kûçikê diranketî li ser qûnê dikûze.
- 3830- Kûçikê hewt-hewto mêvanê bêwext tîne.
- 3831- Kûçikê ku biewite nadire.
- 3832- Kûçikê malê helal e.
- 3833- Kûçikê me ye lê li ber deriyê xelkê direyî.
Varyanteke weha heye: Kerê me di axura xelkê de dizire.
- 3834- Kûçikê mirov hêrisê mala mirov e.
- 3835- Kûçikê mirovê xwe, bi xelkê xerîb mede.
- 3836- Kûçikê mîran bê nan û bê av in.
- 3837- Kûçikê pîs gur tîne pez.
- 3838- Kûçikê xelkê ji xelkê re hîzan tîne,
 yê min ji min re daw û dozan tîne.

3839- Kûçiktiya san, ne kûçiktiya biran.

3840- Kûsî hêkên xwe dixê bin axê û dibêje:

Ku ji Xwedê re bibe dê derxe.

3841- Kûsî ji qalikê xwe derdikeve lê qalikê xwe naecbîne.

Weha jî dibêjin: Kûsî ji qalikê xwe dertê û tû dike qalikê xwe.

3842- Kûsî li delava xezalan av venaxwin.

3843- Kûsî têt ax naxwe.

3844- Kûsiyên kendalan xwe dikin hember xezalan.

3845- Lanê şêr bê hestî namîne.

Lan, di wateya qulik an cîh de ye.

3846- Lawê derewîn dixwe carek firavîn.

Varyanteke weha jî heye: Derewîn dixwin carek firavîn.

3847- Lawê mencê çû qezencê.

3848- Lawikê Cebexçûrî nabe Stanbolî.

Di van salên dawî de, vê gotinê weha guhaztine: Lawikê Bîngolî nabe Stanbolî.

3849- Lawikê min çû seferê dîsa hat kerê berê.

3850- Lawikê Qureyşî kes nîne pişt neyîşî

belê xîret û namûs dikêşî.

3851- Layîqê nîskê nanê ceh e.

3852- Lehî diçe sêl dimîne,

şêr dimire çerm dimîne,

mêr dimire nav dimîne.

3853- Lehî her roj qotikan nayîne.

3854- Lelîxan e xwediyê kirinên giran e.

3855- Lep hilanîn feraca xêrê ye.

Weha jî dibêjin: Desthilanîn nîşana xêrê ye.

4856- Lepê te çavê rojê nagire.

3857- Lewra şikestiyê ku xwar bicebire.

3858- Lê tê dibêjin "jê tê," lê nayê dibêjin "jê nayê."

3859- Lêhatin ji jêhatinê çêtir e.

3860- Lêv ji diranan pêştir e.

Weha jî dibêjin: Lêv ji diranan pêşdetir in.

3861- Lêxistina pit, girî qelb dike.

3862- Liba girs di gewriyê de dimîne.

3863- Licî neçin tu cîh ku çûn malê li mirov dikin du cîh.

Navçeya Licê li herêma çiyayî ye û ji bo çandiniyê axa wê gelek kêr e û têra xelkê nake. Ji ber vê yekê ji berê ve Licî bi destpêka biharê re li herêmên Kurdistanê yên din belav dibûn û li wan deran bi mehan kar dikirin û payizan jî vedigeriyan mala xwe. Bi pîranî Licî diçûn herêma Serhedê. Li wir serdestî li xelkê herêmê dikirin û di danûstandinên xwe de xelkê dixapandin.

3864- Li aliyekî şîn e, li aliyekî şahî ye.

- 3865- Li aliyekî berf û li aliyekî baran e.
- 3866- Li ba derewînan warê koçeran reş e.
- 3867- Li ba goristanan raneze li ba şîniyîn razc!
- 3868- Li ba hesinkeran raneweste çîkên agir napekine te.
- 3869- Li bejnê nihêrî, bi zêran kirî laçek rakir kertikê gurî.
- 3870- Li bejn û balan seyr meke li rêz û gotinan meyze ke.
- 3871- Li ber agirê nemerdan rûnene.
- 3872- Li ber bûka beravêtî nakeve,
li ber mankerâ ku cewî anî şabû.
- 3873- Li ber çem kanî çênabc.
- 3874- Li ber çavê mişk pisîk bi qasî deve ye.
- 3875- Li ber defa herkesî govend negire.
Weha jî dibêjin: Li ber defa herkesî xwe hilmede.
- 3876- Li ber defê tût e tût e lê mal ji ber mişkan rût e.
- 3877- Li ber deriyê min dan dixwe, li ber deriyê xelkê hêkan dike.
Varyanteke weha jî heye: Li ber deriyê min qût dixwe lê ji xelkê re hêkan dike.
- 3878- Li ber deriyê min nan dixwe lê li ber deriyê xelkê diewite.
- 3879- Li ber devê nakeve li ber kêçê dikeve.
- 2880- Li ber golan damiçkînê bax,
xelkê bêesil meke çirax,
şixulê ku çû mebêje ax.
- 3881- Li ber goştê mîhê nakeve li ber ser û piyan dikeve.
- 3882- Li ber kêlên goristanê pesin nayê dayîn.
- 3883- Li ber merdan merd dixuye hûr
li ber nemerdan nemerd dixuye şûr.
- 3884- Li ber mirinê radiket li ber tayê re here.
- 3885- Li ber rez nakeve li ber gûşiya tiriye dikeve.
- 3886- Li ber şîya şêr be bila şêr te bixwe.
- 3887- Li ber şêr kes nikare destê xwe bide simêlê xwe.
- 3888- Li ber xwe binêre da stûyê te neşike.
- 3889- Li Bexdayê xurme zehf in lê ji me re çi?
- 3890- Li ber ziman ne çiya hene ne gelî.
- 3891- Li bin sîha daran sêv nakevin devan.
Weha jî dibêjin: Di bin sîka daran de, sêv nakevin devan de.
- 3892- Li bûkê binêre, qelind bibire.
- 3893- Li cem bêaran her bihar e.

3894- Li cem Cihûyan nan bixwe li cem Filehan raze.

Weha jî dibêjin: Li mala cihuyan bixwe û li mala filchan raze.

3895- Li cîhê bav û bapîran qizwan xweştirin ji hêjîran.

3896- Li cîhê bê xwedî rûne û li yê bê mezin rûnene.

3897- Li cîhê ku hêvî hebe jiyan heye.

3898- Li cîhê nizim qûç xwe çiya dihesbînin.

3899- Li deriyê kesî nexe bi tilîkan.

bila kes li deriyê te nexe bi mîrkutan.

3900- Li deryan gemî, li deştan zêrzemî,

derdê min mirovê demdemî.

3901- Li dinê Wan, li axiretê îman.

Wek tê zanîn Tirkan vê gotina pêşiyar a kurdî jî dizîne û li gor zimanê xwe dibêjin. Dagîrker bi tenê stran û çîrokên kudî nedizîne, herweha ew di hemû beşên folklorê dizê çanda Kurdî ne.

3902- Li dîwar mişk hene li mişk guh hene.

3903- Li dû rastiye rizgarî ye.

3904- Li dû tariyê ronahî ye.

3905- Li gel dizan neçe kozan.

3906- Li gel neyaran neçe beyaran.

3907- Li gor makê golik pak e.

3908- Li her sûkekê bazarekê heye.

3909- Li her welatekî malekê xwe çêke.

3910- Li hespê dinêrin li gor wê ceh didinê.

3911- Li jina xwe hêcetê dibêje:

Çima tu qûna xwe li ber bêjîngê dihejînî?

3912- Li kû der bû, li kû zer bû!

3913- Li kû derê hebe nan û dew li wir derew.

3914- Li kû derê komek li wê derê kedek.

3915- Li kû derê leş li wê derê qijik,

li kû derê mirî li wê derê mele.

3916- Li kû derê mirov bêşe, can li wir e.

3917- Li kû derê nan e, li wê derê wetan e.

3918- Li kû derê tav e, li wê derê kurkê xwe radixe.

3919- Li kû derê westiyayî rûne.

3920- Li kû derê xwar e, li wê derê ji min re war e.

3921- Li kû derê yekîfî li wê derê risq.

- 3922- Li kû zirne be li wir dê govend hebe.
- 3923- Li mala bavê nexş û tevn çêdikir, li mala mêr tev ji bîr kir.
- 3924- Li mala bûkê def û zirne, mala zavê hay jê tune.
- 3925- Li malê şêr e li der ve pisîk e.
- 3926- Li malê tune arvanok navê jinê Dînanok.
- 3927- Li me bibc bihar em dê tehta ber malê bikin xiyar.
- 3928- Li melê bangdan e.
- 3929- Li meydanê bisekinê bila şêr te bixwe
lê mekevc teldê rovî ku tu xelas bibî.
Ev jî wek gotina "Li ber siya şêr be bila şêr te bixwe" ye.
- 3930- Li meydanê mîr û mirtib yek in.
- 3931- Li mexelê pişkul tune, li pirêzê deve tune.
- 3932- Li min û li girê Eradê, genim û ceh hatin ber seradê
heta dilê dê nekeve zavê, dotê nadê.
- 3933- Li nav malê şêr e, li nav êlê kitika bêkêr e.
Kurd ji pisîkê re kitik jî dibêjin.
- 3934- Li nav mêran mêr be li nav şêran şêr be.
- 3935- Li navê rûdine ji qeraxê dixwe.
- 3936- Li oda xal û xwarzê ye şerê ap û birazê ye.
- 3937- Li paşiyê başî hebûya dê li paşiya pez ker tunebûya.
- 3938- Li pey mirî kesî xwe nekuştî ye.
Weha jî dibêjin: Li pey mirî kes çavê xwe dernaxe.
- 3939- Li pey paşê mirov dijmînê paşê dide.
Li devera Licê wek Soranan ji "çêr" re "dijmîn" dibêjin.
- 3940- Li pey tengasiyan tim firehî ye.
- 3941- Li pê be, li dîyarê gorê he!
- 3942- Li pêş diçe, dibêjin "bîj e," li paş diçe dibêjin "gêj e."
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Li pêş diçin dibêjin "zû," li paş dimîne, dibêjin "dereng e."
- 3943- Li pêş ziman ne dîwar in ne dîyar in.
- 3944- Li pêşiya malê xişt û pişt li paşiya malê rîx hişt.
- 3945- Li qûnê bidin derman e, li piştê bidin zîyan e.
- 3946- Li şûna şêran mane roviyê şikêran.
- 3947- Li qunca germ dide xeberdanên nerm.
- 3948- Li rastiyê rehme dibare.
- 3949- Li rengê titûn û mêran nenêre!
- 3950- Li riya here bila dûr be

li buriya here bila kûr be
keç bîne bila pîr be.

3951- Li rû binêre mirovê xwe binase.

3952- Li ser bextê keçan rûncnin.

3953- Li ser darekî du mêwe nabin.

3954- Li ser darê tune dawêşîne li bin darê tune berhev bike.

3955- Li ser hemû riyan kanî tune.

3956- Li ser hemû riyan xan nayên çêkirin.

3957- Li ser mirî nekin girî.

3958- Li ser qeşa hêle hêl neke ya pîs bi hevalê xwe neke,
dê bê pêşiya te ji bîr neke.

3959- Li ser û sosinan, li destan û bazinan,
Xwedê ji hinekan distîne û dide hinekên dinan.

3960- Li serê çiyê şêr hene, li binê çiyê rovî hene.

3961- Li şûna gulan şîn dibin şîlan.

3962- Li şûna şêran dixwînin kundên şikêran.

3963- Li şûna şêran rovî dikin gêran.

3964- Li taxa koran mirekan mefroşe.

Kurmanc ji mirekê re "eynik" û soran jî "awênc" dibêjin.

3965- Li te cehd li Xwedê mirad.

Weha jî dibêjin: Li te ehd li Xwdê mirad.

3966- Li te xweş tê, li min xweş tê, ev çi ard e li teştê?

3967- Li te xweş tê lê li min beş tê.

3968- Li tebîetê bi şîrî li siwarê tê hêlan.

3969- Li tiştê bihurtî meke ax,
li her golan meke bax,
li pîsan meke çirax.

3970- Li warê bê av daneyne.

3971- Li Xwedê dinêrin hespan nal dikin.

3972- Li zik xist got: "ax pišta min."

3973- Li zozanan berf dibere,
li beriyê dest û ling diqerisin.

3974- Ling bûn çar jehr het hal.

Zewac bela ye, ku mirov zewicî êdî ne bi serê xwe ye.

3975- Ling mirov digerînin heta diqurmînin.

3976- Ligan nexe sola teng.

3977- Lingê bi sir nede ber agir.

- 3978- Lingê gerê nayê bin berê.
- 3979- Lingê gerê nayê ber kerê.
- 3980- Lingê hînê gerê bû,
 devê hînê virê bû,
 destê hînê diziyê bû,
 qûna hînê tirê bû,
 êdî ra li wan nabe.
- 3981- Lingê pêxwas li ber deriyê goçkaran e.
 Weha jî dibêjin: Lingê pêxwas li ber derê solbendan e.
- 3982- Lingê xwe li gor pelasa bavê xwe dirêj bike.
 Di şûna gotina "pelas" de "kilîm", "ber" an jî "doşek" bi kar tînin.
- 3983- Liva xwazî liva reş divê.
- 3984- Lîstika dînan li ber tava hîvê tê.
- 3985- Lîstika zarokan ji dil e.
- 3986- Lîstina pisîkê mirina mişk e.
- 3987- Lîstin li gayê pîr nayê.
- 3988- Loma berf tê, xatirê lingê biçûkê biqerise.
- 3989- Loma yan rû ye yan jî li dû ye.
- 3990- Lome dibin gome.
- 3991- Lomên xelkê ji ezabê gorê xweştir e.
- 3992- Lorikê dixwe virikê dide hevalan.
- 3993- Lorî dikim ji te re koma kulan tînim ji xwe re.

- 3994- Ma dîn bi çolan ketine?
- 3995- Ma ez her nanê xwe bixwim û şîretan li te bikim?
- 3996- Ma ga dike û ga dixwe?
- 3997- Ma ne xwîn e, ha ji dest û ha ji zend?
- 3998- Ma te deve nedît pişkûl jî ne dît?
- 3999- Ma te çet bihîstiye, ku maldar kuştiye?
- 4000- Made ye, ma ne cade ye?
- 4001- Madem heme ez, divê hebim ez.
- 4002- Maf nayê dayîn tê girtin.
- 4003- Makerê, mizgînî li te ji te re çasek bû!
- Got:* Barê min her li min e.
- Varyanteke weha jî heye:* Ji ker re gotin çavên te ronî ji tere çasek bû!
- Got:* Êmê min kêmbû barê min zêde bû.
- 4004- Mal ava nabe bi xap û viran.
- 4005- Mal berê têkuz bû kevanî bê kûz bû.
- 4006- Mal bê sermiyan wêran e û derdê bê derman e.
- 4007- Mal bê xwedî nabe kur bê bav nabe.
- 4008- Mal bi jinê ava dibe.
- 4009- Mal birçî ye kevanî qereçî ye.
- 4010- Mal bi zarokan şên dibe.
- 4011- Mal bû bi du dew ma li sêpiyan.
- 4012- Mal çiqas mezin dibe kul û derd ezîm dibe.
- 4013- Mal dibistan e dê û bav mamoste ne.
- 4014- Mal hebe heta serî bipeyîve wek kerî, bibêjin aferîn.
- 4015- Mal hebîn e, jin xatûn e.
- 4016- Mal hebîn e, derd revîn e.
- 4017- Mal ji bo can e.
- 4018- Mal ji can re, can ji mal re.
- 4019- Mal ji zik re û zik ji gur re.
- 4020- Mal ji mişkan rûreş e.
- 4021- Mal jin e, binyat xanî.
- 4022- Mal ku yekîti tê de hebe ji artêşa bê yekîti çêtir e.

- 4023- Mal li Hemka, banahî li Çemka.
- 4024- Mal li ser malê nabe.
- 4025- Mal li ser piştta dîk e dîk jî di bin de fîke fik e.
- 4026- Mal mala aşîqa ye, simêl simêlê subaşî ye.
 Ji bo ew kesên ku li mala xwe nanêrin, ji mala xwe re mesref nakin lê cilûbergên xweş li xwe dikin û xwe dewlemend nîşan didin re dibêjin.
- 4027- Mal malê mêran e û azar a jinan e.
- 4028- Mal mezal e her kes bi emel e.
- 4029- Mal mirov bengî dike ceh ker misrî dike.
- 4030- Mal mirtibî ye lê bejn hakimî ye.
- 4031- Mal qirêja destan e.
- 4032- Mal têr e, kevanî şêr e.
- 4033- Mal têkûz e, kêmanî kûz e.
- 4034- Mal û mevdan nebû qutik û fîstan.
- 4035- Mal xişt e bira li pişt e malxerabûn hemû tişt e.
- 4036- Mala aşîqan bi rûniştinê xerab dibe.
- 4037- Mala aşîqan bi malbarkirinê xerab û kavil dibe.
- 4038- Mala axê behr e tije jehr e.
- 4039- Mala bavê şêrîn e, mala mêr hêlîn e.
- 4040- Mala bavê tûrê xwê ye, destê min têde ye.
- 4041- Mala bavê ye wek cerê avê ye mala mêr e
 bi hemd û kêr e.
- 4042- Mala Bekê dido dan bi yek, ew jî ne wekî xelkê.
- 4043- Mala Bekir e yek ji yekê setir e.
- 4044- Mala bê aqûbet zû belav dibe.
- 4045- Mala bê jin bê xwê ye.
- 4046- Mala bê malxo kes nizane mezin kî ye.
- 4047- Mala bê malxoyî mîna xwarina bê xwê ye.
- 4048- Mala bê mêvan, gundê bêşivan, ew herdu jî bêguman.
- 4049- Mala bê mêvan hêvî ji meke bi dîn û îman.
- 4050- Mala bê mêvan û bê cîran wek axura sewalan.
- 4051- Mal bê pisîk mişk têde pelewan e.
- 4052- Mala bê sermiyan wek pezê bê şivan e.
- 4053- Mala bê zarok wek xana xerabe ye.
- 4054- Mala bi xwedî kar têr û tijî, mala bêkaran tazî û rijî.

- 4055- Mala biran mala guran.
- 4056- Mala di ber re her kes ji xwe re.
- 4057- Mala dizan qunca gûzan.
- 4058- Mala Eliyê jar e, dijminê ava sar e.
- 4059- Mala Eliyê Xişo
ba dibe û baran dişo,
serî qûç e û binî pûç e.
- 4060- Mala gewz dûxan ji kuleka wê radibe.
Gewz, di wateya xurt û dewlemend de ye.
Weha jî dibêjin: Mala şên dûxan ji rojina (bixêriya) wê radibe.
- 4061- Mala giran qurbana mala sivik be.
- 4062- Mal gur e ne av e û ne bilxur e.
- 4063- Mala kal û pîran çêtir e ji ya axa û mîran.
Weha jî dibêjin: Mala pîrê çêtir e ji mala mîrî.
- 4064- Mala ku mix lê tune be,
mirov nikare qutikê xwe dayîne wir.
Varyanta nû jî weha ye: Mala ku bizmar lê tune be, mirov nikare çaketê xwe dayîne wir.
- 4065- Mala ku zarok lê îblîs naçe wê.
Weha jî dibêjin: Mala zarok tê de Îblîs naçe têde.
- 4066- Mala ku yekîfî têde nebe zû xerab dibe.
- 4067- Mala Kurdan, mala merdan.
- 4068- Mala li kerekî, her ro li derekî.
- 4069- Mala li ser malê, xwelî lê.
- 4070- Mala mamê şekir e, derve ji hundir çêtir e.
- 4071- Mala me ya li nav riyan
kor û kut li me civîyan
xizmetkar ji me revîyan.
- 4072- Mala mêran çêtir e ji mala mîran.
- 4073- Mala mêran kaniya zêran.
Varyanteke weha jî heye: Mala mîr lê, kaniya zêr lê.
- 4074- Mala mêrê jinê xezne be jî, dîsa çavên wê li mala bavê ye.
Du varyantên din jî hene:
a) bûk weha ji mala bavê hez dike ku rê bidî dê pêxwas here.
b) berê bûkê bikeve mala bavê wê dê bi serserî jî here.
- 4075- Mala mêro mala heq, mala bavo mala neheq.
- 4076- Mala min çoyê min, çoyê min li ser milê min.
- 4077- Mala min a rûtikî serê min ê tûtikî.

- 4078- Mala nandayî tunebûnê nabîne.
- 4079- Mala pir mezin xerab bû ji bin.
- 4080- Mala pîrê gora pîrê.
- 4081- Mala pîro, xweştir e ji mala mîro.
- 4082- Mala şer lê hebe tu aramî lê tune.
- 4083- Mala te ye şerm neke, devê dîzê veneke, nan kerî meke.
- 4084- Mala Xwedê bi sebrê avabûye.
- 4085- Mala viran tûra tiran.
- 4086- Mala virek şewitî kesê jê bawer nekir.
- 4087- Mala xelkê nabe mala mirov
lawê xelkê nabe lawê mirov.
- 4088- Mala xwe kir zêr piştê xwe da stêr.
- 4089- Mala zarok têde lîrişt naçine têde.
- 4090- Mala zêran pûç e, mala mêran qûç e.
- 4091- Mala zêran xerab dibe lê mala mêran xerab nabe.
- 4092- Malan mal bar kir, terziyan got:
Derziya me di serê me de ye.
- 4093- Maldar têr nabin ji zêr û peran zindî têrnabin ji evînê,
şerker têr nabin ji kuştin û xerabkirinê.
- 4094- Maleke ava çêtir e ji sedên xerab.
- 4095- Maleke bi tifaq beramberê êlekê
êlekê bi tifaq beramberê dewletekê.
- 4096- Malê axê diçe, canê xulam diçe.
- 4097- Malê axa diçe, dilê xulam dipiçe.
Xulam li ber xwe nakeve lê li ber malê axê dikeve. Ji ber vê yekê di nav bera vê gotinê û ya hejmara "4096" an de ferq heye.
- 4098- Malê bavan, li hember çavan.
Du wateyên vê gotinê hene: Yekem, dema kesekî bixwaze bêje ku malê min gelek baş e, ez naxwazim pesnê wê bidim. Va ye li ber çavên te ye û tu dibînî. Ne hewceyê pesnindayînê ye. Ya duyem, dema mirov bixwazebêje, ku malê bavê mirov gelek şêrîn e.
- 4099- Malê çêke ne ji ewladê çê û ne ji yê xerab re.
Weha jî dibêjin: Malê neke ne ji kurê qenc re û ne ji kurê xerab re.
- 4100- Malê çikûs û comerdan mîna hev dihere.
- 4101- Malê çikûsan ji xelkê re dimîne.
- 4102- Malê dinê, li dinê dimîne.
- 4103- Malê dinê mespêre jinê.

- 4104- Malê dinê ne tu tişt e.
- 4105- Malê dinê ji dinê re dimîne,
qirşê salê ji salê re dimîne û
navê mêran ji mêran re dimîne.
- 4106- Malê dinê him dibir e, him dilbir e.
- 4107- Malê dinê qirêja destan e.
- 4108- Malê dinê strûyê mêran e.
- 4109- Malê dinê xweliya cixarê.
- 4110- Malê dizan berfa pûk û ava germ e.
- 4111- Malê heram di riya heram de diçe.
- 4112- Malê heram wek xwîna beraz e.
- 4113- Malê hevşendî xurê xwedî ye.
- 4114- Malê hor horan xurê Çoxsoran.
Çoxsor, navê êleke Kurdan e.
- 4115- Malê ku bi tirê bê bi lîsê jî diçe.
- 4116- Malê kuran malê duran.
- 4117- Malê miriyan ji zindîyan re dimîne.
- 4118- Malê neke ne kurê çê re û ne ji yê pîs re.
- 4119- Malê nexwarî para zordaran e.
- 4120- Malê pir gerdena stûr.
- 4121- Malê pir zû zîyan dibe, gerdena stûr zû zirav dibe.
Weha jî dibêjin: Ne malê pir û ne gerdena stûr.
- 4122- Malê qelb li xwediyê xwe vedigere.
- 4123- Malê qûn divê, girarê rûn divê.
- 4124- Malê te hebe li ba lawê xwe be,
quweta te hebe li ba keça xwe be,
heger eqilê te hebe li mala xwe be.
- 4125- Malê te hebe herkes dostê te ye.
- 4126- Malê te dibe belayê serê te û tê pêş te.
- 4127- Malê xesîs diçe fetîs.
Weha jî dibêjin: Malê kesê xesîs diçe fetîs.
- 4128- Malê zehf bê heram nabe, axaftina zehf bê vir nabe.
- 4129- Malhindiko, çargurçiko gotina te bi xelkê kîn û riko.
- 4130- Malika mefûna ji ber ya zordaran wêran dibe.
- 4131- Malhebûna dinê qiloçê seriyan e.
- 4132- Malika min e holika min e.
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Malikê min e holika min e.

4133- Malxotî ket destê kurî, kîskê salê sê car birî.

4134- Malxotî ket destê jinê karik birî, berxik mirî.

Weha jî dibêjin: Malxotî ket destê jinê karik birî, berxik hişt di bin livayê de.

4135- Malxo ku Elo be dê xwarina min şor be.

4136- Malxoyê min Xelo be dê xwarina min çilo be!

4137- Malxwediyê kulê ye lê mêvanê xwe ye.

4138- Mamê maman eqilê faman!

4139- Mamê Remezan, ga û golik bi derdan
di dest de ma ev xeberdan.

Li hinen deveran jî dibêjin: Mam Hemdan çel û golik li derdan, mane em û ev xeberdan.

4140- Mamo ye bê nano ye.

4141- Maneya tirekan nanê cehîn e.

Dema kesekî li mane û behaneyan bigere, wê demê jê re vê gotina pêşiyan dibêjin. Li hinek herêman di şûna “nan”de gotinên wek “ar” û “ceh” jî bi kar tînin.

4142- Manga me mir şîrê me ziwa bû.

4143- Mar bê oxir e tu bikujî çêtir e.

4144- Mar bi jehra mêr dimirc.

4145- Mar bi marîtiya xwe axa bi qinatî dixwe.

4146- Mar çêlikên xwe naxwin.

4147- Mar dîkuje tîremar dixwe xewê.

4148- Mar dibêje: Min dîkujî bi dijminatî,
min binax bike bi dostî.

4149- Mar e, ne cîh û ne jî war e.

Weha jî tê gotin: Mar e, bêcîh û war e.

4150- Mar e, xwedî jahr e.

Weha jî dibêjin: Mar bê jehr nîne.

4151- Mar e, neyar e.

4152- Mar ji pîjanê nexweş bû, ew li ber qûna wî şîn bû.

4153- Mar ji pûngê hez nake û pûng jî li ser qula mar tê.

4154- Mar ji serê xwe tê kuştin.

4155- Mar ku heft stêrkan li asîman nebîne namire.

4156- Mar ku mar e li ser avê bi mirov ve nade.

4157- Mar nabe yar.

4158- Mar pak bûyan, lingên wî ne diketin zik.

Weha jî dibêjin: Mar ku qenc bûya dê lingên wî ne di zikê wî de bûya.
4159- Mar pêve daye êdf ji sîha werîs ditirse.

Varyanteke weha jî heye: Mar gestî ji werîs ditirse.

4160- Mar qula xwe nas dike.

4161- Mar xwar bi rê ve diçe lê rast diçe qulê.

4162- Marê kor avsinê nagire.

4163- Marê ser berfê mirov ew dixwe paxila xwe,
germ dibe û bi mirov ve dide.

4164- Mar û dûpişk bûne xwişk.

Li hinek deveran di şûna gotina "dûpişk" de gotina "mişk" jî dibêjin.

4165- Marîfeta derewkeran sondxwarin e.

4166- Marîfeta ker zirêna ker e.

4167- Marîfeta qelsan pesindayîn e.

4168- Masî di deryayê de bazar nabe.

4169- Masî di delavan de nasekinin.

Varyanteke weha jî heye: Golik di zikê çêlekê de bazar nabe.

4170- Masî di deryayê de mezin dibin.

4171- Masî di golan de nabin hût.

4172- Masî ji serî ve xerab dibin.

4173- Masî nabin bê dasî.

4174- Masiyê ava mezin mezin e.

4175- Masiyê çeman di behrê de najîn.

4176- Mastê kîs nabe rîs.

4177- Mastê ku se bileqînin her ji seyan re baş e.

Varyanteke weha jî heye: Mastê ku seyî herimandî, ji bo seyî dibe.

4178- Mastê payîzan bidin ezîzan, mastê biharê bidin neyaran.

Mastê payîzê gelek tîr û xweş e û dewê biharê jî ne xweş e. Dema mirov bixwaze qîmeta mîvanên xwe bigire, wê demê mastê payîzê dide mîvanan, lê dema mirov ji mîvanê xwe ne memnûn be jî, dixwaze şîrê biharêan jî dewê biharê bide mîvanên xwe. *Li hinek herêman du varyantên din jî tên gotin:*

a) mastê payîzan bidin ezîzan, şîrê biharê bidin neyaran.

b) dewê payîzan bidin ezîzan, dewê biharê bidin neyaran.

4179- Me bûk anî bi lezûbez

me lê da rez û pez,

sivika malê her bûm ez.

4180- Me Cizîr ava kir, Heso bi ser de zava kir.

- 4181- Me çî se girt tajî derket.
- 4182- Me çî got û tembûra me çî got!
- 4183- Me got lêxe, negot bikuj.
- 4184- Me kerê xwe bi ker da, barê mewij bi ser da.
- 4185- Me rû daye scrûkê dixwaze.
- 4186- Me şem kirine, mane şembelûk.
- 4187- Mebe malxerabo bibe xalxerabo.
- 4188- Meçe şerê xal û xwarzîyan, neke hewar û gaziyan.
- 4189- Meger li erd û kaş, nebîne xewnên şaş.
- 4190- Meger li newalan, nebîn xeyalan.
- Varyanteke weha jî heye:* Megere li cîhê kaş ku nebînî xewnên şaş.
- 4191- Megir, ku te girt bermede, ku te berda, li pey mekeve.
- 4192- Mehbûb ew e ku dil hebandiye.
- 4193- Mehkeme milkê qadî ye.
- 4194- Meko û mebinê.
- 4195- Mele çû şaşik da dû.
- 4196- Mele destên xwe nadin mirov lê bi destê mirov digirin.
- 4197- Mele deynê xwe zû ji bîr dike lê deyndarên xwe ji bîr nake.
- 4198- Mele gû tê, îşa zû tê.
- 4199- Mele herçiqas nezan be jî Qurana wî kevin e.
- 4200- Mele her gotiye: Elîf û bê.
- 4201- Mele jî li ser Quranê şaş dibê.
- Weha jî dibêjin:* Mirov carnan xwe di Quranê de jî şaş dike.
- 4202- Mele ku xwarin dît, Quran ji bîr dike.
- 4203- Mele sor jî li xwe bike, dilê wî reş e.
- 4204- Mele tim dibêje "elîf û bê" nabêje "elîf û here."
- 4205- Melê nexwendî digere li nav gundî.
- 4206- Melevan û bask û milên xwe.
- 4207- Memir heyfa te, tu mirî ji şûn ve kêfa te.
- 4208- Menêr li ser ava, tu dê bihesilî li çirava.
- 4209- Mepirse tu çend salan jîyayî lê bipirse tu çawan jîyayî.
- 4210- Mesrefa zêde îsraf e.
- Li hinek deveran di şûna gotina "îsraf" de gotina "heram" jî dibêjin.
- 4211- Meşk meşka gamêşan rûnê wê para dewrêşan.
- 4212- Metê du gun pê ve hebûya, dê bigotan mamo.

- 4213- Mey çiqas taze be hêza xwe didrîne.
- 4214- Mey û jin, ji siwar re dijmin.
- 4215- Meya kesan li ser destan ji bo seran ne ji bo zikan.
- 4216- Meyê nedin keran ker dizirin.
- 4217- Meymûn belaş dîlanê nake.
- 4218- Meymûn di çavê diya xwe de kifş e.
- 4219- Mezin casûs in, biçûk ji wan dihewisin.
Li herêma Licê, ji "hînbûn" re "hewsandin" dibêjin.
- 4220- Mezin bibe ker divê nebe ser.
- 4221- Mezin li malan biçûk li banan.
- 4222- Mezin kir bi nanê xwe, har kir berda canê xwe.
- 4223- Mezin melisîn biçûk reqisîn.
- 4224- Mezin mezin gotiye, biçûk jî biçûk.
- 4225- Mezin qedrê mezinan dizanin.
- 4226- Mezinê malê qurmê malê ye.
- 4227- Mezinê me bi tom e, xwelî li serê me bi kom e.
- 4228- Mezinê mirov ku qijik be dê nikulê mirov jî tim di gû de be.
- 4229- Mezinahiya gund di pehnayiya rê de xuya ye.
- 4230- Mezinan şûr avêt lê biçûkan da dar.
- 4231- Mezelê ker zikê gur e.
- 4232- Mêjî sivik e û ling çapik e.
- 4233- Mêr ava kaniyê ye û jin jê re sikur e.
- 4234- Mêr bi navê xwe teyr bi refa xwe,
birûsk bi zerqa xwe şêr bi lepê xwe.
- 4235- Mêr ciwan, jin ciwan, xwelî li xizan.
- 4236- Mêr çem e, jin gol e.
- 4237- Mêr di mala xwe de xulam û paşa ye.
- 4238- Mêr dîwarê, der ê malê ye.
- 4239- Mêr ew e ku zengil têxe stûyê pisîkê.
- 4240- Mêr ew e ku bibe xwediyê gotina xwe.
- 4241- Mêr ew e ku birîna xwe bi destê xwe derman bike.
- 4242- Mêr ew e ku cila xwe ji avê derxe.
- 4243- Mêr ew e ku di rojên qalên giran de serî xwar neke.
- 4244- Mêr ew e ku di rojên teng de
li hevalê xwe xwedî derbikeve.

4245- Mêr hene, mêrik hene.

4246- Mêr heye şêrê demdemî û mêr heye şêrê herdemî.

4247- Mêr ji neta dimire, ga li ser beran dimire.

4248- Mêr jinê dike xatûn jî û dike darqûn jî.

Varyanteke weha jî heye: Mêr jinê ezîz jî dike û rezîl jî dike.

4249- Mêr kanî ye, pîrek birk e

Birk, hewzê e. Weha jî dibêjin:

a) mêr kanî ye jin quleteyn e.

b) mêr kanî be jin liç e.

4250- Mêr ketine kewarê, jin çûne hewarê.

Çend varyantên din jî hene:

a) mêr ketin qumarê jin çûn hewarê.

b) mêran xwe avêtin kewaran, jin şandin hewaran.

4251- Mêr ku heye carnan şêr û carnan jî rovî ye.

4252- Mêr li serkar e, jin li bindar e.

4253- Mêr mêran nas dikin, çav çavan qiyas dikin.

Ev jî hema hema wek gotina "mêr mêran nas dike" ye.

4254- Mêr mêran nas dike, palzûm qûna keran rast dike.

4255- Mêr mîr, Xwedê pêlav, te danî.

4256- Mêr ne gulek e ku di ber serê xwe re bikî.

4257- Mêr pêl e pîrek behr e.

4258- Mêr pîs e ku ker be, çav li der be, bêkar be û sera ser be.

4259- Mêr şûrê xwe bi ser pîreka xwe re naweşîne.

4260- Mêr xulamê mala xwe, mêrxas xulamê ala xwe.

4261- Mêran mêr dikuşt Cibo ûr dişûşt.

4262- Mêranî bêzanîn, zanîn bê mêranî nîvçe ye.

4263- Mêraniya bêzanîn bê pîv e, zanîna bê mêranî nîv nîv e.

4264- Mêranî bêxesar nabe.

4265- Mêranî duvê masî ye, herkes nikare bigire.

4266- Mêranî hene, di kevir de ye.

4267- Mêranî ne di devê tîfingê de ye, di serê mirov de ye.

4268- Mêraniya bê birîn, comerdiya bê zewac netêw e.

Mirovê ku carekê birîndar bibe û bi êşa birîne bizanibe, cara duyem

dîsa şer bike mêr e. Comerdbûna cînsî ya mêrê ezêb jî qebûl nabe.

Gotina "netêw" ne qebûl e û derbas nabe.

4269- Mêrê baş bi şîva pîs qayil nabe.

- 4270- Mêrê baş ji bav û bira çêtir in, yê xerab ji ber dîwar çêtir e.
- 4271- Mêrê baş nanêre ne li pêş û ne li paş.
- 4272- Mêrê bêbext pird be bi ser re derbas nebe.
- 4273- Mêrê bê dijmin ne mêr e.
- 4274- Mêrê bêkêr du caran şer dixwaze.
- 4275- Mêrê bê dil, kirasê bê mil û baxê bê gul yek in.
- 4276- Mêrê bê qerar dikeve tengasiyê, li çavê jina xwe dinêre.
- 4277- Mêrê bê simêl û jina bê kofî!
- 4278- Mêrê bê xwedî jar dibe, jina bê xwedî har dibe.
- 4279- Mêrê çav li der û jina xwelîser.
- 4280- Mêrê çê bi kêrî her tiştî tê.
- 4281- Mêrê çê bi lepê xwe ye.
- 4282- Mêrê çê bila li dinê be mêrê pîs bila para mirinê be.
- 4283- Mêrê çê bi ser navê xwe de tê.
- 4284- Mêrê çê di roja xerab de kifş dibe.
 Li hinek deveran di şûna gotina "kifş" de gotina "belû" û li hinek de-
 veran jî, di şûna gotina "xerab" de gotina "teng" bi kar tînin.
- 4285- Mêrê çê li paş yê xerab nameşe.
- 4286- Mêrê çê li navê xwe tê.
Li gelek deverî weha jî dibêjin:
 a) mêrê çê li dengê xwe tê.
 b) mêrê çê tê ser çovê.
- 4287- Mêrê çê sergêr e, mêrê kotî bingêr e.
- 4288- Mêrê du jinan dergevan e.
- 4289- Mêrê du jinan durû ye.
- 4290- Mêrê kose bêoxir e.
- 4291- Mêrê malê bi cizme ye, teştî malê teneke ye.
- 4292- Mêrê mêr di bin mineta xelkê de namîne.
- 4293- Mêrê mêrxas ji dûr ve kifş e.
- 4294- Mêrê mêrxas mirov dîkuje û dixê gorê jî.
- 4295- Mêrê min çû seferê hat dîsa kerê berê.
Weha jî dibêjin: Min mêrê xwe şand seferê, ji bo mêrekî çê jê derê, çû
 hat dîsa kerê berê.
- 4296- Mêrê newêrek sînga gewrê nabîne.
- 4297- Mêrê paşî pînê bervajî ye.
- 4298- Mêrê qenc ew e ku tiroziyên tehl dixwe.

- 4299- Mêrê virek û jina tirek yek in.
- 4300- Mêrik li qazoxê dixistin, jinê kil û neynik dixwestin.
- 4301- Mêrik nalek dît, got "ma sê nal û hespekê".
- 4302- Mêrikî Êzîdî bi simêlan tê naskirin.
- 4303- Mêrikî Êzîdî baweriya wî bi sondê ye.
- 4304- Mêrikî feqîr diranên wî di gebolê de dişike.
Di şûna gotina "gebol" de gotina "pelûl" jî bi kar tînin.
- 4305- Mêrikî Kurmanc dibêje: "razan, gezek nan û kutan."
- 4306- Mêrikî Kurmanc dikeve mitala benikê çaroxê,
nakeve mitala nexta şoxê.
Next, hevwateriya qelend e û şox jî di şûna keçika xweşik de hatiye bi kar anîn.
- 4307- Mêrikî Kurmanc du caran bi cilê xwe şa dibe;
gava nû dikire û gava kevin dibin.
- 4308- Mêrikî xerab çîçika diya xwe gestî ye.
- 4309- Mêro bi xwe kêro.
- 4310- Mêrxas carekê dimire, bizdonek her roj.
- 4311- Mêrxasî deh e yek zor û neh jî fen e.
- 4312- Mêrxas ew e ku birîna xwe bi destê xwe derman bike.
- 4313- Mêrxasiya zêde chmçqî ye.
- 4314- Mêş bê wawik nabe.
- 4315- Mêş dikeve devê vekirî.
- 4316- Mêş dizane ku dê di kîjan qulê de hingiv hilîne.
- 4317- Mêş leqî, gurî peqî.
- 4318- Mêş ne tiştek e lê madê mirovan li hev dixê.
- 4319- Mêş xwe li cîhê rengîn digire.
- 4320- Mêşa gû, li gû datîne.
- 4321- Mêvan berî ku rûne mîr e, gava rûnişt esîr e
û dema rabe begzade ye.
- 4322- Mêvanê bêwext ji kîsê xwe dixwe.
- 4323- Mêvan bi nan û ava ve xwe tê.
Weha jî dibêjin: Mêvan qismetê xwe dixwe.
- 4324- Mêvan hat yek şûto ye, yek pîjo ye.
- 4325- Mêvan heye yê gayekî yê karekî û yê nanekî.
- 4326- Mêvan ji mêvan ne xweş e,
malxoyê malê ji herduyan ne xweş e.
- 4327- Mêvan mêvanê Xwedê ye.

4328- Mêvan xwedîkirin ne karê her kurbavî ye.

4329- Mêvanê seyîdan mahrûm bû ji herdû îdan.

4330- Mêvanê xerab carekê nan dixwe.

Weha jî dibêjin: Mêvanê derewîn carekê nan dixwe.

4331- Mêvanê yekî mêvanê gundekî ye.

4332- Mêvano tu têr î an birçî yî?

4333- Mihtacê elbê li elbê digere.

4334- Mij û dûman e dema gur û roviyan e.

4335- Milek serê sed newalan dibire.

4336- Miletê bê ziman, wenda ye.

Weha jî dibêjin: Miletê bê ziman ne tu millet e.

4337- Min çî xêr dît ji bêderê çî bibînim ji kazerê.

Gava îmkanên mezin û girîng ji destê mirov herin û hinek kesên din bix wazin ku mirov li pey hin îmkanên biçûk bigere, wê demê vê gotinê dibêjin.

4338- Min deng nekir, wî şerm nekir.

4339- Min diz berdê, ew min bernade.

4340- Min got "rêç e", wî got "kêç e."

Weha jî dibêjin: Min got "hirç va ye," wî got, "na, rêç va ye."

4341- Min jê re cîhê xwe kir war, ew ji min re bû neyar.

Weha jî dibêjin: Cîhê xwe min jê re kir war, ew ji min re bû neyar.

4342- Min ji kê re got; "bira" wî ji min re got; "birakuj."

4343- Min jin anî ji dûr, ne xurc e û ne tûr.

4344- Min kengê gotiye hespê te ker e?

4345- Min kir, te kir, Şêzerê navê xwe kir.

4346- Min ne dît ne bîhîst, te bi xwe de mîst.

4347- Min ne jê ye, ne jî pê ye.

4348- Min rocî girt, te îd kir.

4349- Min xelk hîn kir govendê, êdî kes destê min nagire.

4350- Mir kerê qazî, xelk çû tehzi; qazî bi xwe mir, kes pirs nekir.

4351- Mirazê bê dil mîna baxê bê gul.

mîna kirasê bê mil, mîna gayê bê cil.

4352- Mirêk kêmasiyên mirov derdixc.

4353- Mirin benikê sor, zer û spî ye, li ber deriyê her kesî ye.

4354- Mirin çeka cindiyan e, her kes li xwe dike.

4355- Mirin çêtir e ji xizaniyê.

Weha jî dibêjin:

- a) mirin ji feqiriyê çêtir e.
- b) mirin çêtir e ji tunebûnê.

4356- Mirin hebe lê kalbûnî û pîrîtî tune be.

4357- Mirin hespa boz e, li ber deriyê her kesî ye.

Weha jî dibêjin: Mirin bera sor e û li ber deriyê herkesî ye.

4358- Mirin ji tirsê çêtir e.

4359- Mirin li ber deriyê her kesî ye.

4360- Mirin mirin e xire-xir pir gotin e.

Argoya wê jî weha dibêjin: Mirin mirin e, ev çi xire-xira xirê min e.

4361- Mirin nabêje "ez têm."

4362- Mirin ne hêjayê şînê ye.

4363- Mirin paqijî ye.

4364- Mirina bêwext, def-dawet.

4365- Mirina di ber êlê de dawet e.

Weha jî dibêjin: Mirina bi êlê re dawet e.

4366- Mirina bi hevalan re xweş e.

4367- Mirina dewlemendan ji bo mela mizgîn e.

mirina xizanan ji bo mela şîn e.

4368- Mirina kur, çav kor dike, mirina bira piştê xûz dike.

4369- Mirinê dibîne bi tayê qayîl dibe.

4370- Mirî ber bi gorê ve dibin, çavên wî li malê ye.

4371- Mirî bi definkirinê kar jî bi kirinê.

4372- Mirî bi giriyê venagere.

4373- Mirî bi xêr be mirîşo bi xwe tê.

4374- Mirî bi xêr be, mela dê bi xwe bê ser.

4375- Mirî bin ax dibe, ji nû de bi xwedî û şax dibe.

4376- Mirî dimirin qûnzêrîn dibin.

Weha jî dibêjin: Mirî dimirin qûn bi helaw dibin.

4377- Mirî heye hewcê şînê nîne.

4378- Mirî hew zanin zindî helaw dixwin.

4379- Mirî kevirê bin bîrê ye.

4380- Mirî nazivirin lê zindî rojekê vedigerin ax û kevirên xwe.

4381- Mirî ne melun be gor lê teng nabe.

4382- Mirî tiran nakin.

4383- Miriyê mezel şeva pêşî mêvan e,
ya pey re cîran e û ya sisêyan gundî ye.

- 4384- Miriyê teres gor lê teng dibe.
- 4385- Miriyên gorê ranabin emelê xerab çênabin.
- 4386- Mirîşk çerçî ye, tu qût bidî wê dê hêk bike.
Weha jî dibêjin: Mirîşk çerçî ye, tu bidî dê tu jê bigirî.
- 4387- Mirîşk e bi nan û hevrîşk e.
- 4388- Mirîşk hêk dike lê qire-qir bi dîk dikeve.
Du varyantên din jî hene:
 a) mirîşk hêk dike û birih bi dîk dikeve.
 b) mirîşk hêd dike, qûna dîk dêşe.
- 4389- Mirîşka birçî di xewa xwe de garis dibîne.
- 4390- Mirîşka cîran li ber çavê cîran dixwiye.
- 4391- Mirîşka ku bi qazê re baz de qûn lê diqete.
Li hinek herêman weha jî dibêjin: Mirîşk e, lê hêkên betê dike.
- 4392- Mirîşka reş e, her roj nexweş e.
- 4393- Mirîşka xwe ya îro bi gayê sibehê mede.
- 4394- Mirîşkê çav li hêka qazê kir, qûna xwe çirand.
- 4395- Mirîşkê hêk kir ji xwe re hevalek çêkir.
- 4396- Mirîşkê tu kedî yî kovî yî?
Got: Ez hevalên xwe bi serê pistikê ve dibînim.
- 4397- Mirov bê deng nabe, serdar bê zor nabe.
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Bazirgan bê deng nabe, mirov bê deng nabe, serdar bê zor nabe.
- 4398- Mirov bê dost û dijmin nabe.
- 4399- Mirov bi benê xelkê naçe bîrê.
- 4400- Mirov bi dijmin e, yek ziman e û yek jin e.
- 4401- Mirov bi doma dirêj digihîje mirazan.
- 4402- Mirov bi hişê xwe giran û sivik dibe.
- 4403- Mirov bi ling şiqitî xwe digire
 lê bi ziman bişiqitî xwe nagire.
- 4404- Mirov bi paşatiyê nabe mirov.
- 4405- Mirov bi pîrsê diçe qursê.
Li hinek deveran weha jî dibêjin:
 a) mirov bi pîrsê diçe Xursê.
 b) mirov bi pîrsê diçe Qursê.
- 4406- Mirov bi sebrê dihere qebrê.
- 4407- Mirov bi werîsê her kesî xwe bernade bîrê.
- 4408- Mirov bi xurtî distîne lê bi xurtî nade.

- 4409- Mirov bi zimanê xwe tê girêdan.
- 4410- Mirov bimire, deyn namire.
- 4411- Mirov carekê dixape.
- 4412- Mirov cîranê dewlemendan be birçî namîne.
- 4413- Mirov çar dîwaran datîne, giliyên mirov têde dimîne.
- 4414- Mirov çi biçîne wê hiltîne.
- 4415- Mirov çi bike bi xwe dike.
- 4416- Mirov çi dibîne jê hîn dibe.
- 4417- Mirov çiqas dûr be hewqas nûr e.
- 4418- Mirov çiqas dûrî çavan be, hewqas nêzîkî rehma Xwedê ye.
- 4419- Mirov çiqas kal dibe hewqas dinya pê şêrîn dibe.
- 4420- Mirov çiqas mirî dişo ew tiran dike.
- 4421- Mirov çiqas zana be dîsa nezan e.
- 4422- Mirov çiqas zengîn dibe hewqas çikûs dibe.
Weha jî dibêjin: Mirov çiqas têr dibe çikûs dibe.
- 4423- Mirov di agirê dostan de naşewite.
- 4424- Mirov di ber zîyaretê de here, dûr û nêzîk yek e.
- 4425- Mirov dikare bin çiya vala bike
 lê nikare xeyseta jinê wenda bike.
- 4426- Mirov dikare bistîne lê nikare bi zorê bide.
- 4427- Mirov dikare heft sal ji yarê diya xwe re bêje bavo.
- 4428- Mirov dikare keran bend bike lê nikare mêran bend bike.
 Li hinek deveran di şûna gotina "mêran" de gotina "jînan" jî dibêjin.
- 4429- Mirov dikeyîne Xwedê dimeyne.
- 4430- Mirov dimire gulîzêrîn dibe.
Li hinek deveran weha jî dibêjin.
 a) mirov dimire qûnzêrîn dibe.
 b) mirov dimire tîrzêrîn dibe.
- 4431- Mirov diz be şereş pir in.
- 4432- Mirov fêh neke, eqil qîm nake.
- 4433- Mirov firindê bê bask û pel e ku bixwaze dê here.
- 4434- Mirov gur nake şivanê berxan.
- 4435- Mirov hene xeber didin bi devê xwe
 û mirov jî hene xeber didin bi eqilê xwe.
- 4436- Mirov hene, merez hene!
- 4437- Mirov heye yê dilan e, mirov heye yê zikan e.

- 4438- Mirov hezar sal li dinê be rojek mêvanê gorê ye.
 4439- Mirov ji axê çêdibe û lê vedigere.
 4440- Mirov ji hespê xelkê zû peya dibe.
 4441- Mirov ji bo xatirê gulê striyê dixwe baxilê.
 4442- Mirov ji birîna xwe diheve hekimiyê.
 4443- Mirov ji her tiştî xelas dibe lê bi mirinê bin ax dibe.
 4444- Mirov ji çî direve ew tê pêşiya mirov.
 4445- Mirov ji gur bitirse pez xwedî nake.
 4446- Mirov ji nasan digîhe xasan.
 4447- Mirov ji neçariyê goştê mirîşkê dixwe.
 4448- Mirov ji nîvê rê vegere ne poşman e.
 4449- Mirov ji qehrê dijminê xwe kêlek xwê dixwe.
 4450- Mirov ji yekî re bêje: Dîn e, dîn e... dê dîn bibe.
 4451- Mirov kevîr davêje kûçik lê ji xwediyê wî fedî dike.

Li hinek deverên Kurdistanê weha jî dibêjin:

Mirov li seyî dide lê ji xwedî şerm dike.

- 4452- Mirov kevîr davêje Birca Belek ne sepeta rêxê.
 4453- Mirov ku dil bike, çiya kul dike.
 Li hinek deveran di şûna çiya de dibêjin "dîwar qul dike."
 4454- Mirov li ber tavê be dê sî xwe bide ser mirov.
 4455- Mirov li halê yên bin xwe nenêre ji xwe razî nabe.
 3456- Mirov li pey paşê çîrî paşê jî dike.

Weha jî dibêjin: Mirov li pey paşa dijmînê paşa dide.

- 4457- Mirov li welatê xwe nabe pêxember.
 Wek ku tê zanîn gelek pêxember dema doza pêxemberiyê kirine, hevwe latiyên wan li dij wan derketine, ew mecbûr mane û hîcret kirine.
 Piştî vegeriyanê bajarê xwe û li wir bûne pêxember.
 4458- Mirov mêr dike, serê xwe zêr dike.

Li hinek herêman di şûna "ser" de gotina "zer" bi kar tînin.

- 4459- Mirov mûyekê jî ji beraz biqusîne dîsa xêr e.
 4460- Mirov nebîne zehmet, naxwe nîmet.
 4461- Mirov ne bi rimekî rimdar dibe ne bi nanekî nandar dibe.
Weha jî dibêjin: Mirov ne bi nanekî nandar dibe û ne jî bi dengêkî dengbêj dibe.
 4462- Mirov ne çoyekî mêrxas dibe ne bi nanekî nandar dibe.
 4463- Mirov nekeve avê soberiyê hîn nabe.

4464- Mirov nikare bi destê xwe piştta xwe bixrîne.

4465- Mirov nikare ji ber mirinê rizgar bibe.

4466- Mirov piçik piçik diçe ber kuçik.

4467- Mirov pîr dibe lê diî pîr nabe.

4468- Mirov sed gulî zîwan bi ûşiyek genim dike.

4469- Mirov şivan be bila yê gundê xwe be.

Weha jî dibêjin: Mirov şivan an jî gavan be, bila yê gundê xwe be.

4470- Mirov tevdîran dike, Xweda teqdîran dike.

4471- Mirov teyrê bê per e, difire heta Feynter e.

Feynter gunedkî Licê ye û 20-25 kîlometre ji navçeya Licê dûr e.

Dema mirov bixwaze bêje, ku per û baskên mirov tune, lê mirov di demeke gelek kurt de dikare, li gelek war û welatan bigere, wê demê vê gotinê dibêje.

4472- Mirov tiliya xwe neke qula mozan, moz bi mirov ve nadin!

4473- Mirov tûk dike tûka xwe danaqurtîne.

4474- Mirov zêrên xwe di sûka ceh de nafiroşe.

4475- Mirovatî germe-germ dijminatî nerme-nerm..

4476- Mirovek bi hezaran xeyal.

4477- Mirovê betal xerabmal e.

4478- Mirovê bê bav, mîna çiyayê bê rê ye.

4479- Mirovê bê bawer riya wî rast nabe.

4480- Mirovê bêbext dostên wî nîn in.

4481- Mirovê bê dê mîna çiyayê bê av e.

4482- Mirovê bê esil, ji wan tê karê bê fesil.

4483- Mirovê bê fedî kal û pîr nabe.

4484- Mirovê bê guman bêdîn û bê îman.

4485- Mirovê bê kêmasî tune ne.

4486- Mirovê bê law, bêwar e.

Weha jî dibêjin: Mirovê bê kur warê wî nîn e.

4487- Mirovê bê nîjad mîna kerê pişt kul e.

4488- Mirovê bê pişt e, ne tu tişt e.

4489- Mirovê bê welat teyrê bê bask e.

Li gelek herêman weha jî dibêjin:

a) mirovê bê welat, teyrê bê per û bask e.

b) mirovê bê war firindê bê bask e.

4490- Mirovê bê xwedî heye lê malê bê xwedî tune.

- 4491- Mirovê bîndest tim rezîl e.
- 4492- Mirovê çavîn pîstir e ji yê şerûdî.
- 4493- Mirovê çê biqewrîne mirovê xerab bihewîne.
- 4494- Mirovê çeyîyan dimire li bin devîyan.
- 4495- Mirovê çikûs dilê wî naçe nanê wî.
- 4496- Mirovê çilek têr nan naxwe.
- 4497- Mirovê derewîn rojekê nanê xwe dixwe.
- 4498- Mirovê demdeme, hin mirov e hin ajalê çar sim e.
- 4499- Mirovê dewlemend li hespê siwar dibe,
xwedî ji bîr dike, peya dibe hespê ji bîr dike.
- 4500- Mirovê dengbêj timî navê wî bêj.
- 4501- Mirovê diçe xebatê
jê re nabêjin te çi xwar, dibêjin te çi anî?
- 4502- Mirovê difire barê vala ye.
- 4503- Mirovê dîn naçe ser zîn.
- 4504- Mirovê dîn-dînik çi telaşê mal û milk.
- 4505- Mirovê eqilsivik tu caran lê meke rik.
- 4506- Mirovê fedîyok bi kundekî,
pîrêke fedîyok bi gundekî.
Weha ji heye: Mêrê fedîyok bi kundekî, jina fedîyok bi gundekî.
- 4507- Mirovê har bi kera xwe dikeve.
- 4508- Mirovê henekker jê re heye cîh û der.
Vê gotinê bi sûffîksa "-çî" jî dibêjin: Mirovê henekçî jê re heye cî.
- 4509- Mirovê heyf bi ziman û qeçema xwe ve kifş dibe.
- 4510- Mirovê kerr ava bin kayê ye.
- 4511- Mirovê koçerî jê dûr e rençerî.
- 4512- Mirovê ku hindik nizanibe, pir jî nizane.
- 4513- Mirovê ku ji bo xelkê bigirî, herdu çavên wî kor dibin.
- 4514- Mirovê ku ji gur bitirse, divê ji pez nexeyde.
- 4515- Mirovê ku ji xwe re nexebite
û ji xelkê re bixebite paşî para wî poşmanî ye.
- 4516- Mirovê ku li xwe miqate nebe, nikare li tu kesî miqate bibe.
- 4517- Mirovê ku malê xwe ji şerefa xwe mezintir bigire,
hêviya qenciyê jê meke.
- 4518- Mirovê ku ne ji cîns û welatê te be,
jê re nebe pir ku di ser te de derbas bibe.
- 4519- Mirovê ku nikaribe bi xwe bila li ber dîwaran rûne.

4520- Mirovê ku teze dewlemend bû Xwedê xwe nas nake.

Weha jî dibêjin: Mirovê ku teze dewletî bû pere jê doyn meke.

4521- Mirovê kurt rojê sê caran di dilê xwe de dibe padîşah.

4522- Mirovê mêr bi sed û hezar yek in.

4523- Mirovê mirov, mîna zêrê veşartî ye.

4524- Mirovê nemerd bibe pir jî bi ser re derbas nebe.

4525- Mirovê nexebitî mîna gîsna zingargirtî.

4526- Mirovê nezan wek defê ye,
deng zehf jê tê lê hundir vala ye.

4527- Mirovê ne çavnebar pê re bibe heval.

4528- Mirovê ne çê bibe pir jî bi ser re derbas mebe.

4529- Mirovê neheq, tîrê deq.

4530- Mirovê nezan, newirekan camêr dike.

4531- Mirovê poşman ji nîvê rê jî bizivire, ne xerab e.

4532- Mirovê qenc ji kîsê Xwedê dixwe yê xirab ji kîsê xwe.

4533- Mirovê raketî xwe dispêre dîwarê ketî.

4534- Mirovê sebirî, debirî.

4535- Mirovê şixulkar gula geş e.

Di şûna gotina şixulkar" de gotina "xebatkar" jî bi kar tînin.

4536- Mirovê tirsonek ji sîya xwe direve.

4537- Mirovê tirsonek her dimire yê mêr carekê.

4538- Mirovê xerîb kor e.

4539- Mirovê xîzan merd e yê zengîn bi kul û derd e.

4540- Mirtib birçî dibin, qala nanê dawetê dikin.

Weha jî dibêjin: Mirtib dema birçî dibin, dawet tê bîra wan.

4541- Mirtibê zir e, ne li defê ye û ne li zirnê ye.

4542- Mirtibo bistire!

Got: Tiliya min kul e.

4543- Mişqalek siûd ji sed siwarê top û tifengê çêtir e.

4544- Mişk çû seferê pisîk ket kewna berê.

4545- Mişk digote kêçê: Kêça devzer,
te xwar sing û ber, te malê ji war kire der.

Kêçê lêvegerand: Mişko diran hûro,
te xwar têr û tûro, te mal ji war kire dûro.

4546- Mişk hezar qulê wî hene.

4547- Mişk ne tu tişt e, dikeve sîtila dimsê dihermîne.

Li hinek herêman di şûna "dimsê (mot)"de gotina "şîr" bi kar tînin.

- 4548- Mişkek heft kûpan dihermîne.
- 4549- Mişkê kor hingê axê bikole, bi ser xwe re davêje.
Weha jî dibêjin: Mişk çiqas axê bikole, bi ser serê xwe re davêje.
- 4550- Mitale xweş tişt e lê ebûr pê nabe!
- 4551- Mizgeft çiqas pak be, bê kepîne nabe.
- 4552- Mîh berxa xwe naêşîne.
- 4553- Mîh bi hirî be dê li nav kerî be,
 mîh bi şîr be dê li cem xwedî be.
- 4554- Mîh bi lingê xwe, bizin bi lingê xwe, herkes bi karê xwe.
Weha jî dibêjin: Mîh bi lingê xwe, bizin bi lingê xwe, her yek mêvanê emelê xwe.
- 4555- Mîh bûn kavir û kavir jî bûn vir.
- 4556- Mîh digere berxa xwe dibîne.
- 4557- Mîh mirî, şîr firî.
 Li hinek deveran di şûna gotina "mirî de gotina "birî" jî bi kar tînin.
- 4558- Mîh li ser berxa xwe dikale.
- 4559- Mîh pê li berxwe xwe nake.
- 4560- Mîha birçî şîr nade.
- 4561- Mîha kol li strûyan gerî ji guhên xwe bû.
- 4562- Mîha nedîtî nayê kirîn.
- 4563- Mîha xerîb li rex kerî mexel tê.
- 4564- Mîna guran goşt dixwe û mîna melean xafê dikşîne.
- 4565- Mîr dimire xizan (ebdal) dimîne.
- 4566- Mîr gotiye bi mîr ve, cimeta wî ne hesîr ve.
- 4567- Mîr gote diya xwe: Xwezî tiştê me neba li dinê.
Dê lêvegerand: Ku çêlek neba gayê cot neba, ku bizin neba dê konê reş neba, ku ez nebam, dê mîrê wek te neba.
- 4568- Mîr jî dimire evdal jî dimire.
- 4569- Mîr muhtacê gavan û şûştinê jî dibe.
- 4570- Mîr terka baz û şahîn kir, sîsyang
 û tilûr kirine şewirdarê xwe.
- 4571- Mîrê min heliz bûrî.
- 4572- Mîxo çû, rîxo hat.
- 4573- Mîza mişk jî ji aş re kar e.
- 4574- Morîka bi qul bi etar re namîne.
- 4575- Mû bi mû rîh çêdibe.
- 4576- Mûş xweş Mûş e, li piştta wê Alqûş e.

- 4577- Nabêjin kê kir, dibêjin kê got.
- 4578- Naçe mêran, diçe tevr û bêran.
- 4579- Naçim hewarê naxwim savarê.
- 4580- Nagelûje ba çcm derpêyê xwe derdixe.
- 4581- Nalbendan kihêl nal dîkir,
kevjalê got: Ev e lingê min jî.
- 4582- Nalbend baş mîroyan nal dike.
- 4583- Namirim tîrê pê re dimirim bi gotina pê re.
- 4584- Namûs e ne bexdenûs e!
- 4585- Namûs ji mêr re jehr ji mar re.
- 4586- Namûs ketiye kundirê, ew jî tunc.
- 4587- Namûs nema bi mêran re,
 sir nema bi şêxan re,
 jehr nema bi maran re.
- 4588- Namûs û xîret ne bi peran e.
- 4589- Namûsa mêr, jin xwedî dike.
- 4590- Namûsa gund navê gund e.
- 4591- Namûsê avêtine ba kûçikan, kûçikan ew nexwariye.
Weha jî dibêjin: Xîretê avêtina ba seyan, se ew nexwerine.
- 4592- Nan bi nan e, çi minet li gavan e.
- 4593- Nan bi xwê, xwê bi tehm.
- 4594- Nan bide nandaran, deyn bide deyndaran,
 lê rû nede bêbawer û dil nede neyaran.
- 4595- Nan bixwe bi avê, hilneyîne mineta bavê.
- 4596- Nan bixwe parî parî şorbe bixwe heta dikarî.
- 4597- Nan bixwin bi qinyat, jin bixwazin bi kok û binyat.
- 4598- Nan hebe, dew tune, dew hebe nan tune,
 herdu hebin ez ne li malê me.
- 4599- Nan ji bo hemû nefsî ye, çek ne ya hemû kesî ye.
 Çek, di wateya kinc de ye.
- 4600- Nan ji çolê av ji golê.
- 4601- Nan ji Quranê pêşdetir e.
- 4602- Nan li cem birçiyên namîne.

- 4603- Nan li ser çokê ye û çav li xelkê ye.
- 4604- Nan mirov ra jî dike û wenda jî dike.
- 4605- Nan padîşah, goşt wezîr yên din kizîr-mizîr.
- 4606- Nan pir, pîvaz pir, gelo çima mir?
- 4607- Nan û dew taştîya derew.
- 4608- Nan û dewê mirov ji qeliya xelkê çêtir e.
- 4609- Nan û gayek di çavê mirovê merd de yek e.
Weha jî dibêjin: Nan û gayek li cem mirovê merd yek e.
- 4610- Nan û jajî xwarina tajî.
- 4611- Nan û mast xwarina rast, nan û dew xwarina derew.
 Li hinek herêman di şûna gotina “xwarinê” de gotina “taştê” jî bi kar tînin.
- 4612- Nan û pîvaz xureka birçiyar.
Weha jî dibêjin: Nan û pîvaz, nexweşî û çavreşî.
- 4613- Nan winda nabe.
- 4614- Nan xwar, pişt re kêr di sifrê re kir.
- 4615- Nanke hazir ê pehtî, hêjayî deh girikên hevîr e.
- 4616- Naneke helal çêtir e ji gayekî heram.
- 4617- Nanê bêxwê dixwe û tirên şor dike.
- 4618- Nanê bêked heram e.
- 4619- Nanê bi minet nayê xwarin.
- 4620- Nanê bide nanpêjan bila nanekê te zêde be.
- 4621- Nanê cehîn dixwe, tirên pola dikan.
Ev jî wek vê gotinê ye: Nanê bêxwê dixwe û tirên şor dike.
- 4622- Nanê ceh şûna nanê genim nagire.
- 4623- Nanê êvarê bihêle sibê, şuxilê êvarê nehêle sibê.
- 4624- Nanê garisî ne tu nan e, malik bêarvan e.
Wek: Nanê garis ne tu nan e, lê kes nabêje ev mal bê arvan e.
- 4625- Nanê genim li feqîran nayê.
- 4626- Nanê germ, zikê çerm û mêvanê bêşerm, hersê yek in.
- 4627- Nanê Îsa dixwe, selawatan li ser Mûsa tîne.
- 4628- Nanê kêmeqilan tim di zikê bi eqilan de ne.
- 4629- Nanê ku kerî bû êdî hev nagire.
- 4630- Nanê melan pahtî ye.
 Yanî meslekê melan heyc û ew birçî û tazî namînin.
- 4631- Nanê mêran li mêran qerz e.
Weha jî dibêjin: Nanê mêran li ser mêran deyn e.
- 4632- Nanê min dixwe, lê paleyiya xelkê dike.

- 4633- Nanê mirovan li rûyê mirovan tê xwarin.
- 4634- Nanê necûtî naçe xwarê.
- 4635- Nanê nemerdan nexwe bila tu ji birçînan bimirî.
Weha jî dibêjin: Nanê nemerdan nayê xwarin.
- 4636- Nanê nekeran nînc.
- 4637- Nanê nerm e zikê çerm e, Siltokê bêşerm e.
- 4638- Nanê nexwarî bi destê zalim diçe.
- 4639- Nanê paşa dixwin bi serê gavan sond dixwin.
- 4640- Nanê patî wek sultanê ser textî.
- 4641- Nanê ristan, çavên xwaran.
- 4642- Nanê Romiyan li ser kabokên wan e.
 Tirk bê bext in û bi wan bawerî nabe. Li hinek herêman di şûna gotina
 “kabok” de gotina “çong” jî dibêjin.
- 4643- Nanê sêlê durû ye.
- 4644- Nanê sêwîyan kor e.
- 4645- Nanê xwe bixwe bi avê bila minet nevê.
Weha jî dibêjin: Nanê xwe dixwim bi avê, mineta kesî min navê.
- 4646- Nanê xwe neke tûrê kesê ku ew bibînî dê tu birçî bimînî.
- 4647- Nanê xwe yê cehîn, bi nanê xelkê yê genimîn mede.
Varyanteke weha jî heye: Golika xwe bi gayê xelkê mede.
- 4648- Nanê xwe yê hişk bixwe, ji qeliya xelkê çêtir e.
Weha jî heye: Xweliya ber arê mirov ji qeliya axa û began çêtir e.
- 4649- Nanê xwe dixwim lê şîret li xelkê dikim.
- 4650- Nanê yekê bi avê de çû got; bila xêra bavê min be.
Weha jî dibêjin: Nanê mêrikê Kurmanç li ber avê çû, got: bila xêra dê û
 bavê min be.
- 4651- Nanê yekî nebû, pîvaz kirîbû.
- 4652- Nanpêj birçî ye terzî tazî ye.
- 4653- Nav giran e, bajar wêran e.
Li gelek deveran weha jî dibêjin:
 a) nav giran e lê war wêran e.
 b) nav giran, mal wêran e.
- 4654- Nav heye lê huner tune ye.
- 4655- Nav naviya namûs di dêra de cenciya.
- 4656- Nav pale ye lê das şikestî ye.
- 4657- Navbera dil û dil riyeke dirêj e.
- 4658- Navê bira Taedîn e him dîn e him derewîn e..

4659- Navê eqil gelo ye.

“Gelo” di rêzima kurdî de peyveke pirsyariyê. Bi fikrandinê mirov dibe xwediyê plan û proje. Ji ber vê yekê jî dibêjin, ku “navê eqil gelo ye.”

4660- Navê gund namûsa gund e.

Weha jî dibêjin: Navê gund rûmeta gund e.

4661- Navê gur bi rûtî derketiye lê rovî dinyayê xerab kiriye.

4662- Navê jinê Dînanok di mal de tune arvanok.

Weha jî dibêjin: Dew tune firbike lê li hespê siwar dibe çir dike.

4663- Navê malê, yek bûka malê xerab dike,
yek pêvanê berderî û yek jî xulamê malê.

4664- Navê mêrê wê paşa, nan di malê de tune
dide çûçikan toza aş.

4665- Navê mirinê ne xweş e lê zû belav dibe.

4666- Navê Xwedê heye lê ew bi xwe li navê tune ye.

4667- Navtêdan ji mêraniyê çêtir e.

4668- Nazir e xwediyê para hazir e.

4669- Ne adar e ne nîsan e; roja Feqiyê Teyran e.

4670- Ne aş û ne çeçeqo.

4671- Ne bi berxî têr şêr vexwar ne bi kavirî têr giya xwar.

4672- Ne bi duan bûme ku bi nifiran bimirim.

4673- Ne ber gêr bike, ne jî beran xêr bike.

Ji “kevir” re “ber” dibêjin. *Weha jî dibêjin:*

Ne bera gêrke û ne berana xêrke.

4674- Ne bi ewrê gurgurî û ne bi mêrê zirzirî.

4675- Ne bi malê hela hela ne bi zarokên şêx û mela.

4676- Ne bi golikî têr giya xwar û ne bi gayîtî têr kizin xwar.

4677- Ne bi kêrî defê tê û ne bi kêrî zirnê tê.

4678- Ne bi lezê ne bi bezê, kes nagihîje tu mirazê.

4679- Ne bi tîktik û tirêz e, bi cîh û bi pez e.

4680- Ne bi wê hêkê û ne jî bi wê qidqidkê!

4681- Ne bi xewnê şevan û ne bi nihtê dînan.

4682- Ne bide dînan û ne bike dînan.

4683- Ne bide min û ne bide rûyê min.

Weha jî dibêjin: Ne bide min û ne jî tiliya xwe bike çavê min.

4684- Ne çira ber koran û ne deholâ ber keran.

4685- Ne dar e û ne bizmar e.

4686- Ne dengbêjê bi zirnê re û ne peyayê bi siwaran re.

4687- Ne dijminê xeraban bin, dijminê xerabiyê bin!

4688- Ne distrînc û ne ditewîne.

Weha jî dibêjin: Ne dikene ku em pê re bikenin
û ne digirî ku em pê re bigirîn.

4689- Ne dixwe ne dide hevalan, genî dike û davêje newalan.

4690- Ne dixwim nanê te ne dajom kerê te.

Çend varyantên din jî hene:

a) ne dixwim savarê ne diçim hewarê.

b) ne dixwim gilyaza ne didim hevraza.

c) ne dixwim virika te ne dajom horika te.

4691- Ne dixwim savarê û ne diçim hewarê.

4692- Ne dostê fileh û ne hespê qule.

4693- Ne dûrî zanan here ne nêzîkî dînan were.

4694- Ne ew e ne ev e, keşk birayê dew e.

4695- Ne êla bê scrî ne şivanê bêkerî û ne mala du derî.

4696- Ne fen e, ev çi dar û ben e?

4697- Ne feqîrê bitir ne zengînê diz ne maqûlê derewîn.

“Bitir” di wateya qure, fehş û pozbilindî de hatiye bi kar anîn.

4698- Ne feqîr ne zengîn bi comerdî rûne li ser zîn.

4699- Ne gayê min li garanê ye ne galgala nanê gavên dikim.

4700- Ne golikê bimijîne, ne jî xesûyê bikujînc.

4701- Ne gundê bêrez ne konê bêpez ne mêrê bibêje. “ez û ez.”

4702- Ne gur bibîne ne jî qulîwela bixwîne.

Dema mirov nexwaze kesê bibîne an jî pê re têkilî dayîne, wê demê vê gotinê dibêjin. Musilman di şûna gotina “gur”de gotina “şeytan” an “Îblîs” bi kar tînin.

4703- Ne gurgura ezmanan û ne xire-xira mêran.

4704- Ne gû ye û ne rîx e, kul li herduyan bûye.

4705- Ne her tiştê ku biçirse zêr e.

4706- Ne hesil çav û kildan e, hesil duhêl û badan e.

Weha jî dibêjin: Mebest ne çav kildan e mebest duhêl badan e.

4707- Ne hiyûşkir ne çiyûş kir, hat hazir li ber çiyûş kir.

4708- Ne Îsa li me dibe xwedî û ne Mûsa li me dibe xwedî.

4709- Ne gîr e ne bîr e.

4710- Ne gotinên xweş û ne jî paşê tirên reş.

Li herêma Serhedê weha dibêjin: Ne giliyên xweş û ne jî tirên reş.

4711- Ne her mêr mêr e û ne her jin jin e.

- 4712- Ne hewqas şêrîn be ku te daqurtînin
 û ne hewqas tehl be ku te biterqênin.
- 4713- Ne him e û ne gum e.
- 4714- Ne ji fesadan be gur û mîh dê bi hev re bijîn.
 Di şûna gotina “bijîn” de gotina “biçêrin” bi kar tînin.
- 4715- Ne ji koran ji nankoran
 ne ji bêrûyan ne ji dûruyan
 ne ji xeraban lê ji şîrheraman bitirsîn.
- 4716- Ne ji malekê ne lê ji rewşekê ne.
- 4717- Ne ji maneyan bûya dê rovî li sûkan bigeriyân.
- 4718- Ne ji me jar dibe û ne ji me bar dibe.
- 4719- Ne ji min be ne ji te be dê xanî û mal xerabe be.
- 4720- Ne jina belaş ne xulamê bêmaes û ne jî erdê kaş.
- 4721- Ne jina pûrt ne mêrê zilût.
Weha jî dibêjin: Ne jina bi pirç ne mêrê kose.
- 4722- Ne jina kenokî û ne mêrê şermokî.
Weha jî dibêjin: Ne jina korekî û ne mêrê pitpitokî.
- 4723- Ne jina parî rind ne mêvanê mal li gund
 û ne belengazê pozbilind.
- 4724- Ne jina pîr ne mehîra bê sîr û ne peza bê şîr.
- 4725- Ne jina xewar ne mêrê tiral.
- 4726- Ne jinên bi derman û ne jî mêrên bi devgirêdan.
- 4727- Ne ker ket ne hîz dirî.
- 4728- Ne ker tê ber bar ne bar tê ber ker.
- 4729- Ne ker li garan e û ne pirsyar li gavan e!
 Li hinek deveran di şûna gotina “pirsyar” de, gotina “hesab” jî dibêjin.
- 4730- Ne kerê min e û ne gayê te ye.
- 4731- Ne kêr e ne bêr e, tev diçe ji xelkê re.
- 4732- Ne kif-kifa nefî û ne çip-çipa dolabê.
- 4733- Ne ji koran bûya dê kewan hêlinên xwe
 li ser kolan û riyân çêbikîran.
- 4734- Ne kutana pîran û ne xwarina sîran.
- 4735- Ne kûçik bibîne û ne jî rîya xwe biguhrîne.
- 4736- Ne lawê bi tiştan ne mêrê bi kaxez û nivîştan.
- 4737- Ne li goristana raze û ne xewnan bibîne.
Weha jî dibêjin: Ne li newala kûr radizim û ne xewên xerab dibînim.
- 4738- Ne li mino ne li ber kûçê mino.

- 4739- Ne li şînê ne şahîyê.
- 4740- Ne malê çêbike ji lawê baş re û ne jî çêbike ji lawê xerab re.
- 4741- Ne malê pir ne gerdena stûr.
- 4742- Ne malê pir ne derdê giran.
- 4743- Ne malê pir û ne zarokên bêxêr.
- 4744- Ne mêşan ji xwe difrîne û ne ji hevalan.
- 4745- Ne mewijan pêş min bike û ne tinazan bi min bike.
- 4746- Ne mirovê bêbiryar û ne rêwiyê bêheval.
- 4747- Ne mişkê terezînê ne berxa li ber bizinê
û ne mêrê li ber gotina jinê.
- 4748- Ne nanê deriyan û ne dewê ji keriyên.
- 4749- Ne pîrê baş kir li ser gonî rûnişt
ne jî gonî başkir di pîrê re çû.
- 4750- Ne pîvaz xwar û ne dev şewitî.
- 4751- Ne sala du bihar û ne jî pîra bi guhar.
- 4752- Ne sola teng û ne mala bêdeng.
- 4753- Ne sora ber agirên ne rinda ber çiran.
Weha jî dibêjin: Ne sorên ber agirên ne finda li ber çiran.
- 4754- Ne şerm e ku tu şaşa bû, şerm e ku tu şaş bimînî.
- 4755- Ne şên dike û ne jî xerabe dike.
Du varyantên weha jî dibêjin:
a) ne xan dike û ne jî xerabe dike.
b) jê ne xan çêdibe û ne jî hemam.
- 4756- Ne şîrîn be ku xelk te bixwe ne tehl be ku xelk te bavêje.
- 4757- Ne şîş bişewite û ne jî kebab.
- 4758- Ne tîr e û ne tehl e.
- 4759- Ne xema wê ye ne dema wê ye,
qirçe qirça benîştê wê ye, çêleka sor qelendê wê ye.
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Ne xema min e ne dema min e,
qirçeqirça benîştê min e.
- 4760- Ne xêr li mişarê ne bereket li xiyarê.
- 4761- Ne xizanê bi tîr ne dewlemendê diz û ne mehqûlê derewîn.
- 4762- Ne xizanê pozbilind, ne mêvanê mal li gund
û ne yê ku di civatê de dibêje “jina min rind.”
- 4763- Ne xir e ne cir e, ev çi vir e?
- 4764- Ne xox dar e ne keç war e ne adar bihar e.
- 4765- Ne xwar ne da hevalan, genî kir û avêt newalan.

- 4766- Ne xwezî bi wî şêrê ku li dû rovî dere.
- 4767- Ne ya xwe ye û ne ya hevalan e,
kevaniya bîst û pênc mala ne.
- 4768- Ne zivistana bê berf û ne jî havîna bê tav.
- 4769- Nebe qal, nabe mal.
- 4770- Nebêje Ereban merhaba, heyne wê birîn li ser kurk û eba.
- 4771- Nebêje ez nizanim, bike tu bizanî.
- 4772- Nebêje tu kê bû, bêje niha tu kê yî?
- 4773- Nebêje xweş tişt e, bêje xweş xuya ye.
- 4774- Nebînim behra bê gcmî, nebînim însanê demdemî.
- 4775- Nebînim êla bê serî, nebînim çiyayê bê kerî.
- 4776- Neçe wî derî ku kesê te lê nebe.
- 4777- Nede du heta kêr negihe stû.
- 4778- Nede ser kevîrê bê bin,
neçe pêşiya mirovê demdemî.
- 4779- Nede tû û nede rû.
- 4780- Nefs babet e, cil nobet e.
- 4781- Nefs bêje goşt, tu bêje hoşt.
- 4782- Nefs îblîs e.
Nefs mirov ji ser rê dibe. Divê mirov nefsa xwe gem bike.
- 4783- Nefs mirov dibe helakê.
- 4784- Nefsa bilind mirov nizim dike,
nefsa nizim mirov bilind dike.
- 4785- Nefsa birçî xwe davêje ser sêla sor.
- 4786- Nefsa kal û pîran tenik e.
- 4787- Neheqî palasa ker e, kes navêje ser xwe re.
- 4788- Nehînkera hîn meke ku te hîn kir ji bîr meke.
- 4789- Nekerî dil kesero.
- 4790- Nekes, nekevin ser kes, bikevin ser kes, êdî nabêjin “bes!”
- 4791- Nemêran najon, mêran bajon dê nemêr bibin mêt.
- 4792- Nenêre li çavê min ê şaş, binêre li bextê min ê baş.
Weha jî dibêjin: Nenêr li korahiya çavê min, binêre li bextê min.
- 4793- Nenêre li eslê min binêre li nav û dengê min.
- 4794- Nivê hezarî pênc sed e bila ew jî tune be.
- 4795- Neqeba heram mala mirov e.
- 4796- Newal cewiyên çiya ne.

4797- Newal xalî ye, rovî walî ye.

4798- Newalên kûr bê av nabin.

4799- Newroz ecêb roj.

4800- Nexweş e, xwarin pê xweş e.

Weha jî dibêjin: Nexweş e, parî pê xweş e.

4801- Nexweşê bi xêr, hekîm bi xwe tê cem.

4802- Nexweşê bêxwedî, dermanê wî mirin e.

4803- Nexweşê me helak e, tûrê nan ji ber serî rake,
heta sibê ne nan û ne pariyek e.

Li hinek cîhan weha jî dibêjin: Nexweşê me nale nal e, tûrê nan ber
serî dake, heta sibê pariyê betal nake.

4804- Nexweşan neşîne hinaran.

4805- Nexweşê parî xweş e.

Varyanteke weha jî heye: Nexweşê tiştên xweş e.

4806- Neyar bi halê neyar nizane.

4807- Neyar tu carî nabe yar.

4808- Neyarê bavan nabin dostê lawan.

4809- Neyarê bi eqil ji dostê bêeqil çêtir e.

4810- Neyartiya mirovatî, girantir e, ji derdê kotîfî.

Weha jî dibêjin: Neyartiya xwdiyan girantir e ji derdê kotiyan.

4811- Neyartî ye bêminetî ye.

4812- Neyîne serê kesê kesa dê bînin serê pisê pisan.

Weha dibêjin: Nêke serê kesê kesan, bira neyê serê pisê pisan.

4813- Neyîn ji berê hişktir e.

4814- Neynik eyba mirov nîşan dide.

4815- Neynûk û goşt ji hev nabin.

4816- Neynûk nayê ji cefê, por nayê ji sefê.

4817- Nezanê ne guhdar, derdê wî ye derdek bêderman.

4818- Nezanî binêre cîranî.

4819- Nezanî ji zora zaliman xerabtir e.

4820- Nezanî rehetiya canî.

4821- Nezanî ne eyb e lê hînnebûn eyb e.

4822- Nezer keviran hûr dike.

Li hinek herêman weha jî dibêjin: Nezer kevir belav dike.

4823- Nêçîrvan di xewnê de nêçîrê dibîne.

4824- Nêçîrvan kewê xwe di mijê de bernade.

4825- Nêçîrvan nêçîra xwe nas dike.

- 4826- Nêrî bi sekwata ji tehta nakevin.
- 4827- Nêrî nemînin, dibêjin gîsko “belo belo.”
- 3828- Nêriyê bê pez,
mirtibê bê saz,
jajiya bê pîvaz hersê yek in.
- 4829- Nifirên dê û bavan tewş naçin.
Li hinek deveran weha jî dibêjin:
a) nifirê dê li ewlad naqewime.
b) nifirê dê li kur nagire.
- 4830- Nikarîbûn rehetiya can e.
Vartanteke weha jî heye: Nezanî rehetiya can e. Ji bo ew kesê zexel û kone tê gotin.
- 4831- Nikare bi kerê dibeze kurtanê.
- 4832- Nikare pelûlkê ji xwe re çêke,
jajerûnkê ji hevala xwe çêdike.
- 4833- Nikare yekê dibêje “du werin.”
- 4834- Nimêja Kurdan ne îbadet e, edet e.
- 4835- Nivişta bê tişt xwediyê xwe kuşt.
- 4836- Nivişt çêkir ji qîzê re, gû herikî bi mîzê re.
- 4837- Nizane kî miriye, dibêje “heylo birayo.”
- 4838- Nîne bixwe nan û jajî, xwedî dîke tûl û tajî.
Wek gotina: “Dew tune fir ke, li hespê siwar dibe çir dîke.”
- 4839- Nîr ji aliyê gayê qelb ve xwar dibe.
Li hinek deveran weha jî dibêjin:
a) xeta xwar ji gayê pîr e.
b) nîr ji aliyê pîr ve xwar dibe.
- 4840- Nîsan e, bûka salan e.
- 4841- Nîsan e, çipik bi kîsan e.
Li Kurdistanê di meha nîsanê de ji bo zewîyan hewcedariyeke mezin bi baranê heye. Heger baran nebara kiştûkal (ziret) têkdiçe. Weha jî dibêjin: Nîsan e dilopa baranê bi kîsan e. Yanî dilop bi kîsekê zêr e.
- 4842- Nîsan e, dew li kîsan e, li cem kotî û pîsan e.
Weha jî dibêjin: Nîsan e, dew li kîsan e, derî hemû kotî û pîsan e.
- 4843- Nîska pîrê nadim birinca mîrê.
- 4844- Nîşana baranê ba ye û nîşana mirinê jî ta ye.
- 4845- Nîştîman bi çek tê girtin û bi çek tê stendin.
- 4846- Nîv mela dîn wenda kir, nîv hakim can wenda kir.
Weha jî dibêjin: Nîv hekim can der dide, nîv ilm dîn der dide.

4847- Nîvê hezarî pêncsed e.

Dema mirov bixwaze bêje ku li ser meseleyekê dûr û dirêj mefikire, hûr û kûr hesab û kîtab neke, wê demê weha dibêjin.

4848- Nîvê miriyê mezelan, mirine ji nezera.

4849- Nîvî jê meke hêvî.

4850- Nîvkarê salê yekî ka bir, yekî ga bir.

4851- Nok çû bajêr bû lelebû.

Dema kesekî li herêma xwe bêqîmet û bêhurmet be û ew here xerîbiyê fort û pesnê xwe bide, wê demê vê gotinê dibêjin. Mirov çî be, li her derî ew e.

4852- Nokê radibe ser kokê

Li hinek herêmên Kurdistanê weha jî dibêjin:

a) nokê herî li kokê.

b) nokê dê bê li kokê.

4853- Nû hatin, kevn xelat in.

Li hinek herêman weha jî dibêjin: Nû hatin kevn hilatin.

4854- Nûmalan rahiştin koremaran, gotin:

Ev e werîsê şahran, em dê mala xwe pêbigihînin kevnemalan.

O

- 4855- Oda belek nan lê tunc lê av lê gelek.
4856- Ode nabe bê nan û rûn, avahî nabe bê stûn,
can nabe bê xwîn û kar nabe bê dijûn.
4857- Odeyên kevn rabûn, çayxane xuya bûn.
4858- Ol û baweriya birçiyay tune.
4859- Ol û îman e, îro Ezdî ye û sibchê Musilman e.
4860- Omerî ye, bi mewij û tirî ye.
Omerî, li herêma Mêrdînê navê eşîr û herêmekê ye.
4861- Orspî nabe rûspî!
4862- Osê maldawo û Şewêşo malavawo!

4863- Padîşah divê wek navê xwe rabe û rûnê.

4864- Padîşahê bêbext, ket ji text.

4865- Pakî ji îmanê ye.

Weha jî dibêjin: Paqijî ku heye ji îmanê ye.

4866- Pakî ku heye pir dimîne.

4867- Pale qels e hêcet das e.

4868- Paleyê xerab dasê diguhêre.

Li hinek herêman weha jî dibêjin: Palê xerab das û tar vedişêre.

4869- Paniya mirov ne be xwîn, li ser mirov nakin şîn.

4870- Par mirdî, pêrar mirdî, kefen zerdî, îsal dibêjî “şîrdî birdî.”

Weha jî dibêjin: Par mirdî, pêrar mirdî, kefen zerdî, ji nû ve îsal dibêjî “şîrdî birdî.”

4871- Para ferad pê re tir hat.

4872- Para gerokan çû ber babîsokan.

4873- Para mayî ji zalim re mayî.

4874- Pare para dikin, xweşmêr geza li bera dikin.

4875- Parî bi fêde ne dawî bi serhevde ne.

4876- Pariya gerokan xwar pîsokan.

4877- Pariya mezin gewriyê didrîne.

Li hinek cîhan weha jî dibêjin: Pariya mezin gewriyê naqelşîne.

4878- Pariya mezin bixwe lê gotina mezin neke!

Berfiradî weha dibêjin: Pariya gir bixwe, şorê gir meke.

4879- Pariya xwe necûyî tu nikarî daqurtînî.

4880- Pariya xweş bide mirovê xwe û zarê xweş bide dijminê xwe.

4881- Pariyeke xweş hêja ye gayekî reş.

4882- Pariyê bixwe û nanê bide hevalê xwe.

4883- Pariyê bixwe û nanê hilîne.

4884- Pariyên ji devê xwe mezintir mexwe.

4885- Pars bi parsê çû Qersê.

4886- Pars heye derd tune ye.

4887- Pars ji parsekan nabe.

4888- Parsek e bi şûr û qetek e.

Weha jî dibêjin: Parsek e û bi dar û qetek e.

- 4889- Paş de anî manî pêş de korpoşmanî.
 4890- Paşê re mayî paşiyê re dimîne.
 4891- Paşê tu goşê bi ser Mûşê de tîni xwarê.
 4892- Paxir zer e lê ne zêr e.
Weha jî dibêjin: Paxir nabe zêr.
 4893- Payîz bi nîşan e çaxê dawetan e.
 4894- Payiz hat berîka feqîr diriya.
 4895- Payîz vala bûn kodik û dîz.
 4896- Payîzê girtiye waran pel diweşin ji dar û jaran.
 4897- Payîzê gote çiya “bila rêwî ne rawestin li ser riya.”
 4898- Payîzê li me kir gazî dar man rût û tazî.
 4899- Payîzokên me ji stranên xelkê çêtir in.
 4900- Pela spî ji qelema reş çêtir e.
 4901- Pelên darê, darê dixemilîne.
 4902- Pelên darên feqîran li bin guh e.
Weha jî dibêjin: Feqîr li şovê çû darê titûn di qûnê çû.
 4903- Pelên sîran bidin pîran.
 4904- Pembû û agir hev didizin.
 4905- Pembûyê wê di hebanê zer de
 zivistan çû û bihar hat bi ser de.
 4906- Perdê rûyê mirov sê ne: Yek ya avê ye, yek ya xwînê ye û
 yek jî ya namûsê ye; ku herduyên pêşîn çirîn tişt nabe, lê ya
 namûsê çare lê nabe.
 4907- Pera navêje berîka gedan dê hezarî bîne sedan.
 4908- Pere bide bela bikire.
 4909- Pere di kuleka xanî re nayên.
 4910- Pere hebe helaw mişe ye.
Li hinek herêman weha jî dibêjin: Perc hebe helaw pir e.
 4911- Perc mêrê pişta mirov e.
 4912- Pere, pere tîne.
 4913- Pere qirêja destan e.
Weha jî dibêjin: Perc gemara destan e.
 4914- Pere xulamekî qenc e lê axayekî xerab e.
 4915- Pere xwe li peran digirin.
 4916- Perê kê hebe gotin ya wî ye û navê wî heye.
 4917- Perên te hebin bê wan mere çolê.

4918- Pero here û were wek kero.

4919- Pertaľfiroş tazî ne aşvan birçî ne.

4920- Pesnê çayirê mede lê pesnê giyayê xwe yê lodkirî bide.

4921- Peya bi peya re pîrek bi pîrek re.

4922- Peyayê fedîkok bi kundekî pîreke fedîkok bi gundekî.

Li gor edetên Kurdan ên kevn, peyayê ku fedî bike rûmeta wî tune, jina ku fedî bike, rûmeta wê pir e. Di şûna gotina “peya” de gotina “mêr” jî bi kar tînin.

4923- Peyva li rû guneh efû.

4924- Peyva pir ji mêrikê ehmeq re ye.

4925- Pez bimîne ya gur dixwe ya diz dibe.

4926- Pez tune lê rûn difiroşe.

Ev gotin jî wek gotina ku “dew tune firke lê li hespê siwar dibe çir dike” ye.

4927- Peza bi tenê gur dixwe.

4928- Peza kulek û bizina mûçek rastî hev tên.

4929- Peza sitewr nayê dotin, dûr erzan nayê firotin.

4930- Pezê bê şivan an gur dixwe an diz dibe.

Weha jî dibêjin: Pezê bê xwedî, gur dê bixwin.

4931- Pezê bê şivan an taştê an firavîn an jî şiv e.

4932- Pezê bê şivan, şivanê bê se, ew dibe malxerabî.

4933- Pezê goşt malê kêrê ye.

4934- Pezê nêr ji bo kêr.

4935- Pê li agir meke piyê xwe birîn neke.

4936- Pê li dêla kûçikan neke bila neyên te.

4937- Pê li marê razayî meke.

4938- Pê li min nexe gotin jî devê min dernexe.

Weha jî dibêjin: Pê li min nexe, giliyan jî devê min dernexe.

4939- Pêla avê bi halê kevir giriya.

4940- Pêla bihurî venagere.

4941- Pêla çuyî mede duyî.

4942- Pêlê ez birim pêlê şelû jî dê yên din bibin.

49743- Pêlên avê nayên hejmarê.

4944- Pêlên ava rewan xurtir in ji pêlên deryan.

4945- Pêlên mayî jî yên borî pirtir in.

4946- Pênc tilî nabin yek.

4947- Pêncî salan mihacertî ne salekê neyartî.

- 4948- Pêş li rojê nayê girtin.
- 4949- Pêşî bicû paşê daqurtîne.
- 4950- Pêşî bixwe paşê bişikrîne.
- 4951- Pêşî bifikire, piştire bikire.
- 4952- Pêşî bifroşe, paşê bistîne.
- 4953- Pêşî can paşê canan.
- 4954- Pêşî derziyê di xwe re bike û piştire şûjinê di xelkê re bike.
- 4955- Pêşî eçî dike (lêdixe) û paşê maçî dike.
- 4956- Pêşî hespê bikire piştire alir çêke.
- 4957- Pêşî ji cîranê xwe re bixwaze pişt re ji xwe re.
- 4958- Pêşî ji hevalê xwe re bixwaze, pişt re ji xwe re.
- 4959- Pêşî ji me re paşî ji we re.
- 4960- Pêşî li xwe guhdar bike paşê derxe û dîyar bike.
- 4961- Pêşî ne bi rêşî ne paşî ne bawî ne.
- 4962- Pêşî xweş dike û paşî reş dike.
Weha jî dibêjin: Pêşî xweş dike dawî reş dike.
- 4963- Pêşiyên tiştêkî ji paşiyên re nehiştine.
- 4964- Pêxember ji bo canê xwe dua dike.
- 4965- Piç bi piç diçe kuç.
Weha jî dibêjin: Piçik piçik çû binê kuçik.
- 4966- Pir gotin ciger sotin.
- 4967- Pir in hevalê xwarinê kêr in hevalê kirinê.
- 4968- Pira Batmanê, Medresa Gomeydanê,
 mizgefta Hîzanê xerab nabin heta axirê zemanê.
- 4969- Piranî garanî ye.
- 4970- Piranî malwêranî.
- 4971- Piranî viranî.
- 4972- Piraniyê zora mêraniyê biriye.
Weha jî dibêjin: Piranî mêraniyê betal dike.
- 4973- Pîrbûn ji hindikayiyê çêdibe.
- 4974- Pîrs pîrsê tîne.
- 4975- Pîrs xwestina dilan e nezanî şerma mêran e.
- 4976- Pîrsa xwe bipêje û paşê bibêje.
- 4977- Pîrsa xerab pê sê pût hingiv nayê xwarin.
- 4978- Pîrsa yekî dike yan li ser xaniyan yan li ber deriyan.
- 4979- Pîrsê bike ji ciwanên gerok û ji kalê zemanan.

- 4980- Pirsê ji yekî meke ku pirs ji eqilê wî mezintir be.
- 4981- Pirsên ne pak bi zû digijîne cîh.
- 4982- Pirsên pêşiyar, bendên şîretê ne.
- 4983- Pirsên pêşiyar nexşên koçeran in.
Koçer nexşên herî baş û xweristî dikin. Ji ber vê yekê qîmeta nexşên koçeran heye. Gotinên pêşiyar jî wek wan bi qîmet û bi rûmet in.
- 4984- Pirskirin ne şerm e, nezanî şerm e.
- 4985- Pisîk di hewla rihê xwe de şêr e.
- 4986- Pisîk di sibatê de bengî dibin.
- 4987- Pisîk ne li malê ye mişk Evdirchman e.
- 4988- Pisîk û mişk nabin xwişk.
- 4989- Pisîka bi esil mirarê xwe nîşan nade.
- 4990- Pisîka ku mast birjîne ji dûr ve dîyar e.
- 4991- Pisîkê çawa bavêjî dîsa ew li ser lingên xwe disekine.
Weha jî dibêjin: Pisîkê çawa bavêjî dîsa ew li ser lepên xwe radiweste.
- 4992- Pismam, dotmamê ji ser piştta hespê peya dike.
- 4993- Pişkul çûye bajêr bûye leblebû.
Ev ji bo ew kesên qure û bêesil tê gotin. Kesên ku biçûk in xwe mezin dihesibînin û yên ku xwe înkâr dikin.
- 4994- Pişt bi dijmin û zivistanê nayê girêdan.
- 4995- Pişt bi kesên durû nayê girêdan.
- 4996- Pişt bi mêran nayê girêdan.
- 4997- Piştta xwe bide çiyayekî asî an mêrekî çê.
- 4998- Piştta xwe bi destê xwe nexurînî xurka wê naşike.
- 4999- Piştî baranê kerê cil nêke.
- 5000- Piştî her ketinek rabûnek heye.
- 5001- Piştî her şerî aşî heye.
- 5002- Piştî ku tu nabî gul xelk te bîhn bike, mebe strî li ser rîyan.
- 5003- Piştî mirinê çavkulînî nîne.
- 5004- Piştî padîşa bavê padîşa jî dibêjin.
- 5005- Piştî pêl çû xwe mavêje dû.
- 5006- Piştî tariyê ronahî ye.
- 5007- Piştî tengahiyê firehî ye.
- 5008- Piştî tirê hê kezîkurê.
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Piştî tirê nûka kezîkurê.
- 5009- Pişrûka mirovan ji danê xelkê çêtir e.

Li hinek deverên Kurdistanê weha jî dibêjin:

a) şorbeya mirov a pelîrî ji savara xelkê çêtir e.

b) nan û dewê mirov ji qeliya xelkê çêtir e.

5010- Pîr zanayo pîrxesiryo.

5011- Pîhnan li min mexe, gotinan ji devê min dernexe.

5012- Pîr baş e li cîhê xwe,

ciwan baş e li cîhê xwe.

5013- Pîr bike lê ji bîr meke.

5014- Pîr bi carekê nabe qehpik.

Weha jî dibêjin: Pîr bi canekê hîz nabe.

5015- Pîr bi nimêj be, roj dirêj e.

Varyanteke weha jî heye: Pîr bi nimêj be î nî pir in.

5016- Pîra bi nimêj û sala dûv dirêj.

5017- Pîr xêrker be, êvarên î nê zehf in.

5018- Pîra pisyayî,

navran qusyayî,

hî nî bi xwe hesyayî.

5019- Pîra sibatê dê ji nû ve biçe liqatê.

Dema her tiştî heye, heger di wê demê de neyê kirin, êdî qîmet jê re namîne û mirov nikare êdî pêk bîne. Di meha sibatê de mirov nikare here liqatê. Liqat berhevkirina gûşiyên genim e.

5020- Pîra Şamê tabihê amê.

5021- Pîrek darê şikestî ye.

5022- Pîreka ku ne di fikra mirov de be dojah e.

5023- Pîreka qenc ew e; ne rûniştî û ne pelpelokî

ne rûşûştî û gerokî.

5024- Pîrê bawer ne dikir mêr bike,

doza mehr û heşteke dike.

5025- Pîrê ji bê kesî, kalo ji bê nefî, herduyan li hev pirsîn.

5026- Pîrê ket guvendê, govend berneda.

5027- Pîrê me pîr dibin bi xirxirik û perik dibin.

5028- Pîrê memir bihar tê, kalo memir pincar tê.

Weha jî dibêjin: Kalo memir bihar tê, kero memir qîvar tê.

5029- Pîrê têxe nav xweşiyên, ciwan têxe nav reşiyên.

5030- Pîrê tir kiriye û pîr ne razî ye.

50631- Pîrgotin li Quranê xweş e.

Bi Soranî dibêjin: Zörgotin li Quranê xoş e.

5032- Pîrî tê ji serî ne ji simêl û rî.

- 5033- Pîrî ye û sed qelsî xwarî ye.
- 5034- Pîrîtî û hezar eybî.
- 5035- Pîrozgehê min çêkir,
bîyanî hat û navê xwe lê kir.
- 5036- Pîs pîsan distîne parsek jê dikeve.
- 5037- Pîvaz çiqas firk bin,
serên wan hewqas mezin dibin.
- 5038- Pîvaz, pîvaz e, çi serî ye çi binî ye?
Li hinek deveran weha jî dibêjin:
a) pîvaz tûj e çi sor, çi spî.
b) pîvaz pîvaz e çi sor, çi spî ye.
- 5039- Pîvaz nexwî bîn ji te nayê.
- 5040- Pîvazê êvarê bidin neyaran,
danê sibê bidin yaran.
- 5041- Pîyale şil e dev ziwa ye.
- 5042- Pola ji pola naxwe.
- 5043- Por xemla keçan e.
- 5044- Porê dirêj eqilê kin.
- 5045- Postê conga li ser pišta gaye.
- 5046- Postê hêştirê barê ga ye.
- 5047- Pozê jê bikin kemo ye,
guh jê bikin kerro ye,
ziman jê bikin lalo ye,
dîsa li ser benga her ro ye.
- 5048- Pozê wê dibirin, dibêje:
“sûcê zimanê min e.”

- 5049- Qada avdayî bi du xwedî ye.
- 5050- Qada bêxwedî warê guran e.
- 5051- Qala kûçik bike û çov amade bike.
Li hinek deveran di şûna gotina “çov” de “ço” û li hinek deveran jî gotina “dar” bi kar tînin. Weha jî dibêjin: Qala gur bike û dar bigire destê xwe.
- 5052- Qalibê mêşan e û dengê şaşan e.
- 5053- Qam qama mêşê ye deng dengê gamêşê ye.
- 5054- Qam û çem wek hev in.
- 5055- Qanûn lastîk e, tu bi ku de bikişînî bi wir re dere.
- 5056- Qanûna Romê û benîştê Cûmê.
- 5057- Qantir bi pêş ve gez dîke, bi paş ve zîtîk davêje.
- 5058- Qantir bize, dawîya dinê lê.
- 5059- Qantir çiqas bi hêz be, tu eslê wê bipirsî dîsa ker e.
- 5060- Qantir nazê û xwê jî şîn nabe.
- 5061- Qantir e, zîtîk vire vir e, kes nikare wê bigire.
- 5062- Qantirê berdayî zîyanê dide.
- 5063- Qasid gû xwariye.
- 5064- Qawê dizî di çil rojan de cyan dibe.
- 5065- Qaz bi qaz re baz bi baz re.
- 5066- Qaz nabin qazî.
- 5067- Qaza ku bi mirîşkê re bazde, qûna wê diçire.
Weha jî dibêjin: Qaza ku bi mirîşkê re bazde qûn lê diçete.
- 5068- Qazî gote walî “min çavê te yê vî alî.”
- 5069- Qazî rabû, muftî şa bû.
- 5070- Qazî ye ji xwe razî ye.
- 5071- Qaziyê zarokan xwe kuştî ye.
- 5072- Qebihet bibe taca zêrîn, dîsan kes nade serê xwe.
- 5073- Qeda bê li sê tiştî: Li Toriyê bê rez, li koçerê bê pez û li wî kesî ku xelk nebêje “tu”, ew bibêje “ez.”
- 5074- Qeda bigîhe nokê ku nagîhe kokê.
- 5075- Qeda bikeve cixarepêçana ber bayê û razana ser kayê.
- 5076- Qede diçin bela naçin.
- 5077- Qeda xelkê ji serê çîyan tê ya me ji ber lingên me dertê.

- 5078- Qedehek jehr vexwe lê qedehek qehr venexwe.
- 5079- Qeder, cenet û cehenem hemû li ba mirov bi xwe ne.
- 5080- Qedrê axê zanibe dê zad bide!
- 5081- Qedrê gul çi dizane kerê reş jê re divê kelbeş.
- 5082- Qedrê hîvê tune heta ku nebe şev.
- 5083- Qedrê porê spî bizanibe.
- 5084- Qedrê se tune lê yê xwedî heye.
- 5085- Qedrê zêrê, zêrker dizane.
- 5086- Qehpe ku pîr dibe tobe dike.
- 5087- Qehpê da dizê da zikmezinan neda.
- 5088- Qehpê tu çima ber nagirî?
Got: Heta yek çêdike yê din xerab dike.
- 5089- Qehwe li ber çayê derket, bihayê çayê ket.
- 5090- Qelem çekê nivîskar e.
- 5091- Qelendê mitirban didî, qîza eşîran dixwazî.
- 5092- Qelendê qîzê digihe bavê.
- 5093- Qelî ji serê çûkan çênabe.
- 5094- Qeliya ji destê xelkê mîna axa ji ber tifikê.
- 5095- Qelsemêran neajon bi qurçikan,
 xweşmêran ji warê derbên ji bin kincikan.
- 5096- Qenc çêkirin ji pîr çêkirinê ye.
- 5097- Qenc li me rast nayên û pîs jî ji me danayên.
- 5098- Qenc qencyê dajo, xerab xerabiyê dajo.
- 5099- Qencan ez xwestim, pîsan ez birim.
- 5100- Qencî bê zehmetî nabe.
- 5101- Qencî carnan dibe xerabî û xerabî dibe qencî.
- 5102- Qencî dibe xerabî, lome dibe gome.
- 5103- Qencî ji mêrikê Musilman re nabe.
- 5104- Qencî nayên ji bîr kirin.
- 5105- Qencî qencyê nas dike.
Li hinek deverên welêt weha jî dibêjin:
- a) qencî qencyê tîne.
- b) qencî wenda nabin.
- 5106- Qencî xweş e, xerabî marê reş e.
- 5107- Qenciya ne di cîhê xwe de bela ye.
- 5108- Qencyê bike û bi avê re berde.

5109- Qereçî nabin xatûn.

5110- Qerz qed e û minet li ser e.

Li hinek deveran “deyn” dibêjin û li hinek deveran jî “qerz” dibêjin.

5111- Qesab ketiye derdê kêra xwe,
nêrî ketiye derdê serjêkirina xwe.

5112- Qetla mêran li erdê namîne.

5113- Qewet alet dibire.

5114- Qewlê mêran sê car e.

Li hinek deveran weha jî dibêjin: Qewlê nebî sê car e.

5115- Qeyda desta nexcê lingan.

5116- Qeysî bê dendik nabe.

5117- Qijik penîr didize, jûjî maran dikuje.

5118- Qijikê xwest meşa werdekê hîn bibê, cotkê xwe jî ji bîr kir.

5119- Qiloç jî guh derbas dibin.

5120- Qiloçên gayî li mîhê bûya dê dinyayê xirab bikiran.

Li gor herêman gotina “qiloç” dibê “strû” an jî “şax”.

5121- Qiloçên keran çênabin dibêjin qey em tim cehş in.

5122- Qiloçên xwe li qiloçên mêran bide.

5123- Qirêja diranan zik têr nake.

5124- Qirşê xwe daneyne ser werîsê xelkê.

5125- Qise hezar e dawî bê kar e.

5126- Qise kir agir bi serê xwe kir.

5127- Qisas nagihîje qîyametê.

5128- Qismetê pisîkê di destê kevaniya xerab de ye.

5129- Qismetê seyan li dînan e.

5130- Qiyasa teşkê li meşkê.

5131- Qîmeta zêr û zîv zêrker dizane.

5132- Qîz bûm ezîz bûm, bûk bûm wezîr bûm,
ketim ber darê dergûşê pîr û rezîl bûm.

5133- Qîz çira xelkê ye.

Weha jî dibêjin: Qîz ewladê xelkê ne.

5134- Qîz dara sêvê ye, herkes tê çovê xwe davêje.

Weha jî dibêjin: Qîz ku hycê dara sêvê ye hafî-çûyî kevîrê xwe davêje.

5135- Qîz e dawilmîz e mîr ezîz e.

5136- Qîz e, lê ne ezîz e.

5137- Qîz ketin meha şeşan qûna wan daynin ser ferşan.

5138- Qîz malê xelkê ne.

- 5139- Qîz mêvanê malê ye.
- 5140- Qîz pûç e, xort qûç e.
- 5141- Qîz sêva darê ye berê kanikên hemû xortan lê ye kes nizane qismetê kê ye.
- 5142- Qîz sor in, xort kor in.
Qîz xwe kil didin, boyax û derman dikan, kincên xweş li xwe dikan û xortan dixapînin. *Weha jî dibêjin*: Qîz devsor in, xort kor in.
- 5143- Qîz teşîya dayê hiltîne, kur kevanê bavê.
- 5144- Qîz zebeşên gehîştî ne.
- 5145- Qîz zîyaret in, xort zîyaretvan in.
- 5146- Qîza axa dixwaze lê qelindê mirtiban dide.
- 5147- Qîza baş li pey bibe kaş.
- 5148- Qîza belaş wek kelaş bêrûmet e.
- 5149- Qîza bê dê mîna çiyayê bê rê.
- 5150- Qîza bêxwedî har dibe, xortê bêxwedî jar dibe.
- 5151- Qîza bi qelend zimandirêj e.
- 5152- Qîza cîran, cîran dide mêr, kurê cîran, cîran dizewicîne.
- 5153- Qîza destgirtî mîna gula devgirtî.
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Qîza destgirtî mîna qîza devgirtî
- 5154- Qîza kerê me lê jina mêrê çê me.
- 5155- Qîza mêran barê zêran.
- 5156- Qîza mêran şîresil e.
- 5157- Qîza mênêkirî, derdê dê û bavê ye.
- 5158- Qîza se be lê jina mêrê çê be.
- 5159- Qîza tîyê min, destê min hişt hat rûyê min.
- 5160- Qîza xizan e, wek strîkên ezman e, tim û tim erzan e.
- 5161- Qîza xwe bide yên bi ser xwe ve
û bûkê bîne ji yên bin xwe ve.
- 5162- Qîzan bidine mêran, nedine xwediyê zêran.
- 5163- Qîzan bikin hedefa tîran lê nedin pîran.
- 5164- Qîzek nazand gundek bezand.
- 5165- Qîzeke kor ji kurekî bêxîret çêtir e.
- 5166- Qîzê bide mêrê çê, şûrê xwe jî li ser bide.
- 5167- Qîzê bîne ji esîlan, avê vexwe ji mesîlan.
- 5168- Qîzîtî çiqas xweş e, bûkîtî gula geş e,
dema dikeve berdarê dergûşê per û baskên wê diweşe.

- 5169- Qazî ye bi gazî ye.
- 5170- Qorîna quling ji derdan e.
- 5171- Qubên spî giş ne zîyaret in.
- 5172- Qul heye lê hemza avê tune ye.
- 5173- Qumaşên baş ji bajarê xwe dernakeve.
Weha jî dibêjin: Mirov li welatê xwe nabe pêxember.
- 5174- Qutik çûye lê tu li peyî qilçik û dûçikan ketî.
 Li hinek herêman di şûna “qutik” de “îşlik” dibêjin. Wateya vê gotinê nêzîkî ya “aş çûye, li du çeqçeqoyê digere” ye.
- 5175- Quwet îletê dibire.
- 5176- Qûl bê qisûr nabe.
- 5177- Qûn qûna mirîşkê ye lê hêkên qazan dike.
- 5178- Qûna cîranan bî cîranan mezin e.
- 5179- Qûna elimî tira naelimî ser bera.
- 5180- Qûna ku hîn bû tiran û devê ku hîn bû viran
 çênabe heta kurê kuran.
- 5181- Qûna ku hînî ser potikan bibe, nikare li erdê rûne.
- 5182- Qûna li ser doşekê hînî tir û fisan dibe.
- 5183- Qûna qereçiyar erd nagire.
- 5184- Qûna reş û spî di roja teng de kifş e.
- 5185- Qûna reş û spî li ber bircê dîyar dibe.
- 5186- Qûna şil erd nagire.
- 5187- Qûna şûştî-mûştî li mala xwe rûniştî.
Weha jî dibêjin: Qûna şûştî li ser pot rûniştî.
- 5188- Qûna tazî tembûr dixwazî.
- 5189- Qûşxane gindirî devika xwe dît.
- 5190- Qûtê me dixwe, ji xelkê re hêkan dike.
Varyanteke weha jî heye: Ji xelkê re kew digire, ji xwe re kûsî.

- 5191- Ra li diziyê dibe lê li ziman nabe
 5192- Ra li her tiştî dibe lê li mirinê nabe.
 5193- Rabûn û ketin ji mêran re yek e.
 5194- Rake bi nanê xwe û berde canê xwe.
Varyanteke weha jî heye: Xwedî bike bi nanê xwe û berde canê xwe.
 5195- Raket ro germ e, rabû ro serm e.
 5196- Rast be bi Xwedê re biger li dinê zewal tune jê re.
 5197- Rast e, me hiştir nedîtîye lê pişkulê wê dîtîye.
 5198- Rast e navê mêr li ser min e lê azara stûyê min e.
 5199- Rastan zewal tune, xwaran kemal tune.
 5200- Rastan zewal nîne bêbextan kemal nîne.
 5201- Rastgo li mala xwe namirin.
 5202- Rastî bibe dezî jî naqete.
Weha jî dibêjin: Rastî bibe dezî jî naşike.
 5203- Rastî hey tehl e.
 5204- Rastî rizgarî ye.
 5205- Rastî riya xwedê ye.
Weha jî dibêjin: Rastî navê Xwedê ye.
 5206- Rastî serî dişikên e.
 5207- Rastî zirav dibe nadire, derew stûr dibe dişke.
 5208- Rasto bi rastî re xwaro bi stûyê şikestî re.
 5209- Rasto bi xwe dere, xwaro bi erdê re.
 5210- Rasto-duristo, xwaro şikesto.
 5211- Rasto û besto dan tayekî xav neqetandin,
 yek dîno, yek duristo.
 5212- Rastiyê vemeşêre û nebêje ez im şêr.
 5213- Ray li her tiştî dibe lê li pîrbûn û mirinê nabe.
 5214- Ray li her tiştî dibe lê li nefis û mirinê nabe.
 5215- Refê tûtiyan bi tenê ye.
 Kurd ji “papagan” re “tûtî” dibêjin. Kesên ku pir dipeyîvin kes zêde guhdariya wan nake.
 5216- Rehme li gora melûnan nabe.
 5217- Rencberê xwe be xweşdiviyê cîranan be.

- Weha jî dibêjin:* Rencberê xwe be axayê xelkê be.
- 5218- Rencberê zanan be ne axayê nezanan be.
- 5219- Reng rengê mêşê ye, deng dengê gamêşê ye.
- Weha jî dibêjin:* Qam qama mêşê ye deng dengê gamêşê ye.
- 5220- Rengê mêran û titunê ne dîyar e.
- 5221- Rengê sor li her kesî nayê.
- 5222- Req ketine avê xwe dane ber tavê.
- 5223- Reş bi reş kenîya reş çû ber eletewş kenîya.
- 5224- Reş ke, dilê xwedî pê xweş ke.
- Weha jî dibêjin:* Reş ke dilê xudanê xweş ke!
- 5225- Reş û peş me nakin nexweş.
- 5226- Reşê dê û bavê, spî nabe bi sabûn û avê.
- Weha jî dibêjin:* Qijik reş e, çiqas xwe bişo dîsa spî nabe.
- 5227- Reşî reşiyê tîne.
- 5228- Rev heye carman ji mêranîyê çêtir e.
- Varyanteke weha jî heye:* Rev nivê mêranîyê ye.
- 5229- Rev jî ya mêran e, desthilanîn jî ya mêran e.
- 5230- Reva pisîkê heta kadînê ye.
- Li hinek herêman weha dibêjin:* Beza pisîkê heta kadînê.
- 5231- Rewşa biharê hişînayî ye.
- 5232- Rewşa bostan qewind û zebeş e.
- 5233- Rewşa çiya bilindayî ye.
- 5234- Rewşa daran mêwe ye.
- 5235- Rewşa dewlemendiyê eqil e.
- 5236- Rewşa guran nêçîr e.
- 5237- Rewşa gamêşan stûrbûn e.
- 5238- Rewşa gan strû ne.
- 5239- Rewşa gundan mirov in.
- 5240- Rewşa jinan kofî ye.
- 5241- Rewşa kalan mûyên spî ne ya
xortan temûrî ne ya qîzan bisk û
kezî ne ya pîran tevn û teşî ne.
- 5242- Rewşa keran herdu guh ne.
- 5243- Rewşa konan rêşî ne
ya çeman darê bî ne
û ya geliyan av û kanî ne.
- 5244- Rewşa konê çît û stûn e.

- 5245- Rewşa malê kevanî ye.
- 5246- Rewşa malan xort û qîz in.
- 5247- Rewşa malan zarok in.
- 5248- Rewşa mirovan kinc e.
- 5249- Rewşa payîzê aş û arvan e.
- 5250- Rewşa şovê tov e.
- 5251- Rewşa zivistanê berf e.
- 5252- Rewşa zozanan konkutan e.
- 5253- Rextê bêfişek e,
Xwedê bi milê kesî ve neke.
- 5254- Rez ji darê dûr nakeve.
- 5255- Rez û pez li dû bibez!
- 5256- Rêbîro kur biro.
- 5257- Rê dûr e, keser kûr e.
- 5258- Rê ji gund diçe gundan
lê ji dil naçe hemû dilan.
Weja jî dibêjin: Rê ji dilan naçe.
- 5259- Rê li ber dizan mexe.
- 5260- Rê li dilan teng e.
- 5261- Rê, riya mirinê be jî, tu her li pêş be.
- 5262- Rêwî diçe rê dimîne
şûr diçe derb dimîne.
- 5263- Rêwî di rêwitiya xwe de.
- 5264- Rêwî xweş tişt e
lê çirte-çirta pişt e.
- 5265- Rih dibe bost dijmin nabe dost.
Weha jî dibêjin: Rih dibe bost, ji dostaniya dijmin re ne qerar ne soz.
- 5266- Rih diqusîne û pişt re mirikê dide ber.
- 5267- Rim di tûr de nayê veşartin.
- 5268- Rimê rimbaz davêje.
- 5269- Rind e, geroka nava gund e.
Weha jî dibêjin: Rind î rind î lê geroka nava gund î.
- 5270- Rinda ber çiran sora ber agiran.
- 5271- Rindên gundan bê nav û nûtik nabin.
- 5272- Rindiyê bike bi rubar re berde.
Rûbar çem e. *Li hinek herêman weha dibêjin: Çeyî bike bi avê re berde.*
- 5273- Rindiyê bike bila rindî bê pêşiya te.

Li hinek cîhan weha jî dibêjin: Çeyiyê bike çeyî bibîne.

5274- Risqê cixarê fireh e.

5275- Risqê gur bi xema şivanê bêxêr e.

5276- Risqê haran li dînan e.

5277- Risqê mêvan berî mêvan tê.

Weha jî dibêjin: Risqê mêvan fireh e.

5278- Risqê san li dînan e.

Weha jî dibêjin: Risqê san li dînan e yê Tirkan li Kurdan e.

5279- Risqê siwar ji bo peya ye.

5278- Ritila te bila li ser tuxta wê be.

5281- Rî nebe girîş heger bû girîş, divê şeh hilbigirî.

5282- Riya dilan bi ser dilan de diçe.

5283- Riya dûr çêtir e ji tirba kûr.

5284- Riya dûr derman e.

5285- Riya ezman berwar e.

5286- Riya ga her gelî ye.

5287- Riya hezar mîlî bi gavek dest pê dike.

5288- Riya ku tu lê biçî, ez lê zivirî me.

Weha jî dibêjin: Heta tu ji vir ve çûyî, ez ji wir ve hatime.

5289- Riya ku mirov dizane ya herî kurt e.

5290- Riya malê malxo dizane.

5291- Riya mirinê li pêş her kesî ye.

5292- Riya rast riya evîna welat e.

5293- Riya tu çûyî lê nezivire.

5294- Riya şînê ji şînê re ye.

5295- Ro bi bêjîngê nayê veşartin.

5296- Ro bi destan nayê girtin.

5297- Ro çû dîsa, bû fitara qîza.

5298- Ro li kû derê li te çû ava, li wê derê bisekine.

5299- Ro û hîv padîşahê dinê ne.

5300- Roj bûye sal zik bûye çal.

5301- Roj derbas dibe qeda rojê derbas nabe.

5302- Roj diçe bela naçe.

5303- Roj dîyar e pencere navê.

5304- Roj e dûman e kêfa guran e.

5305- Roj hatiye delavan, maye dewê xeraban.

5306- Roj hilhat mirina gavan û şivan hat.

5307- Roj reş bû, tu jê reştir be!

5308- Roj tê yê dikene digirî yê digirî dikene.

5309- Roja bager ji malê meçe der.

5310- Roja çê ji sibehê ve kifş e.

Li hinck deveran di şûna gotina “çê” de gotina “xweş” jî bi kar tînin. Gotinêke din heye ku tam li dijberî ve gotina han e: Roja reş ji sibehê ve kifş e.

5311- Roja êş ji êş re ye.

Dema ku mirov bixwaze roja xwe bi giştî ji bo tiştêkî bi kar bîne, wê demê vê gotinê dibêjin. Li vir gotina “aş” hatiye tewandin û bûye “êş.”

5312- Roja ku çû ava êdî bi paş ve venagere.

Weha jî dibêjin: Roja here bi paş ve venagere.

5313- Roja Kurd bûn Musilman, wenda bûn li cîhan.

5314- Roja teng her kes ji xwe re ye.

5315- Roja teng mirov berê xwe dide çiyê an mirovekî çê.

5316- Roja teng mirovê mirov kêrî mirov tê.

5317- Rojek ya gulê ye û yek jî ya gulşilavê ye.

5318- Rojek rijîya, rojek pijîya û bihar qedîya.

5319- Rojêke xweş hêja ye sed rojên ne xweş.

5320- Rojê gûzek bû dîzek.

Karê bi dom encam dide. Berhevkirina tişt jî weha ye:
Bi piç piç dibe qûç.

5321- Rojên mayî ji yên bihurtî pirtir in.

5322- Rojên xerab çêdibin lê mirovên xerab çênabin.

5323- Rom bêbext e pişt pê girênedê.

Kurd ji Tirkan re dibêjin “Romî” û ji Tirkîyê re jî dibêjin “Rom”. Ev ji dema dewleta Romê tê. Piştî Tirk jî ji rojhilat ve hatine, derbasî Anato lî bûne û ketine welatê Romê. Êdî ew navê “Rom” li ser Tirkan maye.

5324- Rom kûçikê bê dûçik e.

5325- Rom neyar e, Osmanî koremar e.

Qest dewletên Roma û Bizans in. Osmanî ji wan jî xerabtir e.

5326- Ronahiya çavan ji rûn e.

5327- Rondikên çavan bi deyn in.

Rondik: Hêstir, fermisk.

5328- Rovî bi teriya xwe şa dibe.

Hewwateyên gotina terî pir in. *Çend jê*: Boçik, qemçik, dûv, dêl...

5329- Rovî digere, tê dora mirîşkan.

Weha jî dibêjin: Rovî dijminê mirîşkan e.

5330- Rovî diweste dûv giran dibe.

5331- Rovî li derê qula xwe şêr e.

5332- Rovî naçe qulê hej bi dûvikê xwe ve dike.

5333- Rovî ne gelaciyê be dê here sûkê.

5334- Rovî têr e, tirî tirş e.

5335- Rovî tu çima xwe dihejîni?

Got: Li min tê û ji min tê.

5336- Rovî û sûk?

Weha jî dibêjin: Şixulê rovî çî li sûkê heye ku postê wî were pênc peran?

5337- Roviye berdayî çêtir e ji şêrê girêdayî.

Weha jî dibêjin: Roviyeke gerok ji şêrekê raketok çêtir e.

5338- Roviye şekalan, digere li dora malan.

5339- Roviye fenek nakeve çî dafikan.

Weha jî dibêjin: Roviye feltinok nakeve çî telha.

5340- Roviyan rê birîne lê navên guran derketiye.

5341- Rû bide cewrik û kûçikan lê nede zarokan.

Li hinek herêman di şûna gotina “zarok” de “sêlik” jî dibêjin. Li gor vê gotinê dema mirov rû bide zarokan, ew bêterbiye dibin.

5342- Rû da cîh da.

5343- Rû ji lêv pêş in û bi êş in.

5344- Rû ji rû şerm dike.

Li hinek deveran di şûna gotina “şerm” de gotina “fedî” jî dibêjin.” *Var yanteke weha jî heye*: Rû li rû mêze dike.

5345- Rû ji rû şerm dike,

bertîl keviran nerm dike.

5346- Rû bi rû, gunch efû.

5347- Rû xweş e û dil reş e.

5348- Rûmet ji axê re nabe.

5349- Rûmet girtin ji her kesî nayê.

5350- Rûmeta mirovan ehlê gund bilind dike.

5351- Rûn bihelîne paşê hilîne.

5352- Rûn di eyarê seyan de nayê veşartin.

Weha jî dibêjin: Rûn e lê di eyarê seyda ye.

- 5353- Rûn li axê ke û li ber axê ke.
 5354- Rûn li ba Ereban zehf dibe,
 li dora “k.” û “g.”ê xwe didin.
 5355- Rûn para mîran e dew para feqîran e.
 5356- Rûnê genî li ser nanê xwedî ye.
 5357- Rûnê paqij bi ser avê dikeve.
 5358- Rûnê serekî,
 dayne derekî,
 bibe barê kerekî.
 5359- Rûnişt li germa,
 rabû li serma.
 5360- Rûniştin xwişk û bira, ker dane gura.
 5361- Rût e, şan e, roja şilî dest û pêwan e.
 5362- Rûtên pey şiliyê dest û piyên wan ziwa ne.
 5363- Rûto çi li vî aliyê avê çi li wî aliyê avê.
 5364- Rûto xeber pûrto.
 5365- Rûyê jinê hinar e, barê mêrê wê hejar e.
 5366- Rûyê ku ji ava behrê şil nebe, çawa ji tifê şil dibe.
 Li hinek deveran weha jî dibêjin:
 Rûyê beqê ji ava golê şilnabe, çima ji tifa te şil bibe?
 5367- Rûyê mirov ji xwîn û goşt e.
 5368- Rûyê mirovê virek tim reş e.
 5369- Rûyê qayîm ji berê cotê ga çêtir e.
 5370- Rûyê reş ne hewceyê teniyê ye.
 Weha jî dibêjin: Rûyê reş çi bike bi teniyê

- 5371- Sabûnê bînî ji erş, dîsa ji te naçe qalikê reş.
- 5372- Sal bi sal xwezî bi par.
- 5373- Sal mij e, kodik tije.
Sala ku baran bibare û hewa xweş be, zevî baş tene didin û kodik û kewar jî tijî tene dibin. Wê salê ber û bereket pir e. *Weha jî dibêjin*: Sal bi mijî, koda tijî.
- 5374- Sal mîna bawîşkan tîn û diçin.
- 5375- Sal nû gote got nû.
- 5376- Salê were sultan be, mehê were mêvan be,
her roj mewe bêtehm be.
- 5377- Salekê boxetî nadim deh salên mangetî.
- 5378- Salekê xilik û salekê gurçik.
- 5379- Sanoyê izîr ga daye gizîr.
- 5380- Saq e, gore liyaq e.
- 5381- Sar e, cil sitar e; germ e, cil şerm e.
- 5382- Sar û serma ye, potik bav û bira ye.
- 5383- Savar bi tevdanê şîş bi pêçanê.
- 5384- Savara bi kevir diran dişkîne.
- 5385- Sax dibe şûna xenceran lêbelê xweş nabe şûna xeberan.
- 5386- Saxan zad tune, tiralan guman tune.
- 5387- Saxan zewal tune, xwaran xelas tune.
- 5388- Sazbendê baş ji saz kifş e.
- 5389- Se be, ji qewmê xwe be.
- 5390- Se bê xwedî nabe.
- 5391- Se bi kiş-kişê naçe tu kesî.
- 5392- Se çav bi xwediyê xwe dikeve dir dibe.
- 5393- Se çi bixwe wî dirî.
- 5394- Se çiqas nas be jî dîsan dar ji destê xwe navêje.
- 5395- Se daye pey se, nan ji pisîkê re nema.
- 5396- Se direyî karwan dere.
- 5397- Se direyîn û hev dibînin.
- 5398- Se goştê se naxwe.
- 5399- Se helaw naxwin.

- 5400- Se ji se re got ew jî zivirî ji dora xwe re got.
- 5401- Se ku se ye naçe jinan.
- 5402- Se li pêş mala xwe xurt e.
- 5403- Se, se ye, hestî dikoje, hesabê qûna xwe dike.
- 5404- Se xwediyê xwe nas dike.
- 5405- Seba gulekî mirov strîyan dike paşila xwe.
Di şûna “strî” de gotina “dirik” jî dibêjin.
Weha dibêjin: Seba gulekê mirov dirikan dike paşila xwe.
- 5406- Seba hebûbek tirî mahserok rast dibe.
Weha jî dibêjin: Seba welçekok genim, bender rast dibe.
- 5407- Seba kerê xwe deva xelkê mirar meke.
- 5408- Seba nefsê ket hefsê.
- 5409- Sebir arema mêran e.
- 5410- Sebir dibe birke.
- 5411- Sebir mîrê Misrê ye.
- 4512- Sed bi yekê ye û yek bi sedî ye.
- 5413- Sed çakûç û yek sindan.
- 5414- Sed gaz werîs esil herçîn e.
Ji darikê serê werîs re herçîn dibêjin. Li henel deveran “heçk” jî dibêjin.
- 5415- Sed gotin bi gor kirinekî dibe.
- 4516- Sed gotin bi gotinekê disekine.
- 5417- Sed gulî zîwan mirov gorîna guşiyek genim dike.
- 5418- Sed mîh li bin siya darekê mexel tîn.
- 5419- Sed sal û saetek, saetek û sed sal got rast e;
got piştî du kur û keçekê.
- 5420- Sed tebarek bixwîne li ber serê dewarek,
tu car nake hewl û karek.
- 5421- Sed tir li ba tirekan yek hesab e.
- 5422- Seqa li gor reqa.
- 5423- Ser bide lê sir nede.
- 5424- Ser mezin a ling biçûk wê li malê bikin bûk,
ling mezina ser biçûk wê ji malê bikin der.
Du varyantên weha jî hene:
a) ling mezin a ser biçûk, ne xwezî li wê malê bibe bûk.
b) ling biçûka ser mezin, xwezî bi wê malê ku têde bibe bûk.
- 5425- Ser mit e û qûn rût e.

5426- Serapîra zengilê kera.

5427- Serav dizane binav çi kiriye.

5428- Serbidewa bênanî ji vir heya serbanî.

Serbidew navê xwarinekê kurdî ye û zû sar dibe.

5429- Serdar daketin bindar rabûn.

5430- Serê berjêr nayê jêkirin.

5431- Serê bênamûs naçe buhiştê.

5432- Serê birî nayê kirî.

5433- Serê camêran heye, kela ye.

5434- Serê cîran ji cîran dêşe.

5435- Serê çiyayê bilind tim bi dûman e.

5436- Serê çivîkê çi ye, qelya wê dê çi be?

Weha jî dibêjin: Ji serê çûkê qelî çênabe.

5437- Serê ço jî bi gû ye, binê ço jî bi gû ye.

5438- Serê du beranan di sîtilekê de nakele.

5439- Serê gurî di bin kum de çêtir e.

5440- Serê gurî di bin kum de nayê veşartin.

Mirov her çiqas eyb û kêmasiyên xwe veşêre jî, dîsa dîyar dibe.

5441- Serê heft newalan newalek e, serê heft gotinan gotinek e.

Weha jî dibêjin: Serê heft newalan newalek, serê heft pirsan pirsek.

5442- Serê her kesî li ser singa wî ye.

5443- Serê karan bi bîst û çaran.

5444- Serê kesê mêr bi mij û dûman e.

5445- Serê ku hat berdandê bi heft werîsan nayê girêdan.

5446- Serê ku hat birînê bi nayê kirîn.

5447- Serê ku ji dê derketiye naçe dê.

Weha jî dibêjin: Serê ku ji cîhê xwe derkeve, hew diçe cîhê xwe.

5448- Serê ku nayêşkê kinc li girê mede.

5449- Serê ku ne li nav seriyan be, heqê wî jêkirin e.

5450- Serê ku ne êş e, kundir jê çêtir e.

Weha jî dibêjin: Serê ku neşikê bêxêr e.

5451- Serê ku sed serî jê ne êş e, ew gêj e.

Weha jî dibêjin: Ew serê ku hezar serî jê eciz nebin, ew ne tu serî ye.

5452- Serê li ber minetan bila biçê nav zîyaretan.

5453- Serê lodê bi gurzekê tê girtinê.

5454- Serê merdan her bilind e.

5455- Serê min ne bi şehr e,

- gotina min ji we re bi jehr e.
- 5456- Serê mezin eqilê wî kêr e.
- 5457- Serê min bi kitan e, dilê min bi qitran e.
- 5458- Serê miriyan heta li tehta gorê nekeve hişyar nabin.
- 5459- Serê mirovê rast tim bilind e.
- 5460- Serê navcîtiyê tim dişike.
- 5461- Serê neyêşc ne hewceyê destmalê ye.
- 5462- Serê ne yek hev naçin yek hev.
- Weha jî dibêjin:*
- a) serê ne yek hev naçin nik hev
- b) serên ne bi ser yek be, naçin dev yek ve.
- 5463- Serê paşa diêşa, lebîxe di gunê wî didan.
- 5464- Serê pîvazê çî ye, binê pîvazê jî ew e.
- 5465- Serê qelûnê, binê hêkrûnê para xulaman e.
- Xulam ji axayê xwe re qelûnê amade dikin, agir didin ser û çend hilm di kişînin, dema agir bigire pêşkêşî axê xwe dikin. Di dema xwarinê de jî, axa xwarina xwe dixwe û avrî (bermayî) ji xulam re dimîne.
- 5466- Serê sax balgî naxwaze.
- 5467- Serê sed mêrî mêrek e.
- 5468- Serê sed newalî newalek, serê sed gotinî gotinek.
- 5469- Serê sing du çiq e, loma di axê de naçe.
- 5470- Serê xwe her bide dîwarên kevin.
- 5471- Serê xwe bide û bextê xwe nede.
- 5472- Sergo li ser banan nakeve.
- Dema kesekî ne hêja û bêsil rabe dawa mezinatiyê bike, wê demê vê gotinê dibêjin. Yanî kesên ne hêja nikarin cîhê kesên hêja û rêzdar bigirin.
- Weha jî dibêjin:* Sergo nedaye ser banan.
- 5473- Serhildan jîyan e.
- 5474- Serî benda doqê xulaman e.
- 5475- Serî bê ecel naçe gorê.
- 5476- Serî bi xeml û xêz e, ling striyan diparêze.
- 5477- Serî bikevin serpêç zehf in.
- 5478- Serî çiqas bimîne, qûn ecêban dibîne.
- 5479- Serî dibêje Allah û qûn jî dibêje maşallah.
- 5480- Serî dikeve, dawî xeber tê.
- 5481- Serî hebin serpêç zehf in.

5482- Serî mezin e lê eqil tê tune.

5483- Serî qûç e binî pûç e.

5484- Serî tê birîn û ziman nayê birîn.

5485- Seriyek çortan e û komek xizan e.

Ji dewê hişkiri re çortan dibêjin. Dema feqîrî hebe û îdare nebe weha dibêjin. Belê nifûs gelek e û xwarin tune.

5486- Sero ne êşe dersûkê navêje.

5487- Serqotê ber baranê pêxwasê ber garanê.

5488- Serxweş ne hewceyê dafdanêye, ew bi xwe dikeve.

5489- Se bi xwediyê xwe nagire.

5490- Seyê axa jî axa ye.

5491- Seyê baş hevalê xwediyê xwe ye.

5492- Seyê bêxwedî herkes kevir davêje wî.

5493- Seyê direyî, ji tirsê şevê ye.

5494- Seyê gurîx di tûletiyê de gurîx e.

5495- Seyê har bela xwe dibîne.

5496- Seyê ku diranên xwe pêş bike, nadire.

Weha jî dibêjin: Seyê ku diranên xwe nîşan bide, bi mirov nagire.

5497- Seyê ku hestî dixwe, hay ji qûna xwe heye.

5498- Seyê min e, li ber deriyê xelkê diewite.

Varyanteke weha jî heye: Kerê me di axurê xelkê de dizire.

5499- Seyê xwe xwedî nekî

dê bi qetek nan here ber deriyekê din.

5500- Seyê xwedî çirandî, xelkê ji ber te firandî.

5501- Seyî mirov dide xatirê xwedî.

5502- Sê gidî hene li dinê: Yê li hevrazan dikşîne qelûnê, yê mala xwe dibe ser mala bavê jinê, yê bi rê ve diçe bi tenê.

Gotina “gidî” di wateya “ehmeq” an jî “kêmeqil” de hatiye bikaranîn.

Varyanteke weha jî heye: Yê gula xwe dide bi sosinê yê mala xwe dibe ba mala bavê jinê, yê mîya xwe dide bi bizinê.

5503- Sê ker hene li dinê:

yek jê mîhê dide bizinê,

yê duyem genim davêje şûna kizinê,

yê sêyem mala xwe dibe rû mala bavê jinê.

5504- Sê kevir mirov dide hev, ew bi hev disekin.

5505- Sê malên feqîr mêvanekî têr nakin.

5506- Sê payên qencyê, neqencyê li xwediyê xwe vedigerîne.

5507- Sê kesên bêhiş hene li dinê:

Yê bi rêde diçe bi tenê
yê erzanî dikişîne titûnê
yê ku dike bi gotina jinê.

5508- Sê parên xwarziyan li xalan tên.

5509- Sê şertên mêran hene yek jê rev e.

5510- Sê tişt hene bi serêş; mirtîb, mirîşk û mêş.

5511- Sê tişt hene serê wan bermede: Hesp, av û jin.

5512- Sê tişt ji bo mirinê:

Berxê li ber bizinê, mêrê bi gotina jinê, mişkê terazîne. *Li hinek herêman weha jî dibêjin:* Bila sê bêne mirinê: Berxê li ber bizinê, mêrê bi gotina jinê, mişkê terazîne.

5513- Sê wêne dost hene: Nano, gano û cano.

5514- Sêla min kevir e, ji minetan çêtir e.

5515- Sêv ji dara kurmî ye.

5516- Sêv sor e lê ku kurmî nebe.

5517- Sêv ku bigîhe dê bikeve.

5518- Sêva çê para hirçê.

Dema mirov bixwaze bêje; ku tiştên baş para xeraban e, wê demê vê gotinê dibêje. *Weha jî dibêjin:*

a) sêva sor dikeve devê mişkê kor.

b) sêva sor dikeve destê kundê kor.

5519- Sêwî sitirîn, milyaket heyirîn.

5520- Sêwîbûn ji dê ye, ne ji bavê ye.

5521- Sêzdchê kanûnê rojê berê xwe daye sosin û beybûnê.

5522- Sibat berf tê bi qulat nagirê li tu welat e.

5523- Sibat bêndera berfê ye.

5524- Sibata dînik e geh digirî geh dikene.

5525- Sibat e, libat e.

5526- Sibat e, qîb-qîba ribat e.

5527- Sibat e, selawat e.

5528- Sibe tê, xêr jî pê re tê.

5529- Sibê mirina kedkaran hat, êvarê mirina axa hat.

5530- Sibê parî, nîvro heta dikarî, êvarê dixwî naxwî tu dizanî.

Zanist jî, îro li gor vê gotina pêşiyên Kurdan xwarina sêdanî ji mirov re pêşnîyaz dike.

5531- Sibê rovî êvarê kovî.

- 5532- Sibhan ji heyînê ye.
- 5533- Sibhan ji wî xaliqî,
du li hev eliqîn,
yek kor û yek çav şeliqî.
- 5534- Silav li mîh e ne li rû ye.
Li hinek herêman weha jî dibêjin: Silav ne riyane, silav li mûyan e.
- 5535- Silav li sifreya hazir e.
- 5536- Silto bû kevanî, golikan werîs hilanî.
- 5537- Simêl bi pisîka ve jî heye.
- 5538- Simêl li ber pozê mêran heye..
- 5539- Simêlsorî malxerabî.
- 5540- Sin'et bazina zêrîn e lê di destê herkesî de nîn e.
- 5541- Sin'et çek e, di berîka xwe ke, bi te hewce tê, derî veke.
Weha jî dibêjin: Şuxil çek e, paşla xwe ke, te hewce be derî veke.
- 5542- Sin'etkarê çê, ji welatê xwe dernakeve.
- 5543- Sing ji ber mîkut diçe.
- 5544- Singa sê çiq naçe erdê.
- 5545- Sipî li qerpalan pîrgotin li xerabmalan.
- 5546- Siûd ji eqil zêde ye.
- 5547- Siwar heta nekeve, nabe siwar.
- 5548- Siwar siwar e, li siha guhdar e;
li nav serî nexê dîn û har e.
- 5549- Siwarbûna fîl di heriyê de xweş e.
- 5550- Siwarbûna kerê eybek e, peyabûn du eyb e.
Weha jî dibêjin: Siwarbûna kerê şerm e, dana pey du car şerm e.
- 5551- Siwarê bi tenê, tozê nake.
- 5552- Siwarê dêlrûtê, sibehê diçe, êvarê zû tê.
- 5553- Siwarê hespê xelkê tim peya ye.
- 5554- Siwarê keran ne tu siwar e,
jina bi mêr ne tu yar e.
- 5555- Siwarê kerê nagihe tu derê.
Weha jî dibêjin: Siwarê kerê gû li berê.
- 5556- Siwarê kerê ye lê digere.
- 555- Siwaro Xwedê riya te dirêj bike!
Got: Bi destê min e.
- 5558- Sî xwar bû pale har bû.
- 5559- Sîha sibehê li ser nemîne ya êvarê tê.

- 5560- Sîha pelkê ye ne li xwe ye û ne li xelkê ye.
- 5561- Sîr nexwe bila bîhn ji te neyê!
- 5562- Sîrekê dide bi pîvazekê jê xelas nabe.
- 5563- Sofiyê remezanê wek kerê dû garanê.
Di şûna gotina “ker”de gotina “cahş” jî bi kar tînin.
- 5564- Sola ku ji te re nebû bavêj!
Weha jî dibêjin: Sola ku ji lingê mirov re nebû, mirov davêje.
- 5565- Sola kûr ji mirov re nabe,
newala kûr bê av nabe.
- 5566- Sola teng ling kul dike.
- 5567- Solbend nikarin lingên mar rast bikin.
- 5568- Soldirû xwas in, cildirû bê kiras in.
Weha jî dibêjin: Solker xwas in, cumker bê kiras in.
- 5569- Sond şûrê du dev e.
- 5570- Sor kir, zer kir, her da bi heqê xwe.
- 5571- Sor in hinarikên rû, ji karê comerdê şû.
Li herêma Behdînan ji zewacê re “şûkirin” dibêjin.
- 5572- Sozê mêran soz e, ne toz e.
- 5573- Stêrên ezmanan nayên hejmaran.
- 5574- Strî di navbera goşt û neynûkê de cîh digire.
- 5575- Striyên welatê mirov ji gulên welatên xelkê çêtir in.
- 5576- Stûrî ji gayê cot re namîne.
- 5577- Struyê gayî li mîhê bûya dê dinyayê xerab bikira.
Li hinek herêman ji “strû” re “qiloç” an jî “şax” dibêjin.
- 5578- Stuyê meşkdirûyan xuya ye.
- 5579- Stuyên kur û keçê bi ser dê de xwar in.
- 5580- Sûk tijî qûmaş e lê mele bê şaş e.

- 5581- Şabûn li mirtiban nayê.
- 5582- Şabûna pisîkê kuştina mişk e.
- 5583- Şadî û şînî cêwî ne.
- 5584- Şahîd ji malê ye xazoq li serê darê ye.
- 5585- Şahidê rovî dûvê rovî ye.
- 5586- Şahîno şa ye, Aqbo axa ye.
- 5587- Şal hişîn e tiştêk li malê nîn e.
- 5588- Şal û şapik şixulê saqê.
- 5589- Şal bi tiran germ nabe.
- 5590- Şalê min li xwe ke lê tir û fîsan tê neke.
- 5591- Şam dûr e, ma mişar jî dûr e?
- 5592- Şam şekir e lê welat jê şêrîntir e.
- 5593- Şam xweş e lê ji şamiyan re.
- 5594- Şana hingivî ye belê ne şîrîn kiriye.
- 5595- Şaqolî ne peya be bila li çêlekê siwar be.
- 5596- Şayî rewşa dinê ye,
mirin bi destê Xwedê ye.
- 5597- Şeb û şekir çûn Dîyarbekir
şekir rûnişt deng nekir,
şeb rabû pesnê xwe kir.
- 5598- Şeb û şekir li cem şivan yek in.
Weha jî dibêjin: Şekir ne xwarina şivên e.
- 5599- Şehîd namirin.
- 5600- Şekir naxwim, pîvaz dixwim.
- 5601- Şekir şêrîn e lê her roj nayê xwarin.
- 5602- Şekir şêrîn e lê şûna nan nagire.
- 5603- Şekir û pincar, ev car.
- 5604- Şeko navê xwe li xelkê ko.
Weha jî dibêjin: Şeko navê xwe li hevalê xwe ko.
- 5605- Şem bike, şûm bike: paşiya xwe re cû bike.
- 5606- Şemedan roniyê nade bin xwe.
- 5607- Şemî maka hemû rojan e.
- 5608- Şemze nemirin zêrîn in.

- 5609- Şer başeşov e ne ku bêder e.
- 5610- Şer bi şûrê zirav e,
bazirganî bi dirav e.
- 5611- Şer bi tîfinga vala nabe.
- 5612- Şer bi çek, mamele bi pere.
- 5613- Şer ji betaliyê çêtir e.
- 5614- Şer ji bêxwedîtiyê dibe.
- 5615- Şer jî şer e, nîvşer jî şer e.
Weha jî dibêjin: Şer û nîv şer hevalên hev in.
- 5616- Şer ku mirov di nav de be xweş e.
- 5617- Şer nexweş e lê şername xweş e.
- 5618- Şerab eslê mirovan derdixe.
- 5619- Şeraba bêheq, her kes vedixwe.
- 5620- Şerbik teze ye, av şîrîn e.
- 5621- Şerefa dinyayê mal e.
- 5622- Şerê kûçikan li ser dêlan in.
- 5623- Şerê li şovê ne gengeşa benderê.
Weha jî dibêjin: Şerê nav şov çêtir e ji qire qira bêderê.
- 5624- Şerê sibê ji xêra êvarê çêtir e.
- 5625- Şerma dinyayê, ji ezabê gorê mezintir e.
- 5626- Şert ne hilê hilê ye, şert gêre gêre ye.
- 5627- Şertê dilsafitiyê ne şaşika spî ye.
- 5628- Şervan be lê ne şerxwaz be!
- 5629- Şev çiqas dirêj be jî, dê roj derkeve.
Weha jî dibêjin: Şev çiqas dirêj bê, roj yê derkeve.
- 5630- Şev hemû avis in.
- 5631- Şev keleha mêran e.
- 5632- Şev radizin lê diz ranazin.
- 5633- Şev yek e, diz hezar.
- 5634- Şev li piştê, şixul nekir tiştê.
- 5635- Şeva çirîn kew diçêrin.
- 5636- Şeva tarî ji êvar de kifş e.
Weha jî dibêjin: Şeva reş ji êvarê ve reş e.
- 5637- Şevên li dû baranan mîna çilê zivistanan.
Weha jî dibêjin: Şevê pey rojê bi baranê gelek sar in.
- 5638- Şevên tarî kelha mêran in.
Li hinek deveran weha jî dibêjin:

- a) şevên reş kela mêran in.
 b) şev kelha mêran e.
- 5639- Şevên tarî hîn ji hingurê kifş in.
 Kurd ji “berhêvarê” re hingur dibêjin. Hinek kes gotina “hingur” di wateya “şefcêqê” de bi kar tînin, di vê gotina pêşyan de jî baş dîyar dike, ku ew ne rast e. *Li hinek deveran weha jî dibêjin:*
 a) şeva tarî ji êvar ve dîyar e
 b) roja xweş ji sibchê ve dîyar e.
- 5640- Şênahiya malê zarok in.
- 5641- Şêr bi fen tê gêr kirin.
- 5642- Şêr bi lepê xwe, mêr bi destê xwe.
Di nav Kurdên Ezîdî de weha jî tê gotin: Şêr bi lepê xwe, Şêx Hadî nayê hewara te.
- 5643- Şêr dikuje, rovî dixwe.
- 5644- Şêr ji cîhê raketina xwe ve xuya ye.
- 5645- Şêr ji bûjiyan xelas nabin.
 “Bûjî”, ji pirçên pişt stûyên şêr û hespan re tê gotin. Li hinek deveran jî “bûjî” re “bêjî” jî dibêjin.
- 5646- Şêr ji daristanan qut nabin.
- 5647- Şêr li zozanan dihirmije, gur li binê beriyê mîhan berdide.
- 5648- Şêr ji meydanê dikeve, rovî tolevîskan dida xwe.
- 5649- Şêr li rex şêran dikeve.
- 5650- Şêr şêr e çi jin e, çi mêr e.
Weha jî dibêjin: “Şêr e, çi mê çi nêr e.”
- 5651- Şêr bigere, rovî qula xwe wenda dike.
- 5652- Şêr xwe ji mêşan didin paş.
Varyanteke weha ji heye: Dijmin mêş be jî hesabê wî bike.
- 5653- Şêrê her kesî li ser singa wî girêdayî ye.
- 5654- Şêrê ji berfê kes jê natirse.
- 5655- Şêwir ji mewijan çêtir e.
- 5656- Şêwra çûkan li nav garisê xizanan e.
 Dema kesek an jî hinek çav berdî malê feqîran, wê demê vê gotinê dibêjin. *Li Herêma Botan weha jî dibêjin: Şêwra çûkan li ser garisê Mema ye. Mema, li Botan navê eşîretek e.*
- 5657- Şêwra jinan bêriya bizinan.
- 5658- Şêx e lê di dilê xwe de rêx e.
- 5659- Şêx nebatîn e belê şuxil bi serî hatine.
Varyanteke weha ji heye: Şêx ne batî e, kul bi serî hatine.

5660- Şihina hespê ji ceh e.

Weha jî dibêjin: Şihina hespê ji hunerê wî ye.

5661- Şilfa k.. e û xelesa q...ê ye.

5662- Şilî, şayî ye.

5663- Şimika xwe biqetîne bila ji hevalan re nemîne.

5664- Şingênî bi tasê ket, çi rast çi derew.

5665- Şiva xwe rast bihejîne bila li çavê birayê te nekeve.

5666- Şivan bi kodan tîn naskirinê.

5667- Şivan bûne çar dîsa gur pez xwar.

5668- Şivan dara çam e.

5669- Şivan ji gur natirsin.

5670- Şivan kerî digerîne, kerî şivan nagerîne.

5671- Şivan ku dil bike, ji nêrî golemastê çêdike.

5672- Şivan û gavan li hev dan lê golikvan cirm da.

Weha jî dibêjin: Ker û qantirê li hev dan, golik di nav piyan de çû.

5673- Şivan û gavan ore-ore, ji wan tire dinya kor e.

5674- Şivano heger mêrg e, serê miya reş berjêr meke.

5675- Şivkê çiqas li ber tûle bihejîni, tûle hewqas dir dibe.

5676- Şîn, şînê tîne.

5677- Şîn û şayî bira ne.

5678- Şîn ya me ye û şahî jî ya me ye.

5679- Şîna tevî hevalan şahî ye.

Varyanteke weha jî heye: Mirina bi êlê re dawet e.

5680- Şîr bi şekir xweş e.

5681- Şîr da û lingê xwe li beroşê da.

5682- Şîr di eyarê şîrkê de çû, heşû xistin qûna pisîkê.

5683- Şîr heft damaran dikişîne.

5684- Şîr mîr e, hingiv şehwet e.

5685- Şîr vedixwe şivan, to dixwe berxvan,
xewê dike gavan, xeman dixwe golikvan.

5686- Şîraniya hespê jî ceh e.

5687- Şîrdotin û kodikveşartin nabe.

5688- Şîret dibe xîret.

5689- Şîret li dînan nabin.

5690- Şîret li gur dikirin, gur digot:

Zû, ez nema digihîme dawiya kerî!

5691- Şîrê bizinê rûnê wê kême.

5692- Şîrê homoş homoş e.

Gotina “homoş” di wateya helal de ye.

5693- Şîrê kerê ji daşika kerê re ye.

Weha jî dibêjin: Şîrê kerê çiqas pir be dîsan jî ji cahşika wî re ye.

5694- Şîrê min bila çêbe, toya min pak be.

5695- Şîrê mîyan rûspîtiya kevaniyan.

5696- Şîrê şêr eyarê şêr.

5697- Şîrê şêr e, eyarê sêdan e.

5698- Şîv û şevîn şîr e, ber û bangî goşt û pîr e.

5699- Şor li mirdaran sipî li qerpalan.

Berfiradî ji “gotinê” re “şor” dibêjin. *Li hinek herêmên din weha dibêjin:*

Gotin li mirdaran, sipî li qerpalan.

5700- Şorbeya mirov a pelêrî, ji savara xelkê çêtir.

Weha jî dibêjin: Tasek nan û dewê mirov ji qelya xelkê çêtir e.

5701- Şov reş kir, dilê xwedî xweş kir.

5702- Şuxil bi kirinê, ker bi ajotinê diçe.

5703- Şuxil bike esas ku dilê te neke wase-was.

5704- Şuxil bû bi dor, ocax bû kor.

5705- Şuxil ji min re bike lê ji xwe re hîn be.

5706- Şuxil ji şêx û pîran xerab dibe.

5707- Şuxilkarê xwe be, xweşdiviyê xelkê be!

5708- Şuxil ker e, coşke wî dere.

Weha jî dibêjin: Kar ker e, tu bajoyî dere, najoyî nare.

5709- Şuxil pîr ke lê ji bîr meke.

5710- Şuxil şêr e ku tu dest bavêjî dibe rovî.

5711- Şuxilê bi usûl him bi Xwedê xweş tê him bi resûl.

5712- Şuxilê saetekê xema salekê.

5713- Şuxilê xwe nehile sibê lê nanê xwe bihêlc sibê.

5714- Şuxilkirê xwe be şîrînê xelkê be.

Di şûna gotina “xelkê” de gotina “Evd” bi kar tînin. *Weha dibêjin:*

Şuxilkarê xwe be, şîrînê evdan be.

5715- Şûjin bi fen didin qulkirin.

5716- Şûjinê di çavê xwe de nabîne

lê derziya di çavê hevalê xwe de dibîne.

Varyanteke weha jî heye: Gîsinê di çavê xwe de nabîne lê derziyê di

çavê hevalê xwe de dibîne.

- 5717- Şûna mezinan agir e.
- 5718- Şûna şêran manc kundê dêran.
- 5719- Şûna xenceran rehet dibe lê şûna xeberan rehet nabe.
- 5720- Şûr di kala xwe de zingar digire.
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Kêr di kala xwe de zingar digire.
- 5721- Şûr ji qelemê tûjtir e.
- 5722- Şûr ji şekir şêrîntir e.
- 5723- Şûr kalanê xwe nabire.
- 5724- Şûr Şam, xencer mam, jin dotmam.
- 5725- Şûr şer dike lê pere hil dike.
- 5726- Şûrê hesin,
 tu heft salan bipesin,
 dê her biçe ser guhê gêsî.
- 5727- Şûrê mirinê li milê te be
 bila tîrsa Xwedê li dilê te be.
Li hinek deveran weha jî dibêjin:
 Şûrê qetlê li destê te, belê rehma Xwedê li dilê te.
- 5728- Şûrê mirovê mezin li erdê namîne.
- 5729- Şûrê rast du diranên jehrî têde ne.
- 5730- Şûrê tazî xwîn dixwazî.
- 5731- Şûrkêş û şûrbaz ne yek in.
 Şûrkêş bi mêranî şûrê xwe bi kar tîne û şûrbaz jî bi hîle û dekan.
- 5732- Şûşa dil dema bişike êdî cebar nabe.
Li hinek deveran weha jî dibêjin:
 Dil wek şûşe ye, dema bişike, êdî naceribe.
- 5733- Şûştin reng û rû, xwarin gend û gû.

5734- Ta bi ta dibe rih.

Weha jî dibêjin: Mû bi mû dibe rih.

5735- Ta ji mirinê çêtir e.

5736- Tajî bi zorê naçe nêçîrê.

Li hinek herêman weha dibêjin: Tajî bi kotekan nêçîrê nake.

5737- Tajî dibêje “ya Xwedê,” kewroşk jî dibêje “ya Xwedê!”

5738- Tajîyek mirov hebe, mirov li şûna waran namîne.

5739- Tajiyê tûle li pey nan diçe.

5740- Talana êvarê, berfa sibehê bila di pêşiya dijmin de be.

5741- Talana mîro liva cehî ye.

Li hinek herêmên Kurdistanê ji “mîro” re “mêrû,” “gêrik” an jî “muristan” dibêjin.

5742- Talana qijikê hijik e.

5743- Talda şêran ji stara roviyan çêtir e.

Varyanteke weha jî heye: Sîha şêran ji stara roviyan çêtir e.

5744- Talihê xelkê reş e yê min reş û beş e.

5745- Tas hatiye destan e

ew seba dîwan e

ne seba zikan e.

5746- Tasa ku çingên jê hat ha rast ha ne rast!

Weha jî dibêjin: “Tasa vala çingên jê tê.”

5747- Tasa ku li der bimîne, se dihalêse.

5748- Tav bav e lê av diya zîyan e.

Weha jî dibêjin: Tava rojê bavê genim e, av diya wî ye.

5749- Tav erdê dixemilîne lê xebat mirov.

5750- Tav nede gulan venabin.

5751- Tava biharê dikeve danê êvarê.

5752- Tava biharan li serê neyaran,

tava payîzan li serê ezîzan.

5753- Tava dê û bavê siya qûntepsiyê ye.

5754- Tava rojê ya her kesî ye.

5755- Tava sibehê mirovan germ nake.

5756- Tava sibehan pere nake, tava êvaran qet pere nake.

5757- Taviya teyrokê timî cîhekê dikute.

- 5758- Tayekî xav di navbera dîn û eqılan de ye, naqete.
- 5759- Tazî ji jina xwe re got: Zirav birêse.
- 5760- Tazî rûniştiye ji bo kevir digirî, dibêje:
Baran hat dê kevira belengaz çawa bike?
- 5761- Te beran gurand lê birayê beran nîn e?
- 5762- Te çêyî kir ji xwe re xerabî kir dîsa ji xwe re.
- 5763- Te çi devê deriyê xwe paqij kiriye, dora deriyê xelkê maye!
- 5764- Te çi kiriye beroşê, dê tu wî bixwî.
- 5765- Te çi sor kiriye, dora sorê tarî ye!
- 5766- Te derbek danî û yekê mezintir hilanî, te bi kar neanî.
- 5767- Te dî kanî li ser danî!
Weha jî dibêjin: Te kanî dî li ser danî! Te kanî dît li ser danî!
- 5768- Te girt bermede, berda bi pey mekeve!
- 5769- Te hîn çavên zerzoq di nav kayê de nedîtine.
- 5770- Te hîn kir ji bîr neke,
te ji bîr kir hîn neke!
- 5771- Te nanê kê xwar, şûrê wî rast girêde.
- 5772- Te ne got û kir mêr î,
got û nekir kerê nêr î.
- 5773- Te şilik jî divêt û te kutlik jî divêt.
- 5774- Te xêrek kir, bibe serî.
- 5775- Te xwendiyê û tu dizanî!
- 5776- Tebax e ax û wax e.
- 5777- Tebax e, tirî rax e.
- 5778- Tebîctê şîrî heta pîrî.
Varyanteke weha jî heye: Xûyê şîrî heta pîrî.
- 5779- Tecrûbe belaş e.
Li hinek herêman weha jî dibêjin: Temaşe belaş e.
- 5780- Tehm dikişîne goştê kerê, dibêje:
Guhên wî nola yên kewroşkê ne.
Nola, di wateya “wek” û “mîna” de tê bi kar anîn.
- 5781- Temaşe ji govendê xweştir e.
- 5782- Tembûrvan bi tembûra xwe dizane.
- 5783- Temûrî nîşa xortaniyê ye.
- 5784- Temûz dipîje, tebax dirêje.
- 5785- Temûz e, kakil kete gûz e.
- 5786- Tene ji kaya kevn dernakeve.

5787- Tengayiya li mêran û mija li geliyan.

5788- Tenûr bi tir û fisan germ nabe.

5789- Tenûr ne sincire nan çênabe.

5790- Tenûra avzem nan napêje.

5791- Tenûra bê kulfik, xaniyê bê kulek li pêş dijminan nabe.

5792- Tenûreke germ ji xwe re bihêlc da ku tu nan pê bipêjî.

5793- Teqteq li stûnê, yek çû yek ket şûnê.

5794- Terbendina evînê ji hilweşandina zîyaretê xerabtir e.

Dema mirov bikeve nav du evîndaran û pêş li evîndariya wan bigire, guneh û sûcê wê ji xerabkirina zîyaretan girantir û pirtir e. Li Kurdistanê ev doz gelek nazik û rojane ye.

5795- Teriya kûçik rast nabe.

5796- Teriya qut û quba spî?

5797- Terziyo malan bar kir, got:

Derziya min di serê min de ye.

5798- Teşî ben e glok fen e.

5799- Teşiya zirav barek dirav.

5800- Tev bikin tev bixwin.

5801- Tevnik biriye, taya min firiye.

Weha jî dibêjin: Tevnik li dar e, taya min sar e.

5802- Tevşo destê xwe naxeritîne.

5803- Tewaş nan dide paş.

5804- Text û bextê Romê tune.

5805- Teyr bi çengên xwe difirin û mêr bi mêran dixwirin.

Weha jî dibêjin: Teyr bi baskên xwe difire.

5806- Teyr biçe erş dê dîsa dakeve ser reş.

5807- Teyr difire li hefsûrê xwe digere.

5808- Teyr hemû dijminê kewê ne, kew jî dijminê serê xwe ye.

5809- Teyr heye goşt dixwin hin hene goştên wan dixwin.

Li hinek deveran weha jî dibêjin: Teyr heye ku mirov jê goşt dixwe, teyr heye ku mirov goşt didê.

5810- Teyr û tilûran garis xwar, bextê Erika reben reş.

5811- Teyrê hû re, hû kirin ne hewce ye.

5812- Teyrê ku goşt dixwe, nikulê wî gêr e.

Weha jî dibêjin: Teyrê nêçîrvan nikulê wî gêr e.

5813- Teyrikê wît-wîtanî,

mala xwe xerab kir, ya min jî li ser danî.

- 5814- Teyrok tim li zeviya feqîran dixê.
- 5815- Tê sotin, nayê gotin.
- 5816- Têlekê dikişê sed pîne lê dikeve.
- 5817- Têr bi halê birçî, sax bi halê nexweş nizane.
Li hinek deveran weha jî dibêjin:
 a) têr çî hay ji birçîyan heye.
 b) têr hay ji birçîyan nîn in.
- 5818- Têr e û nêr e.
- 5819- Têr nedixwar nan û jajî, radikirin tûle û tajî.
- 5820- Têrxwarina êtîman roja eydê ye.
Weha jî dibêjin: Têrxwarina sêwiyan di roja xêrê de ye.
- 5821- Ticarê kovî ne kar dike ne zirar.
- 5822- Tifaqa gundekî dertê li ber êlekî disekine,
 tifaqa êlekî dertê li ber padîşahckî disekine.
- 5823- Tifaqa mirovan çiya qul dike.
Li hinek deveran weha jî dibêjin: Tifaqa mirovan çiya dihejîne.
- 5824- Tifek û tifengek wek hev in.
- 5825- Tifing hat, mêranî hilhat.
Varyanteke weha jî heye: Tifing îcad bû mêranî betal bû.
- 5826- Tifing û xencer bi tenê azadiya gelan nagihînin serî.
- 5827- Tifkirine beqê li wan keniyaye û gotiye:
 Rûyê min ji ava behrê şil nebûye, dê ji tifa we şil bibe.
- 5828- Tilarî xerabmalî
- 5829- Tilî hene zêrîn in.
- 5830- Tiliya di qulikê de mar pêvedide.
- 5831- Tiliya xwe meke hemû qulan,
 di hinekan de dûpişk hene
 û di hinekan de mar hene.
- 5832- Tiliya ku şerîet jê bike xwîn jê nayê.
- 5833- Tiliya min bi şekir be,
 ez bixim devê xelkê dê bêjin “tehl e.”
- 5834- Tiliyên bilûrvanan ji dûr ve kifş in.
- 5835- Tiliyên destan hemû ne yek in.
Weha jî dibêjin: Pênc tiliyên mirov nabin yek.
- 5836- Tim kayê bidî bayê, tişt jê nayê.
- 5837- Timahî birakuj e.
- 5838- Timahî bi mirov gû dide xwarin.
- 5839- Timahî kêmahî ye.

- Weha jî dibêjin:* Timahî fenahî ye.
- 5840- Timahî li rê mayî.
- 5841- Timahî mal dike, pir temayî malê belav dike.
- 5842- Timahkar çarix kirîye, gore qetiye.
- 5843- Timahkaro, gunehkaro!
- 5844- Tim û tim çêlek nayê dotin,
her gotin nayê gotin.
- 5845- Tim û tim diya mirov lawan nayîne.
- 5846- Tirba siwaran her kola ye.
- 5847- Tir giş ji tovek e.
- 5848- Tir ji tirê fedî nake.
- 5849- Tir li hemaman û derew li xerîbiyan.
- 5850- Tir li kû û das li kû?
- 5851- Tira me bi deng e.
- 5852- Tirek û du tir li ba tirekan yek e.
Weha jî dibêjin: Tirek û sed tir li ba tirekan yek e.
- 5853- Tirek xelkê, tembûrek xelkê.
- 5854- Tirên xelkê di şalê xwe de neke.
- 5855- Tirî bi sebrê dibe helaw.
- 5856- Tirî li hev dinêre dixewgire.
Weha jî dibêjin: Tirî li tiriye mêze dike û dibe hesirm.
- 5857- Tirk bêbav e, Erebi ji me re nabe.
- 5858- Tirk bi hîz in, bi xapin û nan li ser qap in.
- 5859- Tirk dibêjin; “xwezî eqilê Kurdan ê paşîn ji me re bûya.”
- 5860- Tirkan belâ xwe li me dane, qîra xwe ji me venakin.
- 5861- Tirk û qanûn, Erebi û paqijî!
- 5862- Tirs ber li mirinê nagire.
- 5863- Tirs birayê rovî ye û mamê gur e.
Weha jî dibêjin: Tirs mêrga rovî ye.
- 5864- Tirs dijminê eqil e.
- 5865- Tirs ku heye birayê rovî ye.
- 5866- Tirs nîvê mêraniyê ye.
- 5867- Tirs gur ji baranê hebûya dê ji we re kulavek çêkîra.
Li hinek herêman di şûna “gur” de navê “rovî” dibêjin.
- 5868- Tirsonek tim li paş in lê di revê de li pêş in.
- 5869- Tirşo dilê min dişo.

- 5870- Tisbîh bê serkêş nabe.
- 5871- Tişt bi şîranî xweş e,
her tişt di dema xwe de xweş e.
- 5872- Tişt bîne bi ciwanî,
gava tu pîr bûyî tu dizanî.
- 5873- Tiştêk ji qencyê çêtir tune.
- 5874- Tiştê berî bûkê neyê piştî bûkê jî nayê.
- 5875- Tiştê biçûk mezin meke.
- 5876- Tiştê bi nîvî jê meke hêvî.
- 5877- Tiştê bi lez nagîhîje mirazan.
- 5878- Tiştê bi wext wek padîşahê li ser text.
- 5879- Tiştê çû mede dû.
- 5880- Tiştê erzan bê rêz e.
- 5881- Tiştê ku ba di bin zik re here, qîmeta wî tune.
- 5882- Tiştê ku bibare wek ax,
talî tev dê bibe kambax.
- 5883- Tiştê ku dest dike, dê-bav nakin.
- 5884- Tiştê ku eqil qebûl neke, pê bawer neke.
- 5885- Tiştê ku ji taqeta mirovan meztir be, li mirovan nekin.
- 5886- Tiştê ku kevnê wî tune be, tezeyê wî jî tune.
- 5887- Tiştê ku min kirî ba û baranê birî,
lê bendê li ser min hesab kirî.
- 5888- Tiştê min li mal e,
xeyalê min li bal e.
- 5889- Tiştê ne bi dilê te be, meke.
- 5890- Tiştê ne çê para keçê.
- 5891- Tiştê nedîtî nebêje!
- 5892- Tiştê ne ji mirov re bayê di ser mirov re.
- 5893- Tiştê ne ser ve mîna qûna ji der ve.
- 5894- Tiştê nezê, namire.
- 5895- Tiştê qelemê nivîsî, tevşo nikare xerab bike.
- 5896- Tiştê veşartî di bin cil de namîne.
- 5897- Tiştê zû ye, şil û gû ye.
- 5898- Tiştên ku ba û lehî bînin, bi xwe re dibin jî.
- 5899- Tixûbê xortan tune ye.
- 5900- Tîr naçe tûrê.

- 5901- Tîr û kevanan, bidin nîşanvanan.
 5902- Tîtî ku pê sar dibe, dibêje:
 Ez ê xaniyekî xwe bigirim.
- 5903- To dixwe berxvan, şîr vedixwe şivan.
 5904- Tobedarê Xwedê me, deyndarê te me.
 5905- Tobeya bizinê li ser qiloçên wê ye.
Weha jî dibêjin: Tobeya bizine heya ber devê kadînê.
- 5906- Torê tu bavêjî deryayê, bê masî nayê.
 5907- Tov bavêje şovê û bispêre Xwedê.
 5908- Tovê xweziyê çandin, lahewlewela li şûnê şîn bû.
 5909- Toza keriyên nakeve çavên guran.
 5910- Tu bar î ne heval î.
 5911- Tu berx dixwî, şivan jî şîr vedixwe.
 5912- Tu bibî Gerdî nabînî wî derdî.
 5913- Tu bi hijdî bazdî dê tu zû biwestî.
 5914- Tu bi hemû riyên dizanî lê bi rîya bazarê nizanî.
 5915- Tu bi ku de herî keç xwediyê du memikan e.
 5916- Tu bide min şivekê, ez bidim te êlekê.
 5917- Tu bifirî erş dê tu vegerî ser tirikê reş.
 5918- Tu bixebitî dixwî, nexebitî dilkeser î.
 5919- Tu bûyî mîr, xwedê neke jî bîr.
 5920- Tu cahşê li ba kerê tirek girê bidî dê jê tir û fisan hîn bibe.
 5921- Tu can bî, tu xezan bî.
 5922- Tu carî derew meke, heke derew zîv be, rastî elmast e.
 5923- Tu çi bikî bi xwe dikî.
Weha jî dibêjin: Çêyî kiro bixwe kiro, xerabî kiro bixwe kiro.
- 5924- Tu çi jî bîr bikî, şîrê diya xwe jî bîr meke.
 5925- Tu çi têxî kewarê dê ew bê xwarê.
Weha jî dibêjin: Tu çi têxî beroşê, tu dê wê bixwî.
- 5926- Tu çi tov bavêjî erdê dê wê biçînî.
 5927- Tu çûyî bajarê koran, çavekî xwe bigire.
 5928- Tu dar tune ye ku ba lê nexe.
 5929- Tu di beyabanên bê dar û belg de li Bîngolan digerî!
 5930- Tu dibêjî lê napêjî.
 5931- Tu dibêjî tîza û tu nabêjî çîza dê tu bidî nêrxê gûzan.
 5932- Tu dibî hevalê mirovekî bila ew mirov bi ser te re be.

- 5933- Tu dibî nankir, genim bikire; perçe dikirî, çux bistîne.
- 5934- Tu di dêrê de çi bûyî ku di mizgeftê de çi bibî?
- 5935- Tu dizanî agir e, dev jê berde.
- 5936- Tu dojeh nebînî buhişt bi te xweş nayê.
- 5937- Tu duyê xwe zanî yeka hevalê xwe bizanibe.
- 5938- Tu har bî dê bi canê xwe bikevî!
- 5939- Tu hewdîn î, tu min dibînî.
- 5940- Tu hirî bûya û li nav kerî bûya!
- 5941- Tu ji vir ve çuyî guzim û ji wir ve hatî bi nizim.
- 5942- Tu kes bê derd û kul nîne.
- 5943- Tu kes çavê kor ji xwe re navê.
- 5944- Tu kes ranaje barê ketî.
- 5945- Tu kevir bavêje cewrikê xwe dê xelk gomê bavêje.
- 5946- Tu kêr û ez penîr.
- 5947- Tu li beriya Mêrdînê li siwaran dipirsî?
- 5948- Tu li êşa xwe nepirsî kes li te nabe xwedî.
- 5949- Tu li kû mala dawetê li kû!
- 5950- Tu li tirî digerî an li kuştina nator?
- 5951- Tu mêrxas î babax nebe.
 Babax, di wateya rezîl de ye.
- 5952- Tu min bi çavêkî bibîne, ez te bi diduyan.
- 5953- Tu nanê kê bixwî dê şûrê wî bikşînî.
- 5954- Tu navê hevalê xwe bêje, ez bêjim tu kî yî.
- 5955- Tu rûn nexwî bi simêlên te nagire.
- 5956- Tu teyr î, ez xak im; tu bi ku ve herî dê tu li min vejerî.
- 5957- Tu tişt nemaye ku pêşîyan negotiye.
 Varyanteke weha jî heye: Pêşîyan ji paşîyan re tiştêk nehiştiye.
- 5958- Tu were dewê min bikule, ez jî yê mala mîran.
- 5959- Tu carî bi ava çemê bejik bawer meke!
 Weha jî dibêjin: Tucarî bi bextê ava bejik bawer meke.
- 5960- Tunebûn ji kevirê hiştir e.
 Weha jî dibêjin: Tunebûn kevirê şîne ye.
- 5961- Tunebûn mirov kor û jar dike, nezan û tengezar dike.
- 5962- Tunedîtiyan çi nedît, dema dît bi xwe ve rît.
 Weha jî dibêjin: Tunedîtiyan dan hêrt got cejn e.
- 5963- Tûrên virekan tim qul e.

5964- Tûrê xizanan tim qul e.

5965- Tûrê mirovê parsek tim li mil e.

5966- Ulmdar e, dîn û har e.

5967- Ulmdar e, havîn li bin şîyar e û zivistan li ba ar e.

Mirovê xwenda û alîm her dem zehmetê nabînin û di nav hebûn û xweşiyê d ne. Dinya dinayaya wan e.

5968- Ulmdar e, navdar e.

5969- Ulmdar e, nûr jê dibare.

5970- Ulmdar pêşî ji kîsê xwe dixwe, piştî ji eqilê xwe dixwe.

Kesên zanyar an jî ulmdar, heta dixwînin û dibin ulmdar, gelek mesref dikin û dema dibin zanyar jî vê carê bi zanîna xwe dixwin.

5971- Ulmdar, ulmdar e lêbelê ev çi dost û yar e?

Ev gotin ji bo ew kesên zane yên ku sextekariyê dikin û xelkê dixapînin, tê gotin.

5972- Ûr e ne tûr e!

5973- Ûre-ûr e, agir ji devî difûre.

5974- Ûr û pizûr para xezûr.

Tiştên xerab para xezûr e. Dema mirov bixwaze bêje, ku ew layîqê vî tiştî ye, wê demê vê gotinê dibêjin.

5975- Ûrê bengînan têr e ji nanê zengînan.

Kesên evîndar li dewlemendî nanêrin. Evîna wan bi ser her tiştî re ye. Heta ew kuştina xwe jî digirin ber çav.

5976- Ûrê ga kadîna ka.

5977- Ûza bûkê bixûr e.

Gatina “ûz” di wateya “kemasî” de hatiye bi karanîn. Yanî kêmasiya bûkê ne tişt e. Dema mirov kesekî negire cidiyê û ew biçûk bibîne, wê demê vê gotinê dibêjin.

5978- Va ye dar, va ye mişar.

5979- Varikên nû radibin hêkên sor dikin.

Weha jî dibêjin: Ferxê nû radibin hêkên mezin dikin.

5980- Vemirina çirê, ji çikandina don e.

5981- Vexwe dewê vexwarî,

venexwe qatixê kesî jê vexwarî.

5982- Vê navê, vê gavê

Mihemed Givê ganek divê.

5983- Vire vir e, ne ji dil e.

5984- Vir e û tir e.

5985- Virek bibin hecî jî bi wan bawer nekin.

5986- Viz-viz ji te, hingiv ji min.

- 5987- War ew war e lê bihar ne ew bihar e.
- 5988- War warê hêşîn, bext bextê pêşîn.
- 5989- Warê xwe genî meke,
malê xwe xenî meke!
- 5990- Wekî deh hêja ye, pazdeh jî hêja ye.
- 5991- Wekî du dil bibine tevayî
dê çiya hildin û bidine ser çiyayî.
- 5992- Wekî mêşê ye, deng wekê şeşê ye.
Weha jî dibêjin: Qam qama mêşê ye, deng dengê gamêşê ye.
- 5993- Welat him dê û him bav e, ne tê kirîn û ne firotin.
- 5994- Welat ji dê şîrîntir e.
- 5995- Welatê xelkê ji mirov re nabe welat,
mala xelkê ji mirov re nabe mal.
- 5996- Welat xweş e bi welatiyan.
- 5997- Welat welatê bav û kalan,
nayê kirîn û firotin bi zêr û diravan.
- 5998- Welat welatê Kurda ye,
miletê Kurd di nav de wenda ye.
- 5999- Wcledê malê ne xerîb e ji kesê gund e.
- 6000- Werdek derdikeve ser darê û dibêje:
Xwezî bi mehên biharê.
- 6001- Were ba min salê carekê bi sultanî,
mehê carekê bi mêvanî, rojê carekê bi dilmanî.
- 6002- Were mala me, bibîne rewşa me.
- 6003- Werîs bi herçîn e, bar percîn e, baş bijdîne.
Weha jî dibêjin: Werîs bi herçîn e!
- 6004- Werîs biqete dibe çar serî.
Weha jî dibêjin: Werîs biqete dibe çar serî, êdî bi kar nayê.
- 6005- Werîs kurt be nagîhe te.
- 6006- Werîsê rizî bêkêr e.
- 6007- Werîsê virkeran kin e.
Li hinek herêman weha jî dibêjin: Werîsê derewan kin e.
- 6008- Wetaqa belek nan lê tune, lê av lê gelek.
Weha jî dibêjin: Wetaqa mîr bê na û av nabe.
- 6009- Wext ji wext fedî nake.

- 6010- Wexta dê dimire, destê wê jêkin, pê sêwiyên wê bikutin.
 Ji bavê bêhtir dê li zarokên xwe xwedî derdikeve û ew mezin dike.
 Dema dê bimire zarok bêxwedî li meydanê dimînin, ne kes li wan
 xwedî derdikeve û ne jî kes ew perwerde dike.
- 6011- Wexta heye mêvanî, wexta tune golikvanî.
- 6012- Wexta nêçîra min tê xewa tajiya min tê.
 Li hinek herêman di şûna “xew” de gotina “gû” dibêjin.
- 6013- Wexta şerê xal û xwarzî, wexta kevçî ap û birazî.
- 6014- Wexta xêr belav dibe xewa sêwiyên tê.
- 6015- Wexta xizan derdikevin diziyê, ro li wan derdikeve.
- 6016- Wexta xizanî tune be, qedrê pere dê çi be?
- 6017- Wexta Xwedê bide, nabêje tu lawê kê yî.
- 6018- Wextê giya bû, kes nexuyabû,
 bû firîk Heso û Hemo bûn şirîk.
- 6019- Wextê leglegê çû bi leqleqê.
- 6020- Wextê kar rû vedigerîne, kevçiyên şîvê tîne.
- 6021- Wey li mino ne ji ber tifika mino.
- 6022- Wezna mêran bi dirhem e.
- 6023- Wezreba, çêtir e ji bav û bira.
Varyanteke weha jî heye: Bayê bakur ji bav û bira çêtir e.
- 6024- Wezîr be lê ne rezîl be.
- 6025- Wêrankirin hêsan e, avakirin giran e.
Weha jî dibêjin: Xerabkirin rehet e, avakirin zehmet e.

- 6026- Xaç di avê de xêr nake.
- 6027- Xaka kê m av be, ne tu xak e.
- 6028- Xal xelk e, ap milk e.
- 6029- Xal Xidiro her roj li viro.
- 6030- Xalan xwarziyan rakirin,
apan biraziyan wenda kirin.
- 6031- Xalçê, bavçê, esil şîrê dê.
- 6032- Xalê mirov cedê mirov e.
- 6033- Xalê xesî ne dixwe û ne jî dide tu kesî.
- 6034- Xaltîka min a qatir e,
bi her çar lingên xwe dike vire-vir e;
ji xwarziyê xwe yê gur re derdixe cotek tir e.
- 6035- Xanî bi keviyekî nayê çêkirin.
- 6036- Xaniyo ku çikûso çêkiriye, mîna şikefta bê derî ye.
- 6037- Xaniyê xwe xirab neke heta ku tu yekî din çênekî.
- 6038- Xatir kete bertîlan, gû ket halê feqîran.
- 6039- Xatûna Şam û şerqê ne dixwe ne dide xelkê.
- 6040- Xayîn û xizir kûpê bizir.
- 6041- Xebat ker e bajoyî dere najoyî nare.
- 6042- Xebat şêr e, dest bavêjî dibe rovî.
- 6043- Xebata malê wek qulên bêjîngê ji ber hev dertên.
- 6044- Xebata mîro embarê tijî dike.
- 6045- Xebatkar birçî namînin.
- 6046- Xebatkar risqên xwe ji bin lingên xwe dertînin.
- 6047- Xeber çekê jinê ye.
- 6048- Xeber hene zêr in, xeber jî hene ava cêr in.
- 6049- Xeber kete nav sî û sê diranan
dê bikeve nav sî û sê şaristanan.
- 6050- Xeber li mûrdaran, spî li qerpalan.
- 6051- Xeber ne karê mêran e.
Li vir “xeber” di şûna “çêr” an jî dijmîn de hatiye bi kar anîn.
- 6052- Xebera mirinê sar e.
- 6053- Xebera reş zû belav dibe.

6054- Xebera xerab mîna tîran e.

6055- Xebera xweş bihara dilan e.

Li hinek herêman weha jî dibêjin: Gotina xweş bihara dilan e.

6056- Xebera xweş bide dijminê xwe,

pariya xweş bide hevalê xwe.

6057- Xeftanê giro-gczo, va ye ezo, va ne gezo.

6058- Xelekê zêde bavêje beyaran û neçe mala neyaran.

6059- Xeletî ji biçûkan û efûkirin ji mezinan.

6060- Xelk axê dikolê, ew li serê xwe dike.

6061- Xelk bû beg, ez bûm legleg.

6062- Xelk dewlet çêdike, ez kolozê xwe tûj dikim.

6063- Xelk ji hewarê tê, em nû diçin hewarê.

6064- Xelk kêfa xwe dike, ew avê li xwe dike.

6065- Xelk li mala Fatê ye û Fatê li mala xelkê ye.

6066- Xelk neynika mirovan e.

Ji “neynikê” re “eynik”, “mirek” û “awênc” jî dibêjin. Pîvana her tiştî heye, pîvana mirovan jî xelk e. Xelk ji her aliyî ve mirov kontrol dike û dipîve.

6067- Xelk rast tê li fitiran, em rast tîn li fisegulan.

Kurd ji kuvarkê re “fitir” jî dibêjin.

6068- Xelkê bîyanî bide wan goştê canî, her û her tu poşman î.

6069- Xelkê mêr kir, me mor kir.

6070- Xelkê xerîb ji mirov re nabe dê û bav.

6071- Xema herfê nîne ku debra xizanan tune.

Weha jî tê gotin: Xema zivistanê nîne, kirasê sêwîyan tune.

6072- Xema bûkan bûka çûkan.

6073- Xema gur e ku deve biha ye.

Li hinek herêman di şûna gotina “deve” de gotina “qantir” jî dibêjin.

6074- Xema kor e ku mûm biha ye.

6075- Xema koro ye ku çire vêsiya!

6076- Xemên me ne besî me ne, yên tirekan jî yarê serbar in.

6077- Xeçer bira ye, tîfing pismam e.

6078- Xerab di xerabiyê de diçe.

6079- Xerab dibê mala zêran, xerab nabe mala mêran.

6080- Xerab ji kul û qotikan, baş ji dost û yaran xalî nabin.

6081- Xerîbî ne tu çek e, piyê xwe tê re neke.

Kurd ji “çek” re “cil” û “kinc” jî dibêjin.

- 6082- Xesû mir cîhê bûkê fireh kir.
- 6083- Xeta xwar ji gayê pîr e.
- 6084- Xeta xwe rast bike, karê xwe xelas bike.
- 6085- Xew hene diqewmin, xew hene derew in.
- 6086- Xew ji hesin girantir e, ji şekir şîrîntir e.
- 6087- Xew nema li biçûkan, fedî nema li bûkan.
Li hinek deveran weha jî dibêjin:
 Xew nema li çûkan,
 şerm nema li bûkan,
 goşt nabe ji neynûkan.
- 6088- Xew û kew bi hev re nabin.
Li hinek deveran weha jî dibêjin:
 a) xew û kew herdu nagihîne hev.
 b) xew û dew bi hev re nabin
- 6089- Xew û mirin yek in.
- 6090- Xewa bavkuştiyan tê lê xewa şîvnexwariyan nayê.
- 6091- Xewa birîndaran tê ya birçiyên nayê.
Weha jî dibêjin: Xewa miriyan tê lê xewa birçiyên nayê.
- 6092- Xewa berê sibehê, pîr czab e.
- 6093- Xewa ga li ker e.
- 6094- Xewa pîr risqbir e.
- 6095- Xewa pîr giran, mirovê zir nezan.
- 6096- Xewên kanûnan, tir û fisên xatûnan.
- 6097- Xeyalê aşvên av e.
- 6098- Xeynê serşikestinê tev ji hev digire.
- 6099- Xeyseta ga xwedî dizane.
- 6100- Xeyseta pîs xezeba Xwedê ye.
- 6101- Xeyseta xwe biguhêze, qonaxa xwe neguhêze.
- 6102- Xezalê ji ber rikêf zozan li xwe haram kir.
- 6103- Xêr be berê pêşî nêr be.
- 6104- Xêr bi rêz e şêr bi hêz e.
- 6105- Xêr bike bi avê re berde.
- 6106- Xêr dibe xiyar û dikeve qulika dîwar.
Li hinek deverên Kurdistanê weha jî dibêjin:
 a) xêr dibe xiyar û dikeve destê me.
 b) xêr dibe xiyar û di xwediyê xwe de diçe xwar.
- 6107- Xêr ji xêrê dize.

- 6108- Xêr li ser xêrê tê, baran ji ser deryayê tê.
- 6109- Xêr tê bi rêz şer tê bi hemêz.
- 6110- Xêr wenda nabe.
- 6111- Xêr xwediyê xwe nas dike.
Weha jî dibêjin: Xêr xwediyê xwe dibîne.
- 6112- Xêra çavê rastê ji yê çepê re tunc ye.
Weha jî dibêjin: Xêra destê çepê li yê rastê nabe.
- 6113- Xêra malê biçê mizgeftê betal e.
- 6114- Xêra Xwedê, çêra kerê.
Dema mirov kerd û xwêdan nede û tiştê belaş bi dest bixe, wê demê vê gotinê dibêjin.
- 6115- Xidir e, her ro du ro li vir e.
- 6116- Xilasî di rastiyê de ye.
- 6117- Xilt axê dikole li serê xwe dike.
Ji xilt re “koremişk” jî dibêjin.
- 6118- Xirab dibe mala zêran, xirab nabe mala mêran.
Li hinek herêman weha bi awayekî helbestkî jî dibêjin:
Mala zêran xerab dibe, lê mala mêran xerab nabe.
- 6119- Xirabiya malekê, avahiya gundekê.
- 6120- Xirabiyê herkes dikare bike lê qencî zehmet e.
- 6121- Xirabkirin rehet e, avakirin zehmet e.
- 6122- Xisar ji fêdê wêde ye.
- 6123- Xişt-mişt hemû hûne tişt.
- 6124- Xiyalê birçî her nan e.
- 6125- Xizan dizane çi di tûrê xizan de heye.
- 6126- Xizan her kêlî perê xwe dijmêre.
- 6127- Xizan ku bişewite bîhn jê nayê.
- 6128- Xizanî kirasê hesinî.
- 6129- Xizanî mêran kotî dike.
- 6130- Xizanî nezanî.
- 6131- Xizanî zingara mêranîyê ye.
- 6132- Xizanî zikekî têr û deh zik birçî ye.
- 6133- Xizano bi halê xwe nezano.
- 6134- Xizano riya mala xwe nizano.
- 6135- Xizmet e, bê minet e.
- 6136- Xîret ji îmanê ye.

6137- Xîret zêr e, ji bilî namûsa wê re.

6138- Xîretê avêtine ba kûçik, nexwariye.

Weha ji dibêjin: Namûsê avêtine ba kûçik nexwariye.

6139- Xofkêşo bela li pêşo!

6140- Xort firîn jî bawer bikin bi xwe de rîn jî.

6141- Xort heta bi xwe nehese mîna varikan dimeşe.

6142- Xort û qîz gulên govendê ne.

6143- Xox ne dar e, mizeleq ne bihar e.

Bi dimilî navê giyayek biharê ye ku tê xwarin.

6144- Xura ker tê zira ker tê.

6145- Xurekc ne rind, xwê tişteki pê nake.

6146- Xurê san li dînan e.

Li hinek deveran di şûna gotina “xur” a kurdî de gotina erebi ya “qismet” jî bi kar tînin.

6147- Xursî xwediyê xiyara helisî

ne dixwe û ne jî dide kesî.

Bi navê “Xurs” çend gundên Mêrdînê hene. Gundên avî ne û bi titûna xwe nav û deng in.

6148- Xurtî di zanabûnê de ye.

6149- Xurtî ew e ku mirov hêkê di bin çengê xwe de bibrêje.

6150- Xurto, tu xurtiya xwe dikî, qelso tu doza çi dikî?

6151- Xûyê şîrî heta pîrî.

Varyanteke weha jî heye: Tebîetê şîrî heta pîrî.

6152- Xwar rûne, rast deng bike.

6153- Xwarin çav dixwin ne dev.

6154- Xwarin germa-germ, şuxil nerma-nerm.

6155- Xwarin gend û gû, şuştin reng û rû.

6156- Xwarin li ber kir, çov raserê ser kir.

Weha jî dibêjin: Xwarin ber çav kir, xwe wenda kir.

6157- Xwarin li birçiyên helal e.

6158- Xwarina bêçare pincar e.

6159- Xwarina bêxwedî, her kes tiliya xwe têde dike.

6160- Xwarina qijikan li ser piştê kerê kul e.

6161- Xwarina xizanan yan nan û dew e yan dan û dew e.

6162- Xwarina xwe bihêle lê karê xwe nehêle.

6163- Xwarzî tîn li xalan wekî ciwanî tîn li fehlan.

Weha jî dibêjin: Xwar li xalan diçin.

- 6164- Xwarzîyan xal rakir birarziyan mam wenda kir.
- 6165- Xwe dikin, xwe dibirin.
- 6166- Xwe li ber baranê şil neke.
- 6167- Xwe mede ber dîwarê ketî ku bi ser te ve nekeve.
- 6168- Xwe mezin neke da ku tu neşikî.
- 6169- Xwe tevî kar nekî kar nameşe.
- 6170- Xwedê bide nabêje tu lawê kê yî?
- 6171- Xwedê bide ji yek û nivê ve dide.
- 6172- Xwedê bike gur be û ne Oxizê serkundur be.
Ev li ser zilm û zordestiya Tirkên Oxiz hatiye gotin.
- 6173- Xwedê bike, mele dikare çi bike?
- 6174- Xwedê bi fêla marî dizane loma dest û pê kirine zik.
- 6175- Xwedê bîne bîra xwe, gava tu bi koran re bixwî.
- 6176- Xwedê çiya daniye, berf û baran lê barandiye.
Varyanteke din jî weha ye: Xwedê çiyê dibîne, berf lê dibarîne.
- 6177- Xwedê derdê bêderman nade.
Weha jî dibêjin: Xwedê derd dide û derman jî pê re dişîne.
- 6178- Xwedê dibêje: Min dest, pê û çav dane te,
li pêşiya te av û agir e, xwe navêj navê.
- 6179- Xwedê dijminê çikûsan e.
- 6180- Xwedê dûr dike lê ji bîr nake.
- 6181- Xwedê fersendê şêran nede roviyan.
- 6182- Xwedê ji gote-gotê hez nake.
- 6183- Xwedê goşt dide mirovê bê diran.
Weha jî dibêjin: Xwedê goşt dide yê bê diran, pere dide yê nezan.
- 6184- Xwedê gotiye; ji te hereket, ji min bereket.
Weha jî dibêjin: Xwedê gotiye; ji te cehd, ji min mirad.
- 6185- Xwedê gotiye: Rabe ez bi te re.
- 6186- Xwedê hevalê ristan e.
- 6187- Xwedê heye xem tune ye.
- 6188- Xwedê hind baranê dide ku hindî erd ragire.
- 6189- Xwedê ji yekê re xerabî bike,
diranên wî di pelûlê de dişike.
- 6190- Xwedê kesî şaş neke,
şaş bike fahş neke,
fahş bike bi erdê re kaşkaş neke.
- 6191- Xwedê nokan dide mirovê bê diran.

6192- Xwedê qirika qul vala nahêle.

Weha jî dibêjin: Xwedê qirika ku qul kiriye, risqê wê dide.

6193- Xwedê sax e dil rast e.

6194- Xwedê serî dibîne, paşê şaşik lê dialîne.

6195- Xwedê yar be bila şûr ji dar be.

6196- Xwedê yar be bila dinya tev neyar be.

6197- Xwedê yar bûya dê şûr dabûya.

6198- Xwedê yek e û rê hezar.

6199- Xwedî bike bi nanê xwe û berde canê xwe.

Weha jî dibêjin: Xwedî kir bi nanê xwe, kire dijminê xwe.

6200- Xwedî bêmal dibe, mal bê xwedî nabe.

Weha jî dibêjin: Xwediyê bê mal heye, malê bê xwedî tune ye.

6201- Xwedî kirin li bavê ye, bext û qencî ji dê ye.

6202- Xwediyê çêlekan dest dîke kêlekan.

Li hinek deveran weha jî dibêjin: Xwediyê mîhan, li gor xwediyê çêlekan, dest dixin kêlekan.

6203- Xwediyê fisê zû bi xwe dihese.

6204- Xwediyê heq timî sultan e.

6205- Xwediyê hêrsê tim poşman e.

Dema mirov hêrs bibe, nikare baş nafikire, kar û zîrarê nabîne, piştî jî poşman dibe. *Weha jî dibêjin:* Sil bû, şil bû. Yanî hêrs bû û jê zîrar dît.

6206- Xwediyê hêviyan her rovî ye.

6207- Xwediyê lêyo here pêyo.

6208- Xwediyê lezê her poşman e.

6209- Xwediyê malê nan nexwe, mêvan naxwe.

6210- Xwediyê mirî kor e.

6211- Xwediyê mirîşkan dixwin nan û hevrişkan.

Weha jî dibêjin: Xwediyê mirîşkan dixwazin hevrişkan.

6212- Xwediyê parsê bûye qirase.

6213- Xwediyê pendê dikeve kendê.

6214- Xwediyê pere çav li der e.

6215- Xwediyê rimê tê kuştin lê mertal tê hiştin.

6216- Xwediyê sebrê milûkê Misrê.

Li hinek deveran di şûna gotina “mulûk” de gotina “mîr” jî dibêjin.

6217- Xwediyê tiştîran rûn dikire.

6218- Xwediyê xêrê rebenê dêrê.

Weha jî dibêjin: Xwediyê xêrê çûye dêrê.

6219- Xwediyê xiyarên çilmisî, ne dixwe ne dide tu kesî.

6220- Xwediyê virê kezî kurê.

6221- Xwediyê zêran, zêran naxwe.

6222- Xweliya ber arê mirov ji qeliya axa û began çêtir e.

6223- Xwelî li axê, çaxê pişkul bû malxwê.

6224- Xwelî li wî be, yê ku mirovê xwe bide bi xelkê bîyanî.

6225- Xwelî li wî be, yê ku piştî xwe bi mirovê maqûl girê bide.

6226- Xwelî li wî serî ku ga da bi kerî.

6227- Xwelî li wî serî ku sed serî jê ne êş in.

6228- Xwendin nanê germ e, di paşila mirov de ye.

Weha jî dibêjin: Xwendin nanê patî ye û di tûrika mirov de ye.

6229- Xwendin wek bîra ku tu bi derziyê bikolî.

6230- Xwesteka rûreş e, hevala parîxweş e.

6231- Xwestî birîn e û hatî çûn e.

6232- Xwestin rûreşiyek e, nedan du rûreşî ye.

6233- Xwestin xîret e, te hey neda mirov ne xusaret e.

6234- Xweş xeber e lê min jê ne bawer e.

6235- Xweşik bi nîvî ne reşik arizî ne..

6236- Xwezî bi dehê kanûnê,

berê xwe dide sosin û beybûnê.

6237- Xwezî bi eqlê paşî ne yê bi pêşî.

6238- Xwezî bi sêwiyan ne bi hêviyan.

6239- Xwezî bi navê te ne bi dîtina te.

6240- Xwezî xesû tunebûya, bûk bi dilê xwe bûya.

6241- Xwê avêt nanê xwe û agir berda canê xwe.

6242- Xwê bi birîna vekirî wermeke.

Li hinek herêman weha jî dibêjin: Birîna vekirî xwê wermeke.

6243- Xwişk ber bi bira ne, bira ber bi çiya ne.

6244- Xwîn bi xwînê nayê şuştin, xwîn bi avê tê şuştin.

6245- Xwîn ji kevir nayê.

6246- Xwîn nabe av.

6247- Xwîn yek e, çi li ser hespê û çi li ber singê.

6248- Xwîna ciwanan tim dikele.

Ciwan her tim enerjîk, aktîv û macereperest in. Divê mirov bi psîkolojî û rewşa ciwanan bizanibe û li gor wê perwerde û hîndekariyê pêk bîne. Ji ber ku ciwan pêşeroja civatê ne û sibê ew civatê birêve dibin.

6249 - Xwîna mêran li erdê namîne.

6250- Xwîna mêran û qelindê jinan li erdê namîne.

6251- Xwîna mirov kefçiyek e, navê mirov çiyayek e.

6252- Ya arekî xweş ya zarekî baş.

Kurd ji agir re “ar” û ji ziman re jî “zar” dibêjin.

6253- Ya bavçê ya xalçê.

Weha jî dibêjin: Ya mamçê ya xalçê.

6254- Ya av ya agir.

6255- Ya barek dirav ya barek derew.

Li hinek deverên Kurdistanê weha jî dibêjin: Ya barek pere bide xizmê
xwe û ya abrek derew bide dijminê xwe.

6256- Ya bike û nepirse û ya neke û netirse.

Weha jî dibêjin: Ya bike û neberize yan bide û nelcrze.

6257- Ya bi qelem nivîsî, bi bivir nayê şikestin.

6258- Ya destan neke dilan.

6259- Ya dê ya jin.

6260- Ya dil bila di dil de bimîne.

6261- Ya dilê min bila ji min re be û ya zarê min bila ji te re be.

6262- Ya dîtî ji bîr meke!

6263- Ya dîzikê dê her bibêje kasikê.

6264- Ya duayê aliman ya yê zaliman.

6265- Ya hero ya mero.

Weha jî dibêjin: Ya here ya were.

6266- Ya hevîr bike dê qûna xwe bihejîne.

6267- Ya ji avê ya ji latê.

6268- Ya ji kerê ya ji perê.

6269- Ya ji malê dinê û komê pir be ya gûhê kcrê be.

6270- Ya ji text û ya ji bext.

6271- Ya li falê tê ya li xalê tê.

6272- Ya mela bangdan e.

6273- Ya mêran lê hatin e ne jêhatin e.

6274- Ya mêrekî baş be

ya bivir û das be

ya jî bimire û xelas be.

6275- Ya mêrê çê be ya şêrê çiyê be.

6276- Ya mirov bi pîyê xwe bike ya ji destê xelkê çêtir e.

- 6277- Ya naçe aşê ya diçe aşvan dikuje.
- 6278- Ya naçe dîziyê ya jî diçe şivan dikuje.
- 6279- Ya nanê te genim ya zarê te genim.
- 6280- Ya nebûyî gilî nekin.
- 6281- Ya pîr e ya tîr e.
- 6282- Ya rovî kevl e.
- 6283- Ya şîn neke ya şahî neke.
- 6284- Ya te xebcr bi dil e, mêranî tê kifşê bi gul e.
- 6285- Ya teşîrêş bc, dikare bi kîrê kerê birêse.
- 6286- Ya tu car hilnegire bar ya jî tu ketî meke hewar.
- 6287- Ya xalek ya jinxalek.
Li hinek herêman weha jî dibêjin: Ya xalek ya xalyûmek.
- 6288- Ya xelat e ya celat e.
- 6289- Ya xew e ya jî kew e.
- 6290- Ya ziman dibire, şûr jî nabire.
- 6291- Ya zarê te ji min re ya dilê te ji te re.
- 6292- Ya zêr dizane ya zor dizane.
- 6293- Yara kevin hespê zînkirî ye.
- 6294- Yarê diya min yek bûya,
 min dê bi dendikê behîvê xwecî bikira.
- 6295- Yarê gula geş e, jîna roja xweş e.
- 6296- Yarê neyarê, koç û barê.
- 6297- Yarî bê micdahî nabin.
 Micdahî di wateya cidîyetê de hatiye bi kar anîn.
- 6298- Yarî dibe neyarî.
- 6299- Yarî neke bi kesan, neyê serê te, tê serê pisê pisan.
- 6300- Yarîtî xweşî ye, dîtina wê rûreşî ye.
- 6301- Yek av e, du av e, sê dê û bav e.
- 6302- Yek ban e, du zozan e.
- 6303- Yek bi hêjayê hezaran e lê hezar ne hêjayê yekê ne.
- 6304- Yek bi malê xwe, yek bi canê xwe.
- 6305- Yek bi sedî ye, sed ne bi yekê.
- 6306- Yek birin buhiştê, digot; ma ji mirinê wê de çi heye?
- 6307- Yek dikenc û yek digirî.
- 6308- Yek dîn û yek bi eqil!

- 6309- Yek - du, agir dike dû, pênc û şeş agir dike xweş.
- 6310- Yek e, wekî deq e; du ne benikê stû ne; sê ne, kîrquzdê ne.
- 6311- Yek hezarî wenda dike.
- 6312- Yek heye bi sedî, sed henc ne bi yekî.
Weha jî tê gotin: Yek ji hezarî re, hezar ji yekî re.
- 6313- Yek ji hezarî ye, hezar ji yek e.
- 6314- Yek ji kuran gul e û yek kul e.
- 6315- Yek li Şamê dan dikute yê din li vir dibêje: Hum ha!
- 6316- Yek toto be, yek boto be dê halê me jî ev be.
- 6317- Yek ta nabe du ta.
- 6318- Yek xwedî xwedan, yek bûk e mêvan
 û yek jî ji devê hirç û guran.
- 6319- Yek yek e, du malbatek e.
Varyanteke din jî weha ne: Yek yek e, du komek e.
- 6320- Yek yek e, du komek e, sê ne gerek e.
- 6321- Yek e, deq e;
 du ne, ben lîsto ne;
 sê ne, bi hev asê ne;
 çar in, bi hev neyar in;
 pênc in, bi hev sênc in;
 şeş in, bi hev xweş in;
- 6322- Yekî digote yekî: Were mala me!
Yê din digot: Ma ez şûr û mertalê xwe li kû dayînim?
- 6323- Yekî du ga hebûn, yek nedîçû axur
 û yê din jî, ji axur dernediket.
- 6324- Yekî got: Ez dê guhê te bigirim li dora dinê bigerînim.
Yê din got: Ne dê destê te jî bi guhê min ve be?
- 6325- Yekî got: Ez mêraniyê ji kûçikê xwe hîn bûm.
- 6326- Yekî got “mala min e,” yê din got “warê min e.”
- 6327- Yekî gote yekî: Were ez te bibim buhiştê.
Yê din got: Îro ne roja min e.
- 6328- Yekî ji xêrê naçe dêrê.
- 6329- Yekî jina xwe berda, digot: Were ji min re bibe yar.
- 6330- Yekî li mirêkê nêrî û got: Ev pêşiya min e, ka paşiya min?
- 6331- Yekî rezek da yekî, yê din guşiyek tirî neda.
- 6332- Yekî rez nebû, radibû masle çêdikir.
- 6333- Yekî şalê xwe da yekî, jê re got “pê neçe ser gû.”

- 6334- Yekî tazî di kuwarê de rûnişt
 û digotê jîna xwe “zirav birêse!”
- 6335- Yekî tir kir, got: Kê kir, kê kir?
Got: Sêwiyê bê dê û bav kir.
- 6336- Yekî xwe û dehê hevalan bêje.
Weha jî dibêjin: Yekî xwe û duyê hevalan bêje.
- 6337- Yekîtiya mirovan çiya dihejîne.
- 6338- Yê baştir Behdîn e, ew jî hîz e û derewîn e.
- 6339- Yê bedew diçe ba deriyê Beko.
- 6340- Yê bengîn e, xew lê nîne.
- 6341- Yê berî bûkê dihat piştî bûkê nayê.
- 6342- Yê bêkar tim li ber sîkê ye.
- 6343- Yê bibe hevalê pariyan zû dixeyde.
- 6344- Yê bi dilê xwe bigere bedewan dixwaze.
- 6345- Yê bibe hevalê qereçyan divê li parsê bigere.
- 6346- Yê bibcze diweste.
- 6347- Yê bi jîna xwe nikaribe ne tu mêr e.
- 6348- Yê bike, dixwe.
- 6349- Yê bilind kirasê wî kin e.
- 6350- Yê birçî çû civatê yê tazî neçû.
- 6351- Yê bixeyde li ser nan û avê, bi xwe aşt dibe.
- 6352- Yê bixwe savarê dê biç hewarê.
- 6353- Yê bûkê pê û pal yê şivan ço û gopal.
- 6354- Yê caw çêdike bê kefen tê veşartin.
- 6355- Yê çê li ser navê xwe tê.
- 6356- Yê çû, mede dû.
- 6357- Yê der hat yê hundir qewitand.
- 6358- Yê derewîn vala hildide xwe yê rast tijî hildide xwe.
- 6359- Yê deve xwedî dike, divê serdera deriyê xwe bilind bike.
- 6360- Yê di ber mirinê de miriyan dibîne.
- 6361- Yê dilê mirov rehet dike dew e,
 canê mirov rehet dike xew e,
 mala mirov xerab dike derew e.
Li hinek deveran weha jî dibêjin:
 Yê canê mirov rehet dike xwê,
 nava mirov hênik dike dew,
 mala mirov wêran dike derew.

6362- Yê direve gaziyê Xwedê dike û yê ku dide peyî jî.

6363- Yê dixwe nizane çî dixwe yê didc dizane çî dide.

6364- Yê digere seravan, dikeve çiravan.

6365- Yê evdan tevdîr e yê Xwedê teqdîr e.

6366- Yê gewrî qul kiriye nan jî pê re dide.

Weha jî dibêjin: Yê ku qirikê qul kiriye, risq jî dide.

6367- Yê havînê serê wî keliya, zivistanê kasika wî dikele.

6368- Yê hewanê rokir meydanê.

6369- Yê hinekan mal û dîwan e û yê hinekan ne parîyek nan e.

6370- Yê ji Adem e bi kul û xem e.

6371- Yê ji ba bitirse kumê xwe li serê xwe digire.

6372- Yê ji çiyê dikeve ji destê xwe diç.

6373- Yê ji jina xwe netirse ne mêr e.

6374- Yê ji xelkê xwe hez neke, ji zimanê xwe jî hez nake.

Weha jî dibêjin: Yê ji milletê xwe hez bike, zimanê xwe jî bîr nake.

6375- Yê ji min be dê li ber tîfika min be.

6376- Yê jîr be belî dibe.

6377- Yê ji Xwedê natirse jê bitirse.

6378- Yê keran guh tune, tîrê hîn daşik e.

6379- Yê kerr e, lal e jî.

6380- Yê kinisî çû ba yê dinisî gotê: Ka piçek nanê garisî.

6381- Yê ku aş çêbike çeçqeçoyan jî çêdike.

Li hinek deverên Kurdistanê weha jî dibêjin:

a) yê ku dêzikan çêbike, çembilan jî pêve dike.

b) yê tevnê çêbike, dizane hevo pêveke.

6382- Yê ku amedcya dawetê dike, amadcya kevçiyar jî dike.

6383- Yê ku bikeve govendê divê xwe bihejîne.

6384- Yê ku bimîze dergêhê xelkê dê bimîzîn dergêhê wî.

Weha jî dibêjin: Yê ku bikute dergêhê yekê dê bikutin dergêhê wî.

6385- Yê ku bilind bifire nizim dikeve.

6386- Yê ku caşê wî hebe li rastê namîne.

6387- Yê ku cixarc dikşîne heste jî bi xwe re digêrîne.

Weha jî dibêjin: Yê ku gû bixwe, kevçî bi xwe re digêrîne.

6388- Yê ku dawiyê bikene xweştir dikene.

6389- Yê ku dest dike dê û bav nakin.

6390- Yê ku dizane ji xwe dizane yê ku nizane,

dibêje qey ji bo baqê nîskan e.

- 6391- Yê ku dotmama xwe neccibîne dê kurdinde bimîne.
- 6392- Yê ku dûrî çavan be nêzîkî dilan e.
- 6393- Yê ku eslê xwe înkâr bike heramzade ye.
- 6394- Yê ku gelaciyê li ba te bike, dê gelaciya te jî bike.
- 6395- Yê ku gora xelkê bikolo, ew bi xwe dikevê.
Weha jî dibêjin: Yê ku gora hevalên xwe bikole, ew bi xwe dikevê.
- 6396- Yê ku got û kir şêr e yê got û kir mêr e
yê got û nekir kerê nêr e.
Weha jî dibêjin: Yê nebêje û bike mêr e, yê bêje û neke kerê nêr e.
- 6397- Yê ku here masiyan dê qûn lê şil be.
- 6398- Yê ku hêkê bidizê, kengê hebc dê bizê.
- 6399- Yê ku hêviya yarê be bê welat dimîne.
- 6400- Yê ku ji avê ditirse dikeve agir.
- 6401- Yê ku jinê berde li paşiya xwe nanêre.
- 6402- Yê ku ji xelkê re dafik datîne ew bi xwe dikeve dafikê.
- 6403- Yê ku ji gotina dê û bavê xwe derkeve tim poşman e.
- 6404- Yê ku kar bike birçî namîne.
- 6405- Yê ku ket golê ji baranê natirse.
- 6406- Yê ku mirinê bibîne bi nexweşiyê qane dibe.
- 6407- Yê ku nav şeqê diya min şil neke ne birayê min e.
- 6408- Yê ku nexwe nikare bide.
- 6409- Yê ku neke bi gotina mezinan li serî tê strûyê bizinan.
- 6410- Yê ku nîjada xwe ji bîr bike bênîjad e.
- 6411- Yê ku qedrê xwe zane qedrê benda jî zane.
- 6412- Yê ku singê bi xwe li xwe bixe, nikare ji xwe derbixe.
- 6413- Yê ku sîr nexwe bîhn ji dev nayê.
- 6414- Yê ku şil be ji baranê natirse.
- 6415- Yê ku tevnê çêke dizane hevo pê veke.
- 6416- Yê ku tiştêk dixwe kevçiyê bi xwe re digerîne.
Weha jî dibêjin: Yê ku gû bixwe, kevçiya xwe jî bi xwe re digerîne.
- 6417- Yê ku xaniyê wî ji qeşayê ye divê kevir navêje xaniyê xelkê.
- 6418- Yê ku xebitî, nexelitî.
Yanî yê ku bixebite poşman nabe û dûr-nêzîk dê berhema xebata xwe digire.
- 6419- Yê ku zehf dizane hindik diaxive.
- 6420- Yê ku zimanê xwe dirêj dike nanê xwe wenda dike.

- 6421- Yê kuştinê, bi kuştinê diçe.
- 6422- Yê li ber avê here, dest davêje şel û pelan.
- 6423- Yê ku li ber avê here ji kîsê dê û bavê xwe dere.
- 6424- Yê li ber xwe nekeve pîr nabe.
- 6425- Yê li ber nexweşan nexweş e.
- 6426- Yê li bin deng nake yê li ser qare-qar dike.
Weha jî dibêjin: Yê li bin deng nake, yê li ser qore- qor e.
- 6427- Yê li bin lingê hevalê xwe kortal bikole, bi xwe tê werdibe.
- 6428- Yê li pey ket digire yê dinalê dimire.
- 6429- Yê me qilepîze, bûk stowr e, qîz avis e.
- 6430- Yê melevan qeyik jê re navê.
- 6431- Yê mêran ne gotin e, pirêze ye.
- 6432- Yê mêran ji dîtinê bawer e.
- 6433- Yê mêran bext e ne text e.
- 6434- Yê mirov bi mirov re xayîniyê nake.
- 6435- Yê ne ji diya min e ne birayê min e.
- 6436- Yê ne ji hinavan nayê pêş çavan.
- 6437- Yê ne ji min e ne li min e.
Varyanteke din jî heye: Yê ne li min e, ne ji min e.
- 6438- Yê ne li ber çav e ne li ber dil e.
- 6439- Yê ne li malan nizane bi halan.
- 6440- Yê nebîne reşiyê nabîne xweşiyê.
- 6441- Yê nexwe tehliyê nas nake şîraniyê.
- 6442- Yê nimêjker bêdilê xwe çû mizgeftê dît ku deriyê wê girtî ye, veg
 eriya û got: Mizgeftê ji te derket û lêketê.
- 6443- Yê nizane karê xwe, dûr e ji warê xwe.
- 6444- Yê parker bê par dimîne.
- 6445- Yê pênan dide li pêş wî here yê gez dike li paş wî here.
- 6446- Yê pêşîn nizane yê paşî dê çi bêje.
- 6447- Yê pêşî şîva bê şîv e.
- 6448- Yê qencyê wenda bike rojê ji xwe re deman dike.
- 6449- Yê qure kera wî li çolê dimîne.
- 6450- Yê rastiye bêje serşikestî ye.
- 6451- Yê rastiye bêje ji civatê tê dîrxistin.
- 6452- Yê raze gelekî dizane hinekî.

6453- Yê rojî nagire bihayê cejnê dizane.

6454- Yê saxan zewal tune yê qelban guman tune.

6455- Yê se bikuje cendekê wî jî dikişîne.

6456- Yê serma nebîne nexweş nakeve.

6457- Yê serserem ji zorker xerabtir e.

6458- Yê serxweş şûşê najmêre.

6459- Yê sil bû, şil bû.

Li herêmên Licê û Hekariyê ji hêrsbûn"re silbûn"dibêjin. Divê mirov bîhnfireh be û zû bi zû hêrs nebe. Kesî ku hêrs bibe zirarê dike.

6460- Yê sitemkar nabe ramiyar.

6461- Yê striyan biçîne dê striyan hilîne.

6462- Yê te ne raman e, eman e.

Bi kurdî ji fikir re "raman" tê gotin. Ev gotin ji bo ew kesên zorba ku nahêlin mirov bîrûbaweriya xwe bêje û zorê li mirov dike, tê gotin.

6463- Yê te ne wijdan e, cuzdan e.

6464- Yê te ne zik e, afira ga ye.

6465- Yê têrê rokir ser bêrê.

6466- Yê xebitî neşimitî.

6467- Yê xelkê fisin dimelisin yê min tir in digindirin.

6468- Yê xemgîn e xew lê nîn e.

6469- Yê xelkê sor û zer yê me ji edetan der.

Li hinek deveran di şûna gotina "cedet" de "dinya" jî bi kar tînin.

6470- Yê xurt bibeze zû radiweste.

6471- Yê xwarî telef e yê dayî selef e.

6472- Yê zane ji kesî pirs nake.

6474- Yê zana zane yê nizane baqê nîskan e.

6474- Yê zaroka xwe şîret neke paşê şer dike.

6475- Yên berî me gotine:

Xwecê "q..." mirov ji "k..." zarokan biparêze.

Di nav gel de gotinên weha mustehcen jî hene û gel van gotinan di nav civata rojane de bi kar tîne. Min tîpên pêşîn yên van gotinan nivîsî.

6476- Yên kulek li ba hev dimînin.

6477- Yên xwînê, werin ser şînê.

6478- Yên ziman dirêj, dest û lingên wan kurt in.

6479- Zad, zadê miriyan e û goşt goştê san e.

Dema yek behsa kêmasên yekî din bike û yên guhdar jî, di derheqê wî kesî de hîn bêhtir tiştên xerab bizanibin, vê gotinê dibêjin. Yanî “behsa wî mirovî neke, ew mirovekî gelek erab e.”

6480- Zan zane, bê baqê nîskan çend tane?

6481- Zana dizane, ma nezan bi çi dizane?

6482- Zana ji Bexdayê tê, malxoyê malê xwe çêtir dizane.

6483- Zanebûn kela ye nezanî bela ye.

6484- Zanebûn ne ji biçûkî û mezinayiyê ye.

6485- Zane dawet e lê nizane li mala kê ye.

6486- Zanîn derya bê binî ye.

6487- Zanîn ji şûr tûjtir e.

6488- Zanîn kanî ye.

6489- Zanîn û huner, halanê mêran in.

6490- Zar yê dê ye ne yê bavê ye.

Kurd him ji ziman re û him jî zarok re “zar” dibêjin.

6491- Zarê xweş bihara dilan e.

Zimanê xweş dilê mirov xweş dike.

6492- Zarok bi listikê mezin dibin.

Du varyantên din jî hene:

a) zarok bi girî mezin dibin.

b) zarok bi ketin û rabûnê mezin dibin.

6493- Zarok çi bibîne digire lê çi bibîhse dibêje.

6494- Zarok gotinên mezinan dibêjin.

6495- Zarok gula malan e.

Li hinek deveran weha jî dibêjin:

a) zarok fêkiyê malan in.

b) zarok gulîlkên malan in.

6496- Zarok ji bavê sêwî namîne ji dê sêwî dimîne.

6497- Zarok kezeba dê û bavên xwe ne.

6498- Zarok ku derewîn bû mezin jî bibe derewîn e.

6499- Zarok li ser milê dê mezin dibin.

6500- Zarok mirov bi xwe re nabin cenetê.

6501- Zarok negirî dê şîr nadê.

Li hinek herêman weha dibêjin: Biçûk ku negirî memik naxwe.

6502- Zarok perdeya spî ne, nexşên xweşik lê bike.

6503- Zarok zarok e, çi feqîr çi milûk e.

6504- Zaroka dê ye ne ya bavê ye.

6505- Zaroka ku pehniya min jê bi xwîn nebe, ne ji min e.

6506- Zaroka li ber destê jinebiyan nabîne tu xweşiyên.

6507- Zaroka nebûyî nav lê nakin.

6508- Zarokê b dê, navika xwe bi xwe dibire.

Weha jî dibêjin: Zarokê bê dê navika xwe bi xwe jê dike.

6509- Zarokên biçûk çûkên buhiştê ne.

6510- Zarokên du diyan li du rîyan.

Di nav zarokên hewiyan de tim sarî û teşxele heye û bi hev nakin.

6511- Zarokên hûr çerezên malê ne.

6512- Zarokên horê werin dorê.

Li hinek herêman weha jî dibêjin: Wexta horê werin dorê.

6513- Zarokên şivan û şah wek hev tazî çêdibin

û wek hev bi tazî dimirin.

6514- Zava hate ser malê xezûr kete newalê.

Weha jî dibêjin: Zava hate ser malê, mal ji destê xezûr çû.

6515- Zava kurê malê ye.

Weha jî dibêjin: Zava kurê xezûr e.

6516- Zavayê bi hiş tirên mala xezûr yên wî ne.

6517- Zavayê li ber deriyê xezûran mîne seyê li ber tenûran.

6518- Zavayê li ser xezûran sêwiyê li ser tenûran.

6519- Zavayê malê, kerê malê ye.

Li hinek deveran weha jî dibêjin:

a) zava kerê xezûr e.

b) zava kûçikê xezûr e.

c) zavayê malê kurê malê ye.

6520- Zebeş bi dengê xwe hinar bi rengê xwe.

6521- Zebeş ji lemê xwe direve.

6522- Zehf şêrîn e lê hundir strî ne.

6523- Zehf zarokan delalî bikî dê karê xerab bikin.

6524- Zehmetî rehetiyê tîne.

6525- Zehmetên Aqo mane pêlên meraqo.

6526- Zemanek diçe, zemanek tê

- helbet Kurmanç li hespê siwar dibe.
- 6527- Zenga mirinê davêje diranan.
- 6528- Zengîn bikevin behrê nafetisin.
- 6529- Zengîn ku xizan dibe, sed salî bîhna zengiyê jê tê,
xizan ku zengîn dibe sed sal bîhna xizaniyê jê tê.
- 6530- Zengînek gava feqîr dibe dîsa çil roj bîhna zengîniyê jê tê.
- 6531- Zer e lê ne zêr e.
- 6532- Zerya bi dilopan naqede.
Kurd ji “deryayê” re “zerya” jî dibêjin.
- 6533- Zeviya bê av û welatê bê bav.
- 6534- Zeviya bê co av naçe ser.
- 6535- Zeviya xwe bi ceh ke, kewara xwe tije ke.
Hinek di şûna gotina “zevî” de, gotina “erd” jî bi kar tînin:
Erdê xwe bi ceh ke, kewara xwe tije ke.
- 6536- Zeviya ne zêde heft gîsin lê de, paşê tovê xwe têde.
- 6537- Zewac girêka kor e ne vedibe ne tê girêdan
- 6538- Zewac him serê mirov û him dest û lingên mirov girê dide.
- 6539- Zewaca bêdil ezabê cehenemê ye.
Li hinek deveran weha jî dibêjin:
Zewaca bêdil mîna nanê bêxwê ye.
- 6540- Zêr be bîne, zîv be bîne lê jinebiya bi sêwî neyîne.
- 6541- Zêr biçûk e, biha giran e.
- 6542- Zêr bi zêrîtiya xwe muhtacê kapekê ye.
- 6543- Zêr bide zêrîngeran.
Varyanteke weha jî heye: Zêr bidin destê zêrnanan.
- 6544- Zêr çiqasî hûr e bi qîmeta xwe diçe.
- 6545- Zêr di sikakan de wenda nabe.
Weha jî dibêjin: Zêr di xweliyê de wenda nabe.
- 6546- Zêr narize û dem naze.
- 6547- Zêr xerab nabe.
Weha jî dibêjin: Zêr têkeve nav gû jî xerab nabe.
- 6548- Zêr zane, zor zane, devê tîfînga mor zane.
Varyanteke weha jî heye: Zor zane, mêr zane, devê tîfînga mor zane.
- 6549- Zêr zer e, gezêr zer e?
- 6550- Zêra wendakirî tê dîtin, soza wendakirî nayên girtin.
- 65851- Zêra xas zengê nagire.
- 6552- Zêra zer xera nabe, mêrê çê bê nav nabe.

- 6553- Zêretê min kirî, zêret dumahîk li min anî.
- 6554- Zêrker bi qedrê zêr dizane.
- 6555- Zikbirçî têr dibin lê çavbirçî têr nabin.
- 6556- Zik bi razan û mizdanê têr nabe, bi xebat û kedê têr dibe.
- 6557- Zik heye, çal e.
- 6558- Zik ne sifre ye ku hemû kesî bike xwe.
- 6559- Zik têr e, çav birçî ye.
Weha jî dibêjin: Zik têr dibe, çav têr nabe.
- 6560- Zik têr e, Milî şêr e.
 Ev ji bo eşîra Milî hatiye gotin.
- 6561- Zik têr be, hez dikî bila ji tovê dêr be.
- 6562- Zikek du minetan hilnagire.
- 6563- Zikê dê buxçe ye, ji her rengî têde heye.
- 6564- Zikê têr hay ji zikê birçî tune.
- 6565- Zikê xwe hîn neke du nanan,
 bejna xwe hîn neke du kiras û xeftanan
 ji te re li hev nayê hemû dem û dewranan.
- 6566- Zikê xwe têr xew lê xêr.
- 6567- Zikê zarokê tijî ye lê dev nagere.
- 6568- Ziko, ziko zikakî,
 herçî nikarî peydakî,
 tu namûsê jênakî!
- 6569- Zil-zil berhev kir, mil-mil belav kir.
Weha jî dibêjin: Bi kefçiyê berhev kir û bi heskê belav kir.
- 6570- Zilam hene û zilamok hene, jin hene û jinok hene.
 Gotinên “zilamok” û “jinkok” ji bo rewşa negatîv hatine bi kar anîn.
- 6571- Zilam heye, zalim heye!
- 6572- Zilkê biharê debra malê.
- 6573- Ziman bê hestî ye.
- 6574- Ziman daqoqê serî ye.
- 6575- Ziman girtî ser rehetî.
- 6576- Ziman hevalê xwediyê xwe ye.
- 6577- Ziman him dost, him dijmin e.
- 6578- Ziman ji şûr tûjtir e.
- 6579- Ziman ji xwediyê xwe re xerab nabêje.
- 6580- Ziman kilîta dilan e.
- 6581- Ziman nankor e.

- 6582- Ziman ne kaş li ber hene û ne kendal.
- 6583- Ziman paleyê xwediyê xwe ye.
- 6584- Zimanê dê şêrîn e.
- 6585- Zimanê dirêj edûyê serî ye.
- 6586- Zimanê gunehkaran kin e.
- 6587- Zimanê Îblîs salê carekê li heqiyê digere.
- 65838 Zimanê şîrîn mar ji qulê derdixe.
- 6589- Zimanê têr tim birçî ye.
- 6590- Zimanê xwe bibire, cîhê xwe bikire.
Weha jî dibêjin: Zimanê xwe birî, cîhê xwe kirî.
- 6591- Zimanê xwe didirînim û ji hevalan namînim.
- 6592- Zimanê xweş bihara dilan e.
- 6593- Zimanê sor e, li pêşî ne gelî ye ne zihor e.
Varyanteke weha jî heye: Di ziman de hestî tune.
- 6594- Zimano biriyo, seriyo seqeriyo.
- 6595- Zimano ji sotinê,
 pîrsa nayê gotin,
 çima tu hez dikî ji dinê.
- 6596- Zimano leq û leq, seriyo teq û req.
Varyanteke din jî weha ye: Ziman daqmoqa serî ye.
- 6597- Zîrar birayê karê ye.
Weha jî dibêjin: Kar û zîrar bira ne.
- 6598- Zîrar, du zîrar him dîz him girar.
- 6599- Zîrar ji carisiyê çêtir e.
- 6600- Zivir zivir dîsa li vir.
- 6601- Zivistan hat berîka xizan diriya.
Weha jî dibêjin: Zivistan hat ber deriyan cilika xizan qetiya.
- 6602- Zivistan sar e, du lîngan bikin çar e.
 Yanî zivistanan sar, bizewicin hev germ bikin.
- 6603- Zivistan serma ye potik bav û bira ye.
- 6604- Zivistanan pîne û perû, havînan qît qît berû.
- 6605- Zîp kereng bûne xîp.
- 6606- Zîpik bibarin nebarin, dijwar in.
- 6607- Zîpik zîpdar in, bibarin nebarin xedar in.
Weha dibêjin: Zîpik in bi libik in, bibarin nebarin xedar in.
- 6608- Zîvkerê baş hêkan jî bi çembil dike.
- 6609- Zoq ne tişt e lê kevirê Hemo li pişt e.

- 6610- Zor dizene riya zangert li kû ye.
- 6611- Zor di derî re bikeve hundir,
qanûn di kulekê re derdikeve.
- 6612- Zor gêzerê radike.
- 6613- Zor hat xweşî betal bû.
- 6614- Zor zane, mêr zane,
devê tifinga mor zane.
- 6615- Zor zane, zêr zane, zanîn zane.
- 6616- Zozan çêrandî mastê se leqandî.
- 6617- Zozan rind e hema çiya bilind e.
Zehmetî û berdêla rindî û xweşiyê heye. Li hinek deveran di şûna
gotina “hema” de gotina “lê” jî dibêjin.
- 6618- Zulm li erdê namîne.
- 6619- Zulma bê sînor Xwedê qebûl nake.
- 6620- Zulma mêran bi barê keran.
Dema mêr li jina xwe zulm bike, wê demê vê gotinê dibêjin. Jin
bindestê mêr e û mêr zulmeke gelek mezin û dijwar lê dike.
- 6621- Zulma Tirkan ji edeleta Ereban çêtir e.
- 6622- Zû dişike lê dereng diciribe.
- 6623- Zûrîna gur ne ji xêrê re ye.

6624- Ademî bê ling mirî ye.

Kurdên Xorasanê di şûna gotina "mirov" de gotina "adem" dibêjin.

6625- Ademî feqîr merd dibe.

6626- Axa cewrik mezin kir û bû kûçik axa dirand.

6627- Axa rabûn hingurma(pevçûn),

feqîr û xizan çûn li ber lingan.

6628- Ba jî ji te, baran jî ji te.

6629- Bayê Ecem e, çend qurîşên me li cem e.

6630- Berê nav mizgeftê têrke, paşê dora mizgeftê.

6631- Berê tact, paşê nemat.

6632- Bîbare bihar e, nebare xedar e.

6633- Biharê bereket tê xwarê

xelk dibin şikirdarê.

6634- Bi destekî du zebeş nayê girtin.

6635- Bi qirş û qalan xanî çênabin.

6636- Bi şîr be, ew ê li cem xwedî be.

6637- Bi dev xweş e, bi dil reş e.

6638- Bi payîzê zû dake

bi biharê zû rake.

6639- Bi westiyayî kir, bi vesiyayî xwar.

6640- Bike bi kîzê li ber cenetê bilîze.

6641- Bikşîne cefayê, bibîne sefayê.

6642- Bîr bi cotê tijî nabin.

6643- Bîst û yekê adarê

milyaket hatin xwarê

hela kirin li biharê.

6644- Bû cil û kete mil.

6645- Bû pevek xweş, nebû qira reş.

6646- Bû xarman e ne bû derman e.

6647- Bûka malê stûr e, birîna pîrê kûr e.

* Başko îlawe ye. Dema ku ez êdî pirtûkê bidim çapê, ez rastî van gotinên pêşiyên hatim. Gelek zehmet bû, ku carek din ji serî heta dawî hejmaran biguhêrim û îndeksê nû çêbikim. Ji ber vê yekê, min hejmar da van gotinan û di dawiya pirtûkê de li bin nave "paşko" nivîsî.

- 6648- Bûkê pêpar, şivan ço û dar.
- 6649- Cîran hewcedarê xweliya cîran e.
- 6650- Çawa dîk e, weha jî kumik e.
- 6651- Çi îman e, çi wijdan e,
bazara serbest e, kilîtê xwe cizdan e.
- 6652- Çiri ye û çirî ye, mal teyr û tajî ye.
Ev ji bo meha çirî hatiye gotin.
- 6653- Da min mistek, xistim pistek.
- 6654- Dêhê qanûnê roj, berê xwe da havînê.
- 6655- Dest ji dest. hiş ji hiş mezintir e.
- 6656- Destê ku xan bibire xwîn jê nayê.
Weha jî dibêjin: Destê ku şerîet bibire xwîn jê nayê.
- 6657- Dewran ketiye filan, mirin ketiye milan.
- 6658- Dil pîr nabe.
- 6659- Dilê dê li ser av û agir e.
- 6660- Dilê yekê ku hilbigre, mirov her tîtfî dixwe.
- 6661- Dilop hesin jî qul dike.
- 6662- Dinya dehl e, şêr jî têde hene rovî jî.
- 6663- Divê mirov bûkê li hespê nêr siwar bike.
- 6664- Du kes bêjin kumê te ne li scrê te ye,
divê tu destê xwe bidî serê xwe.
- 6665- Dukana Beko û du serî sabûn.
- 6666- Em hatin payîzan
çêkin cîhê ezîzan.
- 6667- Eqilê heft pîrekan di serê mirîşka gêj de ye,
serê sibê nikulê wê di gû de ye.
- 6668- Eqilê pîr sermiyan e ne karê her mirovan e.
- 6669- Gebûl e xwedî qebûl e.
- 6670- Genimê rijyayî berhev nabe.
- 6671- Gerekî aşê ji dehl gerê destarê çêtir e.
- 6672- Geryan derman e û risq ser piyan e.
- 6673- Gewende têr xwar dê li deholê bixe.
- 6674- Girê ku xelk bixwurîne, rehet nabe.
- 6675- Goştê xizan yê mele ye, hestî yên bavê ne.
- 6676- Gotina ku ji dev derket êdî paş lê nayê girtin.
- 6677- Guhdarê civatê be, delal, dilan be.

- 6678- Gulan e, bexte baran e.
- 6679- Gur hemî jî birçî ne.
- 6680- Gur ji pez re tu wextê nabe dost.
- 6681- Ha dîn ya dinya kî pirr bixebite jê mehrûm namîne.
- 6682- Hejdê adarê
melyaket têne xwarê
gazî dikin li biharê.
- 6683- Heke tu nizanî, temaşeke li cîranî.
- 6684- Her karî bike lê merûmazariyê meke.
- 6685- Her kes qelemê bigire, sa wî şûn pir e.
Ev jî gotina Kurdên Xoresanî ye û baş fêm nabe.
- 6686- Her ketinek ji fendek e.
- 6687- Hevalê ademî (mirovê) gir hesp e yê qiçik se ye.
- 6688- Heyî kanî ye, tuneyî genî ye.
- 6689- Hêka genî di pûngalê de dimîne.
- 6690- Hûtê xwarinê, hûtê kar e.
- 6691- Îlonê zik têr e
û dinya xêr e.
- 6692- Însanê ku bike tekbîr, Xwedê dide wî teqdîr.
- 6693- Îşê Xwedê çîn-çîn e, mirîşk reş e hêk spî ne.
- 6694- Ji ariyê ar tê emelê.
- 6695- Ji bo gayê raketî êm tune.
- 6696- Ji bo raketinê siya kemaran rind e, heger mar tune be.
- 6697- Ji qirik û belikê tev de bû.
- 6698- Ji ruyan anîn li simêlan kirin.
- 6699- Kerr e lê binger e.
- 6700- Kes naxwaze kes jê çêtir be,
her kes dixwaze zarokên wî jê çêtir bin.
- 6701- Kesî qîmez mêvan nayê malê.
- 6702- Kesê bêbext tim rastî bêbextan tê.
- 6703- Kevirê mezin mirovê mirov li serê mirov dixê.
- 6704- Kî kar bike beroşa wî dikele.
- 6705- Kî nanê me xwar, wî gora me kola.
- 6706- Kî pirr xebitî hindik dixwe.
- 6707- Kîşnîş şîrîn e, lê dûv li gewriyê dimîne.
- 6708- Kulavê reş gewr nabe.

6709- Kudirê pîs dendikên xwe pir in.

6710- Kurd miriye, kes tune ku li ser bigirî.

Yanî xwediyê Kurdan tune, Kurd bê xwedî ne.

6711- Kûsî çû tovê garis, heta hat li şimêlan leqitî.

6712- Lingê rûniştî êxil tîne, lingê gerayî gepan tîne.

6713- Mal di riyeckê de dere, xwedî di hezar riyên de.

6714- Malê helal wenda nabe.

Kurdên Xoresanê weha dibêjin: Malê helal yox nawî.

6715- Malê spî ji bo roja reş e.

6716- Mêr beştê malê ye.

6717- Mêrê çê simêl di dev de ye.

6718- Mêrê du jinan êsîr e.

6719- Mirov ji çavekî hezar çavî dibîne.

6720- Mirovê xwedî du jin, ew bi herdu jinan ve dibe sê jin.

6721- Mîya çê li mexel e.

6722- Navê bajarê dûr xweş e.

6723- Ne mêrik bikuje, ne bi qicikê bimije.

6724- Nêr dewlet e, mê qismet e.

6725- Paleyê çê berdana cê.

6726- Qedrê mêran jin dizanin.

6727- Qeşmer şeş qarxa dibe.

Gotinekê Kurdên Xoresanê ye

6728- Qeweta heft pîrekan di piyê zilamekî xerab de ye.

6729- Qewet hîle dibire.

6730- Qîz xwestin germ bi germ, mêrkuştin nerm bi nerm.

6731- Raketin li ser emrê mirov nîne.

Yanî raketin ji emrê mirov nayê hesibandin.

6732- Sed Yasîn û Tebarek bide ber guhê dewarek çî fêrî dîke!

6633- Ser hene bi tac in, ser hene bi hevсар in.

6734- Serê xwe veke, li bextê xwe mêzeke.

6735- Serê xwe şuştîye, heneya xwe helmaştîye.

6736- Seviya rokê xerdiye, heft cara mal barkiriye.

6737- Seyê durist ji mêrê kotî çêtir e.

6738- Simêla garis, nanê genim!

6739- Siya zavê, siya dar e.

6740- Şeytan saz ji wê dinê aniye.

- 6741- Şêr li dîyar ket, rovî bi çekalan ket.
- 6742- Şîrîk şîrîkan jîr kir, hewî hewiyan pîr kir.
- 6743- Şîr ku hat dotin êdî naçe guhan.
- 6744- Şuxil barê keran e, îqbal barê seran e.
- 6745- Şûna bi dar, bi tirs dibe.
- 6746- Şûrê teleban qelem-kaxez e.
- 6747- Taviya nîsanê hêja ye malê Xurestanê.
- 6748- Tebîetê xweş-xweş mirov pê digihêje Xwedê
- 6749- Temûz û tebaxê agir digire axê.
- 6750- Tevdan ji helîsê re baş e.
- 6751- Têke çalê risqê salê.
- 6752- Tîr ku ji kevan çû êdî venagere.
- 6753- Tirs mamê gur e.
- 6754- Tovê belkiyê şîn nabe.
- 6755- Vir li mala me jî pir in.
- 6756- Virek û sed vir li ba virekan yek e.
- 6757- Wijdanê hinek kesan di bin solên wan de ye.
- 6758- Wijdan ku ket bazarê, dest bişo ji hewarê.
- 6759- Xizan bi halê xwe bizaniya, dê riz bixwarana.
- 6760- Xwarin xweş e, kirin reş e.
- 6761- Xwediyê lezê her poşman e.
- 6762- Xweliya heft gundan, li pozê pozbilindan.
- 6763- Yekî nalek dît, got: Ma sê nal û hespek.
- 6764- Yên bê sebir tim tîh in û tim dê bimînin.
- 6765- Zeman şûr e, ger tu wî nebirî, ew ê te bibire!
- 6766- Zimanê sor ji xwediyê xwe re xerab nabêje.

îndeks

Indeks ne li gor jîmarên rûpelan e, li gor jîmarên gotinan e.

- aborî 1, 3537, 4537, 4550, 5610, 2797, 4723
5821, 5914
- berhem 339, 345, 1120, 1126
- aramî an sebir 552, 776, 780, 963,
1168, 1516, 1562, 2079, 2553, 2614, bertîl 394, 395, 6038
3680, 4082, 4084, 4401, 4406, 4427,
4537, 5015, 5409, 5410, 5411, 6754, berxwedan 1893, 2232
6764
- berxweneketî 4750, 5368, 5369,
5370, 5421, 5827, 5852
- aştî û azadî 183, 365, 1311, 2728, 5001
- bext 258, 421, 422, 423, ji hejmara
424 an heta 441 ê, 1873, 3139, 5471,
5988, 6270, 6435
- axa 166, 167, 168, 169, 170, 171, 172, 173, 174, 178, 179, 1025, 1050,
1264, 1270, 1851, 2935, 3103, 4038,
4096, 4097, 5353, 5490, 5529, 6623, 6627
- bêbawerî 2403, 4594, 4994, 4996,
6167, 6234
- başî, qencî, çeyî 874, 967, 968, 969, 970, 1471, 2446, 2697, 4494 ji hej-
mara 5096 an heta 5108 an, 5506,
5762, 5873
- bêbext 38, 447, 1862, 1864, 1879,
3440, 3495, 3643, 4272, 4480, 4864
- bêçare û bêçaretî 2943, 6153
- bav û zarok 240, 241, 242, 243, 246, 247, 348,
- bêdadî an neheqî 2308, 2828, 3027,
3029, 3030, 3378
- bawerî 264, 265, 2972, 3019, 4524, 4858, 5884, 5959, 5985, 6432
- bêdengî 2381, 4338, 6414
- bazar û bazirganî 2461, 5610, 5821, 5914
- bêesil 2931, 2986, 3001, 3034, 3037,
3092, 3424, 3425, 3880, 4482, 4851,
6410
- Bedlîs 1149
- bêexlaqî 2390, 2420, 3466, 5109
- behane an mane 1790, 2136, 3508, 3911, 4718, 5334
- bêfedî 2420, 3466, 3539, 4483
- belaş 55, 108, 109, 237, 306, 386,
3304, 4600, 4720
- bêminetî 3451, 3658, 6135, 6643
- belengaz û belengazî 308, 309, 2412,
- bênamûsî 863, 1845, 3443, 3637,
3642, 5431

bêqîmet 3638, 4318, 4320, 4376, 2085, 3463, 4530, 5433 4430, 4457, 4474, 4547, 4548, 4892, 4987, 4993, 5880, 5881	Cebexçûr - Bîngol 3848
bêşansî 6007, 6010	cehd 3113, 3114
bêşexsiyetî 3459, 3877, 3878, 4627, 4859	cehenem 863, 2701.5079, 5936
bêtifaq î 1193, 2220	cenet 835, 836, 837, 850, 863, 1102, 1142, 2701, 3657, 5079, 5431, 5936, 6321
bêxîret 3054, 3441, 4250	Cihû 845, 846, 3894
bindestî 2575, 4491	cîran 37, 882, 883, 884, 885, 886, 887, 1300, 1895, 2023, 1300, 2375, 2417, 2467, 3494, 4050, 4383, 4412, 4818, 4957, 5152, 5178, 5217, 5434, 6647
bira û biratî 52, 56, 76, 131, 238, 422, 625, 675, 716 heta 730 an, 883, 982, 1687, 1701, 1860, 1864, 1865, 1915, 1974, 2321, 2377, 2384, 2600, 2735, 2752, 2768, 3069, 3169, 3190, 3198, 3206, 3254, 3255, 3288, 3602, 3752, 3765, 3773, 3775, 3778, 3739, 4658, 4694, 4837, 5360, 5382, 5665, 5677, 5761, 5863, 5865, 6023, 6077, 6243, 6407, 6435, 6597, 6603	comerd 889, 890, 4100, 4698 çek an jî sîleh 949, 950, 4267, 5611, 5612, 5724, 5725, 5726, 5727, 5728, 5729, 5730, 5731, 5825, 5826, 6077
biryar 3320, 4746	çikûs 1002, 4100, 4101, 4115, 4196, 4422, 4495, ji hejmara 5837 an heta 5843 , 6179
bîyanî 29, 153, 2703, 6068, 6224	dagîrkerî 2312, 2319
bûk 200, 604, 650, 786, 787, 788, 789, 790, 791, 792, 793, 794, 795, 796, 797, 798, 799, 800, 801, 802, 803, 804, 805, 806, 807, 808, 809, 810, 811, 812, 1419, 1447, 1152, 1156, 1284, 1666, 1974, 2031, 2154, 2208, 2370, 2463, 2660, 2766, 3035, 3234, 3603, 3872, 3 892, 3924, 4079, 4179, 4663, 4840, 5132, 5161, 5168, 5424, 5874, 5971, 6072, 6082, 6087, 6240, 6318, 6341, 6353, 6429, 6647	danûstandin an kirîn û firotin 860, 1081, 1603, 3537, 3538, 3589, 3590 daxwaz 4453, 4958, 4975, 6230, 6231, 6232, 6233 dayik an dê 1177, 1178, 1179, 1180, 1181, 1182, 1183, 1437, 1438, 1439, 1440, 1441, 1442, 1443, 1444, 1445, 1446, 1447, 1448, 1616, heta hejmara 1624 an, 2095, 3542, 3731, 6259
camêrî 636, 813, 1495, 1496, 2021,	

dem an zeman 1204, 1205, 1206, 1207, 1208, 1209, 2110, 4475, 5987, 6009, 6154, 6765	2804, 2805, 2837, 2908, 3296, 2993, 3541, 3904, 4339, 4431, 4761, 5064, 5259, 5632, 5633, 6278, 6398
derengî 2660, 2661, 2730, 6063	dîn 79, 129, 165, 210, 222, 228, 230, 231, 317, 420, 500, 1595, ji 1651 ê
derew an jî vir 23, 221, 262, 488, 489, 562, 1053, 1165, 1166, 1171, 1282, 1283 heta hejmara 1294 an, 1811, 2434, 2475, 3846, 3866, 3913, 4004, 4085, 4086, 4128, 4165, 4497, 4611, 4658, 4697, 4761, 5368, 5849, 5922, 5963, 5983, 5984, 5985, 6007, 6255, 6338, 6358, 6658, 6659	heta 1657 an, 1861, 2508, 2905, 2911, 2951, 2995, 3017, 3309, 3744, 3745, 3994, 4057, 6458, 4681, 4682, 4693, 6308 Dîyarbekir 5597
dewlemend 669, 1414, 1415, 1416, 2270, 3479, 4367, 4412, 4422, 4499, 4520, 4539, 4698, 4761, 5235	dost û dostîfî 578, 640, 1252, 1682 ji heta 1679 an, 2779, 2918, 2996, 3032, 3119, 4126, 4398, 4423, 5265
dewlet 1417, 1418, 1419, 1420, 4095, 6062	dua 502, 503, 1901, 3671, 4672, 4964, 6264
deyndar an qerzdar 632, 657, 665, 666, 669, 683, ji hejmara 1428 an heta ya 1436 an, 2429, 4410, 5494, 4631, 5110, 5903	dujinî 2344, 4288, 4289, 4643, 4715, 4995, 6713
dêûbav 2985, 3468, 3608, 4829, 5988, 6065	durû 548, 549, 745, 1329, 2803, 2806
dêr 2987, 2988, 3478, 6327	edet an tore 3124, 4992, 6469
dijmin an niyar 120, 496, 635, 636, 663, 699, 961, 1258, 1261, 1274, 1486 heta 1503 an, 1808, 2092, 2376, 2425, 2594, 2595, 2772, 2779, 2918, 2990, 2991, 2992, 3041, 3076, 3905, 4148, 4594, 4687, 4806, 4807, 4808, 4809, 4810, 4811, 4947, 4988, 5265	efû 2948, 4923, 5346, 6059
diz 1338, 1339, 1340, 1341, 1348, 135, 1620 heta 1640, 1703, 1795, 1805, 1874, 1888, 2143, 2390, 2414,	ehmeq, ehmeqî 523, 679, 1071, 1080, 1163, 1189, 1307, 2147, 2403, 2718, 2827, 3044, 3373, 3374, 3383, 3393, 3470, 3849, 4216, 4295, 4346, 4924, 5121
	eqil û eqilmendî 859, 1220, 1753, 1754, 1755 heta 1774 an, 2547, 2555, 2674, 3479, 41256 4138, 4432, 4628, 4659, 5235, 5482, 5546, 5884, 6308
	erbab 2562, 4620, 5268, 6608
	Ereb 1612, 1782, 1783, 1784, 1786,

3000, 3559, 4770, 5354, 5861, 6542, 6621	fikir an raman 2893, 4951, 6460, 6462, 6625, 6749
csil û fesil 149, 2369, 2490, 2778, 3001, 3848, 4597, 6031	gelacî 3685, 5333, 6394
evîn an bengî 32, 828, 1106, 1293, 1804, 1805, 1806, 3332, 4016, 4029, 4093, 5292, 5794, 6340	geveze 1747, 2052, 2823, 4139, 4966, 5699, 6019, 6420
êl 159, 335, 1414, 1420, 1740, 1906	gotina xweş 496, 514, 4710, 4880, 6491
heta 1914 an, 2485, 3933, 4095, 4365, 4695, 4775	gotina ne xweş 739, 1426, 2182, 2190, 2191, 2192, 2449, 5385, 5719, 6055
Êzdî 1922, 1923, 1924, 4302, 4303	
Faris 1928, 6625	guhêrîn 2563, 2564
fedî an şerm 942, 1930, 3071, 3125, 3448, 3570, 4338, 4451, 4506, 4722, 4754, 4922, 4975, 5344, 5345, 5625, 5848	guman 203, 1850, 4159, 4484 Heleb 1833
fen an fêlbazî 1932, 1933, 1936, 1937, 1938, 2354, 2416, 2583, 3100, 3750, 4311, 4696, 5339, 6402	helal û heram 2361, 2573, 4111, 4112, 4128, 4616, 4618, 4795, 6707 heq 518, 2465, 2466, 2467, 2468, 2469, 2807, 4002, 4074, 6461
feqîrî an xizanî 388, 610, 785, 1025, 1030, 1163, 1270, 1342, 1711, 1939, 1940, 1941 heta 1950 î, 2935, 3479, 3480, 3481, 3482, 3483, 3639, 4235, 4304, 4367, 4539, 4625, 4697, 4698, 4761, 4894, 4902, 5355, 5485, 5505, 5814, 5964, 6015, 6016, 6071	heval û hevaltî 209, 224, 470, 532, 567, 736, 2558, 2559, 273 heta 2753 an, 2768, 4366, 4744, 4746, 4767, 4958, 4967, 5491, 5910, 5954 hevsarkêşî 1220, 4399, 4407
fersend, keys 22, 2390, 2497, 3408, 3528, 3529	hewce û hewcedarî 1037, 1040, 4377, 5461, 5488, 5811, 6647
fesadî 10, 16, 2124, 2197, 2404, 2710, 3437, 3806, 4714	hewez 2399, 2762 hewî 672, 1271, 1920, 2927, 6653
Fileh 1708, 1784, 1961, 1962, 1963, 2450, 2646, 2844, 3105, 3894, 4692	heyf an tol 44, 45, 2342, 2343, 3899,

4812, 6384	4279, 4299, 4711, 4721, 4921
hez 487, 704, 1517, 1657, 2777, 2785, 2786, 2967, 3472, 3694, 4074, 6374, 65611, 6595	jiyan an jîn 1115, 3256, 3257, 3258, 3897, 4209
hêvî 2797, 2798, 3055, 3068, 3077, 3440, 3614, 3897, 4849	keç an jî qîz 24, 254, 399, 648, 649, 650, 684, 688, 689, 691, 1114, 1246, 3322, 3323, 3324, 3325, 3326, 3331heta 3341, 3534, 3542, 3731, 5092, 5132 heta 5168 an, 5890
hiş ji hejmara 2859 an heta 2861 ê	
hînbûn û hînkirin 2872, 2873, 2874, 3453, 3485, 4219, 4239, 5705, 5770, 6679	ked û xwêdan 75, 754, 991, 2043, 2362, 2441, 2665, 2666, 2673, 2685, 3342, 3343, 3344, 3345, 3346, 3327, 3454, 3545, 4414, 4460, 4618, 4869, 4871, 4872, 4879, 5529, 5918, 5925, 5926, 6639, 6641, 6691, 6698
huner 1331, 1371, 2459, 2525, 3571, 4654, 4656 5715, 5834, 6608	
hurmet, qîmet û rûmet 2034, 3071, 3267, 3623, 4224, 4225, 4452, 6411	kedxwarî 2824, 2825, 3589
îlm 466, 2896, 2897, 2898	kefî 229, 354, 3488, 3543, 4533, 5000, 5944, 6167
îman 2899, 2944, 3901, 4049, 4484, 4859, 4865	kêmeqil 507, 516, 1189, 4231, 4232, 4505, 4628, 5456
îmkan 2488, 2900, 2945	kole 2439, 3016
jin an pîrek 338, 357, 404, 491, 531, 643, 644, 645, 646, 647, 680, 870, 1151, 1313, 1318, 1409, 1708, 1793, 1830, 1938, 1971, 2135, 2215, 2298, 2403, 2483, 2577, 2578, 2826, 2925, 2970, 3034, 3035, ji hejmara 3143 an heta 3253 an, 3475, 3809, 4021, 4027, 4045, 4103, 4214, 4343, 4400, 4425, 4597, 4723, 4724, 4725, 4726, 5021, 5022, 5023, 5044, 5240, 5365, 5401, 5503, 5507, 5650, 5657, 6047, 6259, 6401, 6570, 6664	kolektîv 2555, 2648, 3914, 4972, 5551, 6319, 6320, 6337 kubarî 3713, 3714 kur an law 652, 653, 3534, ji hejmara 3757 an heta ya 3768 an, 3773 heta 3784 an, 3849, 3850, 4087, 4120, 4133, 4736, 4740 Kurd 264, 2406, 2927, 3769, 3770, 3771, 4067, 4834, 5313, 5859
jin û mêr 1468, 2756, 4233, 4235, 4236, 4248, 4249, 4252, 4259, 4278,	Kurmanc û kurmançî 2122, 2443, 2844, 3756, 3788, 3789, 3790, 3791,

3792, 3793, 3794, 3795, 3796, 3797, 2333, 2423, 2486, 2518, 3336, 3629,
 3798, 4306, 4307, 6526 3836, 3930, 4063, 4072, 4081, 4321,
 4565, 4566, 4567, 4568, 4569, 4570,
 layiq 3851, 5189, 5380, 6176 4571, 4843, 5355, 5411, 5684, 5919,
 5958, 6008, 6216
 Meke 2528
 Mosil 3
 mamoste 1616
 Namûs 686, 3085, 4584 heta hejmara
 mele 925, 928, 941, 2911, 2972, 4591 ê, 4632, 4655, 4660, 4906
 3051, 3915, 4196 heta 4205, 4630,
 4675, 4846, 5580 Mûş 1834, 4576
 merd 1353, 4539, 4609, 5454
 nankorî 1475, 2316, 3877, 422, 4341,
 4614, 4715, 5194, 6623
 mêr û mêrxasî 408, 627, 643, 647,
 663, 676, 681, 697, 1107, 1253, 1320, nav û deng 1087, 1976, 3064, 4793
 1354, 1468, 1473, 1748, 1885, 1887,
 1898, 1899, 2027, 2309, 2458, 3518, neçar 3072, 3073, 4447
 3576, 3641, 3808, 3886, 4090, 4091,
 4260 ji hejmara 4233 an heta 4313 an, nehewcedar 4241, 4242, 4243, 4244
 4461, 4462, 4631, 4736, 5122, 5220,
 5228, 5229, 5377, 5467, 5638, 5743, nemerdd û nemerddî 269, 492, 1484,
 6022, 6118, 6429, 6432, 6570, 6709 3871, 4524, 4635, 4791
 mêvan û mêvantî 831, 1225, 1799, Newroz 4799
 2005, 1225, 2426, 2582, 2894, 2595,
 2782, 3060, 3411, 3412, 3830, 4048, nezan û nezanî 80, 234, 270, 579,
 4049, 4050, 4137, 4321, 4322, 4323, 785, 1275, 1374, 1464, 1824, 2335,
 4324, 4325, 4326, 4327, 4331, 4334, 2417, 2418, 2906, 3042, 3457, 3458,
 4438, 4626, 4723, 4762, 5139, 5277, 4421, 4525, 4529, 4817, 4818, 4819,
 5376, 5505, 6001, 6014, 6209, 6318 4820, 4821, 4984, 5218, 5961, 6095
 millet 2596, 2990, 3127, 3465, 3620, nifir 503, 1901, 4672, 4829
 4336, 4487
 nîmet 614, 2357, 3418, 4460
 minet 4592, 4594, 4619, 4645, 5110,
 5452, 5514, 6562 pakî û paqijî 4865, 4866, 5357, 5861,
 5989, 6155
 miraz 4401, 4678, 5877
 mîr 86, 454, 462, 579, 1017, 1163, pere 3080, 4908, 4909, 4910, 4911,
 1752, 1863, 2133, 2139, 2160, 2323, 4912, 4913, 4914, 4915, 4916, 4917,

5725, 5799, 6250	6446
perwerde 1125, 1299, 1453, 1616, 2387, 2410	rexne 361, 1136, 3428, 3429, 3430, 4954
pesn û fort 73, 211, 1299, 1776, 1859, 2616, 3472, 3496, 4167, 4701, 5597	risq û qismet 62, 662, 2049, 2055, 2254, 3136, 3434, 3921, 5129, ji hej- mara 5274 an heta 5279 an, 6094, 6656
pirrengî û pirdengî 2491, 2555	
pîsîtî 3686, 5036	rizgarî 3903, 4465, 6116
poşman 3461, 3617, 3624, 4448, 4531, 4889, 5918, 6068, 6459	serok 693, 694, 2716, 3311, 4172, 4228, 5870
pratîk 1469, 3007, 3295, 3587, 6660	sextekarî 272, 1878, 2114, 3509, 5055
qanûn 5055, 5056	
qedir 5079, 5080, 5081, 5082, 5083, 5084, 5085, 6719	sir 2171, 2172, 2173, 2181, 2198 sond 4165, 4240, 4639, 5569
qehpe û qehpetî 1348, 1593, 5086, 5087, 5088	soz 3367, 5114, 5572
qelb an zexel 1987, 2022, 3495, 4123, 4830, 4839, 4866, 4867, 6454	sûc û sûcdar 2375, 5048, 5186 şans 275, 3101, 3519, 5546, 5845
qelem 48, 822, 795, 808, 2085, 3320, 4509, 4900, 5721, 5895, 6257, 6738	şaşî 4754, 6059, 6083, 6084
qîmet û biha 2659, 2690, 2700, 4843, 5131, 6541, 6546, 6548	şer û şervan 1169, 1170, 1311, 1481, 1819, 2355, 4082, 4093, 4188, 4267, 4274, 5001, 5610, ji hej- mara 5609 an heta 5661 ê, 5622, 5623, 5624, 5628, 6013
qure an pozbilind 1011, 1096 1814, 1925, 2044, 2561, 3584, 3714, 4122, 4122, 4741, 4762, 6168, 6385, 6449, 6683, 6762	şêwir û şêwirmendî 343, 521, 2405, 3675, 5655, 5656, 5657
rastî û duristî 481, 178, 2179, 2185, 2409, 2591, 2592, 3748, 3749, 3903, 4161, 4641, 4948, 5196 heta 5212 an, 5267, 5295, 5922, 6111, 6146, 6445,	şêx 941, 960, 3051, 4675, 5658, 5659 şîret 210, 1227, 2156, 2167, 2168, 2246, 2476, 2505, 2548, 3995, 4649, 4982, 5688, 5689, 5690, 6474

tecrûbe 497, 711, 1408, 2532, 4442, 4979, 5779	xebat û xebatkar 1126, 4525, 4535, 6041, 6042, 6043, 6044, 6045, 6046, 6418, 6466
tedbîr 560, 1815, 4883, 6359, 6365	xerab û xerabî 554, 968, 970, 2671, 2697, 2996, 3498, 3684, 4687, 5322, ji hejmara 6078 an heta 6079 an, 6080
teresî 1107, 1134, 1470, 2974, 6347	
têkoşîn 1115, 1596, 2698, 3855, 4267, 4845, 4869, 5193	xerîb û xerîbî 2907, 3554, 4538, 5283, 5849, 6070, 6081
tiral 84, 471, 4725, 5386, 5828	xesû 141, 788, 1284, 1613, 2031, 4700, 6077, 6240, 6520, 6516
Tirk 38, 438, 644, 1928, 1936, 2367, 2970, 3360, 4642, 5056, 5323, 5324, 5325, 5804, 5857, 5858, 5859, 5860, 5861, 6621	xeyal 4390, 4476, 5888
tirs û tirsonekî 465, 913, 927, 1953, 3442, 3663, 4250, 4296, 4310, 4358, 4445, 4536, 4537, 5862, 5863, 5864, 5865, 5866, 5867, 5868, 6181, 6745	hezûr 3057, 5970, 6514, 6517, 6518, 6519
ulm û ulmdar 46, 48, 5966, 5967, 5968, 5969, 5970, 5971	xêr 1173, 1301, 1302, 3022, 3478, 4337, 4459, 4673, 4760, 4802, 5017, 5774, 6014, 6026, ji hejmara 6103 an heta 6114 an, 6327, 6566, 6622
wekhevî 1576, 3592	xizan 6120, ji hejmara 6120 an heta 6134 an, 6161, 6659
welat û welatparêzî 708, 757, 1624, 1806, 2534, 2703, 3465, 4457, 4489, 4518, 4845, 5292, 5557, 5592, 5993, 5994, 5995, 5996, 5997, 6399, 6533	xîret 5588, 6136, 6137, 6138
wijdan 6458, 6650, 6754, 6755	xulam 573, 579, 3716, 4096, 4097, 4237, 4260, 4663, 4720, 5474
xapîn û xapandin 396, 1738, 2841, 3372, 3535, 4004	xû an exlaq 781, 814, 973, 983, 1348, 1390, 1727, 1984, 2117, 3376, 3583, 3801, 3980, 4425, 5180, 5181, 5182, 5183, 5778, 5795, 6099, 6100, 6101, 6150
xatir 2962, 2963, 2964, 2965, 4441, 5405, 5406, 5407, 5408, 5501, 6038	Xwedê 699, 747, 749, 1007, 1017, 1081, 1130, 1206, 1234, 1818, 2007, 2329, 2423, 2435, 2763, 2977, 3042, 3125, 3290, 4084, 4327, 4418, 4470, 4666, 5196, 5727, 5737, 5907, 6017,
xayîn û xayîntî 1750, 2388, 2928, 3521, 5808, 6035, 6390	

ji hejmara 6170 an heta 6198 an, 4510, 6427, 6637
6362, 6377

xwendin 966, 2566, 3557, 4013, 5775, 6228, 6229
ziman 577, 581, 1001, 1460, 1485,
3450, 4336, 4400, 4403, 4409, 5191,
6252, 6290, 6291 6374, 6490, 6494, ji
hejmara 6573 an heta 6596 ê, 6766

xwezî 572, 1127, 1128, 4766, 5372,
5859, ji hejmara 6236 ê heta 6240 an,
xwişk 453, 1177, 1593, 1915, 2377,
4164, 4988, 5360, 6243
zor û zordarî 487, 494, 501, 1059,
1129, 1142, 1174, 2385, 2804, 3657,
4120, 4130, 4397, 6548, 6610, 6611,
6612, 6613, 6614, 6615, 6618, 6619,
6620

xwîni an xwîndar 632, 683, 6244,
6245, 6246, 6247, 6248, 6249, 6250,
6251
zulm 6618, 6619, 6620, 6621

yekîti 4022, 4095, 5822, 5823

zalim 576, 1546, 2944, 3611, 4638,
4873, 6264, 6571

zana û zanîn 234, 575, 2335, 2586,
2977, 4262, 4263, 4421, 4693, 5218,
6147, 6419, 6472, 6473, ji hejmara
6480 an heta 6489 an,

zarok 586, 1547, 3698, 4053, 4065,
4089, 4743, 5071, 5247, 5341, 5640,
6474, ji hejmara 6492 an heta 6513
an, 6523, 6567

zava 141, 2463, 4180, ji hejmara
6514 heta 6519 an,

zehmetî 6524, 6525

zengîn 6527 heta 6530 an. Li gotina
dewlemen binêre!

zewac an şûkirin 3974, 6537, 6538,
6539

zikreşî an kumreşî 3677, 4158, 4164,

Çavkaniyên nivîskî

1. Tawûsparêz, berhevoka kovara Hawarê cîldê yekem, 1934-1943 - Şam.
2. Mîr Dr. Kamiran Alî Bedirxan, Berhevoka Roja Nû, Xwedî û gerînde Weşanên Jîna Nû.
3. Lawikê Tiloyî, berhevoka kovara Ronahî, 1942-1945 - Şam.
4. Law Reşîd, Jîn kovara Kurdî-Tirkî, 1918-1919 hejmar: 3, 4, 5, 7, 8, 14, 19 û 24, Îstanbûl. Wergêra tîpên latînî: M. E. Bozarslan- Uppsala
5. Emîr Celadet Bedîr Han & Roger Lescot, Kûrtçe Gramerî- 1990 -Institut De Paris.
6. Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, Mesele û Metelokên Kurdî- Adar 1976 Weşanên Ronahî-Zürich.
7. Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, Zargotina Kurda cîlt-2, 1978- Moskova
8. Qanadê Kurdo, Gramera Zimanê Kurdî (Kurmancî-Soranî) Weşanên Roja Nû 1990- Stockholm.
9. M.E. Bozaslan, Alfabe, 1968- İstanbul.
10. Berhevoka kovara Çiya hejmar 1-8, 1965-1970- Ewropa.
11. Mele Mehmûd Dêrşewî, Miştexta Çiya, Ji Gotinên Pêşiya, 1989- Stockholm
12. Kovara Stêr, hejmar 3, sal 1983.
13. Salih Omerî, Roja Nû, kovara hunerî, çandî û edebî- hejmar: 19, 22, 33, 35, 40, 47,49,50,51,54-1983- 1987 -Stockholm.
14. Rojnameyên Welat, Welatê Me û Azadiya Welat- İstanbul.
15. Kulîlk kovara Zarokên Kurd ên şagirt- Stockholm.
16. Amed Tîgrîs, Nîşan û Dawet, 1991- Stockholm.
17. Mahmut Baksî, Gundikê Dono, Orfeus, 1988- Stockholm.
18. Îhsan Culmêrgî, Cembelî (Kurê Mîrê Hekaryan), Weşanên APEC 1995- Stockholm
19. Malmîsanij, Folklorê Ma Ra Çend Numûney, Weşanên Jîna Nû, 1991 Sweden.
20. A. Balî, Gotinên Pêşiyên ên Kurdî, Pelê Sor, 1993- İstanbul
21. Salnameya Roj a 1996 -1997, Weşanên Doz- İstanbul.
22. B. Zinar, kovara Deng hejmar 5.
23. Baran Rizgar, Uygulamalı Kûrtçe Dersleri- Dersên Kurdî, 1993 - London.
24. Hûseyîn Denîz, Gotinê Pêşiyê Kurda- Kaynak Yayınları,1994- Istanbul.
25. Migirdiç Margosyan, Söyle Margos Nerelisen, Aras Yayınları 1996- Istanbul.
26. Salnama Serfiraziyê 1997 a Hereketa Islamiya Kurdistanê.
27. Kurmancî rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parisê li ser pirsên

zaravayên kurmanci

28. Feqî Huseyn Sagniç, Hêmana Rêzimanê Kurdî, Melsa, 1991- Istanbul.
29. Cigerxwîn, Jînenigariya Min, Weşanên APEC 1995- Stockholm.
30. Rohat, Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan-Weşanên Nûdem-1994- Stockholm.
31. Gurikî û Sebîha Özgür, kovara Bîrnebûn hejmar 2, 3, 4, 9, 12- Stockholm.
32. Rêşad Amedî û Bawkî Aran, kovara Avaşîn hejmar 8, 9, 10.
33. Mustafa Gazî, Rojnameya Hêvî, hejmar ji 70 heta 90 î. 1998- Istanbul.
34. Kovara Jiyana Rewşen hejmar: 15, 16, 17, 18, 19, 20.
35. T. Çabuk, Rewşen hejmar 3 Gulan-1992
36. Ereb Şemo, Jiyana Bextewar, Weşanên Roja Nû- Îlon 1990 -Stockholm.
37. Mehmed Uzun, Bîra Qederê, Weşanxana Sara, Stockholm.
38. Mele Beşîr, Sofî Remo, çapxana Medya 1998 - Stockholm.
39. Xurşîd Mîrzengî, Bircên Evînê, 1998 - Stockholm.
40. M. Kadîr Göral, Kuçe Kapısı, Dörtüncü Baskı, 1998-Ankara.
41. Bavê Hozan, kovara Huner, hejmar: 1, 1998.
42. Mehfûzê Mele Silêman, 4000 Pendê Kurdî, 1993-Qamîşlo.
43. Bavê Nazê, Rêzimana Zimanê Kurdî, Weşanên Axîna Welat, 1996 Moskova
44. Prof. Pertev Naîlî Boratav, 100 Soruda Türk Halk Edebiyatı, Gerçek Yayınevî-Istanbul.
45. Pelle Holm, Ordspråk & Tallesätt, 1986-Eskiltuna
46. Ann Boglind & Bengt Brodow, Svensk Boken- 7, 1988- Stockholm
47. Solomos, Ordspråksbok- Gamla Testamentet (beşek ji Tewratê), rûpel 812, 848, SkabFörlag, 1917- Stockholm
48. Jorgen Mejer och Minna Skafte Jensen, Litteraturens Historiya-1, P. A. Norstedt & Sønner Forlag, 1985- Stockholm
49. Omer Güneş, kovara Nûbihar, hejmar 79-81, 1999- Stanbol
50. I. I. Sukerman, (transkîpsiyon M. Lewendî) Xoranskî Kurmancî (Gotinên Pêşiyên ji Xorasanê), 1986-Moskova
51. Paul Beîdar, Garmmaîre Kurde- 1926 (werger: M. Lewendî)
52. Mistefa Gazî, berhevoka Gotinên Pêşiyên a Herêma Qerecaxê
53. M. E. Bozarlan, Quncikê Zimên, Roja Teze- 1999-2000

